# ABÛRIYA DEMOKRATÎK-KOMÎNAL

JI WEŞANÊN AKADEMIYA ZANISTÊN CIVAKÎ YA ABDULLAH OCALAN HATIYE WERGERANDIN

| | | |
|---|---|---|
| **WERGERANDIN** | **:** | **AKADEMIYA ŞEHÎD FERHAT KURTAY** |
| **CIHÊ ÇAPÊ** | **:** | **WARGEHA Ş. RUSTEM CÛDÎ-MEXMÛR** |
| **DÎROKA ÇAPÊ** | **:** | ٢٠١٣ |

## *DESTPÊK*

***Abdullah Ocalan***

*Têgeha abûriyê gerdûniye. Di cîhana tevayê zindiyande wekû rêkûpêk kirina dayîn û standina heyber ya di bûyera metabolîzmayê de, dikare bi danasînek herî giştî were îfadekirin. Ji heybera ne zindî destxistina heybera zindîker û bi mezaxtina wê dûbare vegerandina li heybera ne zindî cewherê çalakiya abûriyê ye. Eşkereye kû civak jî di berdewamkirina çêbûn û hebûna xwe de yê ji vê çalakiyê bê par nemîne. Lê rastiya din ya bi vê ve peywendîdar heta kû zindîtî nebe jî -zîhniyet, wekû ruh tê bi wate kirin- abûrî nabe. Li gora vê, tenê giranî dayîna hebûnekê û nirxandina wê, dê mirov bibe encamên çewt. Nirxandina zîhniyet û abûriyê di nav hev de -komên civakî yên navber an kû ne esasî dewlet û malbate, hîn giştîtir hebûnên civakî û siyasîne-rêbaza herî raste. Bi serê xwe analîzên abûrî yan jî zîhniyetê mirov ber bi şaşiyek wusa ve dibe kû mîna mirov fîlekê bi muyan pênase bike.*

*Wateya bi Yunanî ya peyva abûriyê, "yasaya malbatê, yasaya malê, rêsayên debara malê" ne. Wekû bêje behemê cîhana Grek-Helen ya çaxê kevne. Eko-nomos, tê wateya yasaya malê, karên jin dike, karên malê û karên girêdayê jinê. Ekonomos an kû ekonomî karê jinêye, girêdayê hilberînêye, ekonomîst jî kesê vî karî dike an kû ekonomîst jine. Rêsayên debara maddî ya malbatê, derdora wê, amûr û amrazên din yên wê îfade dike. Eger em dixwazin ekonomiyê di warê civakolojiyê de bi wate bi nirxînin, nêzîkatiya herî rast, wekû beşek yê zanista jinê dê pêşxistina zanista ekonomiyê be. Ekonomî, awayê çalakiyek komaniye kû ji destpêkê ve ye jinê rola xwe ya sereke têde leyîstiye. Pirsgirêka tîmarbûna zarokan ji ber kû li ser pişta jinêye, ekonomî ji bo jinê girîngiyek jiyanî îfade dike. Namûs, ji eko-nomos'ê tê. Zelale kû ev jî karê bingehîn yê jinêye. Rol leyîstina jinê ya di navenda ekonomiyê de, xalek zelal û tê fêmkirine. Ji ber kû zarokan di afirîne û wan tîmar dike. Ji ekonomiyê jin fêm neke, gelo kî yê fêm bike! Di komana bi şaristan de, eger em vê têgehê hîn giştîtir bikin, îfade kirina wê wekû; "rêsayên debarkirinê" yên komikên biçûk jî gengaze.*

*Pirsgirêka abûriyê, ya rastî i avêtina ji dervey abûriyê ya jinê re destpêdike. Bi giştî di dîroka şaristaniyê de, bi taybet di modernîta kapîtalîst de, dema jin tê derkirin, ekonomiya kû zilamên zexim li ser herî zêde leyîstîn, ji ber vê sedemê vegeraye gilokek ya pirsgirêkan. Ev leyîstoka ti peywendiya wê ya lebetî bi abûriyê re neyî, tenê bi hêrsa qezenç û hêzê ya zêde, di serî de jin û herwusa ji bo xistina bin desthilatdariyê ya tevayê hêzên abûriyê hatî destpêkirin, di encam de rê li ber mezinbûna weke kulikekê li ser civakê ya her core hiyerarşiyê û hêzên dewletê vekiriye û gihaye astekê kû neyê domkirin û livandin.*

*Ji destê jinê standina abûriyê û xistina destê rayedarên weke; axa, tefekar, bazirgan, pare, sermayedar û îxtîdar-dewlet tevdigerin, li dijî jiyana abûriyane bûye hingaftinek herî mezin. Abûriya tê xistina nav destê hêzên dij-abûriyê, bi lezgînî anîna rewşa hedefa bingehîn ya îxtîdar û mîlîtarîzmê, bi dirêjiya tevê dîroka şaristaniyê û modêrnîteyê, hatiye vegerandina sedemê bingehîn yê şer, pevçûn, qeyran û*

*tevliheviyên bêsinûr. Di roja me de, kesên ti peywendiya wan bi abûriyê re neyî, tevî pê leyîstina bi perçên kaxezê bi rêbazên ji qûmarê kembaxtir, abûrî anîne rewşa qada leyîstokekê kû bê sinûr nirxên civakî têde tên desteserkirin û dizîn. Pîşeyê pîroz yê jinê hatiye vegerandina leyîstokên nirx û faîzê, vegerandina li borsa û karxaneyên kû berhemên pûç, tenê qezenc(kâr)ê tînin û ti peywendiyek zêde ya wê bi pêwistiyên bingehîn yên mirov re neyî, di hilberîne; dîsa ev pîşe hatiye vegerandina karxaneyên afirandina amûr û amrazên trafîkî, mekîneyên şer yên derdor anîne rewşa neyê jiyanbûn û qada bi temamî jin jê hatî derkirin.*

*Ji tîmarkirina zarok di zikê xwe de em bigrin ta ya zortirîn kû anîna rewşa li ser lingê xwe raweste ya piştî anîna cîhanêye, madem jin vê dike, wê demê pîşevana tîmarkirina malê jî jine; wê demê hêza herî bingehîn jine. Bersiva min, bersivek sosyolojîk ya hîn zêdetir rêzdarê rastiyêye. Lê bi misogerî bi berçavgirtina peywendiya wê ya bi biyolojiyê re. Li milê din, bir ola xwe ya di şoreşa çandiniyê de û milyonan sal bi komkeriya xwe ya şînatiyê, hêjî ne tenê di nava malê de, di gelek qadên jiyana abûriyê de jî ya çerxê dizivirîne jine. Yunaniyên kevin yên şan û serfiraziya avêtina hîmê zanistan hildigrin, wekû yasaya malê, yasaya jinê bi navkirina abûriyê ya wan jî, nîşa dike kû ji beriya hezaran sal ev rastî tespît û kifşkirine.*

*Piştî jinê, di serîde cotyar û herwusa şivan, pîşevan û bazirganên biçûk yên bi abûriyek rast ve mijûl dibin jî, ji aliyê pergalên yekdestên desthilatdar û sermayedar ve gav bi gav ji abûriyê hatiye derkirin û tam navendek ya xenîmetê hatiye sazkirin. Em li beramber mijarekêne kû herî zêde pêwîstiya wê bi ronkirinê heye. Bi wateyek din; pêvajoyên şaristaniyê yên kû talana qadên jiyana abûriyê û amûrên wêne, çawa bû kû hatin rewakirin û ta roja me hat anîn? Hêzên kû abûriyê tine dikin, çawa wekû fakter û mercên bingehîn yên abûriyê hatin pêşkêş kirin? Di komana Sumer de dema xwedê tên afirandin, eger em bêjin; ji vana pir zêde rastîntirbû, emê şaş nebin. Rexmê van rexnan tevan, Karl Marks di ferqa wê ajawe, xeterî û felaketê de bûk û di bin navê abûriya kapîtalîst de dihat pêşkêş kirin. Lê di demek kû modêrnîta kapîtalîst pir berfireh desthilatdariya xwe sazkirî de, eger em bêjin çalakiya wê ya nirxandin û şoreşgerî tenê ev qas karî çêbe, yê hîn rastir be.*

*Abûrî bi xwe, her tiştê mijara tîmarbûnêye. Li gorî abûrî-polîtîqayê jî (Kapîtala Karl Marks jî di nav de) li gora piyaseyan qezenç, rant, faîz û nirxên tişt yên li ser hilberînê re tê dabin kirin, mijara bingehîn ya abûriyê saz dike. Ne li ser zanistê, bi giştî li gor jiyana li ser qezenca burjuwaziyê sazkirî dsîplînek mijara gotinêye. Bi bingeh girtina kar û qezencê re jiyana abûriyane ya tê rêkûpêk kirin, pirsgirêka herî li jêra civakêye. Li gora kar û qezencê rêkûpêk kirina jiyana mirovan, tê wateya îxtîdara herî dirindane. Têgeha biyo-îxtîdar hinek jî vê rastiyê îfade dike. Bi dirêjiya dîrokê tevayê civakan ji bo kû ji dervey pêwîstiyên mirovan dewlemend bibin, li komkirin û destkeftiyên mal û pere yên dihatin kirin, tim bi guman lê nêrîne û hema derfet dîtine-nedîtine ji belavkirina van destkeftan li ser kesên xwedî pêwîstî, xwe nedane paş. Ji aliyê rewişt ve tim xirab dîtina komkirina destkeftiyan ya ne ji bo dijberiya felaketan belkû bi armanca dewlemendbûna hinek grup û kesan, vala û jixwe nîne. Xistina*

*destê **danhevkeran(birikimci)** ya nirxekê kû pêwîste wek jiyana mirov pîroz were destgirtin, bêrewiştiya herî mezin hatiye jimartin. Tişta kû modêrnîta kapîtalîst ya rojava, bi hezar û yek amûrên huquq û hêzê dixwaze rewa bike, ev rastî û ev hebûne. Dêwê wehş yê kû di pirtûka pîroz de derbaz dibe, di cewher de amajeyê vê rastiyê dike. Li dijî civakê wek dêw û dirindeyek tê bi sîmgekirin. Koma hebûnên ne abûrî yên canê abûriyê di hingêvin, di bin navê abûrî-polîtîkê de wek zanist tê pêşkêş kirin. Hewldana Marks ya qet ne kêm, di rasyonel kirina abûrî-polîtîkaya Îngîlîz de, ne abûriyê, dij-abûriyê îfade dike. Ji vê re abûrî gotina wî, ne di civaka sosyalîst de, di her civakê de jî yê rewiştî nebe. Dema kû xwestiye Hegel rake ser piyê wî, xwe serbijêr kiriye. Bi kurtî, danhevkerên sermayê û operasyonên kar û qezencê yên li ser bazarê tên meşandin, bingehê pirsgirêkên abûriyane yên di dîrokê de mînaka wan nehatî dîtinin. Divê vê xalê diyarbikim, heta kû xizmeta pêwîstiyên tîmarbûn, li xwe kirin, barkirin û hewandinê bike; li dijî piyasêbûyîn û ew weke amûra fetişîzma meta nirxandin, ne xwediyê nêzîkatiyek rastîne. Di vê watê de, piyase amûrek pêwîst û baş yê abûriyê ye. Tişta li dijber tê rawestan, ne eve. Li ser piyaseyan li milekê dijî pêleyîstina nirxan, li milê din dijberê sîstema kar ya zêde kû bi sedema çêbûna navberên dûr pêkhatî an kû dijberê kapîtalîzmê derketin çêdibe. Dij-kapîtalbûyîn, dijberbûna li vê sîstemê û hemû aliyên kû vê sîstemê li ser lingan digre ye. Rastiya piyasê ji dervey vê çarçuvêye. Berûvajî, yekdestên sermayedar tim bi pêleyîstina nirxan û bi vî awayî bi zindîgirtina derfetên kar û qezencê, di piyaseyan de çêbûna guhertinek bi tendurist û rast asteng dikin. Wate, kapîtalîzm tenê ne dij-abûriye, dij-bazare jî. Wusa nebûya, gelo tim bi leyîstokên qeyran û fînansê yê jiyana civakî bihata serûbin kirin? Raxmê ev qas zanist û teknîkê, di serî de pir zêdebûna şênî, bê karî, xizanbûn û tinekirina derdor; pirsgirêkên gefê li mirovatiyê dikin, qasî di vê pêvajoyê de mezinbûyî, ma yê ev qas mezin bibûna?*

*Em dibînin kû di civaka şaristaniyê de metabûyîn wek hebûnek pir girîng pêşketiye. Wate di navbera metabûyîn û civaka şaristan (civaka bi mulkiyeta taybet, bi çîn, bi bajar û bi dewlet) de têkiliyek pir xurt heye. Meta û metabûyîn yek ji beşên sereke yên bi şaristanbûna civakêne. Wê demê danasîna metayê pir girînge. Ji dervey karanîna amûrek ya pêwîstiya mirovan beramber dike, bi hêsanî (ji dervey beramber kirina yekser ya pêwîstiyekê û sudekê) em dikarin qala bi metabûyîna wê ya di rewşa qezenç kirina nirxê guhertinê (nirxê bazirganiyê, danûstandinê) de bikin. Civak demek dirêj biyaniyê nirxê guhertinêye. Vê nafikire jî, şerm dijmêre. Amûrek binirx xelat dide kom yan jî kesên ew binirx dibîne. Li cihê xelatê cihgirtina "guhertin"ê, dahênanek ya şaristaniyêye yan jî xapandinek ya wê ye. Ji bo civaka ji derve yan jî ji beriya şaristaniyê, guhertin şerme û ta pir naçar nebe divê rev û xwe jê parastin hebe. Civak bi tecrûba xwe ya kûr dizane kû eger amûrek ya bikaranînê wek tevna herî bingehîn ya xwe derkeve dervey saziya abûriyê û bibe mijara guhertinê, dibe kû her core belayê bîne serê xwe. Li gora vê; li beramber guhertinê pir hessas û nazike.*

*Bi hatina rewşa nirxê guhertinê ya meta re bazirganî û bazirgan hatiye rewşa beşek pir girîng ya şaristaniyê. Bi kurtî divê diyarbikim kû ez metayê wek Karl Marks*

*na nirxînim. Wate îddeaya 'nirxê guhertina meta dikare bi keda karkeran were pîvan' ez vê weke destpêka pêvajoyek bitêgehbûnê kû xeteriyên girîng di afirîne, di nirxînim. Eger em helan û li navçûna civakê ya di roja me de kû hema bêje ti nirxê wê yê bi meta nebûyî nemayî berçav bigrin, ewê hîn baştir zelal bibe ka ez dixwazim çi bêjim. Bi raman û zîhnî pejirandina metabûyîna civakê tê wateya destkêşan ji mirovbûyînê. Ev jî tê wateya ji dirindeyiyê wêdetirê; eger em mînandinekê bikin, tê wateya di* ***kuştargehê(mezbahane)*** *de lawirek were qet kirin, bi wî awayî were firotin û ev li tevayê civaka mirovan were belav kirin û gihandin. Di bingeha xirabiya civakî de faîz, di bingeha faîzê de bazirganî, di bingeha bazirganiyê de meta heye. Bi hilweşandina ekolojiyê re jî girêdanek nêzîk ya bazirganiyê heye. Abûriya ji tevinbûna civakî derketî derve, destpêka qutbûna bi kok ya ji xwezayê ye jî. Ji ber kû yekîtiya nirxên maddî bi nirxên zindî re, rastê cudabûnek bi kok tê destgirtin. Her wekû tovê metafîzîkek xirab tê avêtin. Heyber bê ruh û ruh bê heyber tê hiştin, bi vê re rê ji du-dutiya di dîroka raman de herî zêde zihin û fikir bêzar û tengav kirî re tê vekirin. Cuda kirin û nîqaşên qelb yên bi awayê heybervantî û rewanvantî(meinewî) bi dirêjiya tevayê dîroka şaristaniyê jiyana ekolojîk û azad ji holê radike. Bi têgîna heyber û gerdûna mirî, rewanvantiyek kû ne diyare ka çiye, zihna mirov her wek dagir û desteser dike û dike mêtîngeh.*

*Ez dixwazim di xalek din de jî gumana xwe diyar bikim. Ez ji karîna pîvandina nirxên civakî (di vê navberê de meta jî di nav de) bi gumanim. Ne tenê ya kedek zindî, wek nirxê keda kesekê jimartina xalekê kû berhemê kedên jimartina wan ne gengazin, xeletiyeke û nêzîkatiyeke kû rê li pêşiya desteser kirina nirx û diziyê vedike. Sedemê wê vekiriye. Beramberiya kedên nikare were jimartin, yê çawa were pîvan? Ji wê zêdetir, keda malbat û dayîka kû kedkar tîne cîhanê û mezin dike, herwusa qet nirxê wê nakeve pîvandinê, yê keda wê çawa were pîvan? Wê mafê tevayê civaka kû di nav tişta jê re tê gotin nirx de pêkhatî, çawa were pîvan? Em dikarin nîqaşê dirêj bikin. Li gora vê têgehên weke; nirxê guhertinê, nirxê zêde, ked-nirx, faîz, qezenç(kâr) û rant bi diziyê re (bi rêya fermî û hêza dewletê) hevpare. Ji bo guhertinê dîtina pîvanên cuda yan jî pêşxistina awayên nû yên rêbaza xelatê, dibe kû bi wate be.*

*Abûrî, di çarçuva bingehîn de çalakiyek ya civaka dîrokiye. Ti kes (beg, efendî, karsaz, kole, xulam û karker) û dewletek nikare bibe leyîstikvanê çalakiya abûriyê. Bo nimûne; beramberiya karê dayîktiyê kû saziyek herî dîrokî-civakiye, ti karsaz, beg, efendî, karker, gundî û kesê bajarî nikare bide. Ji ber kû dayîktî, çalakiya herî zor û pêwîst ya civakê, berdewam kirina jiyanê destnîşan dike. Tenê naxwazim behsa zarok anîna wê bikim; ez wekû çandek, wek hebûnek tim bi dilê xwe di rewşa serhildanê de, wek xwediyê çalakiyek barkirî ji hiş bi berfirehî li jinê dinêrim. Ya rast jî eve. Nîşadayîna helwest û nêzîkatiya kedkarek bê destheq û bê dermalî li jina tim di rewşa serhildanê de ya ev qas naçar, bi zor, bi çalakî, tejî ji hêst û hiş, başe dikare bi kîjan mejî û wijdanê were pîvan? Zanistek ya abûriyê kû xulamê karsazekê li quncê jorê dide rûnişkandin, xwediyên çalakiya civakî yên weke vana kû Marksîzmê jî ne aniye bîra xwe, ji dervey dermalî û heqdest dihêle, çareseriya xwe çawa wek civakî*

*dikare pêşkêş bike? Abûriya Marksîst, abûriyek burjûwayî ya di rewşa xirab de ye. Pêwîstiya wî bi rexnedariyek mezin heye. Bêy kirina rexnedariyek bi wêr û netirs, di qada berjiwendiyê ya burjûwaziyê de li sosyalîzmê gerîn, mîna di rûxan û tinebûna (hem jî xwe bi xwe) tevgera (sosyalîzma reel) sed û pêncî salî de hatî dîtin, ji sîstema kapîtalîst re xizmeta herî binirxe. Dema Lenîn di got: "rêya dojehê bi kevirên niyeta baş raxistiye" çend rast di got! Gelo ew bi xwe di fikiriya kû wê rastînbûna vê hevokê di çalakiya wî bi xwe de jî çêbibe?*

*Ev xal pir girînge; taybet kirina abûriyê û dewlet kirina wê wek desteser kirin û diziyek pir zû hatiye nirxandin. Karl Marks'ê bi îfadeyek hîn 'zanistî' ev xal aniye holê dibêje; nirxê zêde yê di keda zêde de hatiye dizîn(wek qezenç). Mijar şiroveyek hîn kurtir pêwîst dike. Ji mulkiyeta taybet û dewletê re bûyîna mijar ya abûriyê, li gora min dikare wek desteser kirin û dizîtiyek ji dervey nirxê zêde, hîn pêştir ji dervey berhemê zêde were nirxandin. Abûriya wek tevnê bingehîn yê civakê, ya taybet û dewletê jî di nav de, tevayê corên bi mulkiyetbûyînê bê rewiştîne; dikevin mijara desteser kirin û diziyê. Çawa dil yan jî lebetek din yê mirov bi taybet kirin yan jî bi dewlet kirin bê watebe yan pir xeter û bi tirsbe, ji bo abûriyê jî heman tişt derbaz dibe.*

*Abûrî rastiyek civakiye kû herî kêm hatiye dewlet kirin, bi taybet kirin. Civak tevnê herî bingehîn yê kollektivîzmê ye. Bi taybet kirina wê, bi dewlet kirina wê nikare were fikirîn jî. Bi taybet kirin û bi dewlet kirina abûriyê tê wateya têkdana tevnê civakî yê bingehîn; tê wateya bê par hiştina civakê ji rêsayên jiyanê yên herî bingehîn û jiyanî. Ti civakekê qasî kapîtalîzmê bi vê sedemê ne wêraye bi taybet kirin û bi dewlet kirinê bîne rewşa sereke ya civakî, ne jî ev fikiriye. Bê guman di civaka şaristanî de çawa kû tevayê qadên civakî hatine bi dewlet kirin, herwusa abûriya kû tevnê herî bingehîn yê wê ye jî, hem kariye bibe mijara mulkiyeta taybet hem jî ya mulkiyeta dewletê. Lê ti civakekê qasî kapîtalîzmê bi fermî û eşkere mulkiyeta taybet û ya dewletê, wek sîstem nedaye zanîn û fêm kirin.*

*Di bingehê nêzîkatiya derbarê qada abûriyê de, divê ji abûriya pesartiyê metabûyîn û qezencê(kâr) derbazbûna li abûriya pesartiyê nirxê karanîn û parve kirinê hebe. Abûriya kû kar û* ***qezencê(kâr)*** *bilind kirî û* ***şihandî(şahlandirma),*** *ne tenê civak; xweza jî hilweşandiye. Ber bi dewrûber û xwezayek nikare were jiyanbûn ve rê tê standin. Eger abûrî-polîtîqaya burjûwa neyê sekinandin, cihê bigehiyê dojehek raste. Derketina pêş ya beşên fînansa burjûwaziyê kû li pey qezenca(kâr) zêdene, bi taybet tenê bi leyîstina peran re qezencê dabin dikin. Cîhangiriyê bi aliyê wê yê herî xirab ve bi mirovahiyê dide jiyan kirin. Di ti demê dîrokê de, ti çînek civakî ev qas qezenç, nirx bi dest nexistiye. Sedemê herî sereke yê rizîna civakê, asta fînansê ya abûrî gihiştiyê ye. Pîşesazî û bazirganiya fînans di xirikîne jî, ji ber kû tim metabûyîn û corên wê yên ne pêwîst yên herî zêde qezencê tînin, pêşkêşî piyasê dike, li gel têrî û zêdehiyek dil xwe de civakê nestandi, ne mezaxtî dibin sinûrê xizantî û birçîbûnek gihiştî xetên tirsnak, ber bi çêbûna mirovek din ve biriye. Mirovahî bi vê abûrî-polîtîqayê hêj zêdetir nikare bijî. Rola bingehîn ya sosyalîzmê li vê derê derdikeve pêşiya me. Ew jî bi hêdî hêdî derbazbûna civaka meta li civaka kû ji bo nirxê karanînê hilberînê dikin; herwusa ji hilberîna kû qezencê bingeh digre*

*derbazbûna li hilberîna kû parvekirinê bingeh digre, dikare were danasandin. Abûrî-polîtîqaya sosyalîzmê eve. Dema ev polîtîqaya abûriyê hat bi karanîn, bêkarî, xizaniya di nav heyîn û zêdehiyê de, birçîtiya rex hilberandina zêde û li gel qezenç û dest xwe ve anînê, rûxandin yan têkwerdana dewrûber, ji bûyîna wek çarenûsekê derdikeve.*

*Di vê xalê de, têgehên perçekirina civakê ya weke avana jor ya abûriya bingehîn û rewiştî, vala û ji xwene. Rewişt dikare weke rêya herî baş ya bi destxistina pêwîstiyên bingehîn yên abûriyê, heta yên jiyanê were danasandin. Weke kevneşopî û rê; rewişt, rêbaza bi destxistina abûriyê yan jî pêwîstiyên bingehînin. Li gora vê, cudakirinên avana jor û avana jêr, ji bûyîna têgehên kifşker û şiroveker dûrin. Rewişt, di serî de hewldanên abûrî, herwusa rastîn kirinên tevayê bi çalaktiyên civakî li ser rêbaza baş, îfade dike. Di encam de her tiştê civakî, rewiştî ye. Her tiştê rewiştî jî civakî ye. Mînak: çawa abûrî rewiştiye, ol jî rewiştiye. Wek demokrasiya raste rast siyaset, rewişt bi xwe ye.*

*Mijara abûriyê, bi fikirîna wek çalekiya navend ya rewiştî û polîtîk ya civaka dîrokî, ger pêwîst be anîna rewşa zanist û rewanî kirinekê, dikare gengaz be. Lê abûrî-polîtîqaya navend Ewrûpa wek zanist fikirîn, belkû jî piştî mîtolojiya Sumer, tê wateya dîl mayîna mejî li mîtolojiyek duwem ya herî mêjûkdar. Şoreşek zanistî ya hişk ji bo vê qadê, wê rolek jiyanî bileyîze. Bi israr divê em diyarbikin kû ti çalakiyek civakî qasî abûriyê nikare bibe rewiştî û polîtîk. Bi vê danasîna xwe, wekû mijara herî sereke ya siyaseta demokratîk, ji wate girtinê nikare rizgar bibe. Ji bo tenduristiya civakê, li ser abûriya dîrokî-civakî ya ji tibbê hezar qat zêdetir pêwîst, sîstema şaristaniya demokratîk qasî şiroveya xwe ya rast, şoreşek rast peyman û ehd dike.*

## BEŞA I.

## DI NAV DÎROKÊ DE ABÛRÎ

Ji bo rast çareser kirina pirsgirêkên derdikevin holê, fêm kirin û rast danasandina qada abûriyê kû bi cewherê xwe çalakiyek civakiye, pêwîstî bi kurtî bi lêv kirina bingehê dîroka gerdûnî, bingehê jiyanê û bi civakîbûyîna mirov heye. Çalakiya abûriyê, bi giştî ji bo berdewam kirina jiyana xwe ya tevayê zindiyan û karanîna destkeftiyên ji xwezayê tên standin, dîroka abûriyê xwe di pesêre destpêka jiyanê. Lê di warê civaka mirov de wate û avaniya abûriyê, taybetiyên xweser yên girêdayê xwe hildigre. Li ser vî bingehî di lêkolîn kirina bingehê mirov û civakê de sud heye.

### ١. Pêvajoya Civaka Xwezayî

#### a. Şoreşa Neolîtîk û Çanda Çandiniyê:

Her çi qas ji çaxa Neolîtîk re were gotin çaxa kevirê nû yan jî kevirê cîlakirî, di aliyê dîroka gerdûnî û pêvajoya civakî de wateya wê gelek wêdetirê vê danasînêye. An kû sedemê ji şoreşa Neolîtîk re gotina şoreşa tenê ne girêdayê cîla kirina kevir û bikar anîna wê ye. Ev pêşveçûna girîng jî di nav de, di qada civakî de gelek şoreş

çêbûne. Li gora vê, danasîna 'Şoreşa Jiyanê' kû neolîtîkê rê lê vekiriye, dibe kû hîn rasttir be.

Têgeha şoreşa neolîtîk, piraniya xwe bi têgeha çanda çandiniyê re tê bikaranîn. Ji ber kû gav avêtina esasî ya bi civakîbûyînê kirî, bi çanda çandiniyê re pêkhatiye. Ji ber vê sedemê, yan bikaranîna van her dû têgehan bi hev re yan jî jêre gotina; 'şoreşa çanda çandiniyê', yê hîn zêdetir alîkar be kû em pêvajoya hatî jiyanbûn têbigihin.

Li ser bingehê zîhniyeta nû civak, ji ber kû di her qada jiyanê de xwe çêdike, şoreşa neolîtîk wateya şoreşek sereke û rast kû di dema civakî de pêkhatî, hildigre. Bi vê şoreşê re civak, bi wateya xwe ya têr gihiştiye asta civaka exlaqî-polîtîk.

Li gora destkeftên herî dawî hatîn bi destxistin, piştî çaxa Mezolîtîk kû pêvajoyek ya navber bû, di navbera salên B.M. nêzîkî ١٠,٠٠٠-٧,٠٠٠'an de Şoreşa Neolîtîk pêkhatiye. Çanda çandiniyê kû yek ji encamên sereke yên vê şoreşêye jî, di navbera salên B.M. ٧,٠٠٠-٣.٠٠٠'an de rewşa çanda bandorker girtiye.

***Di Şoreşa Neolîtîk-Çanda Çandiniyê de Qada Abûriyê û Kiryar;***

Kiryarên çandiniyê û lawirvaniyêne kû li ser qada abûriyê ya şoreşa neolîtîk-çanda çandiniyê kifşkerin. Di serî de pîşevantî, kiryarên din yên abûriyê û heta gelek qadên civakê, li derdora van dû kiryarên bingehîn tên rêkûpêk kirin û rastîn dibin.

**Çandinî:** Ji komkirina şînatiyê derbazbûna çandiniya şînatî-sebze-fêqî pêktê. Şînatiyên destpêkê tên çandin genim û cehin, dûv re jî nîsk, nok, beqlî û **polkin(bezelye)**. Çandiniya van şînatiyan pesartiyê barînane. Yanî şînatiyên bê kû avdanî pêwîst bike tên çandin û dikarin berhem bidinin. Li ser vî bingehî destpêkê genim û ce tên çandin. Genimê kû dexlê destpêkê mirovan çandiye, di roja me de taybetiya xwe ya bûyîna jêderê xwarina herî bingehîn û jêneger di parêze. Li gora destkeftên erdkoliya ta niha; tovên hem kûvî hem kedîkirî yên genimê bi navê 'eînkorn' kû tê pêşbînî kirin ٩٦٠٠ saliye û ji binemalên kûviyên heft 'berhemên sazkar' yên di cîhanê de cotyarên destpêkê dirûtîne, li herêma Riha-**Sîverek**, Karacadax'ê hatiye dîtin. Ev rewş, an kû rastiya van berhemên çandiniyê yên li Kurdistan'ê derketîn holê, ji vî demê me qasî ١٠,٠٠٠ sal berê ne tenê li ser genim, belkû li ser mijara avêtina tovên zimanên Aryenî û bi rêya çandiniyê belavbûna wan li Ewrûpa û cîhanê jî bi xwe re nîqaşên pir micid anîne. Herî dawî dîtinên **gobeklîtepe'yê** di şibe kû yê van nîqaşan hîn zêdetir kûr bike.

Genim, di heman demê de nîşaneya herî girînge kû nûneriya keda hevpar ya koma mirovan dike. Bi **girîmanek(îhtîmal)** mezin ji ber van taybetiyên xwe, pîroztiya koma mirovan nîşa genim kirî, hêj jî nirxê xwe diparêze. Çêkirina sênî-dîzik û **nanxanê(firin),** di çanda tîmarbûnê de rê li pêşiya pêşveçûnên mezin vedike. Ji arê kû ji dexlî tê bi destxistin dikare nan were çêkirin, corên xwarinê zêde dibin, xwarin hîn tenduristtir dikarin werin dirustkirin, xwarinên tên amadekirin dikarin werin parastin. Bi destxistina berhemên lawirî yên wek; şîr, penîr berfirehtir dibin.

Berhemên ji çandiniyê û lawirvaniyê tên bi destxistin, dikarin di depoyan de werin veşartin. Di rojhilata navîn de kû cihê destpêkê genim û ce lê hatî çandine, di heman demê de hatiye çespandin kû nanê destpêkê jî lê hatiye çêkirin. Dîtin û destkeftên erdkoliyê yên li Kurdistan'ê; Kerkûk-Jermo, Êlih-Çemê Xalan, Amed-Çayonu, Riha-Newala Çorî, Cafer Hoyuk'a Anatolî'yê û li Tel Mureybet'a Suriyê derketîn holê, amajeyê vê rastiyê dikin.

**Lawirvanî:**

Guhertina di nîr û erdnîgariyê de tê jiyanbûn, corên lawiran jî bandor dike. Di encama vê guhertinê de, li gora wê demê dayîk û binebabên kûvî yên core lawirên wek; ga, bizin, mîh, se, pişîk, dîkil, mirîşkên roja me derdikevin holê. Kedî kirina van corên wek keriyan digerin, ji nêçîr kirina wan hîn bi sudtire. Herwusa nêçîrvantî, li gel zîhniyeta kû şoreşa Neolîtîk xwe di pesêrê jî naguncê. Ji bo kedî kirina lawiran gihiştina zanyarî û şarezayiya pêwîst ya civakê, pîvanên rewiştî, tengasî, pêdawîstî û derfet dema kû tên gel hev, lawirvantî tê rewşa yek ji herdû qadên kiryara abûriya bingehîn ya şoreşa Neolîtîk.

Hêj di dema Mezolîtîk de kedî kirina hinek lawiran ya komên mirovan, wekû kerî girtina hinek ji van lawiran jî, bi destkeftên erdkoliyê tên çespandin. Di kedî kirina lawiran de jî, wekû di çandina şînatiyan de bûyî, li gora derfetên erdnîgariyê, demsalê û civakî-çandiyê wek tur û demê, cudahiyên di navbera herêman de hene. Mînak; li Amed-Çayonu'yê wekû destpêk se hatiye kedî kirin. Lê li Êlih-Çemê Xalan jî destpêkê beraz hatiye kedî kirin. Kedî kirina lawirên wek; ga, mîh-bizin jî, ber bi qonaxa Neolîtîk ve pêkhatiye.

Kedî kirina lawiran, bi şoreşa neolîtîk re rewşa kiryara abûriyek bi rêkûpêk û bi sîstem digre. Heta di hinek turên lawiran de avis kirin û beramber kirin jî tê encamdan. Li rex vê, ji goşt, şîr, kevil, çerm û hestî; an kû ji her tiştê lawirên tên kedî kirin sud tê girtin.

**Tîmarbûn:**

Piştî hewldanên bi civakîbûna seretayî, komên mirovan ji bo pêwîstiyên tîmarbûna xwe bi bihûrînin(aşmak), di nava lêgerîna hîn zêdetir sud girtina ji lawiran û şînatiyan de ne. Van lêgerînan, ta demê şoreşa Neolîtîk, şarezayî û kombuna pesartiyê milyonan sal aniye holê.

BM. nêzîk ٢٠ hezar sal û şûnde guhertina di şert û mercên nîr û erdnîgariyê de hatîn jiyanbûn, di Flora û Fauna'ya Rojhilata Navîn de jî rê li ber guhertinên mezin vedike. Guhertinên di jêderên xwarinê de, di turên lawiran de jî rêya guhertinê vedike. Turên lawiran yên dema kevin kû piranî di rewşa komikên kêm jimar de di jiyan, mezin û giran tevger dikirin, her kû çû ji holê radibin. Turên lawirên nû yên hîn biçûktir û xwediyê taybetiya jêhatina tevger kirina wan bilind, lê guncawê kedî kirinê, derketin holê û bi awayê kerî jiyan dibin.

Dîsa core darên nû yên fêqî derdikevin holê. Lê vana bi rewşa xwe ya xwezayî, qasî turên kevin bi berhem û berbilav nînin. Di turên şînatiyan de jî guhertin pêktê. Turên şînatiyê yên dewlemend kû li gora her derfetên nîrî û erdnîgariyê guhertinê pêktînin û dikarin werin xwarin, derdikevin holê. Lê di warê corbecorbûn, taybetiyên wan û rewşa belavbûna wan ya li her derê de, ev guhertin û dewlemendiya di lawiran û şînatiyan de pêktê, pêwîstiyên komikên mirovan bi têrî nikare pêşwazî bike. Ji ber wê, çandinî û lawirvanî tê rewşa neyê revandin.

Komana mirovan ya şarezayî û jêhatinên xwe yên milyonan sal hevseng û guncawê guhertina tê jiyîn dike, bi vî rêyê şoreşa Neolîtîk-çanda çandiniyê pêktîne. Yekem qada kû şoreşa Neolîtîk-çanda çandiniyê lê pêkhatî jî, qada kiryarên tîmarbûnê ye.

**Çêkirina Amûr û Pêdawîstiyan:**

Taybetiya mirov ya kû jêhatina afirandin û pêkanînê, an kû cudahiya mirov ji hebûnên din, destpêkê û herî zelal eşkere kirî, taybetiya çêkirina amûr-pêdawîstiyane. Jêhatina çêkirina amûr-pêdawîstiyan ya koma mirovan; bi kevir, dar, hestiyê yekemcar dayî destê xwe û kar aniye re destpêdike. Bi dirêjiya vê çaxa dirêj ya ji hewldana destpêkê ta şoreşa Neolîtîk, mirov di vê qadê de pêşveçûnek mezin çêdike. Lê raxmê destkeft û pîroziya bi milyonan sal, amûr-amrazên bi asanî karanîna heyberên weke; kevir, hestî, dar û axê re tên bi destxistin, ji têrî û beramberiya pêwîstiyên dema nû ya koma mirovan pêşwazî bike, dûrin.

Ji ber vê sedemê derbazbûna li çanda çandiniyê, di çêkirina amûr-amraz û pêdawîstiyan de jî şoreşê naçar dike. Di serî de kevir tevayê heyberên mijara gotinê yên ta vê demê mirovahiyê bi kar aniyî, bi hîn baştir karanîna wan re hem amûr-amrazên di dest de heyîn baştir tên pêşxistin hem jî amûrên nû û cuda tên bi destxistin. Guherîn û pêşveçûnên di çêkirina amûr-amraz de, di serî de abûriyê; qadên civakî û bi vê re veguherîna zîhniyetê di astek pir girîng de bandor dike. Di heman demê de, di wateya sereke û rast de; weke şoreşek ya zanist-teknolojî-pîşesaziyê danasîna şoreşa Neolîtîk-çanda çandiniyê, xwe di pesêre vê rastiyê.

Di şoreşa çandinî/gund de, girêdayê qad û kiryarên abûriyê gelek amûr-amrazên nû tên dahênandin(icat), yên berê heyîn jî tên pêşxistin. Das, gêsin, hawin, tevir, tevirk(çapa), bêr, aşên ji kevirên bazalt tên çêkirin, amûrên corbecor yên ji obsîdiyenê hatîn çêkirin, bi hîn baştir kar pêkirina dar re tîmarbûna tê bi destxistin û pêdawîstiyên derbarê lawirvaniyê de; heta çêkirina pêleyîstokan û belavbûna van tiştên tên çêkirin, bi şoreşa çandinî/gund re pêkhatiye. Herwusa piştî naverasta dema Neolîtîk û şûnde, bi fêrbûna kar pêkirina sifrê(bakir), çêkirina van amûr-amrazane hîn zêdetir hatiye pêşxistin, dirust kirina hinek tiştên xemlê û aşxanê(mutfak) jî hatine destpêkirin.

**Hunerê Kar Pêkirina Kevir:**

Di dema mezolîtîk de pêşveçûnek girîng di kar pêkirina kevir de çêbûye. Lê karanîna amûr-pêdawîstiyên ji kevir tên çêkirin di qada abûriyê de ne zêdeye. Şoreşa neolîtîk jî, ji aliyekê ve lûtkeya hûnerê kevir karanînê jî tê jimartin. Di vê demê de bi giranî obsîdyen û kevirê çeqmak tê bi karanîn. Bi saya rêbazên kar pêkirina kevirên dewlemend, li ser bingeha pêwîstiya civakî çawa kû pir amûr-amraz hatin çêkirin; kevirên nîv tên karanîn jî, di çêkirina avahiyan de bi berfirehî tê karanîn.

Eger em hinek mînakên diyar di derbarê asta kar pêkirina kevir ya di şoreşa neolîtîk de gihiştiyê bidin;

Core avaniyên wek; mala destpêkê, peristgeh, embar û depo ji kevir tên çêkirin, lê piştî demekê bi dîtina kerpîçan re, çêkirina binaxeyên avaniyan û stûnên wan ji keviran berfireh dibe. Bermayên wek kevirên goran, peyker ji kevir tên çêkirin. Li ser kevirên pir rûpehn û hulû, kûnkirin û nexşandinên ji wêne û şiklan pêkdihat tên çêkirin. Di serî de dexil, ji bo biçûk kirin û herişandina hemû xwarinên wusa, aş û hawin(conî)ên destpêkê ji kevir tên çêkirin.

Tişta herî baş kar pêkirina kevir di dema neolîtîk de dide der, bermayên dîrokî yên li Riha-Gobeklîtepe'yê derketîn holêne. Di vê wargehê de kû bi demên destpêkê yên neolîtîkê, an kû dîroka BZ. nêzîk ١١,٠٠٠ an ve tê girêdan, li rasta gelek bermayên pêşketî yên ji kevir çêkirî, hatine. Bermayên derketîn holê didin diyar kirin kû ev wargeh ji cihê kiryarên hilberînê zêdetir cihê kiryarên ramanî-olî bûye. Piraniya wan dîtinan li gel kû amûrên hostayên kevir di xebitînine jî, bivrên kevir, sêniyên xwarinê, hawin û coniyên jî kevir jî hatine dîtin. Li rasta gelek destkeftên din yên dibe kû di merasîmên olî de hatibin karanîn û ji kevirê kisil çêkirî jî, hatine.

Di wargehên Çatalhoyuk yên bi salên BZ. ٦٢٥٠-٥٤٠٠'ê tê bi lêv kirin de jî hatiye dîtin kû karanîna obsîdyenê pêşketî bûye.

**Ji Bo Çêkirina Amûran, Hîn Baştir Bi Karanîna Axê:**

Di dema mezolîtîk de bi hişk kirina axa kû vegerandine heriyê li ber rojê re kerpîç tê bi destxistin, vana di çêkirina nanxane(firin) û avahiyên destpêkê de dihatin karanîn. Lê vê rêbazê, berfirehbûn û navûdengî qezenç nekir.

Di dema neolîtîk de jî karanîna kerpîçê berfirehbû, ji nîva wê çaxê û şûnde; hema bêje di çêkirina hemû avaniyên weke; mal, nanxane, peristgeh û ebmaran de tê bikaranîn. Bi qelandina nav agir re ya axa bi xwelî kû hatî vegerandin li heriyê jî dîzik-kuzik û sênî tên çêkirin.

Yayvantepe ya li dewrûberê wargeha Amed-Çayonu hatî dîtin kû tê gihandina çaxa navbera salên BZ. ٧٣٠٠-٦٧٥٠'yê, Aksaray-Aşiklihoyuk'a tê gihandina BZ. nîva destpêkê ya ٧٠٠٠'ê, herwusa wargeha Konya-Çatalhoyuk'a tê gihandina BZ. ٦٢٥٠-٥٤٠٠'ê; hinek mînakên balkêş yên di derbarê vê mijarê de ne.

**Niştecihî(barinma), Avahî û Endazyarî:**

Komikên di dema neolîtîk de, ji ber kû bixwe dikarîn cihên hewaneya xwe û avahiyên xwe yên din çêkin, li qadên guncaw yên kû bikarin tê de çandinî û lawirvaniyê bikin, bi cih dibin. Ji bo cihek bi cihbûnê, mercê bingehîn yê dihat lêgerîn, li gel ava vexwarinê; ji bo çandinî û lawirvanî bêt kirin, jêderên ava pêwîste. Herwusa ji bo çêkirina zeviyan û çerandina sewalan rewşa erd, ax û şînatiya rûerd pêwîste destdayî be. Bê guman qadên pir bûyerên xwezayî yên weke; erdhej, aşût, lehî lê çêdibin û/yan jî şerên navbera qebîlan lê tê jiyîn jî, di aliyê ewlekariyê de ne guncaw û destdayîne. Di qadê de hebûna kevir, tebeqên xweliyê(kil yataklari), darûbar jî weke mercek tê dîtin. Wate, derfetên nîr û erdnîgariyê ji bo encamdana çandinî û lawirvaniyê, derbazbûna li jiyana niştecîhiyê û parastinê, divê destdayî be.

Li ser vî bingehî, bi awayek bê îstisna tevayê wargeh li cihên nêzîkî jêderên ava vexwarinêne. Li gel vê, piraniya wargehan li qeraxên gol-çem û rûbaran, li deştên bi behrem û li qadên deşt û çiya digihijin hev, tên sazkirin.

Qad û kiryarên abûriya pesartiyê çandinî û lawirvaniyê, derbazbûna li jiyana nîv koçberî û cihwarbûnê dide pêwîst kirin. Bi vê re pêwîstiya amade kirina cihên kû komik bikarin jiyana xwe hîn bi ewlehîtir û rêkûpêktir bidin berdewam kirin, derdikeve holê. Hêj di dema mezolotîk de jî dest bi ava kirina cihên hevpar yên weke; mal, nanxane, depo û heta peristgehan tê kirin. Lê ji ber kû şert û mercên pêwîst kêmin, rêkûpêkiya komikek hîn têr jimartir, tevlêhevtir lê bi pergal kû derbazê jiyana cihwariyê bûyî, dernakeve holê. Bermayên Riha-Girê Navik'ê jî kû heman serdema dîroka derbazbûna çaxa mezolîtîk li çaxa neolîtîke, tê zanîn kû cihê ava kirina peristgeh/bîrdoziyê ye.

Şoreşa neolîtîk, bi giranî şoreşa çandinî-gunde kû tê de nîv koçberî û jiyana niştecihî pêkhatiye. Qlanên bi awayê komikên belav û biçûk jiyan dibin, di çarçuveya qad û kiryarên abûriya hevpar de, bi kombûna li cihek diyar re gundan ava dikin. Derbazbûna li jiyana gund, di heman demê de derbazbûna li qepîlê ya qlanê ye jî. Di gundên kû mezinahiya wan li gor şert û mercên heyî dikare were guhertin de, malên kû komikên qlan yên ji wan re em dikarin bêjin malbatên fireh jî, tê de jiyan dibin; herwusa qadên hevpar yên wek; aş, nanxane, embar-depo, peristgeh, kêlgeh(çîftlik), atolye, pêşangeh û qadên merasîman jî hene. Avahî di destpêkê de bi giştî ji kevir tên çêkirin. Lê piştî dîtina kerpîçan û şûnde; binaxe, stûn û hinek beşên din ji kevir, lê dîwar ji kerpîçan tên çêkirin. Di destpêkên wê pêvajoyê de, dema kû malên derî û pencere lê neyî û hatin-çûn di kuleka banî re çêdibû ava dikirin, girêdayê pêşveçûna civakî, di endazyarî û çêkirina avahiyan de jî guhertin çêdibin.

Çawa kû cihwarbûnên tê de mal bi hev ve û bê kolan hene, herwusa gundên kû bi awayê komî berbilav û xwedî kolan jî hebûne. Lê bermayên ta niha hatîn derxistin didin diyar kirin kû di gundên çaxa neolîtîk de cihên hevpar yên komikê wek; depo, aş, peristgeh hem ji malan cudane û hem jî hîn xweşiktir û hîn rêkûpêktir hatine çêkirin. Dîsa bi berfirehbûna karanîna cihên hevpar ve girêdayî, bi sazkirina goristanên gund re, miriyên berê di nava malê de dihatin veşartin, êdî di van goristanan de tên binax kirin.

Pêşveçûn û berfirehbûna çandinî û lawirvaniyê, bi xwe re zêdebûna şêniya gundan jî tîne. Mînak: şêniya wargeha Amed-Çayonu'yê wekû ٥-٦٠٠٠, ya Jerîcho'ya Îsraîl'ê wekû ٣٠٠٠, ya Çatalhoyuk'a li başûrê rojhilatê Konya'yê jî wekû ١٠,٠٠٠ tê hisab kirin.

**Karpêkirina Kanzayê û Pîşesaziyê:**

Di şoreşa neolîtîk de bi pêşveçûna kar pêkirina kevir re, komana mirov dibe xwediyê derfeta hîn baştir naskirin û jê sûdbûna ji xwezayê, hebûnên xwezayê û yên li derdora xwe. Ev şarezayî û ceribandin jî, di rê û rêbazên kar pêkirina heyberan û çêkirina amûran de pêşketinek mezin çêdike. Ji kar pêkirina kevir tê derbazbûna kar pêkirina kanzayê. Destpêkê heybera sifir ya asanî dikare were xebitandin tê hilberandin û kar pêkirin. Sifir cara destpêkê di dema neolîtîka zû de, di çêkirina amûrên asan û xemilandinê de hatiye karanîn(Amed-Çayonu: BM. ٧٣٠٠-٦٧٥٠), lê bi awayek berfireh karanîna wê jî di çaxa kalkolîtîk de çêbûye. Raxmê kû sifir asanî tê karanîn jî, lê ji ber hişk û xweragir nebûna wê, ne di wê ast û rewşê de ye kû ji pêwîstiyên zêde dibin re bibe bersiv. Ji ber vê sedemê di çêkirina amûr û pêdawistiyan de bi awayek berfireh nayê karanîn. Ji sifrê, zêdetir tiştên xemilandin, li xwe kirin û pêdawîstiyên biçûk dikare bê çêkirin. Sifir, tenê di dawiyên çaxa neolîtîk de an kû piştî salên BZ. ٤٠٠٠'ê cih bi cih kariye berfireh were karanîn.

***Kiryarên abûriyê yên din;*** şoreşa neolîtîk/çandiniyê, ji dervey tiştên hatîn gotin, di gelek qadên din de rê li ber pêşveçûnên girîng vedike. Li gel çêkirina paç û cil û vehandina selik, karanîna çerm ji afirandinên vê şoreşêne. Wekû bermayên li Amed-Çayonu'yê hatîn derxistin jî amaje pê kirî kanzaya sifir, bi rêbazên hêsanî hatiye kar pêkirin û di çêkirina amûr û amrazên weke; tiştên xemlandinê û pêdawîstiyên olî-merasîmî de hatiye bikaranîn.

**b. Civaka Xwezayî, Di Qada Abûriyê De Kîjan Rêgez Bingeh Girtine:**

**Rêgeza Demokratîk Bûyînê:**

Tevayê pêvajo û kiryarên di derbarê qada abûrî de, ji aliyê civakê ve tê diyar kirin, pêkanîn û bi rêvebirin. Wate ji bo civak jiyana xwe berdewam bike, ka pêwîstî bi çi heye, ji bo pêşwazî kirina vê pêwîstiyê sinûrê hilberîna kû dê were pêkanîn, çawanî, li kîderê û bi beşdarbûna kê encamdana vê hilberînê, herwusa li gora kîjan pîvanan nirxên hatîn destxistin çawa, ji aliyê kê ve û ji bo kê dê were parvekirin; yê kû di derbarê vana tevan de biryarê bide kom û komik bixwene. Têvayê endamên komana li ser bingehê yekîneyên qlan, qebîle û eşîretê rêkxistinbûyîn, di asta hêz û jêhatinên xwe de tevlê kiryarên abûriyê dibin. Di vê rewşê de çawa kû ti kes bê kar namîne, îstismar û kurtêlxwarî kirina tikesê ya destkeftên hatîn destxistin jî ne pêkane. Hilberîn bi armanca pêşwazî kirina pêdawîstiyên kû civakê bi şêwazê demokratîk destnîşan kirî, tê pêkanîn. Ji xwe bi taybet qlan, qebîle û eşîret di wateyekê de, yekîneyên jiyana civakî yên di çarçuveya kiryarên abûrî de rêkxistinbûyîne.

Qada abûriyê, kiryar û têkilî ji ber kû ji aliyê civakê ve tên destnîşan kirin, nirxên derdikevin holê jî, ne li ser bingehê xizmet ji bo kes, belkû li ser bingehê xizmet ji bo civakê û pêşwazî kirina pêdawîstiyên civakî tê nirxandin. Ji ber kû civak qasî pêwîstiya xwe di hilberîne û herwusa ji ber kû rewişt û zîhniyeta wê destnade, ji hilberandin, komkirin û mulk kirina ji pêwîstiyê zêdetir re cih nîne. Mulk kirin û bi vê rêyê nêzîkatiya desthilatdar bûyînê çawa kû di zîhniyeta mirov de çênabe; herwusa ji hewldanek bi her awayî kû ber bi vê encamê ve bibe re jî destur nayê dayîn. Komkirin, mulk kirin û kesên nêzîkatiyên jiyanbûna bê ked didin diyar kirin jî, yan di nava komanê de li rasta kiryar û sizayan tên yan jî tên avêtina ji dervey komanê. Dîtina mulkuyetê ya wekû; bi destxistin, desteser kirin, firotin, çêkirina qezenca maddî, jêdera xwe ji vê rastiyê digre. Di latînceyê de peyva “privare” beramberê peyva mulk(tişta lê tê xwedîbûn)e kû em di jiyana xwe ya rojane de kar tînin û dizanin. Bi peyva “privare” tişta tê xwestin were rave kirin jî; rewşa şelandin, dizîn, talankirin û ji kar pêkirina kesên din re daxistine. Wateya mulkiyeta xwe di pesêre bi têgeh kirina latînî, civaka xwezayî ji beriya deh hezaran sal derxistiye zanabûnê û tedbîrên vê xirabiyê girtine. Ji bo di zorî û tengaviyên derketina wan tê pêşbînî kirin de were karanîn, beşek berhemê tê bi destxistin, dibin çavdêrî û kar pêkirina civakê de tê komkirin. Lê komkirina ji dervey vê, guneh û bêrewiştiya herî mezin tê jimartin. Nirxên tê bi destxistin wekû xelat tê pêşkêş kirin. Comerd(ciwanmerd) an kû yê dide, kesê destê wî vekirî, wekû kesê herî rêz lê tê girtin tê jimartin. Awayek din yê parvekirinê jî, rêbaza pêk guhertinêye(takas). Belav kirina li civakê ya tiştên di dest de jî berbilave. Bi taybet di bazarên serbest yên gel de kû li qadên peristgehan tên sazkirin, di şahiyên dema behrem girtinê û berhem pir heyî tên li darxistin de; bi rêbaza belavkirin, pêkguhertin û xelat dayînê berhem di nava civakê de tên parve kirin.

**Rêgeza Ekolojîk Bûyînê:**

Di pêvajoya civaka xwezayî de civak di têkiliyên xwe yên bi xwezayê re hevsengiyê bingeh digre. Heta di mirov û civakê de nêzîkatiya bûyîna perçeyek yê xwezayê pir bi hêze. Civaka kû dizane hebûna wê tenê bi xwezayê re pêkane, ji bo jiyana xwe berdewam bike, dema pêwîstiyên xwe ji xwezayê pêşwazî dike, hevsengiya bi wê re, dijber nebûna bi wê re, heta standin û li şûna yên kêmkirî dûbare cihê wan dagirtin, ji ber derfetên xweza pêşkêş dike şukir kirina ji xwezayê re, tîne rewşa rêgezên xwe yên bingehîn. Di serî de tîmarbûn, herwusa dîtina wek perçeyek yê xwe ya pêwîstiyên ji xwezayê dabînkirî, li ser vî bingehî nirxdayîn û heta piranî caran nêzîkatiya pîroz dîtinê heye û berbilave. Ji ber kû nêzîkatiya destxistina ji pêwîstiyê zêdetirê nîne, ji nav birina xwezayê jî pêknayê. Kiryara çandiniyê, ne kiryarek wusaye kû bê mezin hezkirina xwezayê, nirx dayîna wê, zirav û nazik nêzîkbûnê were pêkanîn. Ji ber kû girêdanên komana mirov yên bi xwezayê re ne li tirs û fikarê belkû pesartiyê hezkirin û qenciyê ye. Lawir kedîkirin jî dîsa ta haydarî, hezkirin, bi wijdanî nebe, nikare pêk were. Armanca bingehîn ya di kedîkirinê de, wekû berhemê maddî ji lawiran sudbûn nîne. Aliyê meinewî hîn zêdetir derdikeve pêş. Lawiran perçek jê neger yê jiyana xwe dijmêre. Di fêrbûn û çandên kevneşopiya

civaka neolîtîk bingeh girtîn yên wek Mîtraîzm û Zerdûştîtiyê de, girîngiya ji lawiran re dihat dayîn; îro jî qasî zarokên xwe nirxdayîna lawiran ya dayîkên kû lawiran xwedî dikin û gelek mînakên din yên dikarin werin dayîn, aliyê ekolojî û jînge parêziya kiryar û têkiliyên abûriya di civaka xwezayî de, didin der û vedibêjin.

Çejin, pîrozbahiyên baweriyê û gelek awayên tevger kirinê yên weke ser jê kirina qurbanan, rêgeza ekolojîk bûyînê ya kû kiryarên abûriya di civaka xwezayî de xwe di pesêrê, datîne holê.

**Rêgeza Azadîperestiya Zayend:**

Ji gavên destpêkê yên bi civakîbûyîna mirov destpêdike, di kiryarên abûriyê de bi hevreyî ya jin û mêr bingeh tê girtin. Di encama kar parve kirina xwezayî ya di nava civakê pêşdikeve de, erk û berpirsyartiyên jin û zilam tên diyar kirin. Di kar parve kirina xwezayî de ji bo kû koman jiyana xwe bikare berdewam bike, li gel pêşwazî kirina pêwîstiyên xwe yên hewce, jêhatin û hêza kes jî wekû pîvan tê esas girtin. Lê di rewşa van berpirsyartiyên tên destnîşan kirin û tevlêbûna jiyana civakî de, mercê bingehîn ne zayende. Li milê din ji xwe bi dirêjiya milyonan sal komana mirov ji zanîn û nasnamên xwe yên zayendê dûr jiyanbûne. Guhertinên di nîr, xaknîgarî û derfetên jiyanê de li gora dem û cih hinek caran jin, hinek caran jî zilam derketiye pêş. Di hinek deman de, wexta di hinek komanan de nêçîrvantî girîngî qezenç dike, giranî qezenç kirina zilam tê dîtin. Jinê jî hema piştî gavên destpêkê yên bi civakîbûyîna mirov û şûnde, giraniya xwe daye daye pêhesandin. Girêdanên jinê yên bi jiyan, civak û xwezayê re, ji bo rêkxistin kirin û berdewam kirina civakê rola kû heye, di wateya giştî de tim rê li ber hîn li pêş de bûyîna jinê vekiriye. Lê li gel vê ta çaxa mezolîtîk wekû giştî gotina; ‘jin û zilam yekîtiya hevseng û guncaw bingeh girtine, pesartiyê vê bi hevreyî yê civakê kariye xwe berdewam bike’, ramanek nêzîk rastiyê ye. Pevçûna Marduk-Tîamat, çîrokên Adem-Hewa yên di mîtolojî û olan de tên şirove kirin, di cewher de dikarin weke şiroveyên bi armanca perde kirin û veşartina vê rastiyê werin nirxandin.

Li gel çaxa mezolîtîk jin her kû çû zêdetir derkete pêş. Ceribandin û şarezayiya xwe di pesêre milyonan sal, rê li ber hîn baştir naskirina jinê ya xwezayê, mirov, civakê û jiyanê vedike. Girêdayê vê di mirov bi xwe de zanîna; “mirov jî parçeyek yê xwezayê ye, xweza û civak tevayetiyeke”, bi awayek pir bi hêz pêş dikeve. Naskirin, pêşveçûna jêhatin û rêbazên dîtina çareseriya pirsgirêkên derdikevin holê, pêktîne. Bi vê re, ji bo ji nû ve saz kirina civakê, di mijara ka pêwîstî çine, pêwîste çi çawa werin kirin de hêza çareseriyê jî pêş dikeve. Bi gotinek din; civaka exlaqî-polîtîk hêj di wê demê de derdikeve holê. Wate wekû peywendîdarê abûriyê jî civaka xwezayî di heman demê de civaka exlaqî-polîtîke. Wekû pesartiyê vî bingehî çanda çandiniyê, bi giranî wek berhemê jinê derdikeve holê. Pîroztiya li jinê tê kirin, ji ber beşdarî û alîkariya jinê pêşkêşî jiyanê û bi civakîbûyînê kirî, herwusa ji ber hêza ava kirina civaktiyê û bi jiyanî kirin û pratîk kirina vê ye. Jin giraniyê qezenç bike û di rewşa pêşeng û rêberiyê de be jî nikare behsa desthilatdariyê were kirin. Kiryarên çandinî û lawirvaniyê dibin pêşengiya jinê de; lê bi beşdariya jin û zilam ya bi hev re tê pêkanîn.

Dayîk-jin, li gel zilamê şareza û pîr jiyana civakî destek û rêve dibe. Di çaxa neolîtîk de zanîna zayend hebe jî, li belge û selimandinek ya di derbarê hebûna zayendperestiya civakî de rastê hatin çênebûye. Eger wusa çêbibûya, pêwîst bû di derbarê zexta jinê ya li beramber zilam hatî kirin û heta xesandina bi giştî zilaman yan jî kolekirina wan de belge û selimandin hebûna.

## II. DI PÊVAJOYA ŞARISTANIYA BI DEWLET DE ABÛRÎ

### *a- Di Dayîkbûna Civaka Hîyerarşîkî De Abûrî*

*Civaka bi pile an kû hiyerarşîk, bazneya navber ya di navbera civaka xwezayî û civaka dewletparêz ya pesartiyê bingehê çînayetiyê, pêktîne. Taybetmendî û çawaniya kesî ya rêveberiyê, bi kes re sinûrdar bûyîna darayiya leşkerî, taybetiya nimûneyî ya çaxêye. Bi sazîbûyîna rêveberiyê, veguherînek cewherî îfade dike.*

*Têgeha pileyê an kû hiyerarşiyê, mînaka ewil ya têgihiştina rêveberiya desthilatdariyê kû bi desthilatdariya şaman ya pîroz re bûye yek, watedar dike. Ev saziya desthilatdariyê kû her diçe dê li ser civakê bilind bibe, hingî pêşveçûnên derbarê bi çînbûyînê de zêde bibin, dê veguhere desthilatdariya dewletê. Deshilatdariya hiyerarşîk zêdetir kesiye, bi sazî nebûye. Ji ber wê qasî bi sazî bûyîna dewletê, di civakê de desthilatdariya wê nîne. Hevsengî û guncan nîv bi nîv ji dile. Girêdan, bi berjiwendiyên civakê tên destnîşan kirin. Lê pêvajoya destpêdike ji afirandina dewletê re vekiriye. Civaka ewil ya komînal demek dirêj beramber vê pêvajoyê li ber xwe dide.*

*Di serdemên civaka ji beriya şaristaniyê de yekemîn rêkxistinbûna zor ya 'zilamê bi hêz' ne tenê lawir xistin xefikê. Yê çav berdayî kombûna malbat-qlanê ya berhemê keda hêstiyarî ya jinê(ronahiya çavê wê) jî, dîsa heman rêkxistinbûyîn bû. Ev, yekem rêkxistinbûyîna zorê ya micide. Yên hatîn desteser kirin jin bi xwe, zarokên wê û xizmên xwîniyên wê yên din bûn; kombûnên çandî yên maddî û meinewî yên hemûyanbûn; talana abûriya malê ya destpêkê bû. Li ser vî bingehî em di tevayê komanên heman serdeman de dibînin kû rêkxistina zorê ya proto-rahib şaman, şêx û zilamê bi hêz yê şareza destê xwe dane hev, hêza hiyerarşîkiya babiksalar(rêveberiya pîroz) ya di dîrokê de yekem û herî demdirêj çêkirine. Heta serdema çînbûyîn, bajarbûyîn û dewletbûyînê, eşkereye kû di jiyana civakî û abûriyê de vê hiyerarşiyê rolek kifşker leyîstiye. Yekem qurbana civaka hiyerarşîk, rêkûpêkiya malê ya dayîk-jinê bûye. Jin, dibe kû di sîstema civakê de di seretaya beşên hatîn perçiqandin de tê.*

*Gav bi gav vekêşa jinê ya li civaka hiyerarşîk, ji destdana tevayê taybetiyên civakiyên xwe yên bi hêz, dijşoreşa herî bingehîn ya di civakê de pêkhatiye. Ya rastî çand û berhemên dayîk-jinê bi sedemên civakî hatiye xistina bin zordariyê de.*

*Ev nakokiya di destpêkê de pir lawaz, her kû çû pêşket. Pêşveçûna nêçîrê dema hêza zilam ya şer derdêxe holê, zanîna wî jî zêde dike. Bi taybet olê 'Şamanîzm'ê vê rastiyê bi awayek balkêş dertêxe pêşberê me. Şaman zêdetirê xwe*

*nûneriya protomînaka rahibên zilam dike. Dixwazin li dijî jinan bi awayek pir bi sîstem tevgerek dijber û rêkûpêkiya malê pêşbêxin. Rêkeftin û hevdengiya Şamanan û zilamên pîr û şareza pêşveçûnek girînge. Bi rêya sazkirina hêza bîrdoziyê li ser hinek zilamên cuwan yên girtîn nav xwe, cih û sekna wan ya di nav komanê de her kû çû bi hêz dibe. Zilamê xurt yê di nêçîrvantiyê de bi hêz dibe û li derdora xwe komekê rêkxistin dike, piştî vê hêza xwe bi başî dizane û dide pejirandin, rêkûpêkiya nav malê ya dayîk-jinê hêdî-hêdî xistiye bin destê xwe. Vê pêvajoyê heta sazbûna dewletên bajêr yên destpêkê berdewam kiriye. Bi çavek naçarî li hêz qezenç kirina têkiliya babsalariyê nikare were nêrîn. Dîsa, derketinek xwerû ya wekû pêwîstiyek ya yasayî bûye, nîne.*

*Dema ji nêzîk ve li Şamanîzm'ê hat nêrîn, dê pir zû were zanîn kû pîşe û karek yê xapandin û nîşadana hêzê ye. Ji bo desthilatdariya bi dek û dolap û felto ya kû dê li ser dilpakî û xwerûtiya civaka xwezayî were belavkirin, hêz û mîtolojî bi awayek nazik û zirav tê amade kirin. Şaman, êdî di rêya bûyîna rahib û zilamê ol de ye. Têkiliyên bi babsalarê pîr re, ber bi rêkeftinan ve diçin. Ji bo desthilatdariya her alî, pêwîstiya nêçîrvanê xurt bi zilamên xwe heye. Koma herî zêde ji hêza xwe û jêhatinên nêçîrkirina xwe bawer, di meyla bûyîna tovika leşkerî ya seretayî de ye. Di destê vê sêyîneyê de her kû diçe nirx û jêhatin kom dibin. Derdora dayîk-jinê bi xapandin û fîltotiyê hêdî-hêdî tê valakirin. Rêkûpêkiya nav malê her kû çû hate bindest kirin. Destpêkê dema kû jin hêza bandorker û fermandera zilaman bû, pişt re hêdî-hêdî dikeve bin zordariya fermanrewayiya nû de.*

*Sazkirina desthilatdariya ewil ya bi hêz li ser jinê ne rasthatineke. Jin hêz û berdevka civaka bi lebete. Ta kû ew neyê derbaz kirin, babsalarî nikare serkeftin qezenç bike. Nikare li wêdetirê an kû li saziya dewletê were derbazbûn. Derbaz kirina hêza dayîk-jinê, xwedî wateyek stratejîke.*

*Li beramber zilamê bi hêz jin bûye qurbana destpêkê. Hîn bi hêztir bûyîna girêdana jinê bi jiyanê re, zekaya hêstî ya xwezayî pêşdetir dibe. Jin wekû dayîka zarokan, bi kedek tevlê êşê stirayî berpirsê bingehîn yê jiyana civakiye. Qasî kû di ferqa jiyanê de ye, çawaniya berdewamkirina wê jî hîn zêdetir dizane. Komkere, komkeriya wê hem encamek ya zekaya hêstî ye, hem jî naçariyek ya ji xwezayê fêrbûyî ye. Ji wan dane(veri) û destkeftên antropolojîke kû bi dirêjiya dîroka kombûn û berhemên civakî ya li derdora dayîk-jinê hatiye pêkanîn, dayîk-jinê rola navendî ya dewlemendî û nirx leyîstiye. Mirov dikare bibîne kû dayîka berhemê-zêde ye jî. Çav berdana ser vî berhemî ya zilamê bi hêz kû rola xwe ya bingehîn wekû nêçîrvantî diyarkiriye, baş tê fêmkirin. Di rewşa avakirina desthilatdariyê de, dikare pir destkeftan pêkbîne. Ji rewşa objebûyîna zayendî ya jinê em bigrin, heta derbazbûna li babîtiya zarokan wekû derbazbûna li serweriya wan, xwedî gotin bûyîna li ser kombûnên çandî yên maddî-meinewiyên din, têra xwe hez û îştah zêdekere. Rêkxistiniya hêza bi nêçîrvantiyê qezenç kirî, ji wî re şansê desthilatbûyînê, avakirina hiyerarşiya civakî ya seretayî, nasdike. Cara yekem di avana(yapı) komanê de bi armanca xirap karanîna zekaya analîtîk û hatina rewşa bi sîstemiyê, em di karin di*

*pêşveçûnên bi vî awayî yên çêbûnî û bûyerî de bibînin. Rawesteka çanda nêçîrvantiyê û şer bigihiyê, rêkxistinbûyîna leşkeriye.*

*Zora civakî (ji vê re têkiliya medenî jî tê gotin) ketiye nav têkiliyên civakî. Hêza kifş dike, xwediyên zorêne. Bi vî awayî rêya maldariya taybet jî tê vekirin. Di bingehê mulkiyetê de razana zorê, xalek tê fêmkirine. Destxistin û desteser kirina bi zorê û xwînê, hêsta ez-eztiyê pir bi hêz dike. Heta kû li têkiliyan ferman neyê kirin, amûr û amraza zorê nikare were pêşxistin û pêkanîn. Hukum û ferman kirin jî bi xwedîbûyînê re têkildare. Di naveroka ferman kirinê de xwedîbûyîn, têkiliyek diyalektîkiye. Xwedîbûyîn jî kirde û bikerê tevayê rêkûpêkiyên mulk û maldariyêne. Êdî pêvajoya bi çavê mulk û sermaye temaşekirina li komikê, jinê, zorokan, cuwanan, li qadên bi berhem yên nêçîr û komkirinê, destpêdike. Zilamê bi hêz bi tevayê mezinî û jêhatina xwe, tê derketina xwe ya yekem dike. Ji bûyîna Xwedê-qral re kêm maye. Şaman-rahib êdî ji bo çêkirina mîtolojiya vê pêvajoya nû, li ser kare. Karê kû pêwîste were kirin, vê çêbûna nû wekû pêşveçûnek pir şaz(nadîr), bi cih kirina li mejî û hişê mirovê tê rêvebirine.*

*Bi migiriya(kurgu) bîrdoziya xwe,  saziyên olî yên xwe û bi yekem xanedanî û koşkên xwe, şefeqa civaka şaristan tê avêtin.*

***b-  Di Çêbûna Civaka Bi Dewlet-Civaka Kole De Rastiya Abûriyê***

*Dewleta koledar, ew core dewlete kû mirov tê de li beramber têrkirina zikê xwe, ne tenê bi kedê, belkû bi tevayê hebûna xwe ve girêdayê dewletê û serwerên taybet yên xwedî dewletin. Awayê mêtina bingehîn ya şaristaniya çaxa seretayî ye. Kole amûra hilberîna bingehînin.*

*Zora bi awayê dewletê, di her qada kû digihiyê de di wateya abûrî de çi bibîne talankirina wê wekû mafê xwe dibîne. Talan, hinekê wek parêza(diyet) zorê tê fikirîn. Zor xudayî û pîroze. Çi bike ji heqe û helale. Bi taybet di şaristaniyên Rojhilata Navîn, Çîn û Hînt yên navenda bi awa bûyîna bingehîn de avana jor ya siyasî yan jî qast, avana jêr her wekû abûriyê di nirxîne û hêza hemû core rêveberiyê di xwe de dibîne. Çawa kû bazar, hevrikî hêj pêknehatiye, têgehek wek sektora abûriyê ya di wateya roja me de jî pêknehatiye. Her çi qas bazirganî hebe jî, ev çalekî yek ji kiryarên bingehîn yên navdewletiye. Bazirganî ji taybetbûyînê dûre. Yekdesta dewletê di heman demê de yekdesta bazirganiyê ye. Bajarên bazarê pir îstisnayî di herêmên tampon yên dewletan de tenê dem-dem derdikevin holê. Ew jî di demek kurt de li dewletên bajar vediguherin.*

*Civaka dewleta koledar di qada abûrî de wekû karxaneyek mezin diyare. Di aliyê teknîk û xwedîtî de ji karxaneyên modern cudaye. Kole bi awayê keriyan tên xebitandin. Karanîna kedek pir mezin ya koleyan di axê, kargehên kevir û xanî-avahiyan de hê jî ji van bermayên di serdema arkaîkan de mayî, tê fêm kirin. Rêveberiya kole, ji rêveberiya lawiran hîn tundtire. Kole lawirek yê di xebite ye. Mijara mulk û samane. Tenê amûrek yê hilberînê ye. Kole ji dervey bazneya huquqîne.*

*Herwekû tiştên hêstên wan tineyîne. Awayê kû zekaya analîtîk di zilam de gihiştiyê, di rastiya kole de hîn balkêştire.*

*Di civaka dewleta koledar de saziya mulkiyetê jî destpêkek saxlem dike. Cewherê sîstemê xwe di pesêre; ji aliyê civaka jor ve tevlê her tiştê wê. mulk kirina civaka jêr. Xuda-qral û alîkarên wan xwediyên her tiştîne. Xwedîtî, encama xwezayî ya desthilatdariyê ye. Dema xweperestiya(ego) mirov derfetê pêşketinê dibîne, taybetiyên sinûrnenas hildigre. Di pêvajoya sazkirina sîstemê de nebûna sedemên sinûrgir rê li pêşiya çand û hebûna xwedê-qraltiyê vedike. Rêkûpêkî û sîstema mulkiyetê kû civaka xwezayî lê nebûye şahid, ji mulkiyeta dewletê destpê dike ta malbatê dikeve nav her saziyekê. Di her kesê de hêsta mulk di afirîne. Mulkiyet binaxeya dewletê tê jimartin, tê pîrozkirin. Êdî ji vir û şûnde tişta pêwîste were kirin, mulk kirina tevayê cîhanêye. Sinûrên dewletê, xak û zeviyên xanedantiyê, sinûrên mulkiyetê wek sinûrên welat; bi awayên cor be cor ta roja me hema bêje wekû dayîn û bexşînek ya xwedê li kesitî û hişê mirovan tê kolan. Ya rast; wekû jêderek ya kutexweriyê(rant) xawendarêtî(mulkiyet), bi rastî diziye. Saziya herî zêde piştevaniya hevreyî ya civakê xirab dike ye. Lê ji bo tîmarbûna civaka jor, wek saziya herî bingehîn jênegere.*

*Bûyera xawendarêtî li gel kû di qonaxa bi çînbûyîna pêşveçûna civakî de hîn aşkiratir dibe, di kûrahiyên peywestiya civakî û hêstên nasnamê de pêktê. Ji hev cudakirina dû core xwedîtiyan(aîdiyet), dibe kû bi sûd be. Xawendarêtiya bi hev re, ya rastî; di wateya bi jiyanî bûyîna komanek lebetî de wek vîna bikaranîna li ser her tiştê pêwîstiya hevpar pê heyî, dikare were danasandin. Her takekesê komanê li ser vî tiştî, xwediyê heman maf û bikaranînê -vîna tasarrufê- ye. Herwusa ji ber vî cewherê xwe, xawendarêtiya bê kêmasî jî nayê gotin. Bi hevreyî an kû kollektîvîzm, red û înkara xawendarêtiya taybete. Xawendarêtiya taybet jî li dijî xawendarêtiya giştî û bi hevre ji aliyê kes û koma kesan ve bikaranîna zêde dibe û vîna bikaranînêye. Şaristaniya Rojhilata Navîn, ji ber cewherê xwe yê çînayetî herî kevin jiyanbûye, nûnertiya civaka herî kevin de xawendarêtî naskirî jî, dike. Bi dewletbûyîn, li derdora xwe li gel sazkirina xawendarêtiyek kû hem cewherê bi hevreyiyê û hem jî yê taybet di nav hev de jiyan dibe re çêbûye. Wate destpêkê xwediyên xawendarêtiya taybet, piştre modela destxistina xwe ya dewletê na, bi dewletbûyînê re rêkûpêkiya xawendarêtiyek di nav hevde ya bi hevre-taybet çêbûye. Çîna jor çi qas bi dewletbûyî be ew qas bûye xwediyê xawendarêtiyê. Dewlet tê wateya; sinûrên kû desthilatê wane, ji xwe re weke mulk û saman beyan bike. Dewlet bi xwe, şîrikatiya xawendarêtiyê ya herî mezine. Yekîneya xawendarêtiya taybete. Di beşên hîn jêr û navîn de destûr ji hebûna xawendarêtiyek taybet re tê dayîn. Ew jî tim ji çavdêrî kirin û desteser kirinê rizgar nabe. Ji ber vê xawendarêtiya taybet zêde pêşnakeve. Zêde piştrastî û dil êminiya xawendarêtiya taybet ya ji dervey dewletê nîne. Ev rewş wekû li rojava heyî, sedemê pêşneketina xawendarêtiya taybet jî rave dike. Rêbaza çêbûna dewletê, sedem û bandora bingehîne kû çawaniya xawendarîbûyînê jî kifş dike.*

*Di wateya teng de mirov dewletê wekû yekdesta abûriyê ya li ser berhem-nirxê-zêde sazbûyî bide nasandin, hîn kifşker û ravekere. Dewlet, ji bo berhem û*

*nirxê-zêde ji dewletê vedize, ji amûrên bîrdoziyê ta yên zorê wek avanek jor li ser komanê xwe rêkxistin û yekdest dike. Eger em li gor vê danasîna teng ya dewletê binêrin; siyaset û polîtîkatiya dewletê di aşkirakirina dawî de, hunerek yê rêvebirinêye kû çavdêrî û koordîne kirina pêkanîna berhem û nirxên zêde yên xwe dike. Eger em bi formulekirinek herî giştî ve girêbidin, em dikarin bêjin; DEWLET = BERHEM-NIRXÊ ZÊDE + AMÛRÊN BÎRDOZÎ + AMRAZÊN ZORÊ + HUNERÊ RÊVEBERIYÊ. Mirov bêje; dewlet, desteserkirina nirxê zêdeye raste lê danasînek pir kême. Dewleta çandinîvan, ji ber kû dewleta destpêkê hatî sazkirin di bingeh da wek rêveberiya bi destxistina berhemê-zêde yê çandiniyê bi rêkxistin bû, wuha danasandina wê pir raveker û di cih deye. Bi dirêjiya dîrokê, gengaze kû mirov qala gelek dewletan bike yan jî girêdayî hêza beşên çandinî û zevîvaniyê yên di nav dewletê de, li ser dewleta çandiniyê baxive.*

*Rêkûpêkiya maldarî û samandariyê wekû tê girîman kirin(sanmak) ne berhemê kapîtalîzma çar sed salên dawiye, belkû berhemê şaristaniya dewletê ya pênç hezar saliye. Berhemê-zêde yê di çandiniyê de diyar dibe, bingehê maddî yê çêbûna maldarî û samandariyê(sermaye) ye. Rêkxistinbûna xwe ya seretayî di bingehê peristgehê de bi rêvebiriye. Ev sîstema kû tebeqa jor ya xudêye(rêvebirê jor), tebeqa navîn ya hêza rewaker rahibe(alîkarê rêveberê jor; qasidê derbarê koman û evdan de), tebeqa jêr ya koleyên ji bo zikê têr dixebitine, ta roja me tim bi zêdebûyîn, ji hev cuda bûyîn, dil reqbûyîn hatiye. Bajarbûyîn, çîndarî û bi dewletbûyîn di vekolîna herî dawî de berhemên destkeft û nirxê zêdene. Li ser bingehê zêdekirina berhemê-zêde naçar kirina karparvekirinê ya civakê, pile kirina wê, bi hêzê dagirtina wê, anîna rewşa parastin û êrişkirinê ya wê ew bûyera jê re tê gotin şaristanîbûyîne û girêdana xwe ya bi saman re eşkere datîne holê. Di wateya teng de samandarî xwe wekû abûrî di pêvajoyên kurt de wek zêdebûnê bi danasîne jî, di wateya fireh de bi zêdekirina bi awayê demên dirêj di cewher de heman wateyê hildigre. Zêdebûna rojaneyiya bazirgan çi qas saman be, berhemê-zêde yê salane ya yekdestê xakê(dewleta çandiniyê) jî bi asanî dikare wek saman were danasandin.*

*Yekdest, rêkxistina di derfetên cih û wextên cuda de bi rêbazên cor be cor ji civakê nirxê-zêde yê mezin ve di dizeye. Di civaka Sumer, Misir û Harappa de di çandiniyê de BM. ji ٣٠٠٠'an ve ye, bi rêbazên(birêkxistî) kû em dikarin jêre bêjin sosyalîzma Fîr'ewn, berhemê-zêde yê pir girîng bi dest dêxe. Yekem mînaka komkirina mezin ya samandariyê ye. Li gora civaka neolîtîk bi berhemtiyek pir mezin hatiye destxistin. Vê bi berhemtiyê bi xwe re bajar, çîn û dewlet afirandiye. Di civaka neolîtîk de jî li ser derfetên berhemê-zêde yên ji mêj ve destpêkiriye, yan bi rêya rêbazên zorê yan jî bi rêya yekdesta bazirganiyê, yekemîn çaxa mêtîngeriya mezin vedibe. Bê guman di sosyalîzma Fîre'ewn da mêtina koleyên wekû corek cuda yê lawiran beramber zikê têr tên xebitandin, bingehîne. Bi kurtî, yekemîn xeleka resen ya mêtîngeriya navend-derdor ya di roja me de, diyare kû bi vî awayî hatiye damezirandin.*

*Heta seretayên BM. ٢٠٠٠'an wekû sîstem dayîkbûn û pêşveçûna şaristaniyê, bi awayê pir xwînî, mêtîngerî, bi avakirin û rûxandina bajêran, bi hevkarî, bi dagirî û*

*desthilatdarî çêdibe. Di xakên avî yên bi berhem de kû kole beramber zikê têr dixebitin; bi çandiniyê, li gel bajarên cîran û herêmên neolîtîkê bazirganî û pîşekarî, berhemê-zêde yê mezin di hilberîne. Ev hilberîn, an kû sîstema şaristanî ya li ser çanda maddî hatî sazkirin, bi avakirina çandek meinewî ya mezin dema kû komên xwe yên rêveber dike xuda, koleyên xwe yên dixebitin jî bi awayê hebûnên ji pîsatiya xudayan çêbûyî dide nasandin û biçûkxistin.*

*Bajarên kû pêdiviya bazirganiya herêma çolê baş bikartînin û herwusa li ser plan û teknîka pêşwazîkirina vê bi rêya hilberîna bi berhemtir, hatîne sazkirin; ji bo destpêkê rolek neyênî naleyîzin. Berûvajî, bi herêmên çolê re di nav hevsengî û hevkariyê de pêşveçûna civakî bi lez têxin. Lê bi têkoşîn û şerên li ser berhemên zêde yên civakî kû rê lê hatî vekirin û berhemên mezin pêwîst dike, qonaxên çînîbûyîn û dewletbûyînê yên pesartiyê bajêr, her kû diçe bi kedvanên çiyayî û bajarî ji bo tevayê sîstemên qebîlê tên rewşa xeteriyê. Bi gotina Hegel, civak bi têkilî û nakokiyek ya serwer(efendî)-kole re ru bi ru hatiye hiştin. Qonaxa şaristaniyê ya dîroka gerdûnê, tim dê bi şerên ji vê nakokiyê jêder dibin, dagirtî bi şêwebûyînên dewletê yên bi van şeran re hatîn sazkirin, derbaz bibe. Dîrok di vê wateyê de 'kuştargehek(mezbahane) ya mirove.'*

*Sîstem yan awayê civakê kû ji tevayetiyên çandî yên maddî-meinewî pêktê yên tovika hêz û alavên îdeolojîk, polîtîk û leşkerî yên li derdora bajêr komdibin çêkirî, ya van hêzên kü bi awayek bêteşeyî(kabaca) em dikarin wek klîkên yekdestdar yên çandinî û bazirganiyê bi têgehbikîn; em dikarin wek şaristanî danasînin. Awayê desthilat yê keda tê şixulandin ji ber kû bi rêbaza koletiyê tê venêrandin û çavdêrîkirin, ji van sîsteman re gotina 'şaristaniyên koledar' jî, dibe kû bi wate be.*

*Heta kû bazirganiya Mezopotamya û bazirganî nebe, şaristanî nabe. Yan her dû bi hev re yan yek ji wan dê bikeve, yan jî dê hevdû hevseng bikin. Yên qezençkirîn û wundakirîn hene. Di hevsengiyê de mayîn, pêvajoyên herdû aliyan qezenç nekirî hîn demdirêjtir çêbûne.*

*Dîrok, piştî BM. ٤٠٠٠'an û şûnde berfirehbûna bazirganiyê kifş dike. Li Mezopotamya jêr, girêdayê şaristaniya li derdora bajarê Uruk'ê(BM. ٤٠٠٠-٣٠٠٠) kû yekem dewleta bajare pêşketî, ji Êlam'a başûrê rojavayê Îran'ê ta Mezopotamya ya jor herêmên Elezîz û Meletî'ya roja me, em li rasta dagiriyek ya bazirgan tên. Yekem deriyê mêtîngeriyê bi vî awayî vedibe. Em berê jî di dema BM. ٥٠٠٠-٤٠٠٠'ê de dibin şahidê çanda desthilat ya ji beriya Uruk El Ubeyd(yekemîn çanda babsalariyê ya ji beriya dewletê micid tê çavdêrîkirin)'ê. Bazirganî û dagirkerî da nav hev de ye. Li beramber dîzik-firax û destkeftên vehandin û ristinê; kanza û darûbar, tiştên giran tê veguhestin. Li gel bazirgan bazar jî reng digre. Navendên berê yên pêşkêş kirina qurban û xelatan, hêdî-hêdî vedigerin bazaran. Bazirganê kû digihe taybetiya nirxdanîna seretayî li ser berhemên herêmên cuda, em dikarin jêre kapîtalîstê seretayî bêjin. Ji ber kû bi derfetê diyarkirina nirx re dibe xwediyê kombûnek ya mal kû ta wê demê ti kesê nekariye biserbêxe.*

*Ji bo abûriyê, diyare dê çandinî, bazar, bazirganiya biçûk, pîşekarî, hêjmarek zêde komên taybet yên serbixwe bikaribin bi sûd jî bibin. Keda mirov ya di tevayê van qadan de, nirxê xwe yê kû afirênertiyê pêşdêxe, çespandiye. Aşkirakirina nepêwîstbûna yekdesta ne siyasî, ne leşkerî, ne jî bazirganî-abûrî; ne zore. Ger Asur nebûya, ma dê abûrî bi rawestiya? Berûvajiyê wê, pêşerojê de gengaz kirina jiyanek bi abûrî ya hîn cuda û erênî ji aliyê qadek aştîxwaz ve, baş tê fêmkirin. Dewleta wek desthilatdariya dij demokrasiyê, ne tenê nepêwîste; bi fermangeriya(burokrasî) çêkirî re, bi şerên rê lê vekirî re, bi desteserkirinên encamdayî re, hêzeke kû abûrî û civakê dirûxîne. Li vê derê ez bajar û girîngiya bi çînbûyînê, pêwîstiya wê nîqaş nakim; ez lêpirsîna têkiliya bi şaristaniyê re ya hêza zordar kû li kîf û bergên bîrdoziya xudayî hatî pêçan û li derdora xwe dîwarek qahîm yê leşkerî-siyasî çêkirî, dikim. Şaristaniyek di wateya aliyên erênî yên bajarbûyînê de hebe jî; çawaniya qirêjkirina vê, bi rêya astengiyek paşvebir û girtî ya mezin hatina neyênîkirina wê, dubare dikim. Koordînasyona rêveberiyê cudaye û yekdestên zordar û dagirker cuda.*

*Bi şaristaniya Greko-Romen qonaxek demdirêj ya dîrokê piştî kû dema xwe ya herî pijayî jiyanbû, dikeve qeyranek kûr. Hilberîna li çiya pesartiyê çandiniyê û li bajêr pesartiyê pîşekariyê, rê li pêşiya berhemek-zêde yê girîng vedike. Pirbûna berhemê-zêde bingehê rêkxistiniya bi corê dewletê ye. Berhemê-zêde di cewherê xwe de bi keda yê ji bo zikê têr dixebite û jêhatinê qezenç dike ve girêdayî ye. Pêşkêşiya keda bi awayê koletî û bikaranîna wê, corê serekeye. Li ser vî turî yekdesta dewletê ya ji sêyîneya bîrdozî, siyasî û leşkerî çêdibe, tê sazkirin. Ev sîstema bi bajarbûyînê re nav hev de pêşdikeve, li gel pîşevantiyê bi pêşxistina karbeşiyê re, çêbûna xeleka metabûyîn-bazar-pere dabîn dike. Di vê xelekê de yekdesta bazirganiyê bi ketina tevgerê re derfetê dest danîna ser beşek yê berhemê-zêde çêdike. Di mijara dest danîna li ser berhemê-zêde yê di çandinî û pîşevantiyê de çêdibe, di nav dewletê yan jî nav dewletan de bi cewherî dû yekdestên pêşbirkê dikin û her kû diçe pevdiçin, tên holê. Di navbera wan de cudabûnek tûj nebe jî, di aliyê çareserkirina gelek têkilî û pevçûnên siyasî û leşkerî de, têgeha dû yekdestan rola kilîlê dileyîze.*

### ***c- Di Pêvajoya Dewleta Feodal De Abûrî***

*Bi giştî em dibînin kû forma civaka koledar ya dewletê BM. ٢٥٠-٥٠٠'an de ketiye nav qeyranê û wekû forma jorîn bi desthilatiya civaka feodal encambûye. Di vê de, ji derve ve êrişên 'barbaran' yên xwediyê taybetiyên civaka xwezayî û ji hindir ve puçbûn û bandora têkoşîna Xrîstiyaniyetê diyarker bûye. Lê ya heliyayî û tinebûyî ne dewlet, forma wê ya koledarbûye. Dewlet hîn zêdetir bi xwe bihêzkirinê, dê bigihe forma dewletê ya feodal.*

*Dewleta feodal, awayê sinûrdar hatî nermkirin yê koletiyê ye. Wekû serf û evd, cudahiya wî ji koleyê kevin, mafê serf yê malbat avakirinê ye. Di kiryarê de pêkanîna wê zor û bi gelek mercan ve girêdayî be jî, ji ber kû hîn zêdetir derfet dide berhem û nirxê-zêde, corê di şaristaniya çaxa navîn de hatî ceribandine. Herwusa berxwedan û serhildanên gel, qebîle, kole û bajarên(pîşekar) bi zorê tê xwestin bi şaristaniyê an kû koletiyê û desteserkirina bazirganî yê ve were girêdan, beşek bingehîn ya dine kû*

*dawî û tine nabe. Şaristanî, ne tenê berhemê-zêde yê kapîtalîzmê(samandarî), belkû sîstemek bixwîn, azarder û mêtîngera koledare kû di bingehê berhemê-zêde(samandarî) yê pênç hezar-şeş hezar sal de razayî ye.*

*Bi sazîbûyîna siyasî û leşkerî ya civaka dewleta feodal jî dê nûnertiya pêvajoyek pijayî ya heman bike. Dewlet pir ji xwe bawere. Li ser ruyê cîhanê hebûna herî pîroz ya xwedêye. Leşkerên wê jî şerkerên xwedêne. Rupoşa pîroztiyê bi başî tê rûnişkandin. Hêza yekem polîtîk, ya duwem nûnerê olî, ya sêyem leşker, ya çarem fermangerî(burokrasî) ye. Saziyên bingehîn yên dewletê bi başî rûniştine. Li gel hatin û çûyîna xanedanan, dewlet ji nirxê xwe yê damûdezgayî tiştekê ji destnade. Ya bingehîn ne xanedan, sazîne. Ji bo kesan jî heman rewş derbazdare. Ruyê erdê, dîsa wekû samanê zordar û desthilatdaran yê ji aliyê xwedê ve hatî bexşandin, tê fikirîn. Evd divê vê bipejirînin, heta divê tim şukir bikin. Kaxeza pîroztiyê li şeran hatiye birîn. Ev li ser navê rêkûpêkiya xudayî tê kirin. Raxmê kû bang û xîtab li wekheviyê û azadiyê, li mirovahiyê wekû tevatiyek tê kirin, talanî(ganîmet) û serane(xeraç) saziyên bingehîn yên mêtinêne. Bi vî aliyê xwe koletiya kevnar berdewam dike. Artêşên wan hîn rêkûpêktir û bi awayê timîbin tên amadekirin. Wekû sazî ji şervantiya berdest mêj ve derbazê artêşê bûye. Bi bingeh girtina sîstema artêşên Pers, Helen û Roma wekû cewher û jimarî artêşên hîn mezintir yên çaxa navîn hatine avakirin. Suwar û şûr nîşanên artêşê yên vê demêne. Saziya suwarçakî(Şovalye) yê bi tevayê mezinahiyê dema xwe jiyan dibe.*

*Şer weke awayek yê hilberînê tê fikirîn. Dagirî, jêderên qezencê yên girîngin. Standina xakên nû, tê wateya berhemên-zêde yên nû. Dewleta herî bi hêz, dewleta herî baş şer dike û dagirdikeye. Tîmarbûna bi xwîn û mêtinê sinûr nasnake. Şerê bi navê xwedê, tenê bi destxistina tevayê cîhanê dikare were temamkirin. Ev jî tê wateya cîhad û têkoşîna gerdûnî û bê dawî. Di jiyana civakî de evd û benîtî, rewşek xwezayî ya ji xwedê hatî tê jimartin. Têgîna evdêtiyê, rewşa ji dayîkbûn û xwezayî ya jiyanê ye, ne tiştek kû pişt re çêbûye.*

*Encama herî girîng ya dikare ji kar û kiryarên şaristaniya Asur were derxistin, li gel navhev û zikhev de bûyîna yekdesta bazirganî û yekdesta siyasî; herwusa têkiliya wê ya bi şeran re ye. Di dîroka şaristaniyê de Asûr pêngavek herî girîng ya yekdesta siyasî û bazirganiyê ye. Dikare were gotin kû, ji beriya împaratoriya Pers, yekem xeleka navend ya di navbera şaristaniya Misir, Çîn û Hînd de yekdestên bazirganiyê yên Asûr avakiriye. Cîhanek bazirganî avakirine. Her wekû cîhangiriya wê pêvajoyê mijara gotinêye. Dîsa derdikeve holê kû yekdesta bazirganî ne abûriye, belkû bi rêbazek ya kûştûkûştara tilîjimar(nadîr) ji derve ve li abûriyê hatiye pesartin, kombûn û destkeftên kû gel û qebîleyan bi hezar û yek kedê komkirî, afirandî, desteser kirye, diziye. Pir aşkiraye bê kû dewlet hebe, yekdesta bazirganî nikare bimeşe. Yekdestên siyasî yên berê dema kû bi giştî bi rêbaza koledar ya çandiniyê re têkildarbûn, cara yekem bazirganiyê giraniyek ya hevsengê çandiniyê qezenç kiriye. Eger em yekdesta bazirganiyê weke kapîtalîzm danasînin, di desteserkirina berhemê-zêde yê çandiniyê de ya yekdesta siyasî wekû hêzek mêtînger ya hîn bi bandortir cihê xwe di şaristaniyê de digre. Împaratortî awayek yê rêvebirinêye kû ji çandiniyê zêdetir*

*bazirganî dehf dideyê. Ewlekariya rê, pêwîstiya bazirganiya qada dirêje. Vê jî tenê împaratortî dabîndike(saglamak). Ew qas eşkereye kû pêşveçûn û mezinbûna kûrbûn û pirbûna wê ya di tundiyê de li gel xweragiriya civakê ya dijî pesartinên nû yên abûriyê di nav hev de, guftûgoyê bi xwere nabe.*

*Di rewşa jinê ya qefesê de tenê di wateya pêşxistina deng û xemlê de guhertin hene. Di astên nayê bawerkirin de kûrkirin û veşartina koletiyê mijara gotinêye. Jina çaxa navîn li rasta duyemîn şkestina mezin ya çanda civaka zayendparêz hatiye anîn. Yekemîn şkestina mezin ya çandî, di qonaxa dayîkbûna dewleta koledar de, dema kû em di çanda Xudawenda Înanna-Îştar de dibînin, li ser jinê şkestina çandî ya sîstema dipije jî em di mînakên; Marîam'a xwîşka mezin ya Musa, Meryem'a dayîka Hz. Îsa û Eyşe ya hevjîna Hz. Muhammed de bi awayek pir balkêş dikarin bibînin. Êdî çawa kû ti şopên xudawendiyê namîne, wekû cihek herî nêzîk şeytanî tê hizirîn. Nerazîbûnek herî biçûk ya wê, dikare wê bike şeytan bi xwe. Her kêliyê dikare giyanê xwe bifiroşe şeytan. Dibe kû serê zilam bixirîne(baştan çikarmak). Rewşa wê ya di pîr-eboktiyê(cadi) de pêwîst dike kû zindî-zindî were şewitandin. Çandek ya qirkirinê kû ji zindî binaxkirina zarokên keç, xirandinên zayendî ta digihe recimkirina ji aliyê koman ve, mijara gotinêye. Rewşa koletiya di civakê de herî kurbûyî, ji hezaran sal ve ye daweriyayî(sûzûlerek) gihiştiye sinûrên mirov nekaribe ji bin derkeve. Bi rastî ta jin neyê dahûrandin(çîzûmleme) û ravekirin, asta koletiya sîstemê nikare were fêmkirin. Bazin, perên next, tiştên xemilandinê yên bi her derê wê ve hatîn girêdan û hilawîstin, çanda koletiyê vedide. Herwekû zimanê wê jêkirîbe hatiye bê ramankirin. Dayîkek hişk, zeviyeke kû zilam li gor dilê xwe dikarin bikarbînin. Ji mêj ve ji kirekbûyînê derketiye û hatiye rewşa tiştbûyînê. Ti şopek ji xwedawendîtiya civaka xwezayî nemaye. Ji jina kû rêvebera zanyar ya zarokan, cuwanan; dîsa jina zilam li dora wê dizivirîn, ti şopek jî nemaye.*

*Serf, gundî, bazirgan, bajarî, pîşekar, xerîkvanên(ugraşanlar) hûner û zanistê dikarin wekû beşên cuda yên civakê werin bi têgehkirin. Wek amraza hilberînê ax û têkiliyên xawendarêtî yên li ser wê, dibe kû di çarçuveya huquqa pêşdikeve de girtina dest pêwîst bike. Fikirîna wekû; ax amraza herî girîng ya hilberînêye, şer û pevçûn; dagirî û desteserkirina xakê bingeh digrin, çîna navîn li ser wê hêz qezenç dike û dikare di pêşveçûnên civakî de rolek girîng bileyîze, pir girînge.*

***d – Kapîtalîzm Ne Abûrî, Dijminê Abûriyê Ye***

*Li gora min kapîtalîzm ewe, ji destpêkê ve ye wekû leşkerî-siyasî-çandî rêkxistinbûye kû di serî de destkeftên maddî herwusa feltotiya(kurnazlik) desteserkirina nirxên civakî rêkxistî ya kevneşopiyek kevnare û herkû diçe hatina rewşa awayê civakek desthilat ya li rojavayê Ewrûpa, piştî ss.١٦'ane. Bi koma talankar ya li derdora yekemîn zilamê bihêz, em dikarin vê dayîkbûnê weke xeleka modern ya çanda desteserkirina nirxên civakî yên li derdora dayîk-jinê kombûyî jî pênase bikin. Li Îngîltere û Hollanda'yê, li bajarên Cenova, Floransa û Venedîk'ê yên kû berê pêşengtiya dewletên bajar yên Îtalya'yê dikirin, komên destpêk yên kapîtalîst çalakiyek ya komikên hişê wan yê plan û davê pêşketî wekû terîqatek bi dewletê re*

*di nav hev de ya awayên jiyanek wan ya taybet heyî, bi nûkirinên kû pêkaniyî li ser pere re hostatiya encamdana talaniyê nîşakirî, di bazarên li her derê cîhanê belavbûyî de bi pêleyîstina nirxên kû çêbûyî re berhemên pir zêde desteserkirî, dema pêwîstkirî û piraniya xwe ji karanîna zorê şûnde nemayî ye. Ji vana re di hinek cihan de dikare xanedan, arîstokrat û burjuwa jî were gotin. Yekemîn û girîngtirîn cudahiyên wan yên ji heramiyên çaxa destpêk û navîn; bi giranî di bajaran de bicih bûyîna wan, bi desthilatdariya dewletê re ketina nav hev de, dema pêwîst dike bikaranîna zorê ya wan ya bi awayek hîn dapûşayîtir û di plana duwem de ye. Li pêş çav zagonên abûriyê hene. Ew jî li gora van zagonan bi mejî û pereyên destpêk yên di destê xwe de qezencê dikin. Dema dîroka kapîtalê rast hate lêkolînkirin, dê were dîtin kû ev nêzîkatî tam jî di nirxê çîrokekê de ye.*

*Di şerên dagirkeriyê yên komkirinên destpêkê lê pêkhatîn de ti zagonek abûriyê tineye. Portekîz, Îspanya, Hollanda, Îngîltere, Fransa, hîn ji beriya wan, mêtingehên(somurge) bajêrên weke; Venedîk, Cenova rasterast bi temamî yekemîn komkirinên sermayên xwe yên pesartiyê zorê dabînkirine. Hem di bazarên welatên nêzîk de, hem di qadên dagirkirî de dîtin û aşkirakirina van rastiyan ne zore. Ji çil heramiyan jî pişt re efendîtî turedane. Beg çêbûne. Ji çil heramiyên modern re jî gotina efendiyên burjuwa, ji modeyê wêdetirê ti giraniyekê saz nake. Binemayên(dîsîplîn) jêre tê gotin zanista abûriyê, dapûşandina(ortulu) cewherê kar weke kiryarên xwe yên bingehîn berdewam dikin. Kîjan bîrdozî di van mijaran de pêşkêşiya serkeftî bike, wekû serberhem(başyapit) ewê were xelatkirin. Ti zanistekê qasî zanista rastiya abûriyê bi rastiyan neleyîstiye û rastî berûvajî nekirine. Ji rê derxistina herî mezin ya mejiyê destsaz û plankirî, em di qada abûrî-polîtîka ya kapîtalîst de rastê tên. Modernîta kapîtalîst, bi giştî yekem sîstema xwedî cudatiya bilindbûna li ser zanistek fêlbaz(kalpazan) ya wuhaye.*

*Komikan di nav bi bîr û ramantiya xwe de tim li tiştên pêwîstiyên xwe yên maddî gerane û xwestine pêşbêxin; xwarin, vehewîn(barinma), zêdebûn û parastin bûye gumanên wan yên bingehîn. Destpêkê razîbûna bi tiştên peyda dikirin, di şkeftan de vehesan, di qeraxên gol û daristanan de hîn baştir xwe parastin, ji dayîka afirêner re pêşî dayîn, ji ber van pêwîstiyên bingehîne. Nêçîrvantî jî her kû çû dikeve jiyanê. Hem xwe parastin hem jî bi goşt tîmarbûn vê çandê pêşdêxe. Lê ji destpêka bi civakîbûyînê û şûnde di navbera komkeriya jinê û nêçîrvantiya zêdetir ya zilam de, dîtin û çavdêrîkirina pevçûnekê û pêşveçûna geşebûnên(evrîm) çandî yên cuda gengaze. Li herdû aliyan jî pêşveçûna yekalî, ji çanda di yekêde 'şêrê nêr', di ya din de 'jina gamêş' re gav bi gav kombûnê pêktîne. Yekemîn têgihiştinên abûriyê yên cuda wuha bi bingeh dibin.*

*Divê diyarbikim kû, dîsa cara yekem ji pêvajoya bi metabûyînê re li gel guhertina mal bandoriya bazirganiyê rê vedike. Ji abûriya xelatê derbazbûna nirxê guhertinê, hêj çênebûye. Ji bo civakê tişta esas, nirxê bikaranîna destkeftane. Nirxê bikaranînê, pêşwazîkirina pêwîstiyek ya destkeftane. Ji bo mirov ya resen jî ev nirxe. Nirxê guhertinê têgehek pir bi nîqaşe. Rast danasandin jî girîngiyek mezin dixwaze. Li gora min, di Marks de jî danîna kedê li bingehê nirxê guhertinê, mijarek pir bi*

*nîqaşe. Dixwazî bi keda diyar yan ya nediyar were şirovekirin, nirxê guhertinê hertim aliyek yê xeyalî (spekulatîf) hildigre.*

*Çawa kû tê zanîn, wek sîstem ya ewil serkeftina kapîtalîzmê pêkaniye, Îngilîstana Geravê û Hollanda ye. Ji bo ji kapîtalîzmê re rewatî were qezençkirin, pêwîstiya sedemek bîrî merce. Bi taybet ji bo dapûşîna qezenca pesartiyê bîr û xeyalêye, hizir û bîrek kû dikare were pejirandin girîngiyek mezin hildigre. Herwekû yekemîn olên bazirganên Uruk'ê pêşkêşkirina awayê nû yê şiroveyek mîtolojîk, ji zanyarên dilê xwe de abûrî-polîtîkê û di cewher de jî ji dahênerên(îcatcî) olê kapîtalîzmê yên nû re ma. Ya tê sazkirin ne abûrî-polîtîka, olek nûye. Wekû di her olekê de bûyî, her kû çû bi pirtûka xwe ya pîroz û bi mezhebên xwe yên çiq-çiq. Abûrî-polîtîk, ji bo dapûşandina kesayeta xeyalî ya kapîtalîzmê kû talana herî nirxdar ya çil heramiyan jî paş xwe de dihêle(ji bo pêleyîstina nirxan komkirinên saman, bikaranîna cudatiyên herêmî), berhemê herî fêlbaz û talankar yê hişê sazkirî-plankiriye kû hatiye pêşxistin.*

*Di dîrokê de, di seretaya sedemên herî bingehîn yên şeran û dam û dezgayên dewletê de ewlekariya bazirgan û mêtingehên(kolonî) wan, ya rasttir parastina berjiwendiyên wan tê. Sedemê bingehîn yê şerên îro li Rojhilata Navîn(çend dilêşe kû yekemîn şerên bazirganiyê daye destpêkirin –Îraq ji Uruk'ê tê– şerê xwe yê dawiyê jî hêj bi awayek herî bêrehm dimeşîne) jî di cewher de baş tê zanîn kû ji bazirganiya petrolê jêder dibe.*

*Dema ber bi kapîtalîzmê ve rê tê kêşan û navenda şaristaniyê derbazê Ewrûpa dibe, dîsa em dibînin kû bazirganî serê wê dikêşe. Bazirganî û şaristaniya bazirgan ya navend Rojhilata Navîn, di çaxa navîn de bi Îslam'ê ji nû ve gavekê davêje.*

*Dîrok şahide kû çanda bazirganiyê ya bi destê bazirganên misilman yên Rojhilata Navîn gavek din pêşde diçe, piştî sedsala ١٣'an û şûnde di bin pêşengiya bajarên Îtalya'yê Cenova û Floransa de derbazê Ewrûpa hatiye kirin. Pere û bazirganî sedemê dewlemendiya bingehîn ya van bajarane. Ta sedsala ١٦'an pêşengtiya bazirganiya di navbera Ewrûpa û Rojhilata Navîn de dikin. Di dîrokê de dibe kû cara yekem hem wekû têgeh, hem jî pêkanîn, di pêwer û mena(olçek) bajêr de serkeftinên biçûk yên kapîtalîzmê pêktînin. Di vê de yekdestiya nirx ya di navbera cerdevantiya Deryaspî û qeraxên rojhilat-rojava ya Deryaspî rolê sereke dileyîze. Dîsa di bin siya zordariyê de gotin û xeyal bê rawestan dimeşin. Bazirganî ji kapîtalê re, kapîtal ji bajêr re, bajêr ji bazarê re, bazar ji berfirehbûna xeyal û ramanan re rê vedike û elinda(şefeq) şaristaniya kapîtalîst tê avêtin.*

*Di dewletên bajêr yên Îtalyan de di salên ١٣٠٠-١٦٠٠'an de ceribandina serkeftî ya kapîtalîzmê di belavbûna ber bi bakûrê-rojava û bakûrê Ewrûpa ve dereng nema. Îspanya ji xwe berê hatibû dagirkirin. Piştî sedsala ١٦'an û şûnde çîroka rêya direj ya bazirgan cara yekem serkeftinên li seranserê welat yên kû bajaran derbazdikin, xiste zorê.*

*Li seranserê cîhanê bazarek pêkhatiye. Efrîqa û Emerîka hatiye standina nav dagirkeriyê. Bi ladayîna împaratoriya Osmanî, li ser Qelzûma(okyanus) Atlas û Başûrê Efrîqa re hatiye gihiştina Hîndîstan û Çîn'ê. Ewrûpa hatiye girtina nav bajarbûyînek giran û berfireh. Cara yekem bajaran dest bi serkeftina li ser çandiniyê kirine. Paşayetiyên feodal dizivirin dewleta monarşîk ya modern. Osmaniyên împaratortiya îslamî ya dawî, li ser hev bin dikevin. Ronesans dîsa di sedsala ١٤'an de li Îtalya'yê destpêkiriye û belavê tevayê Ewrûpa bûye. Di ol de tevgere reformasyonê, li welatên bakûrê Ewrûpa gihiştiye serkeftinê. Şerên olî cara yekem çaxên xwe dadigrin. Ya hîn girîngtir, tevayê nirxên çandî û şaristaniyê yên Çîn, Hînt, Îslam û heta Efrîqa û Emerîka, hatiye herikandina Ewrûpa'yê. Li milekê dewleta modern, li milê din netew di afirin.*

*Dema kapîtalîzm ber bi serkeftinê ve dimeşe, ev qas dîrokê, çandê, kombûna wêrekiyê, şaristaniyê, erk û pileya siyasiyê û giştiya cîhanê ya hatî bazarkirin digre pişt xwe. Ji bo abûriya kapîtalîst gelo heta kû ev pêşmerc pêkneyên û bêy xwe pesartina van mercan, gav avêtin û serkeftin gengaze? Ji dervey gengazbûnê, kapîtal bixwe jî dikare were fikirîn? Dîrokê çawa kû mîna li Mezopotamya Jêr gava xwe ya yekem bi bajarbûyîn, çîndarî û dewletbûyîna bi rêya sîteya Uruk'ê, duwemîn gava xwe ya dêw jî bi bazirganî û bajarbûyîna li Fenîke û Îonya'yê avêtiye; vê carê sêyemîn gava xwe ya mezin li qada coxrafî ya Îtalya, Hollanda û Îngîltere kû bi tevayê derfetên navê wan derbaz dibe hatiye rewşek guncaw, li ser bingehê serkeftinek mayînde ji abûriya kapîtalîst re kû bazirganiya mezin, bajarbûyîn û li ser bazarê û dijberê wê yê li seranserê cîhanê pêşdikeveye, avêtiye. Hêj jî ya dibin pêşengtiya DYE'yê de tê jiyanbûn, ev rastiye.*

*Di navend û qadek ya pêşveçûna civakî de kû ji awêneya(ayna) dîrokê desthilatdar bûye, qasî kariye di navenda xwe de bazar pêşxistiye, dest bi serdestbûna ji bajar ta çolê kiriye, girêdana xwe ya bi ol û rewişt(ahlak) ve avêtiye pileya duwem; em awa yan jî turê çalakiyek abûriyê ya pesartiyê talana hatî ziravkirin û hatiye xistina nav kîfê bîrdoziyê ji bo desteserkirina destkeftên kombûyî, dibînin. Di vî awayê nû yê desteserkirinê de bêguman biha û vedana biha bi rêya pereyê ji aliyê pêşkêşkirin-xwestina(arz-talep) di bazarê de hev dibîne ve şêwe digre, li gora demên berê pêşveçûnek mezin yan jî jêhatina leyîstikvaniyê qezenç kiriye. Li şûna tefekar û pareguherê yekem, banqe, belge(senet), perê kaxez, kredî, jimêryarî(muhasebe), şîrketbûyîn pir pêşketiye û vana mijarên bingehînin kû rêsayên abûriyê yên çaxa modern pêktînin. Ya kêm mayî şiroveya zanistiye. Ewê jî abûrî-polîtîkavanên Îngîlîz yên dayîkniştîman û pir balkêş û bi nakok be jî pişr re dijberên xwe yên kêşayî aliyê xwe, di serî de Karl Marks; sosyalîstan xebitiye kû ava bikin.*

*Xeta talanê ya jêre tê gotin abûriya kapîtalîst, dema di tevayê cîhana kevin û nû de civakan û xakan dagîrdike û ji nû ve kole dike, dema tevayê pile û benikên hêzê (bi deyndarkirina awayek yê desteserkirinê, dewletên demê) bi xwe ve girêdide, dema şerên herî bi xwîn yên dîrokê rêvedibe, dema bi her tiştê xwe ve li ser hişê civakê dileyîze û desthilatdariya xwe dide erêkirin, Karl Marks û li gel şopvanên wî xetên bîr û raman yên mîna wan kû vê yekê li dijî civaka kevin şoreşger didin zanîn, li*

*gora min zanistê saz nakin. Das Kapîtal pirtûka herî bi kêmas, herî bi derfet kû şaş were şirovekirin ya li dijî kapîtalê hatiye nivîsîne. Li vê derê Marks tawanbar nakim. Tenê dibêjim; çarçuveya dîrok, dewlet, şoreş û demokrasiyê ya berhema wî nîne û nehatiye pêşxistin. Li gor avana xwe rewşenbîrên Ewrûpa yên pir "zanistî" xwe diyardikin, wekû naxî(subjektîf) bi zanabûn nebe jî, ji ber pêwîstiya rewşên xwe yên babetî(objektîf) bi lêhûrbûn û lêkolînên xwe yên bi bingeha Kapîtal(wekû pirtûk) li ser hîmê dij-kapîtalîst bi navê komên jê re tê gotin 'kedvan' zanist û bîrdozî saz nekirin. Lîberalîzmê jî, kêmasiyên wan yên pir baş dîtî, bi şîkirin(tehlîl)ên kapîtalê di dayîkbûna kapîtalîzmê de wekû şoreşger beyankirina wê, pir baş bikaranî. Ji xwe piştî demekê, bi helandin û asîmîlekirina; destpêkê sosyal-demokratên Alman'î, duv re sîstema sosyalîstî ya reel (Rusya û Çîn di nav de) û herî dawî de jî bi asîmîlekirina sîstemên rizgariya netewî (bi hêza bîrdoziya modernîst, bi netew-dewletê û pîşesaziyê) re şerê çînayetî yê di bendeha wê de pir hatî şerkirin jî qezenç kir. Li beramber lîberalîzmê binkeftinek pir eşkere ya her sê xet û bîrokeyan(akim) mijara gotinêye û mixabin hêj di vê mijarê de rexnedanek zelal nayê kirin.*

*Bi têgehkirinên kar-nirx di qada abûriyê de, burjuwa-proleter di qada civakî de, gavên yekem yên bi şêweyê pozîtîvîst bi zanîstkirina sîstemek kû tevayê kombûna dîrokî ya mirovatiya ji aliyê kapîtalîzmê ve hatî perçe-perçekirin, bi rêbazên herî dilreq û zirav asîmîle dike û di encam de bi qirkirinê û karesata nukleerê li gerekstêrê di reşîne ne. Bi tena serê xwe bi keda kesê jêre tê gotin proleter afirandina nirx, pişt re sermayedarê wekû xwediyê vê ye, wek qezenç ji vî nirxî qutkirina beramberiya pere û amûrên xwe yên din, mîna dîtin û aşkirakirinek zanistî dayîna pêş, bingehê nêzîkatiya abûrîzmêye.*

*Wate û cewherê dîrokî-civakî yê nirxên abûriyê pir vekiriye. Ji xwe di destpêkê de rastê şermizarkirinê hatina guhertinê, xelat dayîna tiştên zêde, ji ber sedemê wateya pîroz ya ji nirx re dihat dayîne. Hêj jî ti cotyarek nabêje "Min Hilberand"; dibêje: ez bermayê pêşiyên xwe bikartînim û jê par digrim." Heta bi gotina; "ji berhem û destkeftên xwedê re spas", ka çi ji jêderê fêmdike, bi awayek asanî lê ji 'zanist'a dilê xwe de bi watetir datîne holê.*

*Emê bedel û mafê keda dayîkekê dayî kû proleter neh mehan di zikê xwe de hilgirtî, bi hezar û yek zehmetiyan takû aniye rewşa karkirinê, çawa bidin ravekirin? Emê xwedîti û behrên amûrên hilberînê yên bi komkirinên hezaran sal hatî amadekirin û sermayedar dizî, çawa destnîşan bikin? Em ji bîr nekin kû nirxê ti amûrek yê hilberînê wekû di bazarê de tê firotin nîne. Tenê dahênertiya(icatçilik) teknîkî ya karxaneyekê, berhemê afirênertiya têr jêhatin ya bi hezaran mirovên dahênere. Nirxê vana emê çawa destnîşan bikin û bidin kê? Nefikirîna parên civakî ya vana, gelo bê kû mirov bi temamî rewişt piştguhbike gengaze? Van nirxên dîrokî-civakî tenê di nava dû kesan de parkirin li gel dadê di guncê? Li aliyê din malbat û derdorên civakî yên van dû kesan hene. Li ser van dû kesên bi malbat û derdorên civakî yên xwe ve tên parastin û çavdêrîkirin, ma mafê vana qet tineye? Em dikarin pirsan hîn dijwartir û zêdetir bikin. Lê ev qas têra nîşakirina bi nakokbûyîna dûdûtiya qezenç-biha dike.*

*Divê em ji bîr nekin têkiliya karsaz(patron)-karker ya kû mîratê têkiliya kole-efendî ya hezaran sal dewirgirtî bi hezar û yek girêyan bi hev ve girêdayî ye; ji dervey hinek îstisnayan, wusa li dijî patron ji serxistina serhildan û serkeftinên bi kok dûre.*

*Di jiyana abûrî ya civakê de cihê kapîtalîzmê di tebeqeyên herî jor de pêktê. Di destpêkê de xwe dipesêre komkirina sermaya bazirganê mezin ya bi nirxên yekdestdariyê li ser bazarê. Sermaye, li gor danasîna xwe nirxên pareyîne kû tim xwe mezin dike. Bi taybet li beramber bazarên dûr yên dinavbera wan de cudatiya nirxê mezin heyî, komkirina(bîrîkîm) nirxên mezin tê destxistin. Wekû beramberiya deynên wek fînans ji dewletê re tên dayîn, mezinbûna bi faîz û îltizamê(pêwîstî) rêya dûyeme. Karxaneyên kanzayê, çaxên xela û şer, qad û demên wê yên din yên girîngin kû tê de stûrbûye. Ji dervey bazirganiyê, hingî di çandinî, pîşesazî û gihandinê(ulaşim) de qezencê bi dest dêxe, cih digre. Bi şoreşa pîşesaziyê qadên qezencê(kâr) dibin sektora pîşesaziyê. Di her dû pêvajoyan de jî bi pêleyîstina pêşkêşkirin-xwestinê(arz-telep), dixebite kû hem hilberînê hem berxwarinê(tûketim) desnîşan bike. Bi qasî kû kifşkere rêjeyên qezencê(kâr) zêde dike. Bazirganiya mezin û pîşesazî, dema kû qada qezencê(kâr) ya pêvajoyên destpêkirin û pijana kapîtalîzmêbûn, lê di roja me de sektora kû giraniya xwe heye, fînanse. Amûrên weke; pere, senet, banqe û kredî kû amûrên sereke yên fînansêne, rê vedikin kû abûriya kapîtalîst bi lez bûyînê re dewreyên qezencê kurtbike, kûrbike û berfirehbike. Bi vî awayî di rêjeyên qezencê(kâr) de pimpimokên xeyalî yên mezin pêktên. Bi vî awayî jî pêvajoyên qeyranê(krîz) tên rewşa jêneger û jênehêlên vê abûriyê.*

*Zêdekirina bêkariyê û xistina destheqan, herwusa li welatên bi erzanî kardikin çêkirina berhemhênan(yatırım) û projeyan, rêbazên din yên kû qezencê(kâr) di werimîninin. Di encam de, ev awayê abûriyê kû jêdera xwe ji çanda herî kevin ya nêçîrvan û bazirgan digre, bi qezençkirina hêza pêleyîstina bi bihayan şansê pêşveçûnê destxistî, bi nermkirin û pêleyîstina rewişt û ol re ji çavdêrîkirina civakî xwe rizgarkirî, bi deyndanê desthilatdarî bi xwe ve girêdayî û li ser bazarê bi sazkirina yekdestiyê re pêşketî, di şîkirina(tahlil) dawî de ji bûyîna abûriya talanê nikare rizgar bibe. Bi armanca qezencê destavêtina wê ya pîşesaziyê, li gora rêjeyên qezencê(kâr) bingeh girtina wê ya avanek hilberîn û berxwarinê(uretim-tuketim), li ser bazneya civakî û dewrûbera xwezayî bi barkirina barên kû her diçe hilgirtina wan zehmet dibe re qeyranên kû rêya wan hatî vekirin, piştî dayîkbûna wê û şûnde rêhevalên wê yên hilweşan û rizîna wêne. Bê guman tevaya abûriyê nîne. Ne bazirganî, çandinî, pîşesazî ne jî geran, amûr û bazar dahênanên(îcat) kapîtalîzmê nînin; berûvajî, saziyên bingehîn yên abûriya civakîne kû li rasta bi karanîn û talankirina kapîtalîzmê ya giran hatine. Bi dîrok û şaristaniyê hatine diyarkirin û li gel polîtîkayê xwediyê jiyanek nav hev de ne.*

***e – Kapîtalîzm Ne Abûrî, Desthilatdariye***

*Pêwîste em baş têbigihin û bi cewher bikin kû abûriya kapîtalîst xwe dipesêre qezencek ya yekdestdariyê kû li ser têkilî û hevrikiya bazarê ya metabûyîna kû jê re abûriya guhertinê jî tê gotin daniştî(tunemek) û ya rasttir bi pêleyîstina bihayan û jê*

*sudbûna ji bihayên cuda yên di navbera qadên cuda de pêkhatî re hatiye sazkirin. Ya rastî, ji ber vê pênasê pêwîste em baş têbigihin kû ne sektorek ya nirxê guhertinê di afirîneye. Bi beşek pir biçûk yê jiyana abûriya giştî ve têkildare. Lê ji ber cihê xwe yê stratejîk, ev beşek kû kifşkertiyê pêktîneye. Kombûna nirxek yê guhertinê kû di destê kesên pir kêm de di astek pir mezin de kombûyî ye. Li gora vê desthilatiya stratejîk ya pêleyîstina hem bi pêşkêşkirinê(arz) hem bi xwestinê(talep) heye. Pêwîste neyê ji bîr kirin kû ev bilindî û desthilatî(ustunluk) ta wê rojê di dewletan de jî nîne. Ya balkêş dayîkbûna vê bilindî û desthilatiyê û rêbaza bikaranînêye. Dayîkbûna wê kêm-zêde em fêmdikin. Bikaranîna wê ji ber kû tim pesartiyê mezinbûna sermayêye, pir zêdetir balkêşe û serûbinkerê civakêye. Ji vê re şoreşger gotin, hemwateyê îxaneta li civakêye. Bi taybet li civaka dîrokî-demokratîk.*

*Ji ber vê sedemêye kû xelekek ya neyê revandin ya pêşveçûna şaristanwarî ne mijara gotinêye jî. Bi bandora hevgirtî ya hezar û yek helkeftinan(tesaduf) û di kelaştekên şaristaniyên kevin de û herêmên wê yên biçûk de, li ser û dijberê bazarê bi leyîskên pere dabînkiriye(saglamak) û ji rêyên dûr yên bazirganiyê, ji talanên dagirkeriyê, komek nijînîner(istifçi)ên bazirganên mezin yên ji para berdikeve bi zêdehî wergirtine, li ser dû bajarên herî bê biryar û bê rê yên Ewrûpa; destpêkê li Ewrûpa, piştre li ser tevayê cîhanê şansê kû desthilatdariya xwe saz bike bi destxistiye û pir baş bikaraniye. Tevayê lêkolîn didin diyarkirin kû ev koma nijînîner(istifçi) pir zêde hişk û girtîne û ti ramana wan ya afirêner û dahênanek wan tineye. Karê kû herî baş biserdêxe li ser pere qezençkirina pereye. Ji kurtêlên(rant) xela û şer dîsa pere qezençkirin, ji cudatiya nirx ya tevaya cîhanê de çêdibe hîn zêdetir qezençkirina pere, yêkane qada civakiye kû tê de jêhatiye. Taybetiyek balkêş ya Ewrûpa'ya seretayên sedsala ١٦'an jî, gihiştina hêza rêvebirina her tiştî ya pere bû. Rêvebir û fermandarê rast bibû pere. Pere li gel kê bûya, hêz li gel wî bû. Di vê de bê guman metabûyîn, bazarbûyîn û bajarbûyîna seyr sedemê bingehîne.*

*Di dîroka şaristaniya cîhanê de (ne dîroka cîhanê ya dijbertiya şaristaniyê!) di bingehê nûvejentiyê de bandora hebûna pere, di şaristaniyê de rê li ber nûvejentiyekê vedike. Lê di cewherê xwe yê bingehîn de rê li ber ti guhertinek bi kok û bingehîn venake. Ji xwe li aliyê din, şaristanî pere, bazarê, bajarî, bazirganiyê, heta banqê û senedê ne kû nû nasdike. Hemû, amûrên berê hezaran sal hatîn dahênandinin.*

*Qezençkirina hêza fermankirinê ya pere, di rastiyê de îtirafa derkeftina ji bûyîna bûyera abûriyêye jî. Dîrokzanê hosta Fernand Braudel, dema kû dibêje kapîtalîzm dij bazare, herwuha dij abûriye, heta ji dervey abûriye, rastiyek pir watedar tîne ziman. Ji ber kû abûrî bi rastiya guhertin û bazarê daye despêkirin, ev darez(yargi)a wî nirxek mezin hildigre. Bi abûriyê re nebûna ti peywendiyek ya kapîtalîzma kû her tiştî di abûriyê de dixeniqîne, heta bûyîna dijminê canê wê, dîtin û ramanek bû kû min jî hertim dixwest bînim ziman. EZ ÎDEA DIKIM: KAPÎTALÎZM NE ABÛRIYE, DIJMINÊ CANÊ ABÛRIYÊ YE. Fînans abûriye? Fînansa cîhanî, abûriye? Karesata jîngeyê abûriye? Bêkarî pirsgirêkek abûrî ye? Banqe, sened, nirxê pere(kur) û faîz abûriye? Wekû pençeşêrê di bendeha qezencê(kâr) de hilberandina*

*meta abûriye? Rêzbenda(liste) pirsyaran berfirehe. Yêkane bersiva ji hemûyan re were dayîn, NEXÊR'ek mezine. Şêwe(formul) eve: pere, sermaye hêcete = desthilatdarî şirîne(şahane). Bi leyîskên pir bi fêlbazî yên pere-sermayê ne şêweyek nû yê abûriyê hatiye afirandin ne jî awayê civaka kapîtalîst, heta awayê şaristaniyek bi navê şaristaniya kapîtalîst mijara gotinêye. Di holê de leyîstokek ya civak xistina destê xwe kû di ti demê dîrokê de li rastê hatin çênebûye heye. Ne tenê hêza abûrî, xistina destê xwe ya tevayê hêzên siyasî, leşkerî, olî, rewiştî, zanistî, felsefî, hunerî, dîrokî, maddî û meinewî û tevayê hêza çandî. KAPÎTALÎZM FERMANREWATÎ Û DESTHILATDARIYA HERÎ PÊŞKETIYE. Em li çarsed salên dawî yên mirov kû jê re çaxa kapîtalîzmê jî tê gotin, binêrin. Di derbarê civakê de, gelo tenê şane û tevnek yê civakê maye kû nehatî xistina bin fermanrewatiyê, ta rayên mûyî yên herî zirav, desthilatdarî li ser nehatî sazkirin?*

*Ez qala çêbûna rêkxistinekê, hêzekê polîtîk ya abûriyê birêve dibe kû bi navê kapîtalîzm, kapîtalîst û abûriya kapîtalîst hatiye bi têgehkirin, dikim. Ev hêz yekem car di Ewrûpa'ya sedsala ١٦'an de bi bandor bûye, li Hollanda û Îngîltere'yê bi taybet bi van navan bûye fermanrewayê polîtîk yê bingehîn yê van welatan. Bikaranîna abûriyê ya wê, abûrîbûyîna wê nîşa nake. Dikare were gotin kû Fernand Braudel civakolog-dîrokzanek bi nirxe kû ewil ev rastî dîtiye. Lê ramana xwe nekariye bi sîstem bike. Heta, herçend zaniye û dîtiye kû destpêka rêsayek baweriya tevayê fikra Ewrûpa çiqas xirab dike jî, lê pir ne aniye ziman. Dibe kû fikra xwe ya vê derbarê de nekarîbe pêşbêxe. Pir eşkere dibêje; kapîtalîzm, dij bazare, talana yekdestiyêye û pesartina ji derve ve ye. Wê demê pêwîste bipirsîn: gelo eva ji derve ve xwe dipesêre, dijî bazarê û ne abûrî, çiye?*

*Ewên em jêre dibêjin kapîtalîzm, kapîtalîst û abûriya kapîtalîst; ewên ne rasterast bi duv abûriyê de diçinin, lê wekû bingehîn têde cih nagirin. Mijûlahiyên vana yên bingehîn çine? Bi yekdesta desthilatdariyê re peywendîdarin. Yekdestên abûriyê bi yekdestên desthilatdariyê re dikin yek. Şer dikin; dema li welat şer qezenç dikin, di nav welat de hêza wan zêde dibe. Ev tê wateya hîn zêdetir nirxê-zêde. Dema ber bi derve şer qezenç dikin, ev tê wateya qezençkirina dagiriyê û desthilatdariyê. Ev pêşveçûn jî wateya talana yekdestêye.*

*Dibe kû seyr û na asayî were pêşwazîkirin, lê li gora min xwediya abûriyê ya rast, raxmê tevayê hewldanên dagirkirin û mêtingehkirinê(somurgeleştirme), jine. Eger em dixwazin abûriyê di aliyê civakolojiyê de bi wate binirxînin, nêzîkatiya herî rast; eger wusaye em ji tîmarkirina zarok ya di zikê jinê de bigrin, piştî anîna cîhanê ya herî zor ta tîne rewşa kû li ser lingan raweste madem jin tîmardike, pîşekara tîmarkirina malê jî jine; wê demê hêza herî bingehîn jine. Bersiva min, bersivek civakolojîke kû hîn rêzdarê rastiyê ye. Bi misogerî bi berçavgirtina girêdana wê bi zîndewerî-ceste(biyoloji) ve. Li milê din, bi rola wê ya di şoreşa çandiniyê de û milyonan sal bi komkeriya wê ya şînatiyê re hê jî ne tenê navmalê de, di gelek qadên jiyana abûriyê de ya çerxê dizivirîne jine. Yunanî'yên kevin kû serfiraziya avêtina bingehê zanistan hildigrin, wekû 'zagona malê, zagona jinê' nav lê kirina abûriyê jî ev rastî ji beriya hezaran sal aşkira kiriye.*

*Bê guman di rêza duwem de, ewên ji bo desteserkirina berhemê-zêde û nirxê-zêde yê hêzên şaristaniyê wek hunerê sereke diyarkirî, di beşa kole, evd(serf) û karkeran de cih digrin kû bê navber û bi rêbazên dilreq hertim dibin çavdêriyê de hatine xebitandinin. Di rêza sêyem de her cor pîşekar, bazirganê biçûk, dikandar û cotyarên xwediyê erdên biçûk yên hinekê azadtir hene. Li ser vana bi zêdekirina hunermend, mîmar, endazyar, pizîşk û kesên xwediyê pîşeyên serbest jî, emê xişteyê kêm-zêde temam bikin. Bê nîqaşe kom yan jî refên civakî yên bi dirêjiya dîrokê çerxê abûriyê zivirandîn, evin. Dîsa di navbera wan de beg(senyor), axa û efendî tinebûn. Pir eşkereye vana ne hêzên abûriyêne, belkû hêzên dagirker, mêtînger, talankar û asîmîlekarin kû li ser mirov û keda mirov, hemû turê mêtinê, dagiriyê, talaniyê û asîmîleyê ji derve ve û wekû yekdestdar dipesêrin. Yê ji derve ve pesartvan(dayatmaci) û ne abûrî, ne tenê kapîtalîste. Ji bilî kapîtalîstê wek bazirganê mezin, pîşekar û banqevan; beg, efendî, siyasetmedar, leşker û rewşenbîrê şaristanîvan jî hêzên ne abûrîne û yên ji derve ve xwe dipesêrin abûriyêne.*

**Abdullah Ocalan/Manîfestoya Civaka Demokratîk**

## BEŞA II.

## LI KURDISTAN'Ê QIRKIRINA ABÛRIYÎ (Ekonomik)

Di serê qadên kû têde polîtîkayên mêtin û talanê herî bi bandor tên bikaranîn de, abûrî tê. Di berdewamkirina her core polîtîkayên mêtinê yên bi armanca abûriyê tên pêkanîn de bê nasnamekirin û mêtin-qirkirina çandî bi awayek hîn bi bandortir tê pêşxistin. Şaristaniya li ser berhemê-zêde xwe bi awa kirî; di nava pêvajoya dîrokî de xala kilîlî û navend ya êrişên li ser pir gelan meşandî, di qada abûrî de derketiye holê.

Em dikarin diyarbikin kû netewek wek Kurdan kevnar jî di vê mijarê de li rasta her core êriş û qirkirina abûrî ya şaristaniyê hatiye. Bi salên dirêj ev êriş û talaniyên li ser Kurdan hatîn meşandin; rewşa xwe ya herî berfireh û dilreq, di nava pêvajoya dûsed salên dawiyê de pêşkêşkiriye. Di nava vê pêvajoyê de talan û mêtina abûriyê ya li civaka Kurd hatî pesartin; di roja me de rewşa qirkirinek bi sîstem girtiye.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan vê rewşê, di paraznameya xwe ya bi navê; "Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Netewa Demokratîk" de wuha tîne ziman: *"Dagirkeriya abûriyê, xetertirînê dagirkeriyane. Rêbaza herî dirindane ya xistin, ji bin birin û helandina civakekê ye. Ji statuyên netew-dewlet yên li ser civaka Kurd zêdetir; bi destdanîna li ser amûrên abûriyê, wana birêvebirinê re hatiye anîna rewşek bê henase. Piştî wundakirina çavdêriya xwe li ser amûrên hilberînê û bazara xwe, ne*

*gengaze kû civakek jiyana xwe azadane berdewam bike. Kurdan tenê li ser amûr û têkiliyên hilberînê di astek mezin de çavdêrî û rêveberiya xwe wundanekirin; desthilatiya hilberîn, mezaxtin(tuketim) û bazirganiyê jî ji destan hate standin. Ya rasttir qasî kû li ser bingehê înkarkirina nasnameya xwe bi netew-dewletên desthilatdar ve hate girêdan; bikaranîna saman û malên xwe, di bazirganiyê û pîşesaziyê de rol leyîstina wan gengaz bû. Dîl girtina abûriyane, bû amraza herî bi bandor ya înkarkirina nasnamê û bêparbûna ji azadiyê. Bi taybet li ser rûbar û kanên petrolê karxaneyên yekalî hatîn avakirin, qasî hebûnên çandî yên dîrokî, xakên bi berhem jî tine kir. Piştî mêtîngeriya siyasî û çandî mêtîngeriya abûriyane ya hîn zêdetir hatî kûrkirin, ji lêdanên kûştinê bû ya herî dawî. Di encam de xala kû hatî gihiştinê, bûye; 'yan ji civakbûyînê derkeve yan jî bimire.' "*

Ji ber girîngî û cihê wê yê jeostratejîk dewlemendiyên li tevayê perçeyên Kurdistan'ê bi destê şaristaniyê û hevkarên wê yên herêmî tê mêtin û li ser Kurdan di vê qadê de zextek pir mezin tê bikaranîn. Ji bo hîn baştir karîna fêmkirina vê talana dilreq kû ji dembûriyê ta roja me li tevaya Kurdistan'ê tê jiyanbûn, hîn ji nêzîk ve dikare li rewşa berçav ya li tevaya Kurdistan'ê derketî holê were nêrîn.

### ١. Bakûrê Kurdistan'ê:

Hem di aliyê şêniyê û hem jî xakê de beşa herî mezin ya Kurdistan'ê ye. Di vê beşa kû ٢٠ milyon şêniya Kurd tê de jiyan dibe de, ji salên ١٨٠٠'an û vî alî ve li ser Kurdan mêtin û qirkirinek abûriyane ya pir giran tê meşandin. Piştî hilweşiyana împaratoriya Osmanî, mêtina abûrî ya ji aliyê Komara Tirkiyê ya derketî holê û hêzên kapîtalîst yên rojavayî ve di vê xaknîgariyê de tê meşandin, ji bo zext û mêtinên abûriyane yên di beşên din de tê xwestin were meşandin jî pêşengtî kiriye.

Mêtin û talana abûriyane ya dijî Kurdan hatî meşandin; li ser qadên berhemên abûriyane yên civakê (çandinî û lawirvanî), hatiye rêvebirin. Dîsa dewlemendiyên din yên herêmê û jêderên wê yên binerd jî, ji aliyê desthilatdaran ve di rasteka van polîtîkayan de rastê mêtinê hatine anîn. Yek ji êrişên abûriyane ya herî girîng kû li bakûrê Kurdistan'ê tê meşandin jî, bi polîtîkayên koçberkirinê derketiyê holê. Li rex vê êrişên abûriyane yên din kû girîngin, tê xwestin li ser çîftlikên navend dewlet yên bi rêya bendan û qenalên mezin yên avdaniyê tên sazkirin, werin meşandin.

#### a. Çandinî û Lawirvanî

Di abûriya gelê Kurd de cihê kifşker yê çandinî û lawirvaniyê ta salên avakirina KT'yê jî dom kiriye. Lê di stratejî û polîtîkayên bingehîn yên derbarê Kurdan de, bi destê dewletê qutkirina gel ji kiryarên abûriyane yên pesartiyê çandinî û lawirvaniyê; bi giştî ketina jêr destê dewletê ya vê qadê, yek ji armancên navendiye. Di encama kiryarên mişextkirin(surgun)-koçkirin(goçertme)ê yên ta salên ١٩٥٠'yê de nêzîkî nîvê gundên Kurdan hatine valakirin, bi belavkirina eşîrên xwecih yên di koçeriyê û gundan de beşek ji wan li diyarên dûr, beşek jî li bajarên kû dewlet tê de desthilate hatine mişextkirin. Li ser beşek ji warên cihwarbûnê û xakên kû hatine valakirin, koçerên bi eslê xwe Tirk kû ji derve hatine anîn, hatine bicihkirin; xakên kû bi petrol-bi

kan-bi berhem û xakên xwediyê kombûnek maddî ya pir girîng wekû zeviyên fireh yên çandiniyê jî hatiye standina bin desthilatdarî û xawendariya dewletê de.

Di pêvajoya ta sala ١٩٥٠'yê de ji ber kû dewletê di herêma xaka Kurdan de bi serekî giranî daye xwe avakirina wekû leşkerî û kargêrî(idarî), xebat û kiryarên wê yên derbarê qada abûriyê de zêdetir li ser çêkirina bingehekê bûne. Di giştiya herêmê de xebatên îstimlak, belavkirina erd û tapûyê hatine meşandin. Bi lêkolînkirina kanzayan, petrol, jêderên avê, daristan û dewlemendiyên din yên xwezayî, herwusa bi lêkolînkirina kombûn û derfetên maddî re amadekariyên xebitandina van jêderan hatine kirin. Li gel vê, hêjmarek kêm karxaneyên çandiniyê kû bibin nimûne(model) jî hatine sazkirin. Girêdayê çandiniyê saziyên dewletê yên weke; TMO, TEKEL, DSİ, Xizmetên Gund, Karxaneyên Çandiniyê yên Dewletê, TZDK'ê xebatên rêkxistinbûn û çêbûnê meşandine. Pêvajoya kû vegere GAP'ê di sala ١٩٣٧'ê de bi Bendava Keban'ê hatiye destpêkirin. Di nava heman salê de li Ceylanpinar'ê, di sala ١٩٤٩'ê de jî li Mûş'ê çîftlikên hilberînê yên dewletê hatine damezirandin.

Piştî sala ٢٠٠٢'yê nêzîkatî û polîtîkayên neo-lîberal yên serdestbûyîn, di pêşengiya dewletê de li qad û kiryarên çandiniya tevaya herêmê jî vedanê dike. Tevayê hebûn û têkiliyên dikevin çarçuveya qada çandiniyê yên wek; serkaniyên avê, xakên bi berhem, berhemên bingehîn yên tên hilberandin, teknîk û amûrên hilberandinê, bazarkirin û hêza kar, tên lêkolînkirin. Karxaneyên çandiniyê û projeyên pesartiyê kapîtalîzma dewletê ya di salên ١٩٣٠'an de destpêkirî, qadên wan yên bi bandortiyê tên berfirehkirin, di pîvanekên mezintir de û bi awayê bi derfetên rojane re hatî li hev anîn, ji nû ve tên avakirin. Bi vê re, ji bo hîn bi bandortir li hev anîna polîtîkayên neo-lîberal li qada çandiniyê û ji bo hîn zêdetir derbazkirina derfetên di vê qadê de li bazara kapîtalîst, ber bi rêkûpêkiyek yasayî ya nû ve tê meşîn û damûdezga tên rêkxistinkirin. "Ajansên Pêşveçûna Herêmî" yên weke; bernameyên destek û paldera çandiniyê û weke DIKA, FKA, KUDAKA kû beşek mezin yê bernameyên xwe ji çandiniya pîşesaziyane re veqetandî, tên damezirandin. Desthilatdariyên li ser kiryarên çandiniyê yên di xaka Kurdan de bi awayê hevpar ya dewletê û hêzên sermaya taybet ya xweyanî(yerli)-biyanî, bi koordînasyona van damûdezgayan dest bi avakirinê tê kirin.

Di encama vê nêzîkatiyê de gelê Kurd hatiye xistina rewşa kû kiryarên cewherî yên çandiniyê bi îradeya xwe nekarin pêkbînin. Jêdera bingehîn ya pirsgirêkên kû di qada çandiniyê de tê jiyanbûn, li pêvajoya biryar girtina di derbarê kiryarên çandiniyê û destnîşankirina polîtîkayê de bi rêyên rasterast yan jî ne rasterast nekarîna pêkanîna tevlêbûnek demokratîk ya gele an kû nekarîna xwedî gotinbûna wê ye. Dema wusa dibe, raxmê kû kar û xebatên çandiniyê taybet pêktîne, ked dide, di hilberîne, di afirîne; ewê rasta pirsgirêk û zoriyên giran kû nikare bin derkeve tê, bihêlin pêşwazîkirina pêwîstiyên xwe yên bingehîn, ewê nikare bi temamî pirsgirêkên xwe yên tîmarbûnê jî çareserbike dîsa gundî û cotyarê Kurd bixweye. Vê rastiyê, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wekû "di welatê bingehîn yê nanî de, bê nan hiştin" bi awayek pir balkêş bilêv dike.

Jêdera bingehîn ya pirsgirêkên di qada lawirvaniyê de tê jiyanbûn, ji destê gel standina derfetên kû di asta pêwîstiyên xwe bikare pêşwazî bike de rêvebirina vê kiryarê bi îrada xwe ya gel, li cihê vê avakirina desthilatdariya xwe ya şîrket û saziyên sermaya taybet û dewletêne. Çawa kû di qadên din de bûyî, di qada lawirvaniyê de jî yê bi xebitînê, ked dayînê, renç kêşanê û rû bi rûyê pirsgirêkên giran hatinê re di hilberîne dema kû gundî-cotyare; nêzîk tevaya berhem û qezenca tê bi destxistin jî, derbazê bazara kapîtalîst û hêzên wê yên desthilatdar tê kirin.

Di lawirvaniyê de pirsgirêkên wek; zoriyên di dema bikaranîna deşt û mêrgande tên jiyanbûn, veşartina şînatiyên alif(yem), xistina bazarê ya berhemên lawirî, di asta têrê bike de nebûyîna rêkxistinê, berdewamkirin û xebitandina bi awayê karxaneyên malbatî û di astek ketî de ya karxaneyên herêmê, bi awayê beşî û perçeyî bûyîna erd û zeviyan, pirsgirêka avdaniyê, bi awayek aqilane bikarne anîna zevî û xakan û girêdayê vê kêm û lawaz mayîna para kû ked ji hilberînê distîne û pirsgirêkên mîna vana hêjan berdewam dikin. Li gel vê;

١. Ji holê rakirina bingehê lawirvantiya sewalên sermezin û serbiçûk ya pesartiyê gundan, rakirina gund valakirinên piştî sala ١٩٨٥'ê û şûnde dîsa hatî xistina karanînê û di navbera salên ١٩٩٣-٩٧'ê de hinek din hatî kûrkirin û zêdekirin û bi her awayekê piştî van salên dawiyê jî her tê berdewam kirin.
٢. Bi hêceta ewlekariyê, beyankirina wekû herêma leşkerî ya zevî û zozanan re qedexekirina wan, şewitandina çêrgeh û mêrgan, tim ji hewa û bejahiyê bombebarankirina zevî û xakan re kûştina lawiran, dîsa bi zextên pir zêde yên weke ji nav birin û pûçkirina tiştên zivistanê re Koçer hatine naçarkirin kû derbazê bajar-jiyana xwecih bibin. Di encama van polîtîka û kiryaran de, nehiştina derfetên meşandina lawirvantiya sewalên serbiçûk kû di herêmê de bingehê lawirvantiyê ye û bi giranî ji aliyê Koçeran ve tê meşandin.
٣. Bi sedemên weke; ji heyberên kîmyawî bûyîna cewherê çekên di şeran de tên karanîn, bermayên alavên leşkerî, şewitandinên zeviyan, mayînên hatîn çandin, rê vekirina ji wundabûyîna taybetiyên bi berhem ya mêrg û çêrgehan ji lawirvaniyê re.
٤. Kêmbûna çandiniya şînatiyên alif ya ji aliyê gel ve tê pêkanîn, ketina bin yekdesta karxaneyên çandiniyê yên Kapîtalîst-pîşesaziyane ya hilberîna di vê mijarê de.
٥. Kiryar û pêkanînên Rewşa Awarte(OHAL) yên li herêmê dom dikin, operasyonên leşkerî û zextên hêzên leşkerî.
٦. Berpirsyartiyên dibin navê standartê de tên karanîn yên weke; bac, nasnameya lawir û aşiya lawir.
٧. Nebûna derfetên mîna; bi karxistin, paketkirin, depokirin, pê gehandin û pêşkêşkirina li karanînê ya berhemên lawirî kû gel bi destxistî.

### Li Kurdistan'ê Pirsgirêkên Lawirvantiya Pîşesaziyane(Endustriyalîst) Rê Lê Vekirî;

١. Abûriya lawirvaniyê ya serbest-kevneşopî kû civak ji bo pêşwazîkirina pêwîstiyên xwe pêktîne dema tê tinekirin, li şûna vê lawirvantiya yekgirtî(entegre) ya kapîtalîst-pîşesaziyane ya "modern" tê bicihkirin.

٢. Li şûna çêkirina turên taybet yên herêmê, tîmarkirina lawirên jê re tê gotin "nijadê çandê" û ji derve tê anîn, tê belavkirin û pêkanîn. Wekû encamê vê nêzîkatiyê, turê lawirên xwecih û corên wan rû bi rûyê tinebûnê tên, derfetên destdayî yên kû xak û nîr pêşkêş dikin ji bo xwedîkirin û mezinkirina lawirên "nijadê çandê" tên seferberkirin û pêşkêşkirin.

٣. Di lawirvantiya kevneşop ya taybet herêmê de lawir bi giranî ji bo destxistina berhemên lawirî yên wek; şîr, hirî, penîr, nivişk tên xwedîkirin û tîmarkirin. Di vê rêbazê de lawir wekû amûrek kû dê were serjêkirin û xwarin yan jî dê qezencê bîne, nayê dîtin. Gundî-Koçer wekû perçeyek yê xwe li lawirê kû mezinkirî dinêre. Ji ber vê sedemê tê derxistina zozan û zeviyan, bi alifên xwezayî tê tîmarkirin. Di lawirvantiya pîşesaziyane ya "modern" de kû li şûna vê tê xwestin were anîna rewşa desthilat jî lawir, wekû makîneyek tê dîtin kû ji bo bi destxistina goşt, şîr, nivişk, hirî, penîr tê bikaranîn. Bi vê sedemê di girtîgehên xaneyî(hucre) yên lawiran de kû jêre "Çîftlika Modern" tê gotin, bi alifên destsaz(suni) tên tîmarkirin, bi hormonan tên werimandin. Bi dermanên kîmyawî û îzolasyonê tên parastin. Li gora vê armanc û rêbaza tîmarkirinê dijî mirovbûyîn û xwezayê ye. Herwuha goşt û berhemên din yên ji lawirên bi vî awayî tên tîmarkirin tên bi destxistin jî, rê li ber pirsgirêkên micid(ciddi) yên tenduristiyê vedike.

٤. Karxane û damûdezgayên çandiniya pîşesaziyane- yekgirtî(entegre), di kiryarên hilberîna alifê xwezayî û destsaz(suni), bi rêya cotkirina destsaz destxistina lawirê avis(damizlik), avakirina avaniyên "lawirvantiya modern", bi mijarên weke endazyarî bi karxistina berhemên ji lawiran tên destxistin yên wek; goşt, şîr, çerm, nîvişk, hirî, xwînê û derbazkirina bazaran de jî desthilatdariya xwe bi xwe ava dikin.

٥. Karxaneyên pîşesaziyane yên pesartiyê dewlet û sermaya taybet, bi lawirvantiya koxik û xwedîkirina masiyan re kiryarên mêşvantiyê jî dixwazin bigrin bin yekdestiya xwe bi xwe de. Wekû pesartiyê qezenç(kâr) û firotina derve(ihracat), di avaniyên bi pîvana mezin de karxaneyên mirîşkvantiya goşt, hilberîna hêk, karxistinên masîvantiyê û berhemên mêşvantiyê dixebitînin dema kû li bajarên wek; Meletî, Elezîz, Dîlok, Erzerûm'ê tên kûrkirin û firehkirin, tevayê berhem û derfetên girêdayê van kiryaran, ji aliyê karxaneyên mijara gotinê ve tê xwestin kû werin bazirganîkirin û werin derbazkirina bazara kapîtalîst. Ev nêzîkatî, dema kû jiyan û pêşveçûna xwezayî ya lawiran dêxe metirsiyê de, rê ji xirabûn û têkçûna eko-sîstemê re jî vedike. Dîsa gihiştina gel ya jêderên xwarin û zat yên di xwezayê de, asteng dike.

٦. Xak û zeviyên ew kesên tên anîna rewşa kû nikarin kar û kiryarên lawirvantiya kevneşop bimeşînin, li gel hêza wan ya ked û hilberînê, bi rêbaza bernameyên weke; tîmarkerî-cotyariya bi peyman, destek û paldera(teşvik) lawirvantiyê, bi lawirvantiya pîşesaziyane ve tên girêdan.

**b. Daristanvanî**

Dîsa ji belge û bermayên dîrokî gengaze em bixwînin kû bi dirêjiya dîroka nêzîk pênç hezar salan hêzên dewletparêz ji bo talankirina daristanên li erdnîgariya Kurdistan'ê tim sefer amadekirine, di şeran de ev daristan tim hatine şewitandin lê dîsan jî dewlemendiyên xwe parastine. Ji ber sedema destdayî bûyîna erdnîgarî, avana xakê û nîrê wê, di herêmê de daristanên dewlemend-tejî û betenok(bitki ortusu) ta sedsala ٢٠'ê hebûna xwe di astek girîng de berdewam kiriye. Li Rojhilata Navîn û herwusa li welatê Kurdan pêvajoya damezirandina xwe ya modernîteya kapîtalîst bi destê mînaka(model) netew-dewletê, daristanên li herêmê jî rû bi rûyê metirsiyên micid re hêlaye. Di pêkanînên qirkirin û koçberkirinê yên ta sala ١٩٤٠'ê de daristanên di xaknîgariya Kurdan de jî bi awayek berfireh hatine şewitandin û birîn. Di serdema navbera salên ١٩٤٠-١٩٨٠'yê de jî, li milekê qadên daristanî yên heyîn û hebûnên daran, bi armanca destxistina darên şewatê û yên necariyê(kereste) ji aliyê damûdezgayên dewletê ve bi rêbaza pîşesaziyane hatine bikarxistin, li milê din jî bi piştguhkirinê di tevaya herêmê de polîtîkaya çavgirtinê li kêmbûna qadên daristanî û bi darî hatiye şopandin. Piştî sala ١٩٨٠'yê û şûnde jî, ji bo gihiştina armanca ji holê rakirina rastiya Kurd, girêdayê derketina pêş ya rêbazên leşkerî û zexta eşkere; bihêlin nebûna helmetên(kampanya) bi darkirinê, herwusa şewitandina qadên daristanî û bi darî, polîtîka û kiryarên birîna daran ya li cihên dikare were gihiştina wan, di astek berê nebûyî de hatine berfirehkirin û kûrkirin. Li gor dîroka nêzîk dema em xaknîgariya Kurdan lêkolîn dikin, ji dervey çend qadên kû ٪٢٠'ê xakên wan daristan, wekû giştî em dibînin kû zêdetirê ٪٦٥'ê xakan, hinek qadan de jî navbera qasî ٪٧٥-٨٠'yê xakan di rastiyê de daristanin, lê ji ber sedemên wek; polîtîkayên dewletê, êrişa kapîtalîstîk û di civakê de kêmbûna hişmendiya mijara parastina daristanan, di roja me de rêjeya qadên daristanî ya di nava xakên giştî de pir ketiye.

Raxmê her tiştî, li gel avana xwe ya nîr, erdnîgarî û xakê, bi sedema xwe ragirbûyîna turên daran di erdnîgariya Kurdan de qadek daristanî û hebûna daran ya pir girîng heye. Lê xeteriya tinekirina qadên daristanî yên di herêmê de her roja kû diçe, hîn jî zêdetir dibe. Ji aliyê leşkeran ve bi hêceta ewlekarî û operasyonan birîna darên li herêmê yan rasterast yan jî bi bandora çekên agirîn yên tên karanîn şewitandina qadên daristanî-bi dar, bi awayek berfirek dom dike. Karxaneyên ser bi dewletê yan jî sermaya taybet kû projeyên çandiniya pîşesaziyane ya bi pîvanek mezin dimeşîne, bi hêceta darên necariyê destbêxe yan jî erd û zeviyên çandiniyê veke, darên belavê erdên pir fireh bûyî dibire; ger ev kiryar zêde wext bigre jî dişewitînin. Li gel vê hêzên dewletê, di serî de cerdevanan, mirovên ji gel, bazirganên darên necariyê û darên din jî, ji bo daristanan serûbin bikin, pûç bikin, han didin. Di hinek warên niştecihbûnê de gel jî ji bo darên necariyê yan jî darên şewatê bi destbêxe, qadên daristanî xirab dike. Di her werza havînê de ji aliyê gelê herêmê yan jî şaredariyê ve bi destkarîkirinê vemirandina agirê bi zanabûn yan jî bê zanabûn tê pêxistin, bi hêcetên cor bi cor tê astengkirin. Ji bo daristanên di xaknîgariyek din ya di nav sinûrên K.T.'yê de kom û rêkxistinên parastina xwezayê yên pir hişmendin û tevayê derfetên xwe seferber dikin, li beramber şewatên daristanê yên li erdnîgariya Kurdan derdikevin, di wateya giştî de bê deng dimînin. Di roja me de pûç û xirabe bûyîna qadên daristanî yan jî korsî(fundalik) ya nêzîk ٪٧٠'yê xakên daristanî yên

giştiya herêmê de heyî, lê hebûna tenê beşek biçûk ya qadên daristaniya asayî, vê rastiyê diyardike.

Di salên dawiyê de polîtîkayên neo-lîberal yên ketine rewşek zal de daristanan û hebûna daran jî pir micid û di wateya neyênî de bi bandor dike. Ya ji vê rewşê herî zêde bi bandor dibe jî, xakên daristanî yên li erdnîgariya Kurdan’dene. Mînak; “firotina erdên kû taybetiya daristanê ji destdane” an kû zagona ٢B’yê, herî zêde jî ji bo xakên “xirabe” yan jî yên taybetiya daristanbûna wan hatî rakirin ji şîrketên taybet yan jî yên dewletê re werin firotin, tê li darxistin.

### c. Petrol û Dewlemendiyên Binerd

Di aliyê kanza û jêderên din yên binerd de pir dewlemendbûna erdnîgariya Kurd, di belge û destkeftên dîrokî yên serdema ji beriya hezaran sal de jî tê raxistina holê. Herwusa cara yekem li vê xaknîgariyê dîtina kanzaya sifir(bakir) û dest bi karanîna wê kirin, bermayên Amed-Çayonu(BZ. ٧٣٠٠-٦٧٥٠)’yê diçespînin. Li gel vê, kanzaya bronz(tunç) kû ji tevilheviya sifir û tenekeyê(teneke) pêktê, cara yekem li Mezopotamya û Anatolî’yê dîtin û karpêkirina wê, kanzaya hêsin jî ji aliyê Mîtannî, Urartu û Medan ve bi awayek berfireh bi karxistin û karpêkirina wê bi heman bermayên dîrokî tên çespandin. Ji bo destxistina jêderên kanzaya dewlemend, bi destpêkirina ji Sumer’an; tim êrişkirina ser welatên Kurdan ya tevayê hêzên şaristaniya dewletparêz, dîsa di tevayê belge û bermayên dîrokî de tê daxistina holê.

Yek ji armancên herî mezin ya hêzên desthilatdarên şaristaniya kapîtalîst kû piştî sedsala ١٩’mîn bi dagirkirina Rojhilata Navîn û erdnîgariya Kurd re nêzîkatiya tevlêkirina li sîstema xwe nîşakirî, destdanîna li ser destkeftên pir mezin yên petrol, kanza û dewlemendiyên binerd yên li vê erdnîgariyê heyî ne. Dewleta K.T.’yê ya li ser mîratê Osmanî hatî sazkirin, pêngavên xwe yên di mijara “netewîkirin” yan jî dewletîkirina dewlemendiyên xwe yên binerd kû şîrketên Ewrûpî pê kardikin, hêj di sala ١٩٢٧’ê de avêtine. Di encama lêkolînên berê şîrketên biyanî û piştî ١٩٣٠’an jî saziyên peywendîdarên vê qadê yên K.T.’yê kirîn, hatiye derxistina holê kû erdnîgariya Kurd jî di serî de petrol, xwediyê destkeftên dewlemend yên binerd û pir mezine. Wekû hemşêweyê pêkanînên tepisandina tund ya serhildan û berxwedanên Kurd û koçberkirina ji cih-warên xwe ya Kurdan, li gora dane(veri)yên wê demê, dewletê qadên kû tê de petrol û kombûnên kanzayî yên herî girîng heyî, zû û bi awayek pir tund xistiye bin dest û çavdêriya xwe de. Mînak; qadên weke Koçgirî(Sêwas), Dêrsim, Elezîz, Meletî û Erzerûm, ew qadin kû dewleta K.T.’yê wekû leşkerî û kargêrî(idari) cara yekem û bi awayek qahîm xwe têde avakiriye.

Di roja me de, nêzîkî tevaya petrola giştiya Tirkiyê tê li darxistin, li Amed, Sêrt, Êlih û Semsûr’ê tê bidestxistin. Rezerva cewher ya li Elezîz’ê kû di nav de sifir, çinko, zêr, zîv jî heye, ji tebeqên kombûnê yên herî girîngin kû di nav sinûrên Tirkiyê de cih digre. Tebeqên kombûna fosfatê li Mardîn-Çiyayê Mazî’yê, jêderên fosfatê yên di nav sinûrên K.T.’yê de herî mezin û di cîhanê de tilîjimare(nadir). Çawa kû dê ji daneyên çarçuveya bajaran de jî were zanîn, di tevaya herêmê de hem wek tur hem jî wek çendêtiyê(miktar), dewlemendiyên binerd yên pir girîng hene.

Ta demek pir nêzîk di mijara dewlemendiyên binerd de polîtîkaya bingehîn ya dewletê; kanza, petrol û heyberên din yên xam kû bi destê sazûmaniyên dewletê yên wek; MTA-MİGM-TPAO-ETİBANK dihatin derxistin, rasterast şandina ji karxaneyên li bajarên herî nêzîk û “bi ewle” yên ji dervey xaknîgariya Kurdan hatine sazkirin bû, li wan deran pê karkirin yan jî wekû heyberên xam şandina lîmanên herî nêzîk û derxistina ji dervey welat bû. Mînak; hêsinê di nav sinûrê bajarên Sêwas û Meletî’yê de tê li darxistin, rasterast tê şandina karxaneyên hêsin-pola(çelik) yên li Zonguldak-Ereglî’yê. Beşek mezin yê kromê kû di nav sinûrê bajarên Erzerûm, Elezîz û Meletî’yê de tê li darxistin, bi şandina ji lîmanên Îskenderûn û Mêrsîn’ê re tê şandina ji dervey welat(ihraç). Piştî salên ٢٠٠٠’an û şûnde, wekû girêdayê meşandina pêkanînên di vê qadê de ya şîrketên sermaya taybet yên xweyanî-biyanî, polîtîkaya pêkarkirina dewlemendiyên binerd li qadên tê bidestxistin yan jî li cihên “bi ewle” yên herî nêzîkî van deran, hat xistina meriyetê.

Di mijara kanza, petrol, heyberên xam yên pîşesaziyane, jêderên jeotermal û dewlemendiyên binerd yên din de polîtîkayên hatine xistina jiyanê û encamên wê;

١. Beşek yê petrola kû li herêmê tê derxistin, dema di rafîneriya li Êlih’ê de tê xebitandin, beşa din ya dimîne tê şandina rafîneriyên li Îskenderûn û Mêrsîn’ê, li wan deran tê xebitandin. Kanza, heyberên xam yên amûrên avahiyan û jêderên din yên heyberên xam jî, ji dervey hinek caran bi giştî tê şandina karxaneyên bajarên weke; Elezîz, Meletî, Şirnex kû tê de pîşesaziya endustriyalîstî ya li Tirkiyê pêşketiye û polîtîkaya karpêkirina li wan deran dom dike.

٢. Ji dervey Gimgim, Meletî û beşek Êlih’ê, piraniya kesên di binke û karxaneyên dewlemendiyên binerd dertêxin de dixebitin, ji bajarên dervey herêmê tên anîn. Mînak; karkerên avahiya santrala termîk ya girêdayê şîrketa birqa(elektrik) Park ya li Şirnex’ê, ji Çîn’ê hatine anîn. Nêzîk tevayê karkerên di karxaneyên kanzaya nav sinûrên bajarê Elezîz’ê de dixebitin, ji beriya ٥٠ salan yan jî di pêvajoyek hîn nêzîk de yên ji dervey herêmê hatine anînin.

٣. Di her dû pêkanînên li jor de jî, li holêye kû dewlemendiyên binerd yên li herêmê li gor pîvana derxe-bibe hatiye karpêkirin. Di vê çarçuvê de pêşnexistin û avedanî nekirina herêma kû di astên bilind de dewlemendiyên binerd jê tê derxistin, polîtîkaya sûd jênegirtina Kurdan ya ji derfetên kar yên bi rêkûpêk û xwedî paye, tê meşandin.

٤. Polîtîkayên di mijara nirxandina jêder û dewlemendiyên binerd yên li herêmê de, bê kû dîtinên gel werin girtin dijberê daxwaz, berjewendî û pêwîstiyên gel bi awayek navendî, ji aliyê hêzên dewlet û sermaya taybet ve tên destnîşankirin.

٥. Binkeyên kan(ocak) û karxaneyên din, ji ber kû li gora pîvana qezenca(kâr) zêde xebatê dimeşînin, li beramber mirovatiyê, eko-sîstemê û gelê herêmê bi şik û gumana berpirsyartiyek her awayî tevger nakin. Ev karxane ji ber kû ji aliyê dewletê ve bi awayek bandorker nayê çavdêrîkirin û dîsa ji ber kû derfetên çavdêrîkirina ji aliyê civakê ve ya bi her awayî tineye, rêbaz û teknolojiya bikartînin, hem di pêvajoya pêkanînê de û hem jî dema kiryar bi dawî dibin, di aliyê tenduristiya xweza û civakê de dibe sedemê xusar û kavilbûnên nikare jê

were vegerîn. Gelek hilweşiyanên wek; qirêjbûna hewa, lêmişt(erozyon), lehî(toprak goçmesi), çolbûyîn, hatina rewşa hezê(bataklik) ya zevî û xakan, rûxîndina mîratê dîrokî û çandî derdikeve holê. Mînak; karxaneyên asfaltê yên li Şirnex'ê kiryaran dimeşînin, li qad û derdora wê ya kû lêye, di aliyê tenduristiya civak û xwezayê de bi awayek pir micid metirsiyê di afirîne.

٦. Girêdayê anîna rewşa zal de ya polîtîkayên neolîberal, di salên dawiyê de tê xebitîn kû karxane, kargeh û saziyên di navendên pîşesaziyane yên li Tirkiyê de bi salan kiryar meşandîn lê di pêngava kû hatî gihiştin de hem ji aliyê gelê herêmên kû ew bi xwe lêbûne ve nehatîn xwestin û hem jî mezaxtina wan ya karpêkirinê pir bilind û di astek micid de qirêjbûna hewa çêdikin, werin derbazkirina erdnîgariya Kurdan. Tê xebitîn kû hilberîna di beşên mîna plastîk, heyberên kîmyawî, zibil, boye û çermvaniyê de were guhastin û derbazkirina herêmê. Bi vê nêzîkatiyê tê plankirin kû dibin navê bi cihkirin û damezirandinê (istihdam) de, Kurd dibin şert û mercên girande bi destheqên pir kêm, bi awayê ji dilniyayiya(guvence) civakî bêpar werin xebitandin, eko-sîstem were hilweşandin, jêder werin talankirin û bi vî awayî bi rêya herî erzan û bê zorî qezenca(kâr) zêde were destxistin. Mînak; tê plankirin kû tebeqeya kombûnên fosfata Mardîn-Çiyayê Mazî, bi vî awayî were xebitandin. Di vê çarçuvê de tê plankirin kû di bajarên wek Meletî, Erzerûm, Elezîz û Amed'ê de karxaneyên pîşesaziyane werin sazkirin.

### d. GAP

Çêkirina GAP'ê, di bingeh da digihe ta Bernameya Islahata Şark'ê. Piştî qirkirina Dêrsim'ê pêvajoya kû ta GAP'ê dê biçe, tê destpêkirin. Bi navend girtina Elezîz-Keban'ê re kû li gel destdayî bûna erdnîgariya xwe, qadek stratejîk ya xwediyê tebeqên kanzayek pir dewlemende jî, di hewza Firat'ê de xebatên pêşlêkolînê(etud) tên destpêkirin. Piştî pêngava "bi pîşesazîbûyînê" ya li dûv endambûyîna NATO'yê ya dewleta K.T.'yê hatî destpêkirin, ji bo avakirina sîstema kapîtalîst, dest bi sazûmankirina avanajêr(altyapı) ya pêwîst tê kirin. Li ser vî bingehî Rêveberiya Giştî ya Karên Avê ya Dewletê kû weke yek ji damûdezgayên kû girîngtirîn erk hilgirtî ser milên xwe, di sala ١٩٥٤'ê de tê sazkirin. Di dema ١٩٥٠-١٩٦٠'ê de Tirkiye bi beşbûna ٢٦ hewzên avê ji aliyê K.A.D(Karên Avê ya Dewletê)ê ve xebatên hewzê tên destpêkirin. Ji bo zanîn û fêmkirina di mijara xweragirî û hêza hilberandina birqê ya rûbarên Dîcle-Firat û projeyên avdaniyê de, xebatên dahênan û aşkirakirinê tên meşandin û di sala ١٩٦٤'ê de "rapora Pêşveçûna Hewza Firat'ê", di sala ١٩٦٦'ê de jî "rapora Pêşveçûna Hewza Firat'a Jêr" tê amadekirin. Ji aliyê rêveberiya herêmiya Amed'ê ya K.A.D'ê ve jî xebatên hemşêwe tên meşandin.

Di sala ١٩٧٧'ê de pesartiyê yek kirina raporên pêşveçûna hewzên Dîcle û Firat'ê, "Projeya Başûrê-Rojhilatê Anatoliyê" tê amadekirin. GAP projeya herî mezin ya Tirkiyê û projeya ٨. mezin ya cîhanêye. Ger ٣٢ milyar dolar mezaxtina wê were hisabkirin, sinûrê qezenca(talan) kû di aliyê dewlet û kapîtalîstên taybet de dê ev proje bi xwe re bîne, dikare were fêmkirin. Mirov dikare girîngiya GAP'ê ji gotinên

Suleyman Demîrel yên wek; “Ez ٥٠ sale bi vê projê ve mijûlim, ger temenek min yê din hebûya dîsa minê bidaya vê derê,” jî fêmbike.

Di sala ١٩٣٦’ê de Îdareya Lêkolînê(Etud) ya Karên Birqê hatiye sazkirin. Îdareyê bi “Projeya Keban’ê” re dest bi lêkolînên(Etud) berfireh kiriye û rûbarê Firat’ê di her alî de hatiye xistina ber lêhûrbûnê. Li ser bingehê raporên pêşveçûnê yên ji bo hewzên Firat û Dîcle’yê hatîn amadekirin, di sala ١٩٧٧’ê de GAP hatiye sazûmankirin. Koordînasyon û rêvebirina GAP’ê di sala ١٩٨٦’ê de ji Rêkxistina Plansaziyê ya Dewletê re hatiye dayîn.

GAP, plan û konseptek polîtîk-abûrî ya têr armanca stratejîke kû di navenda wê de nêzîkatiyên pîşesaziyane yên wek; li ser bingehê kapîtalîstî bikaranîna rûbarên Dîcle-Firat’ê, bi bazara kapîtalîstî ve girêdana sektorên çandinî û lawirvaniya kû kiryara bingehîn ya abûriya herêmêye û li ser bingehê kapîtalîstî bikaranîna dewlemendiyên sererd-binerd hene. Di roja me de bandorên talanker û kavilker yên projeya GAP’ê û xusarên wê yên li civak û erdnîgariya Kurd hêj jî zêde dibin.

**e. Bendav û SBH(HES)**

Bendav û SBH(Santralên Birqê yên Hîdro-HES-), bi sedema vekirina rêya hilweşandinên li ser civak û xwezayê, projeyên pîşesaziyanene kû gel bi biryar dijberin. Lê yekdestên sermaye-desthilatdar, van projeyên kû wek amûrên herî girîng yên berdewamkirina desthilatdariyên xwe dibînin, raxmê tevayê hêlwest û nerazîbûnên civakê, bi biryar û bi rik pêkanîna wan hildibijêrin.

Hêzên dewlet-desthilatdariyê yên K.T.’yê piştî avabûnên xwe, bendav-SBH wekû nêzîkatiyek bingehîn û negor ya xizmetê ji armanca Tirk kirina Kurdan; bê Kurdkirina Kurdistan’ê re bike, bingeh girtine. Di bernameya Islahata Şark ya sala ١٩٢٤’ê hatî amadekirin de, girîngî û rolên stratejîk yên ji bend-SBH’yan re hatîn dayîn, di roja me de jî tê bingeh girtin. Ji salên ١٩٣٠’ê ta roja me, di serî de bendavên herî mezin Ataturk, Keban, Ilisu yên li Kurdistan’ê di nav sinûrên dewleta K.T.’yê de, nêzîkî ٨٠ bend û SBH hatine plankirin; beşek mezin ji vana hatiye temamkirin, yên mayîn jî tê xebitîn kû di deh salên dawiyê de werin encamdayîn. Golên bend û SBH’yan, bi giştî nêzîk qadek ٣,٢٠٠ km٢ dibin avê de hiştiye, di van golan de qasî ١٢٠,٠٠٠ hm٣ av, hatiye xistina yekdesta hêzên desthilatdar û sermayedar. Ji SBH’yên tên xebitandin, bi giştî salane nêzîk ٣٣,٠٠٠ GWh birq tê hilberandin, ji yên di rewşa avahî û hêj kavil de jî hatiye bernamekirin kû nêzîk ٥,٠٠٠ GWh birq were destxistin. Ev rêje, di nav sinûrên dewleta K.T.’yê de tê beramberê ٪٢٢’yê hilberandina wizeya kû wek navend ١٥٠,٠٠٠ GWh birqe; herwusa tê beramberê nêzîk ٪٧٢’yê wizeya hîdrolîk ya bi giştî ٤٥,٠٠٠ GWh ye. Qezenca(kâr) SBH’yên li Kurdistan’ê tenê ji hilberandina birqê rasterast destxistîn, di salê de nêzîk ٣ milyar dolare.

Armancek din ya girîng kû bi bendavan tê xwestin were gihiştin jî, bi kapîtalîstkirina avdaniya çandiniyê ye. Nêzîk ٪٣٥’ê ٨,٥ milyon hektar xaka dikare were avdan ya di nav sinûrên K.T.’yê de, di xaknîgariya Kurdistan’ê de ye. Di rewşa temamkirina projeyên bendavan de, nêzîk ٪٤٠’ê tevaya hebûna ava di giştiya K.T.’yê

de, dê were girtina jêr çavdêrî û rêveberiya yekdestên dewlet û sermaya taybet. Bendav, li gel têkdana aliyê abûrî; rê li ber gelek rûxandinên din yên di warê civak û xwezayê de jî vedikin.

### Koçberkirinên Bi Bendavan Berfirehdibin

Di dema çêkirina projeyên bendav û SBH'yan de wexta bi sedan gund tên valakirin, bi sedema hilweşandinên rê lê vekirîn, di pêvajoya piştî wê de jî koçkirin berdewam dikin. Eger em çend mînakên girîng bidin; di derbarê bi sedan gund û warên bi sedema bendava Keban'ê hatîn valakirin de bi her corek jî be ti daneyek li holê tineye. Bi çêkirina bendava Ilisû'yê re, ٩٥'ê wan gund bi giştî ١٠٤ wargehên dikevin nav sinûrê bajarên Amed, Sêrt, Şirnex, Mardîn'ê de û dîsa navçeya Heskîf'a girêdayê Êlih'ê dê bi bandor bike. Eger projeya Ilisû'yê pêkwere, dê qasî ٧٨ hezar mirov ji gund û cihên xwe bibin, li ser sedhezarê re mirov jî bi awayek ne rasterast dê bi bandor bibe. Navçeya dîrokî Samosat ya dikeve nav sinûrên bajarê Semsûr'ê û nêzîk ١١٠ gund, bi sedema bendava Ataturk hatine valakirin, koçberî di pêvajoya piştî wê de jî domkiriye. Di sala ٢٠٠٠'ê de dema kû giştî şêniya bajêr ٦٢٣,٨١١ kesbûn, di sala ٢٠١١'ê de daketiye ٥٩٣,٩٣١ kesan. Tevayê şêniya bajarê Dîlok'a bendavên Bîrecîk û Karkamiş'ê bandorkirine kû di sala ٢٠٠٠'ê de ١,٢٨٥,٢٤٩ kese û şêniya gundan di nav vê hêjmarê de ٢٧٦,١٢٣ kesbû, di sala ٢٠١١'ê de di nav şêniya giştî ya ١,٧٥٣,٥٩٦ kes de şêniya gundan daketiye ١٩٧,٤٤٧ kesan. Bi sedema bendava Karakaya ya kû di navbera salên ١٩٧٦-١٩٨٧'ê de avakirina wê hatî dawîkirin, bi dehan gundên girêdayê bajarê Amed'ê hatine valakirin. Lê bi awayek rêkûpêk ji gundiyan re ne pareyê qerebûyê(tezmînat) û berdêl hatiye dayîn û ne jî ev mijar di wateya civakî de hatiye rojevê. Bendavên karakaya, Kral Kızı, Êlih, Dîcle, Ataturk û Ilisû'yê ٩ bajar, ١٧ navçe û nêzîk ٥٠٠ gund û bi giştî nêzîk ٣٠٠ hezar mirov rasterast bandor kirine. Bi bendav û SBH'yên din bi sedan gund hatine valakirin, li ser ٢ milyon mirovan re ji cih û warên xwe hatine koçberkirin.

### Hilweşandina Jîngeyî(Ekolojîk)

Li gel rûbarên Dîcle û Firat'ê, çiqên wê jî li hewzên ji golên destsaz pêkhatî tên vegerandin. Golên bendavan rê li ber ji holê rabûna taybetî û hevsengiya xwezayî ya derfetên xaknîgariyê, zeviyan, nîr û hewa; di rêkûpêkiya barînê, rêjeyên xunavê(nem), ba û germahiyê de hatina holê ya guhertinên neyênî yên mezin re vedike. Herikîna xwezayî ya cok û avên diherikin bi dawîdibin û hewzên wan diguherin. Ji ber vê sedemê, hem mîneral û heyberên tîmarbûna lebetî yên di van avan de û hem jî destkeftên kû jêderên tîmarbûna çandiniyê yên xakêne, di nizilin binê golên kû kûrin; flora û faunayên taybet yên herêmêne, bi awayek lez û nikare were zivirandin, tine dibin. Ev rewş dibe sedemê tinebûna bi hezaran hektar daristan, turên şînatî û lawirên taybet girêdayê nîr û erdnîgariyê. Bi vî awayî, hem hebûna şînatî û lawirên bejayî yên di qadên golên bendavan pêçayî de û hem jî hebûna şînatî û lawirên di avên tên veguhestina golan de jiyan dibin, bi lez dawîdibe. Mînak; şînatiya endemîk ya bi navê Trifollium batmanicum kû di tevaya cîhanê de tenê li herêmê dijî, bi avakirina bendava Ilisû'yê re dê tine bibe. Turên masiya bi vantuz,

masiya bi derzî, masiya maya û masiya bi simbêl kû di rûbarê Firat'ê de dijiyan, bi sedema bendav û SBH'yan tinebûne. Spîndara Firat'ê(Populus euphratica) ya kû tenê di eko-sîstema Dîcle'yê de derfetê jiyanê peydakirî, li herêma Dêrsim'ê bi giştî ١٥١٨ turên şînatiya endemîk kû ji wane ٤٣ lib tenê taybetin bi geliyê Munzur û dewrûberê wê, bi tinebûnê re rû bi rû mane. Ji ber kû li herêmên golên bendavan de derfetê tîmarbûna zindiyên ji berê ve jiyandibûn ji holê rabûne, li şûna vana turên lawir û şînatiyên taybet bi stargehên destsaz tên rewşa desthilatbûnê. Herwusa ji ber kû deştên(delta) devê rûbaran de jî biçûkbûne û bi berhemiya wan daketiye, hem di aliyê çandinî û hem jî şînatî û lawiran de girîngiya xwe ya jiyanî ji dest didin. Bi veguherandina rûbaran li hewzên golan, rêjeyên xunavê(nem) pir bilind dibin. Girêdayê vê, hem wekû giştî germahî û hem jî cudatiyên germahiyê yên di navbera şev û roj de dadikeve. Sîstema barînê, taybetiyên xwe yên xwezayî wunda dike, rêkûpêkiya barînê û li hev zivirîna demsalan xirab dibe. Mînak li herêmê ji beriya sala ١٩٩٠'ê navenda rêjeya xunavê(nem) dema kû ٪٥٤,١ bû, piştî sala ١٩٩٠'ê ev rêje derketiye ٪٥٦,٥'ê. Li gel vê, di dema ji beriya ١٩٩٠'ê de navenda germahiyê dema kû ٨,٨C bû, di pêvajoya navbera salên ١٩٩٠-١٩٩٦'ê de ev jimar daketiye ٨,٢C'yê. Ji ber van sedeman, di xakên herêma GAP'ê de bi berhemtiya çandiniyê dikeve, xusarên nikare were rastkirin yên wek; bi xwê bûyîn, bê berhembûyîn, hezbûyîn(bataklık) yan jî hatina rewşa tozê, tên jiyanbûn. Hê ji niha de nîviya deşta Heran'ê heze; nîvî jî bi xakên hatîn xwêkirin û hişkbûyî hatiye pêçan. Li rex vê, ew pêdawîstiyên xwedî taybetiya çandiniyê kû rûbar û cokan ta deştên jêr xirikandîn, ji ber kû di bendavan de tên ragirtin, di dema navîn û dirêj de, di tevaya herêmê de xakên çandiniyê rû bi rûyê yekcarî ji destdana bi berhemtiya xwe dimînin. Avaniya ava rûbarên Firat û Dîcle'yê kû piranî cemidiye û girêdayê demsalane, di golên bendavan de rê li ber tebeqebûyîna germahiyê vedike. Di encama van guhertinan de ji bo turên şînatî û lawiran bi nirxiya tîmara van avan dikeve. Di golên bendavan de kombûna avê, li gel mezaxtina rêje û wizeya girtina avê ya xakan û rûbaran, herwusa avên binerdê jî tine dike, qadên herikîna xwezayî û bandora wan tevlêhev û xirap dike.

Di herêmên kû golên bendavan dagirkirî de çiya û girik vediguherin gerav û nîvgeravên ji hev perçebûyî. Dema tevnê xwezayî û tevayê xweşikî bi lez tên tinekirin, şkêrên beton û hêsinî her derê dagirdikin. Mînak; di beşa navbera bendavên Keban û Karkamiş'ê de rûbarê Firat û dola Firat'ê tinebûye. Di rezervuarên bendavan de bi herîbûyîn her kû diçe zêde dibe.

**Ji Nav Birina Jêderên Abûriyane**

Bi sedema projeyên bendav û SBH'yan xakên di destê gundiyan de jî hatiye standin, beşek mezin yê xakên çandiniyê dibin avan de mane, deştên mezin jî hatiye standina jêr yektesta hêzên dewlet û sermaya taybet. Di mijara belavkirina xak û zeviyan de bê dadiya kû ji berê ve hatiye sazkirin, bi projeyên bendav û SBH'yan hîn zêdetir hatine kûrkirin. Mînak; li Riha'yê rêjeya di nav giştiyê de ya gundiyên bê xak dema kû ٪٧٠ bûye, di salên dawiyê de ev rêje gihiştiye ٪٩٠'ê; li Amed'a kû duwemîne dema ٪٦٠ bûye, pişt re gihiştiye rêjeyek qasî ٪٨٢. Beşek mezin ya xakan dibin avên bendavan de dimîne, beşek jî ji ber nizimbûn û bilindbûna avan, bi awayek neyênî bi

bandor dibe. Li rex bi xwêbûyînê, hatina rewşa hezekê(bataklik) ya xakan jî bûye pirsgirêkek pir micid. Golên bendavan dibin sedemê di rêjeyek mezin de windabûna xakan jî. Bi sedema barîn, lêmişt(erozyon) û avdaniya pîşesaziyane, li gel qadên kû golên bendavan pêçayî, xakên li derdorê, di herikin rezervuarên van golan û li wê derê komdibin. Mînak; her sal ji rûbarê Firat'ê ta Gola Bendava Keban'ê ٣٢ milyon ton, li gola bendava Karakaya jî ٣١ milyon ton ax bi vî awayî diherike.

Bi hilweşandinên li ser xakên çandiniyê, avana xakê û jêderên avê kû bendav, qenal, tunêl û SBH'yên ta salên ٢٠٠٠'an hatine sazkirin rê lê vekirîn û encamên vana ji civakê hatine veşartin, heta di wateyek micid de darijan, hisab û arşîva wan jî nehatiye amadekirin. Ji ber vê sedemê, di serî de Keban, Ataturk û Karakaya bendavên ji beriya sala ٢٠٠٠'ê hatine avakirin, dane û belgeyên di mijara xusarên kû li ser jêderên abûrî û ekolojiyê rê li ber vekirîn, pir kêmin. Firat'a kû beşa wê ya dikeve nav sinûrên dewleta K.T.'yê bi temamî veguheriye hewza golên bendavê, taybetiya xwe ya rûbarbûyînê windakiriye û eko-sîstema xwezayî ya wê hatiye ji nav birin. Beşek mezin yê xakên li hewza Firat'ê, dibin avên bendavan de maye. Beşê mayî jî, ji ber kêşeyên jîngeyî(ekolojîk) yên kû bi çêkirina bendavan re derketîn holê, taybetiyên xwe yên çandiniyê windakirine. Rûbarê Dîcle'yê jî, ji ber avaniyên pîşesaziyane yên weke bendav û SBH'yan kû di salên dawiyê de hatine projekirin û beşek mezin yê wan temambûye, tê xwestin kû heman weke Firat'ê were bi encamkirin. Di vê çarçuvê de, eger em rêjeya xakên kû hinek projeyan binavkirî lêkolîn bikin;

**Bendava Keban:** Li ser rûbarê Mûrat'ê bi ١٢٥km٢ û bi giştî bi qadek ٦٧٥km٢ nêzîk ٪٤٠'ê xakên çandiniyê yên di navbera Xarpêt û Meletî'yê de dibin avan de hatiye hiştin.

**Bendava Ataturk:** Gola Bendava Ataturk kû di nav sinûrên dewleta K.T.'yê de sêyemîn gola mezine, bi dirêjiya dolek ١٨٠km'yî kû dikeve navbera Urfa û Semsûr'ê, bi giştî qadek ٨١٧km٢ dibin avan de hiştiye.

**Bendava Karakaya:** Xakên di qada bi giştî ٢٦٨km٢ yê de kû di navbera Meletî, Xarpêt û Amed'ê deye dibin avan de hiştiye.

**Bendava Ilisû(Heskîf):** Bendava Ilisû kû di navbera sinûrên Mardîn û Êlih'ê de di avakirinê de ye, qasî dola bi dirêjiya ١٧٠km, dê qadek nêzîkê ٣٠٠ km٢'yî dibin avan de bihêle.

Bi bendav û SBH'yan, gelê li Kurdistan'ê ji derfet û kiryarên abûriyê yên xwe tê qutkirin, bi anîna rewşa dest tengê nanî, di serî de karkertiya çandiniyê ya dem-demî û bi destheq, karkertiya avahiyan û hurûmervantî(hurdacılık), tên dehfdana nav karên bêbawer, paşmayî(tortu) û kêm destheq. Sozên wek; dê bendav sektora avaniyan(înşaat) zindî bike jî, armanca ji rê derxistin û rewakirina talanê hildigre. Mînak; di gelek projeyên bendav-SBH'yan de karkerên avaniyê(înşaat) jî ji derve tên anîn, Kurd jî bi awayek ji dilniyayiya(guvence) destheq û civakê, ji ya derfetên xebitîna bi tendurist bêpar; di karên giran û xeter de; herwusa dem-demî û bi

hêjmarek kêm tên xebitandin. Bi gelek lêkolîn û daneyan derdikeve holê kû bendav û SBH ne kû bêkariyê radikin, belkû rêya hîn bêhtir zêdebûna bêkariyê vedikin.

**Li Ser Mîratê Dîrokî Bandorên Bendav-SBH'yan**

Rûxandina projeyên bendav û SBH'yan li ser mîratê dîrokî, xwe dipesêre dû armancên bingehîn. Ji holê rakirina berhem û bermayên di aliyê dîrok û çanda gerdûnî de girîngiya erdnîgarî, civak û çanda Kurdistanê derxistî holê, di vê mijarê de daneyên pir girîng pêşkêş kirî. Di rasteka armancên siyasî û kapîtalîstiyane de bi karxistina nirxên dîrokî kû di sûd û qezenca bîrdozî û polîtîkayên fermî de dikare werin karanîn.

Di vê çarçuvê de ger em hinek mînakên berbiçav bidin; Bendava Ataturk; Di serî de wekû bermayên bajarê kevin yê Samosat û serdema din ya Kommagene'yê ٥٨٠ wargeh dibin avên bendavan de mane, ji vana tenê ١٩ hatine bi belgekirin. Bendava Bîrecîk'ê; Di serî de Gala û bajarê kevin yê Zeugma'ya navenda bazirganiyê ya serdema Helenîstîk kû bi mozaîkên xwe yên din tê zanîn, nîvê ٣٠ wargehên dîrokî, dibin avên bendava Bîrecîk'ê de mane. Bendava Karkamiş; ٤٠ wargehên dîrokî. Bendava Ilisû; Pênç hezar malên şkeftî, li gel pir, koşk û peristgehan bajarê kevin Hesenkeyf'a kû dîroka wê ya hezaran sal heyî, wargehên mirovan yên kû dirêjî ta ji beriya sedhezar salan dibe û ji ٣٠٠'an zêdetir qadên erdkoliyê ٨٩'ê wan bi temamî dê dibin avan de werin hiştin, yên dimînin jî dê hinekê jê bandor bibin., Avanî(yapı), bermayî û Wargehên dîrokî yên dibin avan de dimînin, piştî bendav temenê xwe temam dikin jî, dê vegerin komek herî, xwelî û tozê.

**Li Ser Tenduristiyê Bandorên Bendav-SBH'yan**

Bi ji holê rakirina taybetiyên herikîna xwezayî ya cok û rûbaran re hepiskirina wan li golan û bi rêyên destsaz qezençkirina herikînê, di aliyê tenduristiya xweza û mirovan de rê li ber hilweşandinek mezin vedike. Bi sedema projeyên bendav-SBH'yan, derfetên gel yên ji xwe re meşandina kiryarên abûriyane yên têrker, ji holê radibin. Ev rewş, rê li pêşiya nexweşî û seqetbûnên ji tîmarbûna bi kêmas û xelet jêder digre, herwusa rê li pêşiya nexweşiyên vegir(bulaşıcı) yan jî belav yên weke; melarya, tifo, werem, kolera; dîsa rê li pêşiya derketina holê û berbilavbûna nexweşiyên hindirîn vedike.

**٢. Başûrê Kurdistan'ê:**

Bi rewşa xwe ya heyî, beşa Kurdistan'ê ya herî zêde li rasta şer, êriş û talanan tê, başûrê Kurdistan'ê ye. Ji destpêka sedsala ٢٠'an ta niha, qada bingehîn ya êrişa modela netew-dewleta kû tê xwestin di vê qadê de were sazkirin, li hember civaka Kurd û dijî Kurdan bûye. Bi vê rewşa xwe, qadek ya pir kûr mêtina abûriyê û êrişên qirkirinê tên jiyanbûne.

Ji pirsgirêkên din yên abûriya herêmê yek jî; kanên dewlemend yên petrolê û pêşkeftinên di encama siyasetên navnetewî de derdikevin holêye. Di seretaya salên ١٩٢٠'î de ji aliyê Şêx Mehmûd ve serhildaên dijî van polîtîka û êrişên abûriyê tê

pêşxistin, ji aliyê van derdor û hêzên paşverû yên li herêmê ve bi awayek pir bi xwîn hatiye tepeserkirin. Di encama vana de jî asta ber bi pêşveçûna herêmê û di mijara jêderên xwe bi xwe de derbarê bikaranîna derfetên xwe de tengaviyên mezin derketine holê.

Tevgera PDK'ê ya piştî salên ١٩٥٠'yan şûnde derketî holê û pevçûnên bi rêveberiya navendî re hatîn jiyanbûn, bûne sedemê tim mêtina herêmê û pûçkirina dewlemendiyên abûriyane. Dîsa derketiye holê kû bi destê malbata Barzanî avakirina xanedantiya xwe ya sazûmaniya PDK'ê û bi taybet di salên dawiyê yên herêmê de ev avana malbatî di siyaseta mêtina abûriyane de rolek kifşker leyîstiye.

Başûrê Kurdistan'ê hem di mijara lawirvanî û hem jî çandiniyê de xwediyê qadên berfireh yên pir destdayîne. Lê di encama şer û pevçûnên di herêmê de hatîn jiyanbûn, herwusa di encama bi salên dirêj pirsgirêkên bi rêveberiya navendî re hatîn jiyanbûn, hem di mijara çandiniyê de hem jî di mijara lawirvaniyê de kombûn û hêza heyî nayê nirxandin.

Ev rewşa kû desthilate di roja me de tevaya herêmê de bi kûranî tê jiyanbûn. Dîsa di vê mijarê de derfet çênekirina li van herêman ya hêzên xwecih û bi her awayekê dibin çavdêriya xwe de girtina gel jî, dibe sedemek girîng yê nekarîna bikarxistina kombûn û hêza heyî. Ji bo gel ji çanda çandinî û lawirvaniyê dûr bikeve, rêveberiya herêmê dixebite kû her core pêwîstiyê bi xwe pêşwazî bike. Beramberê vê jî tevayê derfetên abûriyê ji destê gel distîne. Di demên pijan(olgunlaşma) û berhemstandinê(hasat) ya berhemên çandiniyê de ji bo astengkirina hilberîn û bazara hindir, ji derve ve pir zêde û bi nirxek erzan heyberên tîmarbûnê tîne herêmê. Di tevaya herêmê de koçeriya gel ya di qadên çol û çiyayî de jî piraniya caran ji ber şer û pevçûnên tên jiyanbûn, bi neyînî bandor dibe.

Di avana şênîjimariya(demografîk) herêmê de bi taybet di salên dawiyê de dest têwerdanek ya timî kû hem ji rêveberiya navendî ya Îraq'ê hem jî ji hêzên navnetewî tê, mijara gotinêye. Bi taybet di pêvajoya navbera ١٩٨٠-٩٠'ê de li Hewlêr,Musil û Kerkûk'ê 'Bi Erebkirin' di rasteka van polîtîkayan de hate berfirehkirin. Di roja me de jî bi cihkirina Yahûdî'yan li Musil'ê û ya Ereb'an li Kerkûk'ê, tê berfirehkirin. Girêdayê vana di vê herêmê de kiryarên mîsyonertiyê(derwêştî-murîdî) tên berdewamkirin.

Dîsa li başûrê Kurdistan'ê ji aliyê kargehên Tirk, hêzên rojava û sazûmaniyên abûriyane ve cih û wargehên bicihbûnê yên kû qet bi rastiya civakî-çandî(sosyokulturel) ya herêmê naguncên, tên avakirin. Wek; Gundê Elmanî, Gundê Emerîkî, Vîlleyên Îngîlîz û hwkd…

Yek ji hêzên kû dixwaze di herêmê de bi bandor bibe jî; Cemaeta Gulen'e. Cemaet ji bo kû di xebatên xwe yên hêrêmê de bikare bi bandor bibe, bi rêveberiya herêmî re di nav hevkariyek kûr de ye. Dibin navê xebatên xwenûkirinê yên piştî dest têwerdana ٢٠٠٣'yê şûnde pêkhatîn, di serî de sektora avaniyê(înşaat), ji xebatên perwerde, tendiristî û çapemenî-weşanê ta hîpermarketên gelek mezin, di qadek pir

fireh de tim bandora Cemaetê dibe mijara gotinê. Bi vê wateya xwe di qadên abûrî yên başûr de bandor û çavdêrîkirina Cemaetê têra xwe pire. Kargehên hêsin û çîmentoyê yên li Taşlûca'yê ji bo hevbeşiya Nêçîrvan û Gulen qezencê bi destbêxe hilberînên wan hatine daxistin, pişt re jî ev karxane bi naçarî ji Fransî'yan re hatine firotin.

Wekû hemşêweyê vana jî, tê xwestin kû li herêmê çanda mezaxtin û berxwarinê(tuketim) were berfirehkirin. Cemaet û hêzên cuda yên navnetewî çawa kû dixebitin di qadên weke perwerdê de jî bi bandor bibin, herwusa di vê qadê de ji bo pêkanîna projeyên mîna GAP'ê jî girîngiyek pir mezin nîşadidin. Armanç dikin kû li qadên mîna; Geliyê Zap'ê û Geliyê Elî beg'ê pêkbînin.

Kiryarek din ya abûriyê kû hêzên navneteweî li herêmê pêktînin jî, pir erd-zevî kirîne. Di serî de li Hewlêr'ê, di tevaya başûr de Tirk erdên stratejîk, bi berhem û mezin dikirin. Îbrahîm Tatlises û Gulen'î di vê qadê de têra xwe pir bi bandor dibin.

Yek ji mêtinên abûriyane yên li herêmê jî, li beramber dewlemendiyên dîrokî yên herêmê tê pêşxistin. Dewlemendiyên bermayên kevnare û dîrokî yên heyî, di encama karê qaçaxiyê de tê derbazkirina dervey herêmê. Di sala ٢٠٠٩'ê de muzexana Hewlêr'ê dibin navê şewatê de hatiye şelandin. Li rex vê, jêderên dewlemendiyê yên serdema pir kevin kû di kelha Hewlêr'ê de hebûn, hatin talankirin. Ev herêm destpêkê Fransî'yan û duv re jî Emerîkî'yan kirê kirine. Di vê qadê de jî dibin navê erdkoliyê de mîrate û dewlemendiyên mezin hatine desteserkirin.

**٣. Rojhilatê Kurdistan'ê:**

Di vê beşa Kurdistan'ê de qirkirin û talana abûrî bi awayek pir kûr dom dike. Di tevaya herêmê de ji ber sedema şer û pevçûnên bi salên duv dirêj domkirî, Kurd û nirxên wan yên abûrî ji neyênî bandorbûnê rizgar nebûne. Herwusa di tevaya herêmê de, ji aliyê hêzên desthilatdar ve tim zextên abûrî li ser erdnîgariya kû Kurd tê de dijîn, hatine pêkanîn, heta tinekirin û ji rêzê kirina vê herêmê wekû polîtîkayek desthilat û zal, hatiye pesartin.

Di encama vê nêzîkatiya hêzên desthilatdar de di giştiya gel de, derketina ji dervey sinûrên hatîn destnîşankirin, tineye. Zêdetir, rewşek mîna bi serê xwe çêkirina qadên abûriyê, nirxandina hêz û wizeya abûrîyane ya heyî, nabe mijara gotinê. Li rojhilatê Kurdistan'ê, hem di qada çandiniyê û hem jî ya lawirvaniyê de sekin û hêlwestek serbixwe ji rêveberên navendî, tineye. Ji ber kû çandiniya li vê derê tê hilberandin jî di tevaya Îran'ê de bi bandor dibe, ji bo kû ev rewş neguhere rêveberiya navendî dikeve nav hewldanek kûr.

Di derbarê nêzîkatiyên polîtîk yên Îran'ê yên li ser Kurdan de, mînaka herî berbiçav jî; li van deran serbestbûna gelek tiştên kû li tevaya Îran'ê qedexene, herwusa li van deran qedexebûna gelek tiştên kû li tevaya Îran'ê serbestin. Li rex vê Îran di salên dawiyê de; wekû di her nêzîkatiya xwe ya derbarê Kurdan de çêbûyî, di qada abûrî de jî dixebite kû çav li KT'yê bike(taklit etmek). Bi taybet xebatên bi rê-

rêbazên cuda veguhestina herêmên din ya dewlemendiyên xwezayî yên herêmê kûr û girantir dibe. Dewleta Îran’ê di salên dawiyê de çêkirina bendav û SBH’yan berfirehdike, li Kurdistan’ê bikaranîna jêderên avê yên li herêmên xwe ya gel asteng dike, van avan bi qenal, borî û tunêlan dibe herêmên Azerî’yan.

Yek ji bandortirîn rêbazên mêtinê yên dewleta Îran’ê jî berfirehkirina ristvantî û raçandinvaniya(halı dokumacılıgı) mafûrane. Lê di salên dawiyê de di nav gel bi xwe de li ser vê mijarê zanabûnek pir micid pêşketiye. Wekû girêdayê vê jî, dewleta Îran’ê di gundan de bingeh û derfetê abûriyane nahêle. Mînak; di encama van polîtîkayên dewletê de di sala ٢٠٠٧’an de tenê li Salmas’ê ٧٠-٨٠ gund xwe bi xwe valabûne. Ji ber kû dewlet kete ferqa vê rewşê, ji koçberiyên di herêmê de tên jiyanbûn û di herêmên cuda de bi awayek berbilav û ji hev dûr jiyanbûna Kurdan re çavên xwe digre û heta dawî rê vedike. Di nav gel de bikaranîna bêhişkera(uyuşturucu) bi navê Krîstal berfirehtir dike û dêxe berdest.

Li Îran’ê Kurd bi tena serê xwe di astek bilind de nikarin karsaziyê bikin, kargeh avabikin. Di vê mijarê de dewlet pir zêde tûnd tevdigere. Ji bi destxistina azadiya abûriyane ya xwe ya Kurdan zêdetir, bi awayên cuda ji bo bi dewletê ve werin girêdan handanên(teşvik) cor bi cor li ser gel tên bikaranîn. Ji vana ya herî tê zanîn jî, ‘bi sîxûrkirin’(ajanlaştırma) e. Bi rêya sîstema tîmarkirin û xudankirinê cerdevantî û qeçexvantî dibin çavdêriya dewletê de tê berfirehkirin; qeçexvanên di silsileyên sinûrê Serhedê de tên anîna rewşa bazirganên kû bi dewletê re hevkariyê dikin.

Yek ji polîtîkayên dewleta Îran’ê di qada abûriyê de li ser Kurdan pêkanîye jî pêkanîna Yarane ye. Di cewherê vê polîtîkayê de kû di Tîrmeha ٢٠١٠’an de hatiye destpêkirin, dibin navê alîkariyê de girêdana gel ya bi dewletê ve bingeh digre. Di rasteka vê polîtîkayê de ji aliyê dewleta Îran’ê ve ji her malbatê re ٥٠ hezar tumen alîkarî tê dayîn. Lê beramberê vê di bazara hindir de, nirx û bihayê her tiştî dîsa ji aliyê heman dewleta Îran’ê ve tê zêdekirin, yanî li milekê tişta dide, li milê din bi awayek hîn girantir û dilreqtir şûnde distîne. Mînak; ji beriya van polîtîkayên dema kû telîsek ar ٦-٧ hezar tumenbû, piştî vê polîtîkayê bûye ٢٠-٢٥ hezar tumen.

Dewleta Îran’ê ya kû di salên dawiyê de van polîtîkayane berfirehdike, dibin çavdêriya xwe de çîftlikên pîşesaziyane û cihên hilberandinê jî dixebite kû berfireh û belavebike. Bi taybet di herêma Soran de çandiniya pîşesaziyane ya navend dewlet tê anîna rewşa zal û serdest de. Mînak; di hilberandinên çîlek, kîvar û berhemên lawirî de ev polîtîka tên şopandin. Lê li vê derê, beşdarbûna gel ya li vê hilberînê jî ji dervey hêza kedê nîne.

### ٤. Başûrê Rojava’yê Kurdistan’ê:

Di nav perçeyên Kurdistan’ê de di wateya abûrî de yek ji perçeyên kû rastê her core zext û mêtinê hatiye jî, ev der bûye. Di vê perçeyê de kû bi dirêjiya salan rastê her core polîtîkayên mêtînger yên netew-dewletê hatiye, bi navê hilberîna

abûriyane yan jî di xala çêkirina nirxên xwe de, destur nehatiye dayîn kû tenê pelek jî biheje.

Kurdên kû di beşa başûrê rojavayê Kurdistan'ê de dijîn, piştî sazûmaniya netew-dewlet ya bi serdestiya Ereb'an kû di seretaya sedsala ٢٠'an de hatiye avakirin, wekû abûrî/polîtîk hatine destgirêdayê bê pile û payetiyek(statu) tejî. Bi rejîma BAAS ya piştî salên ١٩٦٠'an pêşketî re ev rewş hîn zêdetir kûrbûye.

Hêz û wizeya(potansiyel) abûriyane ya herêmê ji ber vê sedemê nehatiye bikaranîn, zordarî û desthilatiya bê kêm ya rêveberiya navendî derbazdar bûye. Bi taybet dewletê zevî û erdên çandiniyê kiriye mulkê xwe, di wateya kapîtalîstiyane de jî be, çawa kû karxaneya ji bo hilberandinê û avedaniya bi corê kargeh nekiriye, destûr ji bo avedaniya taybet jî nedaye.

Polîtîkaya bingehîn ya di derbarê nirxên abûriyane de kû herêm xwediyê wane, tê pêkanîn jî; li beramber bikarxistina(işletmek) vana dewletê pêdawîstiyên din yên mezaxtinê veguhastiye herêmê. Bi dirêjiya salan vê rewşê domkiriye.

Di zeytînvantiya li herêma Efrîn'ê pir berbilav û di çandinîvaniya li herêma Dêrik'ê de dîtina vê rewşê bi awayek pir zelal gengaze. Berhemên li vê derê tên bi destxistin, ji aliyê dewletê ve tên standin û li şûna vana tiştên kû pêwîstiya herêmê pê heye hatine dayîn. Li vê derê, di kiryarên bazirganî yên mirovên herêmê de sinûrdarkirinek bi vî awayî hatiye pêkanîn.

Jêderek din ya abûriyane ya herêmê jî dewlemendiyên binerdin. Bi taybet kan û rezervên petrolê yên kû berbilavê tevayê Suriye'yê bûne, li Dêrik'ê cih digrin. Di kanên petrolê de jî çavdêrî û desthilatiya dewletê bi awayek berfireh hatiye karanîn û di kargehên abûriyane yên bi vî awayî de destûr nehatiye dayîn kû Kurd wekû karker jî cih bigrin.

Ta demên dawiyê, yek ji nêzîkatiyên bingehîn ya dewleta Suriyê di derbarê herêmê de jî; destavêtina avaniya şênîjimariya(demografîk) herêmê bûye. Bi taybet Ereb kirin di demên dawiyê de hatiye berfirehkirin û bi awayek berbilav ji bo koçberkirina Kurdan her core rê û rêbaz hatiye ceribandin. Dibin koçberiya kûr ya kû herêm ta salên dawiyê jiyanbûyî de bi giştî ev polîtîkayên dewletê bi bandorbûne. Bi xwe re hilgirtina niyeta perçekirina rastiya civakî ya Kurd ya van êrişên bi armanca qirkirina abûriyane tên rêvebirin, rê li pêşiya encamên talan û rûxandinên bê sinûr vekiriye.

Di qada perwerdê de jî dibistanên taybet li ser bingeha çavdêriya dewletê, bi armanca Ereb kirinê hatine xebitandin. Dîsa li bajarê Dêrik'ê kû dewlemenda petrolê ye, ta salên dawiyê ne misilman hatine bicihkirin û ji bo vana werin standina leşkertiyê ji wan re nasname hatine dayîn.

Yek ji êrişên herî mezin kû rejîma BAAS di vî perçeyî de li ser Kurdan pêkaniye, ne naskirina pile û payeya hemwelatîtiyê û nedayîna nasnameyê jî ye. Ji ber vê polîtîkaya dewletê; nehatiye hiştin kû Kurd ji mafên xwe yên hemwelatîtiyê yên

herî xwezayî jî sud werbigre. Ta ١٩٩٠'an ev polîtîka bi awayek kûr di kiryarê de hatiye hiştin. Bi vî awayî bê nasnamekirin, ji rêzê û tinekirin, herwusa naçarkirina li koçberiyê ya cuwanan hatiye armançkirin.

Demek dirêj mayîna li qada Rojhilata Navîn ya Rêbertiya gelê Kurd û ji nêzîk ve mijûlbûna wî ya bi vî beşî ve, rêkxistina kû Tevgera Azadiyê meşandî û xebatên perwerdê, dîsa gelê Kurd yê vî beşî kû bi şehîdên azadiyê pijaye, li ser bingehê pêşveçûnên di dema dawî de hatîn jiyanbûn, bi armanca sazkirina sîstema xwesertiya demokratîk ya xwe, ketiye tevger û bizavê. Têkoşîna azadiyê ya kû gelê Kurd çil sale meşandî û bi serhildanên gel yên di giştiya Rojhilata Navîn de tên jiyanbûn, polîtîkayên emperyalîst yên derbarê herêmê de, tevayê hevsengî û mîzaniya herêmê diguherîne. Di rasteka van pêşveçûnên kû tên jiyanbûn de, ji bo gihiştina pile û payeyekê û pêşvebirina rêkxistina civakî, siyasî, abûrî ya xwe, herwusa derbazkirina polîtîkayên netew-dewletê yên heyî û ji bo avakirina rêveberiya abûriya cewherî ya pesartiyê nirxên komînal, diyare kû gelê Kurd derfetek pir mezin avakiriye.

## BEŞA III.

## DI GIŞTIYA CÎHANÊ DE HINEK CERIBANDINÊN KOOPERATÎF Û KOMUNAN

Kooperatîfa demokratîk-komînal bingehê xwe dipesêre kevneşopiya abûriya civakî ya pesartiyê nirxên mirovatiyê yên ta roja me hatîn û nirxên di cewherê xwe de demokratîk, hevparvan(ortaklaşmacı), parveker(paylaşımcı), piştevanî(dayanışmacı) û wekhevîparêz(eşitlikçi). Ceribandinên kooperatîf yên dema nêzîk de derketîn holê jî weke nirxên xwe dibîne. Kooperatîfa demokratîk-komînal, di wê biryarêdeye kû bibe pêşengê ji nû ve avakirina tevgera kooperatîf ya bi rêbaza demokratîk-komînal. Li ser vî bingehî, ceribandinên komun-kooperatîfên diyar û navûdeng yên di giştiya cîhanê de derketîn holê, bi kûrtî jî be di girtina dest de sûd heye.

### ١. Lê Nêrînek Kurt Li Tevgerên Komînal Yên Di Jeo-Çanda Rojhilata Navîn De:

Rojhilata Navîn ew erdnîgariya kû ji komikan derbazbûna jiyana civakî tê de çêbûyî, heman demê de qada komunên seretayî lê sazbûyîne jî. Li ser vî bingehî, dikare were gotin şoreşa neolîtîk şoreşek ya komunane. Bi derketina holê ya hêzên dewletparêz re, li Kurdistan û Rojhilata Navîn komikên komînal û çanda jiyanê tim bi êriş û zextan re rû bi rû hatiye hiştin. Lê raxmê her tiştî, jiyan û abûriya komînal ta roja me di astek girîng de kariye xwe biparêze. Di vê de li gel para berxwedana demokratîk-komînal ya civakê ya bênavber, herwusa parek mezin ya tevgerên demokratîk-komînal û azadîxwaz ya bi kesayeta şoreşger jî çêbûye.

Di çêbûna zîhniyetan de diyare kû gel û çand bi hev re di nav bandorkirina beramber hev de ne. Bi taybet bingehên zîhniyetên tevayê tevgerên civakî, demokratîk, çandî, felsefî û ramanî, herwusa berxwedan û ceribandinên komînal ya di jeo-

çanda Rojhilata Navîn de, xwe dipêsêre Mîtraîzm, Hermesvantî û Zerduştîtî'yê. Gelek çandên ji dervey dewlet-desthilatdariyê weke Qizilbaşî, Ehlê Heq/Yarsantî, Êzîdîtî û pirên din mîna van kû karîna ta roja me werin, bi giranî vê kevneşopiyê vedidin(yansıtmak). Di vê çarçuvê de eger em hinek çêbûn û berxwedanên komînal yên tên zanîn bigrin dest;

**Mazdekîzm:**

Mazdekîzma kû berxwedanek komînale û hêza xwe wekû bingehîn ji civak û çanda Rojhilata Navîn digre, bi giranî çawa kû ji Zerduştîtî û Manîheîzm bûye, ji Cuhutî, Bûdîzm, Mesîhî û felsefa Yunan jî kû di Rojhilata Navîn ya wê demê de bi bandorin, di astek girîng de bi bandor bûye. Di Mazdekîzm'ê de pêwîste mirov û civak xwe ji xawendartiya taybet(ozel mulkiyet), ez-eztiyê û kesvantiyê, desthilatdari-ya olî û wek amraza sermayê bikaranînê, ji tundûtîjiyê û çavbirçîtiyê dûr bigre. Mirovatî tenê bi şerkirina dijberê vana dê bikare bigihe civaka pesartiyê wekheviyê, biratiyê û hezkirinê.

***Rêgezên Mazdekîzm'ê;***

١. Ji aliyê civakê ve bi hevbeşî parvekirina mal, sermaye û samanan,
٢. Dabînkirina wekheviyê di navbera jin-zilam de,
٣. Li ser mirovan saznekirina desthilatiyê û zordariyê.

Piştî qetilkirina Mazdek, ji aliyê hevjîna wî Hurrem'ê ve berxwedana wî hatiye domkirin.

**Îhwan-î Safa:**

Ev tevgera kû wek biratiya xwerûtî-paqijbûnê tê zanîn, di navbera sedsalên ٨.-١٣.'mîn de bandortiya xwe domkiriye. Îhwan-î Safa'yê kû dijî hêzên şaristaniya dewletparêz jiyana demokratîk-komînal diparêze, dikare were gotin kû bi lê xwedîbûna kevneşopiya berxwedanê ya demokratîk ya ji beriya xwe Îhwan-î Safa gelek nirxên wan bi derfetên cih û wext re li hev aniye û guncaw kiriye. Lêkolînên hatîne kirin didin diyarkirin kû Îhwan-î Safa xwediyê xeyala civakî ya demokratîk-komînal an kû jiyanek hevbeşbû kû nirxên mirovatiyê yên weke hemdemî, paqijbûna kesî, duristî, pêşengtî, wekhevî, alîkarvanî û biratiyê tê de heyî, bingeh digirt. Di berhema bi navê Îhwan-î Safa ya nivîskarê lêkolînvan Faîk Bulut de, di derbarê projeya "Civaka Fazîletê" ya Tevgerê de, vana tên pêşkêş kirin:

***"… Mehdiyê me dema serhilda û derket, dema roja me ya serhildanê hat, roja me hilat, raza(sır) me hat eşkerekirin, mirovên me ji şkeftên kû têde veşartîbûn derketin, divê em bajarek nûpnû avabikin kû kom û civata me bikare li wê derê kombibe. Em ewên ji hev cudabûyîn, bikaribin bigihin hev. Mala me ya hevbeş bikare were sazkirin û em bi xwe bikarin biryara xwe bidin…***

***Li dijî civakek ya rêya xwe windakirî, komek zalim, çeteyek pîs û dijî zanayên olî yên ji rê derketî, bajarê fazîletê yê kû dê tê de civaka fazîlet ya cîhgir(alternatif)-Ehlê Xêrê- û komana mirovên baş were avakirin.***

***Tevayê zindî(yaratık) bi girêdanên nayê qetandin bi hev ve girêdayîne. Bê kû yek hebe, ya din nikare hebe. Mirovek kû ji jiyanê hatî derxistin, bêkêr û ketiye. Dixwazî bajarî, dixwazî bila gundî be, mirov bi rêya karparvekirinê ji bo pêşwazîkirina pêwîstiyên xwe rêya gelkariyê(imece) hildibijêrin. Herkes bi rêya vê hevkariyê û karbeşiyê di qada xwe de pispor dibe. Qadên karkirin û kiryarê yên weke; pîşe, bazirganî, zanist û perwerde, rêveberî, xizmetên giştî çêdibin. Dîsa bi saya vê hevkariyê û karbeşiyê 'li gora kar û pîşe ji herkesê re destheq(ucret)' tê dayîn.***

***Di vî bajarî de tevayê ceste(beden) û giyan(ruh) yekin. Herwekû yeklaşbûne mirov. Ya rasttir, ceste cuda lê giyan yekin. Ev yekîtiya giyane kû tevayê dijmin û hevkarên şeytan bin dêxe.***

***Havênê wan digihîne hev, doza hevbeş û hişmendiya hertime. Havên û çîmentoya wê jî hezkirine, evîndariye. Ne girînge ka çi hezkirin û evîneke. Çar xirabiyên kû hezkirin û evîndariyê tine dikin hene. Ya esasî, evîndarî ne biyaniyê cewherê xwîşk û birayên(kardeşlerimiz) me ye. Ji ber kû em, wek mirovên ji heman malzarokê hatîn, heman giyanê hildigrin…"***

Endamên Îhwan-î Safa, di qadên kû bi azadane lê jiyan dibûn de, bi armanca xistin û derbazkirina li jiyanê ya projeya Civaka Fazîlet'ê, malên xwe paqijkirinê yên jê re dihat gotin; 'Dar-ul Safva' avakirine. Di van qadên jiyanê de kû jin tê de rêveberên kifşkerbûne, jin û zilam hevjînên xwe bi awayek azad hildibijêrin, têgihiştin û nêzîkatiya hezkirinê ya pesartiyê azadî û wekheviyê tê bingeh girtin; ji zarokên kû dayîk dibin re jî tê gotin: 'Ewlad-ul Safva' an kû zarokên paqijbûyî û ji aliyê civakê ve tên mezinkirin. Ev tevgera demokratîk-komînal ya kû xwe weke; "em xwîşk-birayên Safa'ne, xwedî hezkirina rastin, xwerûne, bexşînerin" didin naskirin, wekû bîrdozî(kuram) û polîtîka, tevayê tevgerên demokratîk yên ta roja me bandorkirine.

**Karmatî:**

Karmatî di destpêkê de tenê di nav komên gundî û kole de tên pejirandin û rêkxistin dibin. Lê tevger çiqas serkeft, herkû çû di çarçuveya Rojhilata Navîn de tevayê kom û derdorên civakî yên ji dervey dewlet-desthilatdariyê, dibin banê xwe de komdike. Di nav tevgera Karmatî de jin, bi nirxiya xwe carek din bi destdêxe. Di Karmatî'yan de ji perwerdeya zarokan re girîngiyek taybet tê dayîn. Di vê çarçuvê de di Karmatî'yan de Daî'yên di asta mamosta-rêber-pêşeng de, bi taybet perwerdeya zarokan digrin ser milê xwe. Karmatî'yan gav bi gav avakirina sîstema xwe ya jiyana komînal û abûriyane hilbijartine. Ji gelên li herêmên kû bandora xwe li ser çêkirine sereta baca "fitrê" ya bi nirxê yek dîrhem distînin û bi vê destkeftê xebatên tevgerê yên di qada mijara gotinê de dimeşînin. Dema gel hat perwerdekirin û baweriya wan bi Karmatî'yan hat, vê carê baca bi navê "hîcret" kû serê her kesekê nirxê wê

beramber yek dînare tê standin û dema beşek yê vê li xebatên rêkxistinkirina gel û bisazîbûnê ya tevgerê tê mezaxtin, bi beşekê jî pêdawîstiyên kesên dest teng tên pêşwazîkirin. Yekemîn Dar-ul Hîcrê; an kû mala jiyana hevbeş bi van bacan hatiye avakirin. Ji gelê kû dibîne Karmatî dê ji pirsgirêkên wan re çareseriyê bîne û ramanên wan dipejirînin, vê carê jî tê xwestin kû ji pêncan yekê destkeftên xwe yên maddî, cilûbergên xwe, xwarina xwe bidin Tevgerê. Gelê kû dibîne jiyana hevbeş ya armanç û projeya Tevgerêye pir baştire, êdî bi temamî ji Tevgera Karmatî bawerdike û jê piştrast dibe; bi vî awayî li rex wan cih digre. Girêdayê van pêşveçûnan Karmatî, sîstema heval-hogirî-dostînî(ulfet) dêxin jiyanê de; ji gel re dibêjin tevayê destkeftên xwe yên maddî di navendekê de kombikin, derbazê avakirina jiyana hevbeş bibin û gel jî weke tê xwestin tevlê dibe. Di civaka Tevgera Karmatî avakirî de, ji dervey çekê, ti tişt û ti sermayeyek taybet ya mirovan tineye; tevayê nirxên wan yên maddî hevbeşin, parvekirin û alîkarvantî bingehe. Tevayê endamên civakê li gora jêhatina xwe û rewşa bikêriya cesteyî ya xwe di kiryarên abûrî de cih digrin. Hilberandin û li gel berhemên tên bi destxistin û dahat, li ser bingehê hevbeşiyê tên parvekirin. Karmatî, civak û abûriya bi hinek herêman ve sinûrdar û girtî bingeh nagirin; bi tevaya Rojhilata Navîn û heta wêdetirê wê bi gelek cihên dûr re jî têkiliyên abûriyane û kiryarên bazirganî pêşxistine. Komanên Karmatî yên kû di qadên nêzîk Kendava Basra'yê de dijîn, ta Japonya'yê bi gelek welatan re bazirganî kirine. Herwusa ev têkiliyên bazirganî yên berfireh, rê li ber tevlêbûna gelek mirovên ji gelên din jî li Karmatî'yan vekiriye.

### ٢. Ceribandinên Komun-Kooperatîfan Yên Dused Salên Dawiyê De:

#### Li Sovyetan Kolhozî:

Kolhozî û Sovhozî'yên piştî nîva salên ١٩٢٠'î û şûnde hatîn sazkirin, kargehên çandiniya kollektîfin kû li ser xakên ji aliyê dewletê ve hatîn dabînkirin hatine sazkirin. Lawir û amûrên hilberînê girêdayê kooperatîfêne, xak jî bi fermî girêdayê dewletê lê di kiryar û karpêkirinê de girêdayê koopertîfêye. Beşek mezin yê van xakan dibin xawendarêtiya dewletêdeye û xakên salên dirêj nehatîn çandinin û herwusa xakên ne ji çandiniyê re ne. Malbatên kû di Kolhozan de bicih dibin, li gel kû xakên Kolhozan bikartînin, li ser xaka sinûr diyar ya ji wan re hatî dayîn jî dikarin hilberîna çandiniyê ya dibin desthilatiya xwe de bikin. Kolhozî, ji aliyê rêveberiyek kû bi hilbijartina komanê hatî erkdarkirin û herwusa ji aliyê serokê kû ji bo salekê vê rêveberiyê hilbijartî ve têne rêvebirin.

Sîstema hilberînê, biha û destheq, ji aliyê dewletê ve wekû navendî û li ser bingehê bernameyên demdirêj têne eşkerekirin. Beşek girîng yê berhemên tên destxistin, li ser bingehê hevpeymanê ji dewletê re tê firotin. Lê berhemên li ser armanca di bernamê de hatî diyarkirin re û berhemên malbatên Kolhozî di xakên xwe de bi destdêxin, di bazarên Kolhozan de tên firotin. Di Kolhoz û Sovhozan de li gorî pîvana herî bilind ya berhemdanê, sîstema hilberandina yekgirtî(entegre) ya pesartiyê rêbazên zanistî û teknolojiyek kûr tê bingeh girtin. Ji bo her herêmekê berhemek cuda yan jî di beşa berhem de kûrbûn û bi vî awayî di mijara hilberandina

çandinî-lawirvanî ya hatî destnîşankirin de pisporbûyîn û hev temamkirina herêman, tê pêkanîn.

Îstasyonên makînê û trektorê kû bingehê pîşesaziyane ya Kolhozî'yan pêktîne, rasterast girêdayê dewletêne û bi Kolhozî û Sovhozî'yan re di nav hevkariyê de dixebitin. Di giştiya Sovyetan de di qada çandinî û lawirvaniyê de, makîne û amûr-pêdawîstiyên herî baş rêkxistinbûyî, têrûtesel(donanımlı), herî pêşketî û di jimarek zêde de heyî, di destê vê saziyêdene. MTİ'yên kû xebatkarên wan endamên dewletêne, bi awayê tugayan hatine bi rêkxistinkirin. Bi destê MTİ'yan di kiryarên çandinî û lawirvaniyê de, di asta herî bilind de bi berhem û kêrhatî karanîna kedê, herwusa di demê wê de, jêhatî û bi awayek têrê bike destxistina berheman hatiye armançkirin.

Kolhozî'yan di hilberîna çandiniyê de, sûdên pir girîng yên weke; di astek bilin de berhem, daxistina bêkariyê, bi hêzkirina giyanê komikê û çanda jiyana civakî, dane. Li gel vana dikare were gotin kû cudatî û bêdadiyên di nav civakê de jî di astek girîng de derbaz kiriye. Wekû komikên dikarin têra xwe bikin Kolhozî, di astek girîng de taybetiyên komînal di hindirê xwe de dihewînin. Lê Kolhozî, ji aliyê civakê ve na belkû rasterast ji aliyê dewletê ve hatine sazkirin, zagonên wan hatine destnîşankirin û di rêjeyek mezin de ji aliyê dewletê ve hatiye bi karxistin û rêvebirin.

Kolhozî, ji ber kû têgeha aramiya pesartiyê hilberîn û berxwarina(tuketmek) bêsinûr bingeh digrin, hilberîna pîşesaziyane di wateyekê de ber bi pîşesaziyanîzmê ve şemitiye. Aliyên wê yên balê dikêşînin ser wekheviya jin-zilam û hevkariya di navbera gundî-karker de hebin jî, ji ber kû taybetiyên demokratîk û jîngeyî(ekolojik) lawaz dike, di encamê de hatine rewşa kargehên abûriyane yên kapîtalîzma dewletê. Sovhozî; bi giştî çîftlikên pîvan mezin yên dewletêne. Xak, makîne û tevayê amûrên din yên hilberînê rasterast yên dewletêne û ji aliyê dewletê ve di nav bernamekirina navendî de tên bi karxistin.

**Îsraîl – Kîbbûtzî:**

Kîbbûtzî, wekû giştî ew wargehin kû tê de di navbera ١٠٠ ta ٢٠٠٠ malbat hene, lê piranî di navbera ٣٠٠ û ٧٠٠'an de malbat lê dijîn. Tevayê endamên Kîbbûtz'ê meclîsa giştî pêktînin. Jiyana komê, tevayê pirsgirêk û pêdawîstiyên derbarê xebatan de, bi rêya komîteyên di meclîsa giştî de tên hilbijartin tê çareserkirin. Komîteyên derbarê qadên weke; cîhwarkirin(iskan), tenduristî, perwerde, malî, çandê de û rêveberiya Kîbbûtz'ê, bi beşdariya tevayê endaman di meclîsa giştî de tên destnîşankirin û tên erkdarkirin. Di hefteyê de civînek tê kirin. Heman rêbaz ji bo bi karxistina abûriyê ya Kîbbûtz'ê jî derbaz dibe. Di meclîsa karkeran ya ji giştî xebatkaran pêktê de, komîte tên destnîşankirin, ji dervey rêveberê giştî, tevayê erkdar tên hilbijartin. Komîte û rêveberî ji aliyê meclîsê ve tên çavdêrîkirin. Desteya rêveberiya Kîbbûtz'ê; ji rêveberên asta herî jor yên kargehan, nûnerên karkeran û nûnerên Kîbbûtz'ê pêktê.

Di Kîbbûtzan de jiyan li ser hevpariyê, alîkarvaniyê, parvekirinê û wekheviyê tê avakirin. Ji qadên jiyana hevpar ya di mijarên weke; xwarin-vexwarin, paqijî û sexbêriya(bakım) zarok de hatîn çêkirin, tevayê endamên Kîbbûtz'ê bi awayek wekhev jê sûdmend dibin. Ev karane ji holê malbatê tên derxistin û weke kiryarên kû jin û zilaman bi hevre pêkanîne, tên rêkûpêk kirin. Sexbêriya zarokan, perwerda wan û mezinkirina wan pevkariye(kollektif). Di Kîbbûtzan de perwerda bê navber ١٢ salan naçariye. Tevayê kiryarên abûriyane; hevbeş û dinav pevkariya(kollektîvîzm) Kîbbûtz'ê de tên bi cihanîn. Tevayê avanî û amûrên hilberînê, di xawendarêtiya(mulkuyet) pevreyî(kollektif) ya Kîbbûtz'ê deye. Berhemên di encama kiryarên abûriyane de tên bi destxistin, tên derbazkirina darayiya(maliye) Kîbbûtz'ê. Beşek ji vana li gora pêdawîstiyên kesên li Kîbbûtz'ê jiyan dibin tê parvekirin, beşek mezin yê vana jî tê firotin. Beşek yê dahatê tê bi destxistin, dema tê guhestina kompereyên ji bo pêdawîstiyên cuda yên komanê hatine sazkirin, bi beşa mayî jî destheqê xebatkaran tê dayîn. Kesek yê li Kîbbûtz'ê bi cihbûyî, nikare mala kû tê de dirûne bifiroşe û bi kirê bide. Li gel vê, mûçeyê(maaş) kesên li derve dixebitin lê li Kîbbûtz'ê jiyan dibin, rasterast dikeve xezîneya Kîbbûtz'ê. ٦ rojê hefteyê xebat heye. Tevayê endamên dikarin karbikin, naçarin di xebatên pevreyî(kollektif) yên Kîbbûtz'ê destnîşankirî de cihê xwe bigrin. Lê li rex vê, bostanê bi pîvanek biçûk yê her malbatê jî heye. Komika di Kîbbûtzan de jiyan dibe, pêwîstiyên abûriyane yên xwe bi rêya rêkxistinbûyînên di giştiya Kîbbûtz'ê de sazkirîn, wekû navendî pêşwazî dike. Di mijarên bingehîn yên wek; hewîn(barınma), tîmarbûn, tenduristî, perwerde, cil wergirtinê de hemû kes di astek wekhev de sûdmend dibe. Herwusa bi Kîbbûtz'ê derfetên maddî yên malbatê û li gora pêwîstiyan kes yan jî malbat pêdawîstiyên xwe yên kesî bi awayek serbixwe jî dikarin pêkbînin. Di hilberîn û parvekirina Kîbbûtzan de rêgeza "ji herkesê re li gora jêhatinê, ji herkesê re li gora pêwîstiyê" tê bingeh girtin.

Di kiryarên abûriyane yên Kîbbûtzan de, girîngiyek mezin dayîna endezyartî û teknolojiyê bi armanca perwerdê, lêkolîn-lêhûrbûn û pêşxistinê, di encam de rê li ber bi pîşesazîvantiyê(endustriyalist) vekiriye.

Bi salên ١٩٧٠'yê re, li gel zêdehiya çandiniyê, çiqên din yên hilberînê wek; berhem anîn(imalat), plastîk, masîvantî û amûrên polayî yên pesartiyê çandiniyê jî, ketine nav kiryarên Kîbbûtzan. Kîbbûtzî, bi zêdekirina sosyalîzmê li ser sîyonîzmê, aniye rewşa bingehê mînaka siyasî, civakî, çandî û abûrî ya herî girîng ya netew-dewleta Îsraîl'ê, li gel vê ji kapîtalîzma Îsraîl'ê re alîkariyek pir mezin çêkirine; di deh salên dawiyê de bi lez ketine rêya şîrketbûyîna kapîtalîstvaniyê. Di roja me de, di gelek Kîbbûtzan de rêveber û karkerên bi mûçe ji derve tên anîn, tên xebitandin û wekheviya mûçe jî ji holê rabûye. Di gelek Kîbbûtzan de avahî hatine rewşa samanê taybet yan jî xwarin, cilûberg, xizmetên çandî û werzîşî hatine bi bazirganîkirin.

**Moşavî:** Gundên kooperatîfîne kû di qada çiyayî ya Îsraîl'ê de hatine sazkirin. Ev kooperatîfane her çiqas hilberîna hevgirtî bi karnehînin jî, ji rêbazên teknolojî û zanistvaniyê bi awayek kûr sûdmend dibin. Raxmê kû Moşavî çîftlikên kollektîfin jî, di

rêjeyek diyar de ji samandariya(mulkiyet) kesî û kiryara abûriyane re jî cih tê dayîn. Di Moşavan de malbat tenê xakên li vê derê kirîne dikarin bikarbînin.

**Kooperatîfvaniya Mînaka Bask – Tevgera Kooperatîf ya Mondragon:**

Tevgera Kooperatîf ya Mondragon, ji aliyê keşeyek welatparêzê Bask'î yê bi navê Jose Marîa Arîzmendlaretta ve li welatê Bask'ê di bajarê Mondragon yê nêzîk Bîlbao'yê de hatiye sazkirin. Di sala ١٩٤٣'an de li bajarê Mondragon'ê pêvajoya bi vekirina dibistanek ya pîşeyî destpêkirî, ta roja me gav bi gav bi dewlemendkirinê re di giştiya cîhanê de digihe astek ya ji tevgerên kooperatîf-komunan ya herî serkeftî. Eger em bi kurtî qonaxên Tevgera Kooperatîf ya Mondragon rêzbikin; di sala ١٩٥٦'an de Kooperatîfa Hilberandinê ya Karkerên Mondragon'ê tê sazkirin. Kargeha girêdayê Kooperatîfê pişt re derbazê hilberîna pîşesaziyane ya bi asta mezin dibe, cor û jimara berheman zêde dike. Di sala ١٩٥٩'ê de kargehek ya sîgortayê bi navê "Caja Laboral Popular" (Banqeya Gelê Kedkar) û "Lagun-Aro" tê avakirin. Di sala ١٩٦٩'ê de, dikanên biçûk yên di Welatê Bask'ê de tên hevgihandin û di giştiya welat de kooperatîfa herî mezin ya Eroskî tê sazkirin. Di salên ١٩٧٠'yî de, li gel enstîtuya lêkolînê ya bi navê ÎKERLAN, navenda lêkolîn û pêşxistinê ya bi navê Otalora, di sala ١٩٩٧'ê de jî Zankoya Mondragon tên sazkirin. Di nav sinûrên dewleta Îspanya de di sedemê bûyîna herêma kû asta berhemhênanê ya serê kesekê herî bilind; di heman demê de di sedemê bûyîna herêma bêkarî herî kêm ya Welatê Bask'ê de, rolek kifşker ya Tevgera Kooperatîf ya Mondragon heye.

Arîzmendîarretta, li ser rexnekirina hem dijî lawaziyên civakî yên gelê Bask'ê, hem jî dijî modernîteya kapîtalîst, Tevgera Kooperatîf ya Mondragon sazkiriye. Tê armançkirin kû tevayê endamên civakê, jiyana xwe û qadên jiyanê yên civakî bi xwe rêkûpêkbikin û rêvebibin; herwusa qada abûrî jî wekû beşek yê vê armancê were destgirtin. Bi xweserkirina tevayê qadên civakî, gihiştina civakek xweser an kû ji dervey-dewletê, hatiye armançkirin. Bi têkoşîna çînê na, tenê bi têkoşîna bêçînbûyînê tê bawerkirin kû civakek demokratîk, komînal, wekhevîxwaz û azad dê were avakirin. Têgihiştina bingehîn ya tevgera kooperatîfê ya Mondragon, wekû cewherî di gotinên J. M. Arîzmendîarretta yên weke: "ceribandina kooperatîfê ya di Mondragonê de tevgerek ya perwerdêye kû çalekiya abûrî bikartîne" û "pêwîste ti kes ne bibe kolê kesek din, ne jî begê kesek din", tê ziman. Tevger, rêkxistinek ya qada abûriyê ya ne dewlet, xweser, komînal û demokratîke kû pesartiyê hêza cewherî ya gele.

***Rêgez û Pîvanên Bingehîn Yên Tevgera Kooperatîf ya Mondragon'ê:***

١. **Endamtiya Vekirî û Ji Dil:** Ji bo karên hatî diyarkirin, tevayê jin û zilamên xwediyê jêhatina pîşeyî, dikarin bibin endam. Li gel vê, bi qezençkirina pîşe ji mirovan re pêşiya tevlêbûna nav Tevgerê ya wan tê vekirin.
٢. **Rêkxistina Demokratîk:** Di asta wekhev de tevlêbûna tevayê karkerên endam li pêvajoya biryar girtinê; mafek yê dengdana her endamekê, tê bingeh girtin.
٣. **Desthilatiya Karker:** Endamên Tevgerê di heman demê de rêveberên Tevgerêne. Bi vî awayî, biyanîbûna li kedê na, xwedî derketina li kedê bingeh tê girtin.

٤. **Amûr û Dûyemînbûna Sermayê:** Sermaye, ji bo kar amrazek dûyemîne û ji bo pêşveçûna kargehê destkeftek pêwîste. Encamên tên destxistin, rasterast bi sermayê ve peywendîdar nînin.

٥. **Tevlêbûna Li Rêveberiyê:** Bi tevlêbûna endaman li rêveberiya kargehê, bi xwe xwe rêveberî herkû diçe pêşdikeve.

٦. **Yekîtî û Hevpiştiya(dayanışma) Destheq(ucret):** Di nav hevpiştiya bi derdora civakî û beşên mayî yên kargehê re, li gora derfetên heyî yên her kargehek ya kooperatîfê destheq tê diyarkirin.

٧. **Hevkariya Di nav Kooperatîfan de:** Hewza qezencê ya di nav kooperatîfan de tê sazkirin û veguhestina endamên karker tê pêkanîn.

٨. **Veguherîna Civakî:** Piraniya xwe ji nû ve veguherîna li berhemhênanê ya qezencê re, ji bo afirandina qadên kar yên kooperatîfa nû û pêşvebirina civakî destek tê dayîn.

٩. **Avana Gerdûnî:** Ji bo demokrasiya civakî, parvekirina armancên xebat, aştî, dad û pêşvebirinê tên destek kirin.

١٠. **Perwerde:** Ji bo Kooperatîfê û perwerda pîşeyî, mirov û jêderên abûriyane yên têrê bikin tên dabînkirin.

**Meksîka – Zapatîstî:**

Têkoşîna Zapatîst, di sala ١٩٨٣'yê de bi navê 'EZLN' (Artêşa Rizgariya Netewî ya Zapatîsta) destpêdike. Roja yekem ya sala ١٩٩٤'ê jî dibin pêşengiya şervanan de serhildanek mezin ya gel tê destpêkirin. Di roja yekem de, li gel çar bajarên mezin yên di herêma Chlapas de, şaredariyên bi dehan wargehên jiyanê tên desteserkirin û ev qad tên standina bin çavdêriyê. Zapatîst'î, ne bi rêya desthilatdariyê guhertina civakê, belkû xwe xwe rêvebirina civakê û ta tê vê astê jî li ser rêveberan raste rast sazkirina çavdêrî û desthilatdariyê diparêzin. Dema gel bi rêbaza "bi milkeçbûnê(itaat) rêvebirin" kû slogana wane çavdêrî dike û rêvedibe, yên rêvedibin jî guhdar dikin û pêktînin. Li gor Zapatîstî'yan komek biçûk, bi çi awayî be bila wusa be nikare bi serê xwe ti biryarek ya civakê peywendîdar dike, bigre û pêkbîne.

- **Aguascallentes:** Aguascallentes qadên kû şervanên EZLN tê de bi gelên herêmê û hêzên din yên civakî re danûstandinan çêdikine.
- **Şaredariyên Xweser-Otonom:** Di sala ١٩٩٤'ê de bi destpêkirina cihên ewil hatîn desteserkirin re di qadên Zapatîst yên herêma Chlapas de şaredarî wekû xweser ji nû ve tên rêkxistinkirin. Ev şaredariyane ne yên girêdayê dewletêne, belkû şaredariyên gelê herêmê rasterast rêvedibinin.
- **Caracoles:** Mena jiyanêye an kû komûna pesartiyê yekîtiya civakî ya ji wargeha herî biçûk ta ya herî mezine.

- **Juntas de Bûen Gobîerno (Meclîsên Rêveberiya Baş):** Di her herêmek ya serhildanê de, bi beşdarbûna yek-yek yan dû-dû ji konseyên şaredariyê yên xweser, jûntayek tê rêkxistinkirin. Ev juntayane, ji meşandina tevayê kiryarên mijara gotinê yên di herêmê de; ji çavdêrîkirina pirsgirêkan, zoriyan û nakokiyan berpirsyarin. Herkesê kû di derbarê kom yan şaredariya di herêma xwe de xwediyê nerihetî û aciziyan be, rexneyên xwe û ramanên xwe digihîne van juntayan. Ev cuntayane, li

rex komik, gel û beşên civakî yên ji dervey herêmên Zapatîst, dema pêwîstbike, bi rayedarên hukûmetê re jî hevdîtinan dimeşînin.

Bi armanca pêkanîna hevpiştî û yekîtiya di navbera herêm, komîk û şaredariyan de, bi hatina gel hev ya çend jûntayan re Jûntas de Bûen Gobîerno (Meclîsên Rêveberiya Baş) tên avakirin. Rêkxistinên komun yên Zapatîstî'yan tenê bi komikên xwecih ve sinûrdar nînin, herwusa komunên kû herêmên berfireh yên gel û çandên cuda digrin nav xwe jî, armançkirine.

Di vê çarçuvê de di sala ٢٠٠٣'yê de "Plana La Realîdad-Tîjûana" danîne holê.

**Komunên Venezuela:**

Di Venezuela'yê de komun, bi navend girtina wargehan rêkxistin dibin. Herkesê ji ١٥ saliyê mezintir dikare bibe endamê komunê û di mekanîzmayên biryargirtinê de cihê xwe bigre. Komun, berdevkê komunê û meclîsa komunê hildibijêre; dema pêwîstbike xwediyê mafê xirabkirina biryarên meclîsêye, xistina endamtiya komunê û ji kar girtina berdevkê komunêye. Komîteyên çavdêrîkirinê yên civakî jî kû komun erkdar dikin; projeyan, xebatên derbarê civakê û abûriyê de bi rêvedibin û çavdêrî dikin.

Di sîstema komunê de, mekanîzmayek demokratîk ya rêveberiya-cewherî kû ji wargeha herî biçûk ta sazûmankariya herî mezin diçe, tê sazkirin. Li ser vî bingehî komunên di her wargehekê de bi hatina gel hev re konseyên komunê sazdikin. Hêjmara endamên konseyên komunê, li gor derfetan ji çend malbat ta ٢٠٠ malbatan dikare were guhertin; lê di hinek herêman de hêjmara konseyên komunê têr jimar û qerebalix dibe. Konsey, ji aliyê rêkxistinbûna jor ya bi navê Yekîtiya Komuna Sosyalîst kû ji yekîtiya konseyên komunê sazdibe ve tê çavdêrîkirin û rêvebirin. Di wargehên kû dê konseya komunê lê were sazkirin de, serdaniya tevayê mirovan tê kirin û ev xebat ji wan re tê ragehandin û tê xebitîn kû werin yêqînkirin(ikna); duv re bi civîna di wargeha mijara gotinê de tê kirin, rêkxistinkirina komunê tê destpêkirin.

Bi yasaya li sala ٢٠٠٨'ê hatî derxistin re, tê xebitîn kû di rêkxistinkirinên komunê de hinek pîvanên bingehîn werin rûnişkandin, di vê çarçuvê de:

Di qadên gelên xwecih lê jiyan dibin de herî kêm ji ١٠ malbatan, di gundan de herî kêm ji ٢٠ malbatan; di bajaran de jî herî kêm ١٥٠, herî zêde jî ji ٤٠٠ malbatan pêkhatina her konseyek ya komunê, di yekemîn civîna kû herî kêm ji sedan ٣٠'ê endamên wê tevlêbûyî de pêwîste nûnerên xwe hilbijêrin. Di desteya nûneran de kû bi hilbijartina pesartiyê beşdariya rasterast ya demokratîk tê sazkirin, dema di mijarên malî de ٥ kes û di mijara rêvebirinê de ٥ kes tên destnîşankirin, ٥ kes jî bi çavdêrî û rêvebirina civakî ve tên erkdarkirin. Kesên tên hilbijartin pêwîste li gel hev têkiliyên wan yên xizmayetiya nêzîk tinebin. Koma kû komunê pêktîne, dema pêwîst dît, bi civînek ya herî kêm ji sedan ١٠'ê endamên wê tevlêbûyîn, dikare kesên hilbijartî ji kar bigre. Dîsa, her konseya komunê berdevkek yê mûçe nagire û ji dil dixebite, hildibijêre. Di salên dawiyê de di navbera konseyên komunê de rêkxistinên yekîtî û sîwanê berfirehtir dibin. Konseyên komunê, di qadên weke; Rêveberiya-cewherî ya demokratîk, pêkanîna wekheviya civakî, projeyên avanajêr-avanajor û vehesînê(barınma), qadên Perwerdê, Abûriyê, Tenduristiyê, Çand-Huner-Werzişê,

Çapemenî û Ewlekariyê de li gel pêşwazîkirina pêwîstiyên civakê, ji bo veguherîna saziyên dewletê jî desteka endam, teknîk û şêwirmendiyê didin.

Tê diyarkirin kû di giştiya welat de, avakirina nêzîk ٦٠ hezar konseyên komunê hatiye bernamekirin; piştî sala ٢٠٠٦'ê bi giştî ٣٠,١٧٩ konseyên komunê hatine tomarkirin û ji vana nêzîk qasî ٢٥ hezarê wan erkên xwe bi cih anîne.

### ٣. Bîrdozîvan û Çalekiyên Komun û Kooperatîfan:

**Robert Owen (١٧٧١-١٨٥٨)**

Karsazê Îngîlîz Robert Owen, li beramber pir zêde giranbûna derfetên jiyan û xebata gelê li herêma kû di sala ١٧٩٩'ê de karxaneyên New Lanark lê kirîbû de, rêyên çareseriyê digere. Dema hewldanên başkirinê yên Owen berhem didin, hem pêdiviyên bingehîn yên karkeran baştir tên pêşwazîkirin û hem jî şîrket di aliyê bazirganiyê de serkeftî dibe. Duv re Owen, dixebite kû ceribandinên xwe bîne rewşa mînakekê. Kêmkirina demjimêrên xebitîna kesên ji ١٨ saliyê biçûktir, qedexekirina xebitîna zarokên biçûktirê ١٠ saliyê, piştî sê saliyê ji aliyê komanê ve mezinkirin û gihandina zarokan, ji aliyê civakê ve bi awayek hevbeş pêkanîna hilberîn û berxwarinê(tuketim), di karxaneyan de sazkirina qadên jiyana hevbeş, giranî dayîna hevkarî û hevpiştiyê(dayanışma); li ser vî bingehî avakirina komikên guncaw yên ١٢٠٠ kesî, diparêze. Owen'ê kû dijî xawendariya(mulkiyet) taybete, di avana ol û malbatê de jî kirina çaksaziyê(reform) rast dibîne. Li gora dem û cihê xwe, ji ber sedema dîtinên xwe yên kû guhertinên civakî yên pir mezin armanç dike, dema rastê zext û êrişên hêzên dewletparêz tê, diçe DYE'yê. Di sala ١٨٢٥'ê de mînakek bi navê New Harmony(rêkûpêkiya nû) sazdike. Lê ev hewldana wî jî bi heman sedeman di sala ١٨٢٨'ê de ji bin diçe. Owen'ê kû sala paştir vedigere Brîtanya'yê, di sala ١٨٣٤'ê de wekû pêşengê sendîkayê, pêşengiya yekîtiya tevayê sendikayên li Îngîltere'yê dike. Di demek kurt de ev sazûmaniya bi lez pêşdikeve, ji aliyê hêzên dewletê û sermaya taybet ve tê belavkirin. Lê bi tevgera sendîkayê ya Brîtanya'ya wê demê re, di derketina holê ya hewldana kooperatîfa Rochdale de, piştgirî, destek û xebatên ramaniyên wî yên pir mezin çêbûne.

**Mînaka Charles Fourler û Falanster:**

Yek ji bîrdozîvanên herî girîng û yekem yê tevgera kooperatîfa hemdem Charles Fourler, pir tund dijî perçebûna kiryara abûriyane derketiye; li cihê vê jiyan û abûriya hevbeş parastiye; wekû çareserî jî mînaka Falanks-Falanster pêşxistiye.

Fourler, yek ji wan komanvanane kû dijberbûna pîşesaziyanîzmê li civakê û di nav civakê de jî hebûna rewşa şer ya herkesê beramber herkesê, herî zû dîtiye. Fourler aniye ziman kû pîşesaziyanîzmê bi tinekirina abûriyê re kombûna qezenç û sermayê pêktîne, di navbera hilberandin û parvekirinê de xwe dipesêre bêdadiya mezin; di encama vê de dewlemend zêdetir dewlemend dibin, hejar jî zêdetir hejar dibin.

Falanks kû têgehek Sumerî ye; rewşa, di şerde mil bi milê hev rêzbûn û xwe girêdana heve. Fourler, ev têgeh di wateya komika hevbeş, piştevanî û parveker jiyan dibe de bikaraniye.

Parvekirina rast ya berhem û qezenca tê destxistin, ji dil û germbûna têkiliyên di navbera mirovan de, sîstemek ya komun-kooperatîfê kû ne tenê hilberînê, belkû hevbeşbûna jiyanê jî diparezê, pêşniyar dike. Di vê sîstemê de, hevbeşbûna aşxane û xwaringehê, hevbeş mezinkirina zarokan jî, li gora daxwazê û her roj di komên cuda yên kar de encamdana gelek karên cuda ya herkesê, tê parastin û pêşniyarkirin.

Bi direjiya sedsala ١٩'an, di serî de li Brîtanya'yê komuna Rochdale, li Fransa'yê komuna Famîlîstere Godîn û komunên Lyon û Parîs'ê, li Swîsre'yê Konfederasyona Jura; gelek ceribandinên komun û kooperatîfan derketine holê. Lê ji ber kû vana bi serê xwe mijarek cuda ya lêkolînêne, emê li vê derê nekarin bigrin dest.

**Mîhaîl Aleksandrovîç BAKÛNÎN**

Bakûnîn'ê yek ji bîrdozîvanên seretayî yê anarşîzma kollektîf û mirovek zindî yê çalekvane, dîtina; "bê kû dewlet hebe, bi rekxistinbûna awayek hevbeşvan ya civakê re, dikare xwe bi xwe rêvebibe," diparêze. Li gel vê pêşbînî dike kû kedkar û karker heman tişt nînin; karker çend wekû karkeran bimînin, di çeperê kapîtalîstan de dimînin, lê dema dest ji karkertiyê bihêlîn û xwedî li keda xwe derbikevin jî dê bikarin kerameta xwe qezençbikin û dê werin rewşa beşek rast yê hilberîna abûriyane. Diyar dike kû di kapîtalîzmê de "karker di demek kifşkirî de (beramber mûçe ji kapîtalîst re) kesayeta xwe û azadiya xwe difiroşe." Bakûnîn'ê kû her core desthilatdariya ji derve ve li civakê tê pesartin red dike; hêza rêveberiyê û desthilatdariyê bi dewletê re hevseng dibîne, têgihiştina sosyalîzmek ya pesartiyê wekhevî û azadiyê; tê de dewlet û hiyerarşî neyî, bingeh digre û dibêje: "Em bawerdikin kû azadiya bêy sosyalîzm, cudakarî û bêdadiye û herwusa bêy kû azadî jî hebe, sosyalîzm koletî û tundûtîjiye." (Felsefeya Siyasî ya Bakûnîn, r.٢٦٩)

Bi dij derketina li cûdakarbûyîna mirovan ya ji yên din re Bakûnîn dide diyarkirin kû kesê xwediyê hercore cûdakariyekê ye, ji hiş û dilê xwe ve qirêjbûyî ye. Dîsa Bakûnîn diparêze kû di rewşa xwedîbûyîna hercore meylek din ya olî, netewî yan jî hêstiyarî ya şoreşgeran de, dê rêkûpêkiya wan ya civakê ya heyî nekarin biguherin; herwusa pêwîste nekevin van core nêzîkatiyan.

**Pîerre-Joseph PROUDHON**

Dema Proudhon ber bi aliyê lêgerînên civaka cîhgir(alternatif) ve diçe, xwe wekû anarşîst dide naskirin. Proudhon jî vê diparêze; bi rêya yekîneyên karker û pîşekaran, komunan, banqeya alîkarîkirinê û kooperatîfan, koman dê bikare bi xwe hilberîna xwe pêkbîne û bazara xwe sazbike, bi rêkûpêk kirina jiyana xwe re, sazkirina komunên xwe re dê bikare xwe rêvebibe. Li gora Proudhon; bi rêbazên

mîna biçalektiya komikî, çalekiyên nemilkeçiyê(itaatsizlik), mangirtinê(grev) civak dikare dewletê bê bandor bihêle û jêhatina xwe bi xwe rêvebirinê qezençbike. Li şûna berxwarin "li gora pêdiviya herkesê" be, li ser nirx û bazarê(piyasa) çavdêrî û rêveberiya civakê, hîn rasttir dibîne. Xwedîbûyîna karê xwe ya herkesê; lê karên ji yekê zêdetir kes bikin jî, pêdiviya pêkanîna wê bi awayê kooperatîfan, diparêze.

**Pyotr Alekseyevîç Kropotkîn û Komînîzm'a-Anarko:**

Kropotkîn'ê bîrdozîvanê komînîzma anarşîst, di çarçuveya vê ramanê de bi pêşxistina çareseriyên derbarê tevayê qadên bingehîn yên jiyana civakî re jî ji wan kesane kû destek û piştgiriya herî mezin ji bo çêbûna avaniya sîstema civakî ya anarşîzmê pêşkêşkiriye.

Li gora Kropotkîn; jêdera pirsgirêkên civakî nav yan jî awa nîne, ji ber kû desthilatdarî bi xwe ye, şoreşa civakî tenê bi rêya komunên azad û bi awayek bê dewlet dê pêkwere. Herwusa Kropotkîn wuha jî difikire: pêwîste şoreş ne tenê hinek saziyên dewletê, belkû her çi tiştê girêdayê dewletê û sîstema mêtingeriyê hebe hemûyan armanç bike, şoreş dê bi serhildanên gel çêbibe lê bi vî awayî dê neyê timîkirin(surekli); **hêj di serdema şoreşê de jî pêwîstî pê heye kû di serî de çareserkirinên tîmarbûn, vehesan(barınma), cil li xwe kirin, perwerde û tenduristiyê, herwusa pêkanîna çareseriyên derbarê tevayê qadên jiyana civakî de çêbibin.** Ji ber kû Kropotkîn zanistvantiyek hişk bingeh digre, di wê fikrê û parastina baweriyê de ye kû hertişt dikare ta ziraviyên herî hûr were bi bernamekirin; bi bêkêmasî û jêhatî karanîna zanistê ya mirov re dikare bi awayek herî baş xweza were nirxandin û herwusa jî dikare pêwîstiyên xwe-xweyî werin dabînkirin.

Kropotkîn wuha dibîne: rasterast tevlêbûna civakê tineye, hercore sazûmaniya rêvebirane ya li ser civakê heyî wekû çêbûn û avaniya dewlet-desthilatdariyê ye. Li beramber vê, komunîzma anarşîst kû ji kesên azad pêktê, tê de hiyerarşî neyî û li ser bingehê ji diltiyê hatî sazkirin, bingeh digre.

Li gora Kropotkîn, her bajarê serî hildide li gora derfetên xwe, bi awayek kû cudatiyan bi hewîne dikare komuna xwe ava bike. Komunîzma anarşîst ya kû tê de dewlet, hukûmet û xawendariya(mulkiyet) taybet neyî û ji mirovên azad pêktê, diparêze. Komunîzma anarşîst, azadiya abûriyane û azadiya siyasî bi hev re û di nav yekîtiyekê de digre dest. Kropotkîn wusa difikire kû şoreş û bi civakîbûyîna pesartiyê komunan, dê di bajaran de were sazkirin, dê gundî jî di nav demê de tevlê vê pêvajoyê bibin, lê piştî tevlêbûn û şûnde jî bi lez û bi coş dê vê sîstemê avabikin. Têkiliyên abûriyane, ne li ser pere û têkiliyên bazara kapîtalîstîkî belkû pêwîste li ser parvekirin, hevbeşbûyîn û pêk guhertinê(degiş-tokuş) were rêvebirin. Keda bi mûçe; mêtinê û hebûna dewlemend-hejar rewa dike. Karker, li beramber mûçe û kirêyê ne tenê keda xwe, belkû keramet û azadiya xwe jî difiroşe kapîtalvan. Karkerê bi mûçe, ne li ser bingehê pêdiviyên civakî belkû ji bo berjiwendiyên desthilatdaran dixebite û di hilberîne. Ji pêwîstiyê pir zêdetir dixebite lê nikare pêdiviyên bingehîn yên xwe jî pêşwazî bike. Dîsa bi hêcet û sedem nîşandana cudatiya pîşe û jêhatinê, di navbera kesên dixebitin de parvekirinek nerast ya mûçe tê bingeh girtin. Ji ber van sedeman,

pêwîste keda bi mûçe ji holê were rakirin; xebata ji dil, bi coş û daxwaz were bingeh girtin. Bi vî awayî, rojê xebitîna çar demjimêran jî dê têrê bike.

Kropotkîn, dijberê rola civakî ya ji jinan re hatî kifşkirine jî; li ser vî bingehî naçarbûna bihûrandina(aşmak) koletiya malê ya li jinê hatî pesartin jî, diparêze. Ji ber van sedeman, pêwîste ked li ser bingehê bi sûdbûna civakî were rêkûpêk kirin. Bi vî awayî dem, wize(enerji) û hêza kedê ya ji bo qadên din yên jiyanê werin bikaranîn, dê zêde bibe. Li gora Kropotkîn; çengek mirov bi îddea kirina mafê desteserkirina ji sêyan dûyê hilberîn û nirxên civakê ji wan re wekû kevneşopî û mîrate maye, vê yekê berdewamdikin û ji ber kû berhemên desteser dikin jî ji pêdiviyên wan pir zêdetirin, piraniya vana berba(savurmak) dikin. Ji bo ji holê rabûna vê rewşê jî, ger civak bi têgihiştinek zanistî derfetên di xwezayê de binirxîne, rêkûpêkiyek civakî ya rast, wekhev û parveker sazbike, difikire kû wê demê dê civak tevayê pêdiviyên xwe bi asanî bikare pêşwazî bike. Ji bo sazkirina sîstemek kû hemû kes di nav aramiyê de be jî, di serî de pêwîste rêkûpêkiya xawendarêtiya newekhevîparêz bi rêya desteserkirin û kirina malê giştî(istimlâk) were rûxandin; ji nû ve xawendarêtî were rêkûpêk kirin. Bûyîna xawendarêtiya taybet ya amûrên hilberandinê hem bêdadî û hem jî bêsûd dibîne û dibêje; pêwîste vana werin kollektîfkirin an kû hevbeşkirin. Derketina holê ya amûrên hilberandinê û berheman bi keda hemû kesê çêbûye, ne gengaze kû mirov hesab bike ka di derketina holê ya vana de destek û rola kê, çend çêbûye û herwusa jî “hertişt yê herkesê ye.” Kropotkîn, hevbeş nirxandin û karpêkirina dewlemendî û derfetên hevbeş; li ser bingehê hevbeşî û wekhevtiyê parvekirina nirx û berhemên hevbeş derketîn holê, diparêze. Li gora Kropotkîn’ê kû rêgeza “ji herkesê re qasî pêdiviyê” bingeh digre; avahî û hewangeh(konut) pêwîste di karpêkirina civakê de bin; di rasteka biryarên civak dide de û bê kû li benda dayîna beramberiyek maddî were rawestan, ji herkesê re hewangeh werin avakirin. Endamên civakê pêdiviyên xwe yên cilûberg jî pêwîste ji kogeh(magaza) û atolyeyên hevbeş, bê pere pêşwazî bikin.

**BEŞA IV.**

## ÇARÇUVEYA TEORÎK YA ABÛRIYA DEMOKRATÎK-KOMÎNAL

### ١- PARASTINA-CEWHERÎ YA ABÛRIYANE

Bi corên din yên qirkirinê re di nav hev de meşandina qirkirina abûriyê kû rê li ber encamên herî giran vedike, bi awayek herî zelal li Kurdistanê tê dîtin. Lê gelê kû rû bi rûyê qirkirina abûriyê tê hiştin, nakeve ferqa vê qirkirinê û heta fêr jî dibe; di serî de dagirî-talana li ser xakên xwe, herwusa li ser jêder, kiryar û têkiliyên xwe yên abûriyê, rewa û asayî dibîne; li beramber têrkirina zikê xwe û berjiwendiyên maddî yên teng yên kesvan/malbatî, bi awayek bi zanabûn yan jî bê zanabûn dibe şirîk.

Parastina-cewherî ya dijî qirkirina abûriyane kû jêdera tevayê qirkirin, kolekirin û kerîkirinane, ji bo berdewamkirina hebûna xwe ya civakekê, mercê di serî de tê û jênegere. Ger bi bandortiya modernîteya kapîtalîst bi taybet ya di roja me de were hizirîn, avakirina abûriya demokratîk-komînal û xwesertiya abûriyane ya kû rewşa wê ya gihiştî pênaseyêye, li holêye kû dê bi êrişên mezin re rû bi rû bimîne. Li beramber vê rastiyê, avakirina xwesertiya abûriyane û parastina-cewherî ya abûriyane naçare di nav hev de be. Dijî qirkirina abûriyê têkoşîna parastina-cewherî ya abûriyane, ji aliyê hêzên civakî yên xwediyê zanista demokratîk û rêkxistinbûnê, yên hişmendiya çalak û bi biryartiya wan heyî ve an kû yên girêdayê namûsa nomosê dimînin ve, tê meşandin. Li ser vî bingehî bi bandortirîn parastina-cewherî ya abûriyane, li aliyekê bi dawîkirina dagirî û talana kapîtalîstîkî ya li ser abûriyê ye; lê li aliyê din, ji nû ve avakirina qada abûriyane ye.

Di qada abûriyê de parastina-cewherî, tevayetiya kevneşopî-îro û pêşerojê bingeh digre. Li ser vî bingehî civak, bi nirxên kevneşopî yên xwe yên derbarê qada abûriyê de, destkeft û berhemên di roja me de derxistî holê, diparêze. Bi vê re, bi dewlemend kirina mîratê kû dewirgirtî, hiştina ji nifşên pêşerojê û tevayê mirovahiyê re, ji erkên herî pîroz dijmêre. Qasî li gel dewlemendkirinê parastina ya heyî, avakirina ya nû jî, bingehê têgihiştina parastina-cewherî ya abûriya komînale. Ji aliyê hêzên netew-dewlet yên navendî û sermayedarên yekdestdar û hevkarên wan yên xweyanî ve talankirina xak, av, daristan, betenok(bitki ortusu), kanza û dewlemendiyên din kû xaknîgarî pêşkêşdike, pêşiya wan tê girtin. Ji nirxê maddî yê herî biçûk ta destkefta herî mezin, êrişên derbarê danhevên(birikim) çanda maddî ya civakê de tên astengkirin. Kiryarên mêtin û talanê yên kû netew-dewlet û hêzên kapîtalîst yên yekdestdar li ser civakê û erdnîgariyê dimeşînin, tên vala derxistin û saziyên wan tên bê bandorkirin. Siyaseta van hêzan ya şkandin, hejarkirin û bê vînkirina abûriya civakê, herwusa li ser qada abûriyê re komkirin zarokan(devşîrme) û sîxûrxistina wan, tê vala derxistin.

Parastina-cewherî, tenê rasterast parastina kiryar û nirxên abûriyane nagire nav xwe. Tevayê hebûn, sazî û nirxên bi keda civakê derketîn holê kû yên civakêne û ji wê re xizmetê dikin, dikevin nav çarçuveya parastina-cewherî. Mînak; astengkirina talankirina jêderên avê ji aliyê dewlet û/yan jî sermayeya taybet ve bi hêceta

dabînkirina wizeyê-çêkirina bendavê, dîsa astengkirina xusardayîna li saziyek ya gel yan jî şewitandina daristanekê; hêlwest û tevgerên mîna nepejirandina bacên giran û sizayên darayî yên kû netew-dewlet bi armanca şkandina civak û kesan wekû abûriyî, bi hêcetên cuda yên dibin kîfê zagon-huquqê de dibire jî, jênegerên parastina-cewherî ya abûriyîne.

### ٢. Zîhniyeta(bîrûbawerî) Abûriya Demokratîk-Komînal:

#### a. Komun Çiye?

Komuna kû bingehê peyvnasiya wê(etimolojîk) ji peyva bi Kurdî ‘Kom’ hatiye, awayê jiyana bi hev re ya di tevayê qadên civakî de rêkxistinbûyî, bi sîstembûyî ye; an kû mena jiyana civakî ya pesartiyê hevbeşbûyînê, parvekirinê, hevpiştiyê, wekheviyê û azadiyê ye. Pîvanên komunê gengaz dikin; giyanê hevbeş, vîna jiyanbûnê, armanc û hedefên bingehînin; yekîtiya çalekî û lebatêye.

Di komunê de çawa kû cih, jimar yan jî armancên sinûrdar yên hatîn diyarkirin bi tena serê xwe nebesin, di heman demê de komun hevpariya berjiwendiyê jî nîne. Lê dîsa komun ne yekîneyên civakî yên bê erk û bê armancin, berûvajiyê wê; yekîneyên bi erkin kû di wateya civakî de herî zêde di hilberînin, di afirînînin, pêşdêxin, xweşik dikin û dewlemend dikin. Xwe tenê bi qadek ya jiyanê ve yan jî bi çareseriya tenê kêşeyekê ve sinûrdar nake. Komun, yekîneya jiyana civakiye kû bi zihniyeta hevpar û cîhana wateyê ya komanek xwediyê wê ye, di tevayê qadên jiyanê de bi rêkxistin kirinê re tê sazkirin. Tevayê koma kû komunê sazdike tenê takekesekê, tenê takekesek jî tevayê komanê dide der(yansıtmak). Komun di heman demê de awayê hebûna civakiye kû mirovên temamkerê hev sazdikin. Jiyana komînal; çawa kû di êş-keyfxweşî, hîs-pêhes, coş-xemgînî, tengî-berfirehî û bi başiyê re jiyanbûnê de bi hevrebûyîn be, heman demê de di têkoşîna dijberê xirabiyê de jî bi hevrebûyîne. Di komana komînal û jiyana komun de rêgeza “yekî me ji hemûyê me re; hemûyê me ji yekî me re, hemûyê me ji hemûyê me re” tê bingeh girtin. Di gotina Şêx Bedredîn ya wek; “Ji bilî lama yarê, li her cih, her tiştî de ji bo em bi hev re bêjin, em ketin rêyan, rêyan…” de, jiyana hevbeş û bi hev re bûyîna tê bilêvkirine, komun. Li ser vî bingehî, yê bikare bibe XWE BI XWE, tenê dikare bibe endamê komunê. Lê, ‘bi xwe bûyîn’ ne li gor xwebûyîn, kesvantî, ez-navendîtî yan jî dîmaneyî(gorecelik) ye. Bi awayê ji civakê qutbûyî bihêle ‘xwebûyîna’ mirov, ne gengaze kû jiyana xwe ya fîzîkî jî dombike. Li gora vê; xwe bi xwe bûyîn, fêmkirina bûyîna perçeyek yê civakê û xwezayê û gihiştina zanîna vê; hilgirtina berpirsyartiya bûyîna vî perçeyî, bi vê berpirsyartiyê tevlêbûn û qasî tevlêbûnê jî hêz girtine. Ji milê din ve bûyîna perçeyek yê komanê; bêvîntî, tevlênebûyîn, ji rêzêbûyîn û bênirx bûyîn, nîne. Kesê wuha, çawa kû nikare bibe kes; dikare bibe mişexwer(asalak) û berxwer(tuketici). Komun jî, civaka xwe ji nû ve avadike ya mirovên xwe ji nû ve di afirînin, pêktîne ye. Ji nû ve avakirin; bi hêst, raman, vîn, tevlêbûn, hilberîn û afirandinê, an kû tenê bi qezençkirina nasname û kesayetê dikare pêk were. Herkesê di komekê de kû biryar daye ji bo sazkirina komunekê, endamê komunêye. Di komunekê de, zarok, pîr, cuwan, jin, zilam, tevayê endam di jiyana komunê de, di berdewamkirina hebûn û

erkdariya komunê de, di çareserkirina pirsgirêkên derdikevin holê de û bi zelalkirina pêdiviyan re derbazkirina wan de, bi awayê guncawê xwesertiyên xwe lê li ser bingehê wekheviyê, tevlêbûnê çêdikin û berpirsyartiyê hildigrin.

Mercek din yê bingehîn yê avakirina komunê jî, demokratîktî ye. Parvekertî, wekhevî, azadî û rêgezên din yên kû bingehên komunêne, tenê di civatek demokratîk de gengaz dibe. Demokratîktiya di komunê de ne piştdayê xapandina nûnertiyê ye, belkû di raman-dîtin-çalekiyê û berpirsyartiyê de pesartiyê tevlêbûna rasteraste. Civatek yan jî civak komuna xwe; bi vîna xwe, hêza xwe ya biryarê û pêkanînê avadike. Bi kîjan sedemê be bila bibe, komun nikare ji derve ve li civata mijara gotinê were pesartin; bi zor, beralîkirin(yonlendirme), pesartin û zexta rasterast yan jî ne rasterast re komun nikare were avakirin. Çawa kû civak bi xwe, tevayê awayên civakî û tevayê çalakiyên di jiyana civakî de, destpêkê di zîhniyetê de vediguhere rastiyê, komun jî sereta di zîhniyetê de tê sazkirin. Biryar û ramanên komunê yên ji zîhniyetê qut, herî dawî bi pevçûna berjiwendiyê yan jî belavbûnê encamdibe. Zîhniyeta komunê, bi avanîbûnê re rastiya xwe dadêxe holê û bi heqîqî dibe. Girtina awayê çêbûnê ya zîhniyeta komunê, tenê bi rêkxistinbûnê re gengaze. Di vê çarçuvê de civat, di tevayê qadên jiyanê de mekanîzmayên xwe yên rêveberiya-cewherî ya demokratîk ava dike. Avanên di mekanîzmayên rêveberiya-cewherî ya demokratîk de heyî, rêkxistinbûyînên ne pêgir(bagımlı) û pir navendî; ne jî tam serbixwe û pir li gora xwene. Ev yekîneyane, avanên xweserin û perçeyên temamker yên tevayetiya li ser bingehê demokratîk û konfederalin.

Ji hebûn û nirxên hevsengê xwezaya civakî ya civat, gel yan jî beşên civakî yên din re, komunek naçare rêzdariyê bingeh bigre. Komunek, di nava xwe de çi qas demokratîk, wekhevîxwaz û parveker be jî, ger vana ji bo civak yan jî komên civakî yên din jî wekû maf nabîne, komuna mijara gotinê, di rastiyê de ji dijberbûyîn û dervey civakê bûyînê nikare xwe rizgarbike.

Komunek, her çi qas taybetiyên komunbûyînê bi awayek bi hêz bi hewîne jî, ger xwe ji komunên din dûr û qut bigre yan jî hebûna mafê sazkirina komunê ya civatên di jî red û mandele bike, nikare were gotin komuna mijara gotinê li beramber civakê xwe berpirsyar dibîne. Li gel vê, komunên bi xwe re sinûrdar dimînin, wekû di dîrokê de nimûnên wê pir hatî dîtin, ji heliyan, belavbûn yan jî zeliqîna bi sîstema dewlet-desthilatdariyê ve dê nekare rizgar bibe. An kû komun di warê cewherê xwe de awayê jiyana civakiye kû li ser hişmendiya “em” pêşdikeve, lê “em”a li vê derê tê armançkirin tenê hinek komunan, koman yan jî civatan na, belkû naçare bibe “em”ek kû ji dervey yekdestên sermaye-desthilatdarî û hevkarên wan yên hişdar, tevayê mirovan dorpêç dike. Ger li “ya din” kû beramberiya dualîstîkî ya “em”a komun bingeh digre ye, were geran; diyare vana divê tenê hêzên şaristaniya dewletparêz û yên wan bi awayek zanabûn hildibijêrin bin. Li ser vî bingehî sazkirina komunekê divê sazkirina komunên din jî armanç bike. Têgihiştina wekheviya di komunê de, ne wekheviya şekliye. Kesên civakê pêktînin, taybetiyên cuda yên wek; temen, rewşa qelafet, zayend, jêhatin û hostayî hildigrin. Ji ber kû tevlêbûna wan ya li jiyana civakî jî li gora van taybetiyane, herkes di heman rêjeyê de nikare tevlê bibe. Pesarteka

bingehîn ya wekhevtiya di komunê de, mirove. Têgihîna wekheviyek kû qasî rewşên cesteyî(bedensel) û giyanî ya takekesên komunê pêktînin, xwesertiya wan ya mîna jêhatinên wan jî berçav digre, tê bingeh girtin. Li ser vî bingehî qasî kû berpiryartiyên endamtiya komunê bi cih anî jî xwediyê mafên wekheve. Kê, çawa û li gora çi wekheviyê pênase dikin jî girînge. Pîvana bingehîn ya wekheviya di komunê de, dijber nebûyîna mirov ya li xwezayê, xwezaya xwe û xwezaya civakî ye. Wekhevîtî, ji aliyê komunê ve tê pênasekirin, pîvanên wê û pêkanîna wê jî ji aliyê civakê ve tê destnîşankirin.

Ger em, exlaq wekû hişê hevreyî(kollektif) yê civakê, wijdana wê, pîvanên bingehîn yên domkirina hebûna civakî; polîtîkayê jî, bi bingeh girtina vana re, ji bo civak hebûna xwe biparêze wekû hilberandina çareseriyan û karên pêwîste werin kirin digrin dest; wê demê komun yekîneyên jiyanêne kû tê de civaka exlaqî-polîtîk rewşa heqîqetê digre. Çawa kû eger komun nebe abûriya demokratîk-komînal dê nekare were avakirin, di heman demê de dezgehên(işletme) abûriya komînal yên mîna kooperatîfan jî ne gengazin.

**b. Abûriya Demokratîk-Komînal Çiye?**

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di paraznameya xwe ya bi navê ‘Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Netewa Demokratîk’ de ji abûriya komunê re danasînek wuha tîne:

*“Abûriya komuna demokratîk, rêya çareseriya ji nû ve gengazkirina jiyana mirov ya civakêye kû meyl û hêlwesta qezenca(kâr) zêde ya kapîtalîzmê ew aniye rewşa koleyên karker û bêkar. Bi dirêjiya dîrokê, abûrî her demê hebûnek ya bi komunê re hatiye pêkanîne. Abûriya bê komun, nikare were fikirîn. Wateya wê ya bêjeyê jî, ‘zagona komuna malbatê’ ye. An kû wek komunek karên debarkirinê yên malbatêne.”*

Di wateya giştî de avabûna jiyana komunê di qada abûriyî de, dikare weke abûriya demokratîk-komînal were danasandin. Di hatina rewşa heqîqetê ya rastiya komunê de qada abûriyî, piştî parastina-cewherî qada civakî ya herî kifşkere. Mirovek di kîjan derfetan de be bila bibe, çawa kû dikare komînal be, abûriya komînal jî ji aliyê ti derfet û hêzekê ve nikare were astengkirin. Şert û mercên derve yan jî maddî, tenê dikare awa û rêbazan bi bandor bike; ya kifşker jî bi ramana xwe, vîna xwe, çalekiya xwe, biryar û hêza pêkanîna xwe civat bi xweye. Civatek kû biryar dayî komunê çêke, li her derê û dibin her şert û mercan de, abûriya xwe jî li ser bingehê komînal dikare sazbike. **Abûriya komînal, di bingeha demokratîk-komînal de pêkanîna tevayê çalekiyên abûriyî yên di nav komunê de ye.** Abûriya demokratîk-komînal, qezenca(kâr) kapîtalîstî û danheva(birikim) sermayê kû weke dijberiya abûriyê dibîne, armanç nake. Tevayê çalekiyên bi armanca pêşwazîkirina pêdawîstiyên bingehîn kû civakê ji bo berdewamkirina jiyana xwe pêdivî pê dîtî û têkiliyên wê yên di vê çarçuvê de, di bazneya abûriyê de dinirxîne. Di vê xelekê de, abûriya demokratîk-komînal, bi giranî çalekiyên abûriyî yên nirxê karanînê dihewîne digre bazneya xwe de. Nirxê

guherînê jî, bi mercê pêşwazîkirina pêwîstiyên civakî û eşkerekirina wê ji aliyê civakê ve, dipejirîne.

Abûriya komînal rewatiya xwe, ji zagonan, huqûqê û mijaran na; ji xwezaya civakî û taybetiyên civakê yên exlaqî-polîtîk digre. Her komunek çawa kû çalekiyên xwe yên abûriyî di bingeha komînal de pêktîne, her yekîneyek ya hilberîna abûriyî jî di heman demê de taybetiya komunê hildigre û komuneke kû komuna giştî temam dike. **Abûriya komunê, tenê ji aliyê ew civat, gel, netewe yan jî hêzên civakî ve kû di bingeha demokratîk û azadîxwaziyê de biryara jiyana hevbeş dane, bi bawerî û zanîna vê yekê re xwe dagirtine, rêkxistina pêwîst sazkirine û çalekiya vê pêkanîne, dikare were damezirandin.**

Abûriya komînal, bi cih yan jî civatek diyar ve nikare were sinûrdar kirin. Çawa kû di civatên biçûk yên ٣-٥ kesî de dibe, di civatên milyon kesî de jî abûriya komînal dikare were sazkirin. Qasî kû di gund, kolan yan jî taxekê de dibe, di bajar, herêm, welat û heta giştiya cîhanê de jî çalekiyên abûriyî, di bingeha demokratîk-komînal de dikarin bi sererastkirinê werin pêkanîn. Li gel vê, di navbera herêm, gel yan jî çandên cuda yên hevbeş de jî komunên hevbeş dikarin werin damezirandin yan jî di bingeha demokratîk-komînal de têkiliyên abûriyî dikarin werin pêşxistin.

### c. Çima Abûriya Komînal?

Destpêkirina pirsgirêka abûriyî ya civakê, xwe dipesêre dagirkirina jêder, têkilî û çalekiyên abûriyî ya hebûnên ji dervey abûrî û civakê. Di roja me de yek ji jêderên herî girîng ya rûxandinên civak rû bi rûyê wê mayî, pirsgirêkên giran û neçaresertiyên beramber vana, ji aliyê hêzên desthilatdar ve ji destê civakê standina qada abûriyê ye. Di aliyekê de zexta siyasî, bişaftina çandî, zora leşkerî û çarçuveya huqûqî, di bingeh de rola dapoşîna dagiriyê û rewakirina mêtinê ya li ser qada abûriyî, dibînin. Rûxandinek din ya desthilatdariya yekdestên sermayê û desthilatdariyê li ser qada abûriyî rê lê vekirî jî, dîtina civakê wekû şkêr û kelekên ji kesan pêktê ye. Di encama têgihîna azadiya sexte ya kapîtalîzmê de, ji ber kû takekes di nav qad û çalekiyên abûriyî de cihê xwe ji civakê wekû serbixwe digre dest, tê beralîkirin(yonlendirmek) kû rizgariya xwe di dijbertiya civak û xwezayê de bibîne. Bi vî awayî hem kes û hem jî civak, bi awayek hîn asantir tê xistina nav rewşa kû xizmetê ji danheva bê sinûr ya qezenç(kâr)-sermayê re bike.

Gihandina abûriyê li cewherê wê, wateya wê ya rast û erkê wê, di wateya teng de tenê qada abûriyî na, tevayê qadên jiyanê yên civakê di astek kifşker de peywendîdar dike. **Jêdera tevayê awayên mêtin-koletiyê ji ber kû dagiriya abûriyî ye, azadkirina qada abûriyî di heman demê de azadkirina civakê û xwezayê ye.** Qasî kû abûrî dibin çavdêrî û rêveberiya; sereta afirênera rast ya abûriyê jinê de, tevayê hêzên civakî û civatên ji abûriyê hatîn derkirin de, herwusa di wateya giştî de dibin rêveberiya civakê û tevayê endamên wê de be, wateya xwe dibîne. Tenê bi ji nû ve sazkirina di bingeha komînal-demokratîk de, abûrî ji bûyîna qadek ne rewa ya kû civakê û xwezayê dimezêxe, dikare were rizgarkirin û vegere cewherê xwe.

### d. Koka Abûriya Demokratîk-Komînal:

Jêdera abûriya komînal, xwe di pesêre pêvajoya civaka xwezayî û çaxa neolîtîk ya bi sedhezaran sal domkirî. Têgihînên abûriyî yên tevayê hewldan û tevgerên parveker, hevbeşvan, wekhevîxwaz, azadîxwaz û piştevanî yên ta roja me, hem pesartiyê abûriya komînal bûne, hem jî li hişê çanda jiyana komînal-pevre(kolektif) ya mirovahiyê pir zêde destek û alîkarî dane. Herwusa di serî de qadên çol û çiyayî, di meydan û çandên kû modernîteya kapîtalîst nekariye bibe desthilat de, awayê abûriyê yê wek abûriya kevneşopî tê bi navkirin teng û perçeyî jî be, ji xaneyên abûriya komînal ya mirovahiyêye. Di yekîneyên civakî yên weke gund, eşîr û xizim de; an kû di ewên ji modernîteya kapîtalîst û netew-dewletê pir bi bandor nebûyîn de jî têgihîn, nirx û rêbaza têkiliyê ya pesartiyê abûriya komînal, bi awayek pir bi hêz, tê jiyankirin. Li gel vê, di qad û civatên kû bajarbûyîna çewt lê ne desthilat de, hevpiştî û alîkariya cîranan jî, di vê çarçuvê de mînakek din ya girînge. Raxmê tevayê êrişên hêzên dewlet-desthilatdariyê, di jiyana civakî de taybetî, nirx û pîvanên girêdayê abûriya komînal, di roja me de jî di rêjeyek diyar de tên parastin. Abûriya demokratîk-komînal, li tevayê van nirxan, mîrat û kevneşopiyê xwedî derdikeve û bi rojanekirinê re jiyankirina wan erkê xwe yê herî bingehîn dijmêre. Ji ber vê sedemê, abûriya demokratîk-komînal; li gora şert û mercên roja me bi sîstematîzekirina nirx, pîvan, rêgez, têkilî û tevgerên komînal yên mirovahiyê sazkirî re ji nû ve avakirina qada abûriyê ye.

### e. Rêgez û Nirxên Bingehîn Yên Abûriya Demokratîk-Komînal:

Abûriya komînal ji beriya her tiştî ji pirsa; 'abûriyek çawa' re bersivek bi awayê; 'abûriyek rewa, rast, baş û xweşik' dide. Pîvana bingehîn ya kû abûriyê dike abûrî, pêşwazîkirina pêdiviyên bingehîne û dema vê dike jî nehatina rewşa dijberê ekolojiyê ye. Di tevayê çiq, kiryar û têkiliyên abûriya demokratîk-komînal de ev rêgez, bê kêmasî û bê valatî tê bingeh girtin. Navê çalekiya tê meşandin çi be bila ew be ger dijberê vê pîvanê bû, qasî kû dibe dijberê abûriyê ye di heman demê de dijberê civak û xwezayê ye jî. Abûriya komînal xwe dipesêre paradîgmaya demokratîk-ekolojîk-azadîvantiya zayendan. Rêgez û têgînên bingehîn yên kû esas bigre, pêwîste di nav tevayetiya vê paradîgmayê de be. Li gel vê, bi têkoşînkirina li dijî şewişandinên(çarpıtma) li ser rêgez, nirx û pîvanên têkildarê qada abûriyî re, rastî tên serdest û desthilatkirin.

*"Abûrî mercê bingehîn yê hebûna civakê ye kû bi misogerî pêwîste girêdayê binemayên çarçuveya komanê, ekolojiyê û bi berhemtiyê rêkxistin bibe. Ji dervey civakê û komanan ti kesên din ne dikarin bibin xwediyê vî mafê hebûnê ne jî dikarin vî mafî ji holê rakin. Yekîne dixwazî bila bazirganî, dixwazî pîşesazî, dixwazî çandinî, heta bi mercê rol leyîstina tenê wek navbeynvan dixwazî bila fînansî be, naçare guncawê van rêgezên bingehîn be. Di bingehê kargehek pir mezin de jî, yekîneyek gund-çandiniyê de jî ev rêgez pêwîste hebin." Abdullah Ocalan- Di Rojhilata Navîn De Qeyrana Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk*

#### ١. Rêgeza Demokratîkbûyînê:

*"Abûrî Demokrasiye. Demokrasî herî zêde ji bo abûriyê derbaz dibe. Di vê wateyê de abûrî ne wek avana jêr, ne wek avana jor dikare were nirxandin. Wekû çalekiya herî bingehîn ya demokratîk ya civakê nirxandina wê, hîn rasttire." Abdullah Ocalan- Di Rojhilata Navîn De Qeyrana Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk*

Rasterast-bi rêya demokrasiya tundraw(radikal) damezirandina qada abûriya xwe ya civakê ye. Qada abûriyî, di tevayê pêvajoyên çalekî û têkiliyan de bingeh girtina tevlêbûna demokratîk, hevbeşî, wekhevî û azadiyê ye. Li ser vî bingehî polîtîka û çalekiyên abûriyî wekû giştî ji aliyê civakê ve tên diyarkirin, pêkanîn û rêvebirin. Tevayê endamên komanê, dema di rêjeya hêz-jêhatina xwe de tevlê çalekiyên demokratîk dibin, pêdiviyên civakî û kesî bi awayê guncawê leza pêşketina wê ya xwezayî be tên pêşwazîkirin, parvekirin û karanîn tê encamdan. Ji aliyê hercore hêz yan jî komekê ve desteserkirina keda hatî mezaxtin, jêderên tên karanîn û nirxên derdikevin holê re derfet nayê dayîn. Di serî de ax, hewa û tav, daristan, bîrên kanzayê û jêderên avê yên xwediyê girîngiyek jiyanîne, herwusa tevayê destkeftên abûriyî-maddî, di karanîn û çavdêrîkirina civakê de ne. Pêdiviyên civakê, nikare bibe binyata(zemin) kû qezenc(kâr) û bazara kapîtaliyane li ser bilind dibe û nikare were şixulandin. Hêza kedê, nikare bikeve rewşa kû xizmetê ji berjiwendiyên kapîtalîstan yên dijberê civak û xwezayê re bike. Abûriya demokratîk-komînal nikare bi herêm yan jî komikekê ve were sinûrdarkirin. Ceribandinek wusa di nava xwe de dikare bibe demokratîk û komînal. Lê ji ber kû dê bibe avaniyek daxistî ya kû xwe ji komikên din dabirayî, di encam de rû bi rû hatina wê li yek ji dû encamên cuda, misogere û nayê revandin. Yan dê weke yek ji pêkhateyên bingehîn yên netew-dewletê kapîtalîst bibe, yan jî dê ji bin biçe û belav bibe. Her kom yan jî netewa li ser bingehê demokratîk xwe di damezirîne, abûriya komînal ji bo komik yan jî netewên din jî pêşbînî dike. Li ser vî bingehî, abûriya demokratîk-komînal; giştgiriya civakî ya kû ji yekîtiya demokratîk û ji diltiya komanan û netewan pêktê, diparêze.

Ti koman yan jî netewek, nikare xwezayê û destkeftên abûriyî-maddî yên di xwezayê de tenê ji bo berjiwendiyên xwe bi karbîne, herwusa nikare wekû samanê xwe bigre dest û wek dixwaze mafê bikaranînê di xwe de bibîne. Bi zanîna kû ev destkeft nirxên tevayê gel, netew û yekîneyên din yên civakî kû di cîhanê de dijîn; di wateya giştî de bi zanîna kû vana nirxên mirovatiyêne, tê tevgerkirin.

Rêgeza demokratîkbûyînê, bi navê civakîtiyê tine jimartina kes; bi navê kesvantiyê(bireysellik) jî belavkirina civakê, kesvantiyê û ez-eztiyê napejirîne. Hevsengiya di navbera civak û kes de, dipesêre bingehê kesê azad-civaka demokratîk. Li gel pêşveçana kes ya xwezayî û ne dijberê civakîbûyînê, pêdiviyên kes jî tên çavdêrîkirin, armanç dike kû bi xwe bibe perçeyek yê civakê. Li vê derê ya girîng, derfet û rê nedayîna ji desthilatdariyê, yekdestdariyê û kesan re ye kû li ser xweza, mirovên din û civakê desthilatdarî û zordariyê saznekin û xusarê nedin. Rêgeza demokratîkbûyînê ya abûriyê, ji aliyê dewletê û desthilatdariya sermaya taybet ve xistina bin dest û zordariya xwe ya civakê an kû kerîkirina wê û tine jimartina kes jî, asteng dike. Ev rewş, li rex azadbûn û bi vîn bûyîna kes, ji pêşxistina

jêhatinên xwe yên kes re jî derfetê dide. Herwusa pêşiya bûyîna wan girseyan tê girtin kû tenê bi êş û kêşeyên debara civakê û beşên civakî ve jî mijûl dibin; derfet, destkeft û jêhatinên wan yên bi qadên din yên jiyanê re mijûl bibin tinene. Bi vî awayî li milekê dema civak, astek ya bikare pêdiviyên xwe pêşwazî bike digre û pîvanên jiyanê wusa bilind dibin; li milê din jî dibe xwediyê dem û derfetên kû bikare çanda xwe ya meinewî pêşbêxe, bikare çalekî û kiryarên xwe yên civakî bi awayek dewlemend berdewam bike.

### ٢. Rêgeza Ekolojîkbûyînê:

*“Her yekîneyek abûriyî, bi zanabûna ekolojîkî dikare bijî. Yekîne û jiyanên abûriyî yên kû xwe napesêrin zanabûna ekolojîk, ji heliyan û jiyanbûna di nav modernîteya kapîtalîstî de nikarin rizgarbibin.” Abdullah.Ocalan – Di Rojhilata Navîn De Qeyrana Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk.*

Bê xweza, hebûna mirov û civakê ne gengaze. Yek ji pesartekên bingehîn yên abûriya demokratîk-komînal, hevsengiya ekolojiyê ye. Di nava tevayetiya gerdûnî de ji ber kû cudatiya biker-berkar(ozne-nesne) nayê kirin, li xweza û derfetên kû ew pêşkêş dike, bi berkarî û heyberî nayê temaşekirin. Mirov û civak nikarin xwe weke bikerên xwediyê mafê mezaxtina jêderên di xwezayê de bi awayê bêsinûr, bêpîvan û bêrêgez, bibînin. Ji ber vê sedemê, jêderên di xwezayê de bi armanca mezaxtinê na, ji bo pêdiviyên xwe yên naçar qasî kû pêwîst dike û bi awayê pêwîst, divê bikarbînin. Lê di serî de jêderên standî û bûyî sedemê kêmbûna wan, herwusa hîn zêdetir tevlêkirina nirx li xwezayê, bingeh tê girtin. Nirxê bilind yê bihostek axê, dilopek avê, libek tov, tenê perçeyek kevir jî kû bi pîvanên maddî nikare were kifşkirin, tê zanîn. Ji xwezayê re nîşakirina hezkirin-rêzdariyek mezin û nirxdayîna wê, bingehê nêzîkatiya ekolojîke. Li xweza û hebûnên di xwezayê de wekû jêderên qezencê destdêxin, nikare were temaşekirin. Ji ber kû çalekî û kiryarên abûriyî hemû dibin çavdêrî û destê civakêdene; zêdehiya hilberandinê, nehevsengiya pêşkêşkirin-xwestinê(arz-talep) bikaranîna jêderan dervey pêwîstiyê, zêhakirina(israf) ked, dem û wizeyê nayê jiyanbûn. Bi vî awayî, bandorên nerênî yên pêvajoya hilberandinê yên li ser sîstema-ekoyê jî, tê daxistina asta herî kêm. Hebûnên abûriyî yên ji bo çalekiya abûriyî destdayî lê ji aliyê dewletê yan jî yekdestên sermaya taybet ve hatine desteserkirin û bê bandorkirin, ji vê rewşê tên derxistin û di çarçuveya abûriya komînal de tên erkdarkirin. Qasî destkeftên tên hilberandin di pêvajoyên abûriyî de di rêbazên tên karanîn de jî xusar nedayîna xweza, civak û tenduristiya mirov, pîvana bingehîne. Di teknîkên hilberandinê de karîna li paşvegerandinî(donuşturulebilirlik) tê bingehgirtin. Ji bo hilberandinê amûr û pêkhateya teknîkî ya kû dê were bi karanîn, di aliyê pêvajoyên hem çêkirin û hem jî bi karanînê de pêwîste li ekolojiyê hevseng be. Kiryar û çalekiyên abûriyî yên ji aliyê civaka kû gihiştî zanabûn û avaniya demokratîk ve tên encamdan, di encamê de bi ekolojî û derdorê re di nav hevsengiyê de ye.

### ٣. Rêgeza Azadîxwaziya Zayendî:

*"… Hem erzane, bêkare, makîneya zarok çêkirinê û bi hezar û yek zoriyan zarok mezinkirinêye, hem jî bê pere û heta tawanbare! Jin, bi dirêjiya dîroka şaristaniyê li tebeqa jêrzemînê ya civakê hatiye bicihkirin. Lê ti civakekê nekariye di hêza pêşxistina îstismarê de be kû kapîtalîzmê ew meşandiye û aniye rewşek pir bi sîstem de. Vê carê jin tenê ne di tebeqa jêrzemînê de bûye, belkû di tevayê tebeqan de heyber û amûra ne wekheviyê, ne azadîxwaziyê, ne demokrasîtiyê ye. Ya xetertir, di tundî û giraniya kû bi ti demê dîrokê re nikare were beramberkirin de, desthilatdariya civaka zayendperest ta lebetên herî veşartî yên mirov mercdar dike û zêde dike, jinê vedigerîne pîşesaziyek ya seksê, cizaretê(işkence) belavê tevayê beşên civakê dike, 'civaka zilam serdest' di serdema şaristaniya kapîtalîst de derdêxe lutkê, weke ji 'ekonomus'ê an kû ji bikera afirênera abûriyê tolê bistîne dijmintiya jinê û abûriyê li her derê û her demê di çespîne!" Abdullah Ocalan-Şaristaniya Kapîtalîst*

Abûriya demokratîk-komînal, li dijî bi metakirina jinê bi xwe, di metakirina civakê de wekû amûr bikaranîna wê, dijî zayendparêziya civakî; herwusa li dijî rol pêdayîna jinê di bingehê zayendparêziya civakî de, di qada abûriyî de têkoşînê dike. Abûriya demokratîk-komînal dipejirîne kû jin afirêner û xwediya rast ya abûriyê ye. Tevayê karên jin li ser bingehê civakî dimeşîne, di heman demê de wekû çalekiya abûriyî dinirxîne. Têkiliya pesartiyê hev jiyana-azad ya di navbera jin û zilam de, encamên herî dewlemend û afirêner di abûriya demokratîk-komînal de derdêxe holê. Di serî de keda dayîkê, keda jinê bi dembûrî û rojanetiya wê ve pîroz dijmêre. Ne bi awayê dîtinbarî û şiklî, belkû bi awayê naverokî û watedarî tevlêbûna jinê ya li abûriyê bingeh digre. Karên di hindirê mal-malbatê de li jinê tên pesartin û her wek encamê karparvekirina civakî ya xwezayî lê tên pejirandin, li ser bingehê kar parvekirina civakî ji nû ve tê rêkûpêk kirin. Li ser vî bingehî, ji kirina tenê malê jinê ya hinek karan re û li ser wê ji metakirina keda jinê re, tenê sinûrdarkirina bi van karan re ji çiq û tevayetiyê qutkirina abûriyê, herwusa ji qutkirina jiyana civakî-çandî-siyasî re derfet nayê dayîn. Qada abûriyî; li gel tevayê pêvajo, têkilî û çalekiyên xwe; ji aliyê jin û zilamê kû yekîtiya wekhevîxwaz, azadîxwaz û bi wate destxistî ve ji nû ve tê damezirandin. (li dijî metakirina bi giştî mirov û bi taybet jinê, têkoşîn esase.)

### ٤. Abûriya Demokratîk-Komînal Çalekiya Komanêye:

*"Abûrî ne pirsgirêkek teknîkî ya avanajêre; çalekiyeke kû wek avana(Yapı) hebûna bingehîn ya civakan bi dîtin, niqaş, biryar û çalekiya rêkxistinî, bi xebitîna tevayê civakê tê pêkanîn. Qutkirina mirov ji abûriyê, bingehê tevayê bi biyanîkirinane. Çawa kû astengkirina vê merce, yekane rêya wê jî bi kirina malê tevayê civatan ya abûriyê re derbaz dibe." Abdullah Ocalan – Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk.*

Abûriya demokratîk-komînal, dûbare ji civakê re dayîna abûriya kû ji dest hatiye standine. Rêveberiya abûriyê; ne wek di kapîtalîzma dewletê de bûyî ji dewletê re, ne jî wek di kapîtalîzma taybet de bûyî ji komek pir biçûk re nikare were hiştin. Abûriya civatekê, komînekê yan jî gel ka dê çawa were damezirandin, dê pesartiyê çi be, çi kar dê werin kirin, ne her çi hêzek ya ji derve, belkû yekîneyên civakî yên mijara gotinê bi xwe dikarin biryar bidin. Ne tenê di hilberînê de, di tevayê pêvajoyên abûriyê de ya kifşker civak bi xwe ye. Lê ji ber kû civak avanek pir berfirehe, ji beşên civakî, komik, komîn, gel û ji gelek yekîneyên din tê holê. Her yek ji vana, abûriya xwe saz dike. Lê çalekiyên abûriyî yên yekîneyek civakî, ger yekîne yan civatên din jî peywendîdar bike, di vê rewşê de hevbeş tevgerkirin merce. Abûriya demokratîk-komînal bi vî aliyê xwe ve jî ji komikên abûriyê yên xweser pêktê.

Di abûriya demokratîk-komînal de, çawa kû komanên abûriyî bi navend girtina wargehên niştecîhbûnê re dikarin werin rêkxistinkirin; bi awayê komên pîşeyî yan jî beşên civakî jî dikarin rêkxistin bibin. Lê ne ji berjiwendiyên hêzên sermaye-desthilatdariyê re, ji civakê re xizmet tê bingeh girtin. Di vê çarçuvê de komanên abûriyî wekû di kapîtalîzma dewletparêz de bûyî eşkere û rasterast; wekû di kapîtalîzma bi zorê yan jî taybet de bûyî dapoşayî û bi zora kû 'hatî pejirandin'; ji aliyê hêzên dervey civakê ve û di rasteka berjiwendiyên wan de nayê rêkûpêk kirin. Her komînek, beşek civakî, civat, gelê herêmê yan jî komek pîşeyî, bi mercê nebe dijberê yên din xwe wekû komana abûriyî rêkdêxe. Abûriya demokratîk-komînal ji ber kû ekolojîk bûyînê û bersiv dayîna pêdawîstiyên bingehîn yên civakê bingeh digre, komanên(topluluk) abûriyî di heman demê de komanên ekolojîkin.

**Parvekirin:** Parvekiriniya(paylaşımcılık) ji komîn û komînalîteyê hêzê digre, rêbaza bingehîn ya dabînkirina pêdawîstiyên abûriyî yên takekes, kom û civatên civakê pêktînine. Lê di milê din de jî bi hêzbûna têkiliyên civakî, yekbûyînê, bi hevre sazkirina jiyanê, çêdike. Di rabûn û nemana takekesitiyê(bireycilik) de jî kû sedem û encama biyanîbûyîna mirov ya li xwe, xwezayê û civakêye; mirov dike gurê mirov bi xwe û ji bo civakê xeteriya herî mezine, rolek kifşker ya parvekiriniyê heye.

Abûriya demokratîk-komînal di aliyê cewherê xwe de, abûriya parvekirinê ye. Li gel vê di civakê de pêşketina çanda parvekirinê çêdike. Bi hêzkirina kevneşopî û giyanê parvekirinê ya kû yek ji taybetiyên bingehîn yên xwezaya civakiye, di qada abûriyî de bingeh girtina parvekirinê, yek ji armancên wê yên bingehîne. Di qada abûriyî de di berpirsyartî, tevlêbûn, biryar girtin, xebitîn, hilberandin, çavdêrîkirin û karanînê de wekû giştî parvekirin tê bingeh girtin. Di parvekirinê de, hevsengiya di navbera pêdawîstiyên kes û yekîneyên komanê pêktînin û pêdawîstiyên hevbeş-giştî yên komanê de, tê parastin. Giranî dayîna yekê û girîng negirtina ya din, nabe. Ji ber kû nirxandina encamên tên destxistin an kû karên abûriyî û parvekirina berheman jî ji ber kû li gora van pîvanan ji aliyê komanê ve tê encamdan û pêkanîn, parvekirin ne pêsartiyê bêdadiyê, belkû di wateya rast de xwe dipesêre wekhevî û rastiyê. Civatek yan jî komînek dema berhemên destxistî bi yên din re parve dike, pêdawîstiyên wan jî weke pêdawîstiyên xwe dibîne. An kû civatek yan jî komînek, rêya ji berhemên destxistî destpêkê pêşwazîkirina pêdawîstiyên xwe û duv re parvekirina beşa mayî li

civat yan jî komînên din, nahilbijêre. Bi hêzbûyîna têkiliyên civakî, bi xwe re pêkhatina parvekirinek xwedî asta kû pêdawîstiyan pêşwazî bike, tîne. Bi karîgerbûyîna çanda parvekirinê, ji bo têkiliyên civakî yên koman û komînan di nav xwe de û bi hev re pêşbikevin, rol û tevlêbûnek mezin pêşkêş dike.

**Piştevanî(dayanışma):** Piştevaniya di serê taybetiyên civakî de tê, ji aliyê hêzên dewletparêz ve bi taybet di modernîteya kapîtalîst de pir zêde hatiye lawazkirin. An kû kapîtalîzm û mînaka wê ya netew-dewlet, qasî kû piştevaniya di civakê de lawaz dike kariye civakê perçebike. Li gel vê, bloqên sermaye-desthilatdariyê dibin navê kiryarên piştevanî-alîkarbûyînê de jî bi sazî û rêbazên weke; weqfên modern, terîqatan, cemaetan, saziyên alîkariyê, krediya-mîkro û rêze xelekên kamiraniyê, gelan û beşên civakî di rêjeyek girîng de bi xwe ve girêdidin. Lê raxmê tevayê êrişan civaka li berxwe dide; hêst, çalekî û çanda piştevaniyê di astek girîng de dikare bide jiyankirin. Sereta di civakên kû çanda çandiniyê tê de bi hêz, di gund, bajarok û heta bajarên kû moderîteya kapîtalîst tê de tam ne desthilat jî, mirov li rastê corên cuda yên piştevaniyê tê. Abûriya demokratîk-komînal, hîn zêdetir bi hêzkirina piştevaniya ji xwe di civakê de heyî, armanç dike. Piştevanî, bi raman û têgihiştina alîkarbûyînê û alîkarî kirinê nikare were girtina dest. Têgeha alîkariyê, têgehek ji şixulandinê re pir vekiriye. Ji ber kû têkiliya di navbera alîkarvan û alîkarîgir de her demê dibetiya(olasılık) vegerîna li têkiliya beg(efendî)-kole hildigre. Ji ber vê sedemê alîkarbûyîn na, piştevanî tê bingeh girtin. Piştevanî bi nêzîkatiya oryantalîst jî nikare were destgirtin; derfet nikare were dayîn kû kesek, komek yan jî komanek hêst û kevneşopiya piştevaniyê, wekû amûra biçûkxistin û girêdana bi xwe ve ya kesek din kû mexdûre û di dabinkirina pêdawîstiyên xwe de zorê dikêşîne, bikarbîne. Piştevanî, yek ji berpirsyartiyên bingehîn yên mirov ya li beramber xwe, kesên din û civakê ye. Piştevanî çawa kû ji bê berhemtiyê re zemîn nade, herwusa bi têgîna le bendê mayîna berambertiyê jî nabe. Her dû nêzîkatî jî şixulandina piştevaniyêne. Piştevaniya di abûriya komanê de, xwe dipesêre bihêzbûna giyan, bawerî û zanîna civatê, herwusa xwe dipesêre tamgirtina ji jiyana civakê, hilberandinê, parvekirinê û dayînê.

**Wekhevîxwazî(Eşitlikçilik):** Wekhevîxwaziya di jiyana komînê de, tê derbazkirina abûriya komînal jî. Wekheviya di abûriya komînal de, wekheviya şêweyî û rast(duz) nîne. An kû nêzîkatiyên mîna; “herkes, heman karî di heman rêjeyê de bike û di heman rêjeyê de par bistîne” yan jî “ji herkesê re qasî kû xebitiye” red dike. Xwesertiyên mîna; zayend, temen, taybetiyên qelafetî(fîzîksel), jêhatin, çand tên berçav girtin. Lê ev cudatiyane, di tevlêbûna hilberandina abûriyî û parvekirinê de, li dijî kesên din û civakê nikare were bikaranîn. Li gel vê, cudatiyên di van mijaran de nikarin werin kirina hêceta hîn kêmtir tevlêbûn û hîn kêmtir parvekirinê jî. Çawa kû destûr nayê dayîn cudatiyên abûriyî, civakî û çandî, di civakê de rê li ber çînbûyîn û perçebûnê veke, herwusa cudatiyên mîna; dewlemendî-xizantî, koletî-begtî, serdestî-jêrdestiyên kû bi xwezaya civakî re naguncên jî nikarin werin pejirandin. Di têgihiştina wekhevîxwaziyê ya abûriya demokratîk-komînal de, li gel wekheviya huqûqî ya xapînok ya paradîgmaya dewletparêz, ji zayendperestiyê re jî cih tineye. Tevayê

endamên civakê yên di rewşa karîna xebitînê de ne, di rêjeya hêz û jêhatinên xwe de tevlê çalekiyên abûriyî dibin. Ji encam û berhemên hatîn destxistin jî tişta pêwîstbe digrin. Lê li vê derê hevsengiya di navbera pêwîstiyên civakî û yên takekes yan jî komek ya di nav civakê de, tê parastin. Wekû di modernîteya kapîtalîst de bûyî, taybetiyên mîna jêhatin, hêjayî, pîşe û pisportî wekû sermaye û amûra desthilatdariyê nikare werin bikaranîn. Çawa hinek jêhatin ji dayîkbûnê tên; hinek jêhatin jî duv re dikarin werin qezençkirin yan jî pêşxistin. Li gel qezençkirina jêhatin û bikêriyê, di mijara pêşxistina wê de jî ji herkesê derfetên wekhev tên naskirin. Dîsa, beşên pîşe û pisportiyê yên di komanekê de heyî, li gora pêwîstiyê ji aliyê civakê ve ji nû ve tê rêkûpêk kirin, sîstema li ser ne wekhevîtiyê sazkirî, di milê wekhevîtiyê de tê veguherandin. Zarok, ewên nerehetiyên wan yên giran-qelafetî(fiziksel) heyîn û kal, ji ber sedemên ji dervey vîna(irade) xwe, bêguman nikarin tevlê çalekiyên abûriyî bibin. Lê ji ber vê sedemê jî ji destkeftên abûriyî nikarin werin bêpar hiştin û di jiyanê de werin derkirin. Pêdawîstiyên van koman, li gora pîvanên ji aliyê komana ew bi xwe jî endamên wê yên wekhevin ve hatî destnîşankirin, tê pêşwazîkirin. Qasî di hindirê komanekê de heyî; di hindirê koman, herêman û komînan de jî têgihiştinek ya wekheviyê kû hev temamdike, tê bingeh girtin. Têgihiştinek ya wekhevîtiyê kû tê de li gel cudatî û xwesertiyên xwezayî, fedakariyê jî berçav digre, tê bingeh girtin. Wekhevîtiya di abûriya demokratîk-komînal de, di qadên din yên civakî de jî, xizmetê ji damezirandina wekhevîtiya di wateya rast de, dike.

**Azadîxwazî(ozgurlukçuluk):** Di abûriya demokratîk-komînal de, azadbûyîna di qada abûriyî û qadên din yên civakî de; di heman demê de bi azadiyên abûriyî yên takekes û civakê re di nav tevayetiyekê de tê destgirtin. Civaka kû li ser abûriyê xwediyê venêrînek(denetim) rasterast û tame, hem dê bikare bi awayek azad qada xwe ya abûriyî sazbike û rêvebibe, hem jî dê derfet û rê nede kû dewlet û yekdestdarên sermaya taybet, li ser abûriyê re wê bişixulînin, bimêjin û destkeftên wê yên abûriyî talanbikin. Wekû di mînaka dewletperestiyê yan jî modernîteya kapîtalîst de bûyî, ji ber kû çalekiyên abûriyî weke bar, suxre(angarya-karkirina belaş), yan jî ji bo debara xwe karên naçarî tên kirin û piranî nayên ecibandin û hilbijartin, dîsa ji ber kû weke karên bi zorê û ne bi hezkirin tên encamdan nikarin werin destgirtin; derfetê peşkeftina xwezayî-azad ya takekesan derdikeve holê. Di abûriya demokratîk-komînal de civak û takekesên wê, çalekiyên abûriyî yên encam didin, dizanin bi çi armancê, arezûyê û li ser bingehê pêşwazîkirina kîjan pêdawîstiyan dimeşînin. Li gora kû azadî tenê bi jiyana hişdar(bilinçli) û çalekiyê gengaze; abûriya demokratîk-komînala kû cewherê wê li ser bingehê hişdarî û bi rêkxistiniyê damezirandina qada abûriya xwe ya civakê ye, di heman demê de li ser qada abûriyî re pêkhatina azadbûna civakê ye.

### f. Di Abûriya Demokratîk-Komînal de Nêzîkatiya Li Bûyer û Çalekiyên Bingehîn

#### ١. Di Abûriya Demokratîk-Komînal de Têgihiştina Hilberandinê:

Bersiva kû ji pirsa ‘çawa were jiyanbûn’ re bêt dayîn, di heman demê de bersiva ji têgihiştina ‘hilberandinek çawa’ re were dayîn jî, kifş dike. Li ser vî bingehî, di çarçuveya pîvan û paradîgmaya kû abûriya demokratîk-komînal bingeh digre de, di civakê de bicihkirina çandek ya hilberandin û bikaranîna abûriya demokratîk-komînal armanç dike. Di abûriya demokratîk-komînal de ji bo tevayê çalekiyên hilberandinê, pîvana bingehîn ya kû naçare bê rê pêdan û tam were pêkanîn, ji pêdawîstiyên sereke yên civakê re bersiv dayîn û guncana bi ekolojiyê re ye. Komîn û koman(topluluk), ka pêdawîstiyên wan yên rast çine û dê çawa werin pêşwazîkirin, rasterast ew bi xwe kifşdikin. Bi vî awayî, li milekê hilberandin û mezaxtina ji pêwîstiyê zêdetir, zêhakirin(israf) û qelewî(obezîte); li milê din ne hevsengiyên mîna xizanî, betalî, ji birsan ketin, nayên jiyanbûn. Civak nikare bi awayê biker-berkar(ozne-nesne) yan jî hilberêner-mezêxer(uretici-tuketici) were perçekirin û nikare wekû girseya(yıgın) takekesên bê giyan kû ji vana pêktên were dîtin. Li gora rastiya bikerbûyîna her yek ji tevayê endamên civakê û tevayê hebûnên di xwezayê de kû xwesertiyên wan bi xwe hene, tê tevgerkirin. Bi têgehên wek; kiriyar(muşterî), li xwegirtiyê(mukellef) bacê, mezêxer û karker kû rewşa tiştbûyînê û ji mirovtiyê derketinê îfade dike, civak û takekesên wê nikarin werin pênasekirin.

Li xwezayê û dewlemendiyên wê, wekû jêderên pêwîste werin talankirin nikare were nêrîn. Derfetên abûriyî yên di xwezayê de, bi mercê kû bibe bersiva pêdawîstiyên civakî, di asta herî guncaw(optimal) de tê nirxandin. Lê civak dema pêdawîstiyên xwe û rêbazên bi destxistina vana kifşdike, li gora hêza veşartî(potansiyel), bikêrî û têrîtiya jêderên xwezayî, tevdigere.

Tevayê beş, yekîne û pêkhateyên civakê sazdikin, wekû tevayetiya yek ya din temam dike, tê nirxandin. Her yek yekîneya civakî yan jî herêm, qasî kû têra xwe heye temamkirina yên din û tevayetiyê bingeh digre. Bi vî awayî, derfet ji ne hevsengiyên hilberandin û bikaranînê yên di navbera komanan û herêman de re, nayê dayîn. Di abûriya demokratîk-komînal de gund û bajêr, bi awayê guncawê cehwerên xwe ji nû ve tên danasandin. Li ser vî bingehî, di wateya hilberandina abûriyî de jî rewşa bûyîna mêtingehiya bajêr ya gund, ji holê tê rakirin, hevsengiyek gund-bajêr ya guncawê xwezaya yekem û xwezaya civakî, tê sazkirin. Gund û bajêr, tevayetiyekê pêktînin kû di mijara hilberîna abûrî û bikaranînê de hebûna hevdû dikin merc û temam dikin.

Abûriya demokratîk-komînal, di rastiyê de abûriyek ya hilberandinêye; di civakê de dema li şûna mezaxtiniyê(tuketicilik) çanda bikaranînê ji nû ve tê rêkûpêk kirin, ne ji mezaxtinê re belkû ji çalekiyên abûriyî yên derbarê hilberandinê re pêşî tê dayîn.

Di nava dem û cihê kû mirov û civak li nav cih digrin de pêdawîstiyên wan yên derdikevin holê jî bi tevayî nikarin hilberandinê destnîşan bikin. Bi hişê kû tiştên em derxin holê û hilberînin, dê ji kesên piştî me re wekû mîrat bimîne, tê tevgerkirin. Li gel vê pêdawîstiyên maddî, tenê wekû destkeftên rasterast tên mezaxtin nikare were destgirtin. Di vê çarçuvê de; derbazkirina xusarên kû li ser xwezayê pêkhatîn; bi

daristankirin, parastina lawirên kû nijadê wan tinedibe, hişk kirina qadên hez(bataklık), li çandiniyê vegerandina xakan, parastina jêderên avê û bi awayê kû bersiva pêdawîstiyên civakî bide, ji nû ve rêkûpêk kirina bikaranîna wan û gelek çalekiyên din, wekû çalekiyên abûriyî yên herî bi nirx tên dîtin û tên pêşxistin.

Di abûriya komînal de çalekiyên hilberandinê di nav tevayetiyekê de tên encamdan. Hem di nava her çi beşek hilberandinê bi xwe de, hem jî di navbera tevayê çiqên hilberandinê de, yekbûyîn û hev temamkirinî bingeh tê girtin. Bi vî awayî her yek çiqek yê hilberandinê û rêkxistina civakê ya di hindirê xwe de, tê bihêzkirin. Awayê jiyana hevbeş ya pesartiyê qada abûriyî, di qadên din yên civakê de jî dikare were encamdan. Tevdebûyîn(butunsellik) çawa kû zêhakirina(israf) ked, nirx, wize û jêderên xwezayî asteng dike, heman demê de besbûyîniya(yeterlilik) di aliyê başbûn, tenduristbûn, cor bi corbûn, bikêrbûn û xweşikbûna berheman de jî pêktîne.

### ٢. Di Abûriya Komînal de Nêzîkatiya Li Nirx û Kedê:

*“Ez ji karîna pîvana nirxên civakî (vê navberê de mal û sermaye jî di nav de) bi gumanim. Ne tenê keda zindî, belkû jimartina nirxê keda kesekê ya heybera kû berhemê kedên jimartina wan ne gengaze xeletiye, nêzîkatiyek ya desteserkirina nirx û vekirina pêşiya diziyêye.” Abdullah Ocalan-ŞARISTANÎ-Serdema Xudayên Bi Maske û Paşayên Dapoşayî-*

Gihiştina avaniyê ya zîhniyetê; hîs, hêst û raman, bi saya kedê çêdibe. Jiyan, hebûn û civak, çawa kû ked nebe pêknayê, berdewamkirina wan jî girêdayê li gor çi, bi çi armancê û çawa nirxandina kedêye.

Têkiliya di navbera ked-nirx de pesartina li pere, di cewher de tê wateya înkara herdûyan û di dawiyê de rê li ber tinebûna xweza û civakê vedike. Li ser vî bingehî, abûriya demokratîk-komînal, beramber pere firotina kedê wekû; hevparbûna li mêtin û talanê, firotina keramet, azadî û hêjayiya mirovbûyînê jî dibîne. Çawa kû tevayê nirxên çanda maddî-meinewî ya mirovatiyê afirandî encama keda wê ye, ev afirandin jî bi saya kedên mezin kariye ta roja me were. Di abûriya demokratîk-komînal de ked pîroze û nirxê tişta pîroz jî bi pere yan jî  her çi pîvanek ya maddî, nikare were destnîşankirin. Keda dayîkê, wekû keda herî pîroz tê dîtin; gotina “mafê dayîkê nikare were dayîn” bi awayê; “mafê dayîkê qasî bi maddiyetê nekare were pîvan, mezine” şirove dike û bi rêzdarî nêzîkatî li vê pîroztiyê dike. Di abûriya demokratîk-komînal de li gel kedê bi xwe, xizmetkirina wê ji çi re û çawa jî girîngiyek kifşker diyar dike. Asta bûyîna hilberîner, afirêner, bi zanist, giştîker û bersivbûyîna ji pêdawîstiyên civakî re, bingeh digre. Keda kû tenê nirxê maddî di afirîne yan jî tenê keda qelafetî(fiziki) wekû ked nabîne. Qasî kû xizmetê ji civakê re bike û rêzê nîşanî xwezayê bide, tevayê corên kedê binirx dibîne. Ji ber, takekes bi civaka kû endamê wê ye re dikare hebûna xwe ya qelafetî û watedarî berdewam bike, keda takekes bi keda civakî re digre dest.

Ji ber kû di abûriya demokratîk-komînal de keda bi zanist, hilberîner, afirêner û civakî tê bingeh girtin, ji karkertî û karker kirinê re cih tineye. Li dijî nêzîkatiyên karker kirin û bêkarkirinê yên hêzên sermaye-desthilatdar, têkoşîna bi bandor tê rêvebirin.

Civak û takekesên wê, ji ber kû ji xwe re dixebitin û di hilberînin, ji ber kû keda xwe ji bo pêşwazîkirina pêdawîstiyên xwe dimezêxin, ne karkerbûyîn di wateya rast de kedkarî tê bingeh girtin. Tevayê endamên civakê yên di rewşa xebitînê de ne, li ser bingehê xwesertiyên xwe û pêdawîstiyên civakî tevlê çalekiyan dibin. Ji berdewamkirina jiyanê û civakîbûyînê tevayê kiryarên kû jin encamdide, wekû xebata abûriyî tê nirxandin. Çawa kû li dijî mêtina keda zarokan, dijî xebitandina wan ya bi awayê kû pêşveçûna qelafetiya xwezayî ya wan were astengkirin, têkoşîn tê meşandin; herwusa karên zarok li mal, di zeviyan de yan jî li cihên din bê kû destheq bistînin dikin jî, wekû xebitîna abûriyî tê dîtin. Ne tenê ya beramber destheq tê encamdan û wekû berçav xizmet û berhemek abûriyî derdêxe holê, belkû tevayê kiryar û çalekiyên ji bo pêşwazîkirina pêdawîstiyên bingehîn yên civakê, wekû xebitîna abûriyî tê nirxandin. Di vê çarçuvê de ji nû ve bi rêkûpêkirina qada abûriyî re, di serî de qadên çandinî û ekolojîk; bi sazkirina gelek qadên xebitînê yên nû re tê armançkirin kû pêşiya bêkariyê were girtin û jêderên abûriyî werin zêdekirin. Di vê çarçuvê de xebitîn wekû çalekiya; bi tam, bi coş û bi hezkirin tê encamdan ya kû rê li ber hilberandin, afirandin, xweşik kirin, di wateya maddî-meinewî de dewlemendbûn û azadbûnê vedike, tê destgirtin.

Di rastiyê de, hêz û kombûnên abûriyê yên kû encama hewldanên bi milyaran sal ya di xwezayê de pêkhatiye û afirînekên(yaratımlar) abûriyî yên kû encama keda sedhezaran sal ya civakêye, bi pîvanên maddî yan jî bîrkariyî nikarin werin hesapkirin. Bibe-bibe tenê dikare nirxdayînek dîtinbarî pêkwere. Di abûriya demokratîk-komînal de ne nirxê guhertinê; li gora pêşwazîkirina pêdawîstiyên civakê û nirxê bikaranînê yê ji aliyê civakê ve tê destnîşankirin, tê bingeh girtin. Bi mercê kû civakî bibe, tevayê çalekiyên abûriyî, binirxin. Lê di serî de qadên tîmarbûn, vehewîn(barınma) û tendirustiyê; pêşikî ji çalekiyên abûriyî re tê dayîn kû ji bo dabinkirina pêdawîstiyên bingehînin.

### ٣. Di Abûriya Komînal de Nêzîkatiya Li Xawendarêtiyê-Xwedîtiyê(mulkiyet):

*“Modernîteya demokratîk, xawendarêtiya li ser bingehê komana kû bi dirêjiya dîrokê hebûna xwe ya komînal ti demekê ji dest nedayî, di derfetên modêrn de ji nû ve bi cihkirina wê li bingehê civaka exlaqî û polîtîk, di wê rewşê de ye kû bikare rola xwe ya dîrokî di vê mijarê de jî bi serkeftî bileyîze.” -Abdullah Ocalan- Di Rojhilata Navîn de Qeyrana Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk*

Ti amûrek yê hilberînê, berhemê abûriyî yan jî çalekiyek, ne tenê encama ked û hewldana kesekê yan jî komekêye. Her çi amûrek yê hilberînê yan jî berhemek kû derbazê xawendarêtiya kesekê yan jî komekê dibe, ji ber kû ji kiryara civakî tê qutkirin, bikêriya xwe û bi berhemtiya xwe jî ji dest dide. Xawendarêtiya kesî yan jî komî, hem pêşwazîkirina pêdawîstiyên civakî û bi berhemtiya wan asteng dike, hem jî rê li ber hilberandin û mezaxtina pir zêde vedike. Ji ber van sedeman jî desteserkirin û xawendarêtiya kesî ya wek dizî hatiye bi têgehkirin, ne rewaye û nêzîkatiyek dijberê rewişt, civak û xwezayê ye.

Di abûriya demokratîk-komînal de, hem xawendarêtiya kesî ya zêde kû dijberê civak û xwezayê ye, hem jî xawendarêtiya dewletparêz ya dibin navê xawendarêtiya pevrayî(kolektif) yan jî ya gel de, tên redkirin. Ji ber kû di her dû awayan de jî, dibin navê xawendarêtiyê de dest tê danîna ser nirxên civakî; li ser nirx û amûrên hilberînê yên kû tên desteser kirin, venêrîna(denetim) civakê ji holê tê rakirin. Ji ber van sedeman ne xawendarêtî, belkû bikaranîna civakî û mafê xebitandinê tê bingeh girtin. Pêdawîstiyên bingehîn yên wek; zat û qut, xanî û cilûberg yên kes û malbatê, bêgumane kû divê di destê wan bi xwe de be. Lê di destxistina vana de, pîvanên bingehîn yên weke; nekaranîna rêbazên dijî civak û xwezayê, desteser nekirina keda ti kesên din û ji pêdawîstiya rast wêdetir nebûyîn, tê bingeh girtin.

Civat û komîn, bikaranîna amûrên hilberandinê bi xwe rêkûpêk dikin. Lê li vê derê bi berhemtî û sudvantiya civakî tê berçav girtin. Ti civat yan jî komînek, li ser nirxên abûriyî û amûrên hilberandinê yên kû afirînekên(yaratım) keda civakîne, mafê xebitandin û karpêkirinê nikare bigre bin yekdesta xwe. Parvekirina nirxên abûriyî û amûrên hilberandinê, li ser bingehê abûriya demokratîk-komînal ji nû ve rêkûpêk kirina sîstema şixulandin û karanînê, nayê revandin.

### ٤. Têgihiştina Bazarê Ya Abûriya Komînal:

Bazar, cewherê xwe hebûnek civakiye, xizmetê ji pêşveçûna çalekiyên abûriyî re dike. Bazar, li gel têkiliyên abûriyî di pêşveçûna têkiliyên ramanî, çandî û civakî de jî rolek pir girîng leyîstiye. Lê hêzên dewletparêz bazar jî, di rasteka berjiwendiyên xwe de rêkûpêk kirine; ew anîne rewşa yek ji amûrên herî girîng ya tinekirina civakê û abûriyê.

Di abûriya demokratîk-komînal de, derfet ji bazara pesartiyê qezenca yekdestdar, spekulasyonê û ne wekheviyê re nayê naskirin. Bazar, ne kifşkera çalekiyên abûriyî, belkû yek ji encamên wê ye. Ne ji aliyê hêzên dewlet-sermayê ve; li gel tevayê derfetên wê, ji aliyê koman û komînan ve tê damezirandin. Li rex vê, her çi kom yan jî herêmek, dema bazara xwe sazdike bi tena serê xwe nikare wan biryaran bigre kû koman yan jî herêmên din peywendîdar dike û nikare derbazê jiyanê bike. Bazar, kê û kîjan herêmê bigre nav xwe, ji aliyê wan ve bi awayek hevpar tê damezirandin. Di sazkirina bazarê de ji têgihiştinên pir zêde xwecihî(yerellik), navendperest(merkeziyetçi) û ji têgihiştinên gerdûnwarî yên xwecihiyê qut re cih nayê dayîn.

Di wateya rast de, pevrayîbûn(kolektif), komînalbûn û demokratîkbûna bazarê tê bingeh girtin. Bazarên wê yên li ser binaxeya azadîxwaz ya abûriya demokratîk-komînal tên sazkirin, hem di çalekiyên abûriyî de û hem jî di qadên din yên civakî de, ji cih û têkiliyên di wateya rast de parvekirinê, piştevaniyê, birabûyînê û ji dewlemendiya çanda meinewî-maddî, pêktên. Komîn, kooperatîf û wargehên niştecihbûnê yên cuda; di navbera herêm yan jî qelzûman de bazar, dikarin werin sazkirin.

### ٥. Di Abûriya Komînal De Nêzîkatiya Li Pere:

Tê gotin kû pere weke amûrek ya asankirina jiyana civakî hatiye dahênandin(icat). Lê ya rastî, hem nirxê guhertinê yê kû bingehê pereye û hem jî dema taybet em li derketina holê ya wê dinêrin; nerastbûna vê dîtinê derdikeve holê. Bitaybet jî dema were fikirîn di moderníteya kapîtalîst de pere anîna rewşek ya hêzê kû hema bêje maddî-meinewî fermanê li hertiştî dike; ji sudmendbûnê hîn zêdetir hebûna xusara pere, dê were fêmkirin. Civaka kû baş dizane pere di rastiyê de çiye, wî pereyî bi biwêja(ozdeyiş) gel ya; "ger namusa pere hebûya, ma dest bi dest dê bigerabûya?" danasandiye. Pere, rê li ber 'li şûna nirxê bikaranînê, bi cihkirina nirxê guhertinê' vedike. Li gel vê, di heyberkirin û malkirina(metalaştırma) tevayê hebûn, mirov, civak, ked, berhemên di xwezayê de; an kû wek tevayetiyekê tiştkirina(nesneleştirme) nirxên çandî yên maddî-meinewî de jî hêza kû xwediyê rolek herî mezine.

Abûriya demokratîk-komînal, di mijara pere de jî naçare çareseriyê hilberîne. Di bawerî û bi biryariya bihûrandina (derbazkirina) têgîna heqîqeta hatî lêkşêwandin(çarpıtma) de bûyîn kû li ser 'abûrî û jiyanek pere tê de tine, ne gengaze' sazbûyî, pêngava yekeme. Bê kû pere hebe pêkhatina beşa ji sedan not û heştê pêvajoya civakî û bi tevaya vî demê dirêj bi pirsgirêkên abûriyî yên micid re rû bi rû nehatin, nîşan dide kû ev armanç ne xeyale; belkû hatiye gihiştin û dikare were gihiştina wê. Ji xwe li milê din, di roja me de jî di beşek girîng ya qada abûriyê de pere bê bandore.

Jêdera serdestiya pere li ser civak û abûriyê ewe kû abûrî dibin desthilatdariya hêzên ji dervey civak û abûriyê de ye. Di vê çarçuvê de, abûriya demokratîk-komînal bi xwe, di heman demê de her çiqas pere bi naçarî tê de were karanîn jî sîstemek abûriyî ya tam dibin venêrîna(denetim) civakê de ye kû pere tê de ne desthilate. Herwusa polîtîka û tedbîrên kû bikaranîna pere dabêxe asta herî jêr, tên derbazkirina jiyanê. Li ser vî bingehî, li şûna nirxê guherînê û bazara kapîtalîstî bingeh girtina parvekirinê û nirxê bikaranînê; di piraniya beşên çalekî û têkiliyên abûriyî de dawî lê anîna bikaranîna pere, herwusa derxistina ji bûyîna jêderên qezenç û komkirina sermayê ya qadên bingehîn yên weke; tîmarbûn, tenduristî, vehewîn, çand-huner û mîna vana standina gelek tedbîrên din yên polîtîk-pratîk, di girîngiyek jiyanî de ye. Li şûna bazirganî kirina dibin navê "sektora xizmetê" de ya nirx û têkiliyên civakî, awayê jiyana komînal ji nû ve tê berfirehkirin û belavkirin. Li gel vê, di qadên mîna gihandin û ragihandinê de ji kooperatîfbûyînê re giranî tê dayîn. Bi tedbîrên tên zanîn yên li gora dem-cih û şertûmercan dikarin werin guhertin, ji aliyekê ve dema venêrîna pere ya li ser abûrî û civakê ji holê tê rakirin, ji aliyê din ve bawerî û zanista gengazbûyîna cîhan û jiyanek bê pere, tê bihêzkirin.

### ٦. Di Abûriya Komînal De Nêzîkatiya Li Teknolojiyê:

*"Pêwîste mirov yekîneyên jîngeyî(ekolojik)-abûriyî(ekonomik) wekû yekîneyên ji rêzê û ji teknolojiyê bêpar nehizire. Dema pêwîst bike, teknolojiyên herî tevilhev û pêşketî jî di yeke û yekîneyên jîngeyî-abûriyî de dikare werin bikaranîn. Heta yekîneyên jîngeyî-abûriyî, yekîneyên teknolojiyê yên herî guncaw û di cihdene.*

*Qadên herî bi sud yên bikaranîna civakî ya teknolojiyê ne." Abdullah Ocalan-Di Rojhilata Navîn De Qeyrana Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk.*

Têknolojiya ji yekîtiya zanist û rêbazê çêdibe, encama ceribandinên mirovahiyê ya pesartiyê bi milyonan sale, xizmetê ji hîn baştir û hîn xweşiktirbûyîna jiyanê re dike. Lê teknolojiya derbazê bin venêrîn û çavdêriya hêzên şaristaniya dewletparêz bûyî, ne civakî belkû wek amûrek dij civakê hatiye bikaranîn. Bi kapîtalîzmê re, ji zanistê, ji jiyan û abûriya civakî hatiye qutkirin; hatiye êxistina rewşa yek ji amûrên herî bi bandor yên bi temamî xizmetê ji danheva(birikim) qezenç-sermayê, tinekirina xwezayê û ez-eztiyê re dike.

Abûriya demokratîk-komînal, li ser bingehê pêşwazîkirina pêdawîstiyên civakî û parastina jîngeyê, armanç dike kû teknolojiyê ji nû ve rêkûpêk bike. Li ser vî bingehî teknolojî, ji bûyîna amûra bêkêr kirin û takekesî kirina mirov, bêkarkirina kedkar, kerîkirina civakê û tinekirin-mezaxtina xwezayê, tê derxistin. Tê dabinkirin û rê tê dayîn kû bibe qadek ya pêdawîstiyên bingehîn yên civakê pêşwazî bike, di hilberandinê de bi berhemtiyê çêke, jêhatin û afirênertiya kes û civakê pêşbêxe, azadbike, hîn baştir û xweşiktir bûyîna jiyanê sazbike, herwusa bibe qadek kû xizmetê ji parastin û dewlemend bûyîna xwezayê re bike. Rêbaz, armanç, pêşikî(oncelik) û qadên bikaranînê yên teknolojiyê jî ji nû ve tên rêkûpêk kirin. Li ser vî bingehî teknolojî, bi pêşwazîkirina pêdawîstiyên bingehîn yên civakê re yên wek; tîmarbûn, vehewîn, tenduristî, perwerdê û gihandinê(ulaşım), armanç dike kû ruxandinên di xwezayê de werin derbazkirin. Di van qadan de ji karanîna teknolojiyê re, pêşikî û giranî tê dayîn.

### ٧. Di Abûriya Demokratîk-Komînal De Nêzîkatiya Li Pîşesaziyê(Endustri):

*"Avana jêr ya teknîkî ya modernîteya demokratîk naçare jîngeyî bibe. Abûriya jîngeyî ya komînal kû bêy bikeve nav ne pîşesaziyê û ne jî dij-pîşesaziyê de bikare were pêşxistin, dê bibe pêkhênera giştîker û qahîm ya modernîteya demokratîk û jiyana netewî ya demokratîk." Abdullah Ocalan-Di Rojhilata Navîn De Qeyrana Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk.*

Pîşesazî, di wateya giştî de bi desteka zanistê û amûr-amrazên teknîkî, bi karanîna hîn kêmtir jêder, wize û hêza kar; lê hîn leztir, qahîm û jimarek zêde de afirandin û çêkirina hilberandina maddî ye.

Hilberandina pîşesaziyî ya derbazê destê hêzên dewletparêz bûyî, ji destpêka çanda El-Ubeyd ta roja me, wekû destkeftek hêzê ya dijî civak, xweza û abûriyê hatiye bikaranîn. Lê anîna rewşa amûra tinekirina civak û abûriyê ya wê, bi rastî di modernîteya kapîtalîst de çêdibe. Zanistvantiya pozîtîf, yekîtiya sermayeya netew-dewlet û kapîtalîstî, hilberandina pîşesaziyane(endustriyel) dêxe rewşa pîşesazîtiyê(endustriyalizm) de.

Abûriya demokratîk-komînal, dema kû li aliyekê dijî pîşesazîtiyê û rûxandinên rê li ber vekirî têkoşînê dide, li milê din jî hilberandina pîşesaziyane ji nû ve rêkûpêk dike. Bi tenê ger hilberandina pîşesaziyane, bi temamî û rasterast dibin venêrana civakê de bibe, wê demê dikare di wateya rast de alîkariyê ji pêşketina civakê û abûriya wê re pêşkêş bike. Wekû jimarî û cewherî(nicelik-nitelik) di astek têr de pêkanîna pêdawîstiyên civakê; û dema vê dike jî naçare têkiliya di navbera civak û xwezayê de, tevayetiya jîngeyî û hevsengiyê, parastina xwezayê û hebûnên di xwezayê de, bingeh bigre. Hilberandina pîşesaziyane, tenê nayê wateya hilberandina pîşesaziyî(sanayi). Li gora rastiya xizmet kirina ji civakê re ya tevayê beşên hilberandinê, li ser bingehê xwesertiyên xwe û bi awayê kû tevayetiyek hev temamker sazbikin, tê tevgerkirin.

Hilberîna pîşesaziyane ya kû di abûriya demokratîk-komînal de; nayê wateya tine jimartina keda mirov, mezaxtina hilberandinê û jêderên xwezayî. Berûvajiyê wê hilberîna pîşesaziyane; wekû keda takekesî û civakî, hîn zêdetir afirêner, hilberîner û azad bûyîna keda mirov; nekû tinekirina qadên kar, belkû zêdekirina qadên kar yên pêwîst, ji berî hertiştî pêwîst dibîne. Di hilberîna pîşesaziyane de, ji teknîkên hilberîna şûnde vegerînê re giranî tê dayîn. Dema kû ji kargeh û teknolojiyên dijî jîngehê re cih nayê dayîn; yên dostê jîngehê tên bingeh girtin.

### ٨. Nêzîkatiya Li Pêşketin û Pêşveçûna Abûriyî:

Ji aliyê yekdestên sermayê û desthilatdariyê ve talana jêderên xwezayî û tinekirina xwezayê, bi desteserkirina derfetên abûriyî re vegerandina civakê li girseya koleyên karker-bi pere û girseya bêkaran, destxistina qezencên ji komkirina destkeftên bi dirêjiya dîroka bi dewlet hatî destxistin hîn zêdetir; wekû peşketin, mezinbûn û pêşveçûna abûriyî tê nîşandan û mîna heqîqeta rewa, bi maf û yekane li ser civakê tê zalkirin.

Abûriya demokratîk-komînal; pêşketina demokratîk, jîngeyî, dikare were domkirin, giştîker û ya kû di sudê tevayê civakan de ye, bingeh digre. Nêzîkatî û têgînên weke; nexweşiya modernîzmê, pir zêde takekesvantî(bireycilik) û mezaxtina serçaweyên xwezayî kû jêdera xwe ji post-modernîtê û oryantalîzmê digre, homojen an kû yek kirina xwezayê, civakê, çandan û girtina wan ya jêr desthilatiya yekdestdar de, wekû pêşkeftin, mezinbûn û pêşveçûna abûriyî nikare were pejirandin. “Pêşketin û pêşveçûna abûriyî” ya kû xizmetê ji civakê re nake, tê wateya kû ji yekdestên sermaye û desthilatdariyê re xizmetê dike. Civak, qasî kû di astek têr de û bi awayê dijberê jîngeyê nebe, pêdawîstiyên xwe yên di tevayê qadên jiyanî de derdikevin holê bikare pêşwazî û dabinbike, di wateya rast de ew qas dikare qala pêşkeftin û pêşveçûna abûriyî were kirin. Pêşkeftin û pêşveçûna abûriyî, civakî û çandî wekû tevayetiyek tê girtina dest û her yek di rewşa bi bandoriya beramber hev de ye kû yek ya din temam dike. Pêşkeftin û pêşveçûna abûriyî naçare xwe bipesêre bingehên demokratîk û komînal, herwusa naçare taybetiyên civaka exlaqî-polîtîk bi hêz bike. Di vê çarçuvê de, pêşkeftin û peşveçûn bi komanekê, herêmekê, komîn yan jî civakekê ve sinûrdar nayê girtin, ji ber kû ji bo tevayê civakê tê pêşbînîkirin. Ji cudatiyên

pêşkeftin û pêşveçûna abûriyî ya di navbera civatan, komînan û herêman de rê li ber bê dadî, ne wekhevî, zordarî û pêgiriyê(bagımlı) vedike re, derfet nayê naskirin.

### ٩. Di Abûriya Komînal De Nêzîkatiya Li Bazirganiyê:

Abûriya demokratîk-komînal, di wateyekê de civaka ji xwe re têrê bike, armanç dike. Ji xwe re têrê kirin, ne abûriya perçeyî û daxistî; berûvajiyê wê, pêşkeftîbûyîna têkiliyên abûriyî yên di navbera komanan û komînan de pêwîst dike.

Di abûriya demokratîk-komînal de, bazirganî weke bingehê qezenca(kâr) kapîtalîstî nayê destgirtin. Bazirganî, ne ya kû abûriyê kifşdike ye, belkû perçeyek yê kû ji aliyê wê ve tê kifşkirine. Bazirganî, wekû amûra asankirina dayîn-standina pêdawîstiyên di navbera komanan de tê nirxandin. Çawa kû armanca bazirganiyê ne pereye, amûra wê ya bingehîn jî ne eve. Di bazirganiyê de ji rê û rêbazên mîna; parvekirin, berambertî û piştevaniyê re giranî tê dayîn.

### ١٠. Nêzîkatiya Li Pirsgirêka Darayî(Maliye) û Fînansê:

**Darayî:** Darayî, di rasteka pêdawîstiyên civakê de rêkûpêk kirina parvekirina jêderên maddî yên di dest de û berhemên tên destxistine.

Darayî ji ber kû yek ji encamên çalekiya abûriyî ye, nikare li cihê çalekiya abûriyî were bicihkirin yan jî nikare wê kifş bike. Darayî ne çalekiya meşandina kiryarên abûriyî, rêvebirina wan yan jî bi destxistina nirxê maddî yan qezencê ye. Danîna darayiyê li şûna abûriyê yan jî bi tena serê xwe weke kiryarek ya abûriyî rêkxistinkirina wê, çawa kû dê dijberê rêgez û paradîgmaya abûriya demokratîk-komînal be, di heman demê de dê rê li ber bêhilberîniyê û pûçbûna nirxan jî veke.

Di çalekiyên darayiyê de armanç bi her kîjan awayî dibe bila bibe, nikare destxistina danheva(birikim) maddî be; ev nêzîkatî bi kîjan hêcetê dibe bila bibe, di cewherê xwe de danheva qezenç û sermayê armanç dike û nêzîkatiyek dewletparêze.

Di abûriya demokratîk-komînal de, saziya darayiyê û polîtîkayên wê naçare bi paradîgma û rêgezên bingehîn yên abûriya demokratîk-komînal re guncanek tam bingeh bigre. Di vê çarçuvê de darayî, di nav tevayetiya çalekiyên abûriyî de û wekû perçeyek temamker yê wê, tê destgirtin. Xebata darayiyê, bi awayê kû alîkarî û destekê bide pêşketina hilberandina abûriyî ya di xizmeta civakê de û bi karxistina derfetên maddî û hêz-wizeya abûriyî, ji nû ve tê rêkûpêk kirin. Çalekî û polîtîkayên darayiyê, rasterast ji aliyê civakê ve tên kifşkirin, pêkanîn û venêrandin.

**Zimhêr(Butçe):** Di abûriya demokratîk-komînal de zimhêr, wekû di dewletan de bûyî pir navendî yan jî wekû di sermaya taybet de bûyî bi têgîna berhemhênan(yatırım)-qezencê(kâr) nayê destgirtin. Tevayê endamên komanan yan jî komînan, li eşkerekirin, sazkirin û venêrandina zimhêrê bi awayek çalak tevlêdibin.

Komîn û koman, zimhêra xwe bi xwe sazdikin. Lê di rewşên kû yên din û wekû giştî civakê peywendîdar dikin de jî di navbera koman û komînan de ber bi çêkirina zimhêra hevpar ve tê çûyîn.

**Fînansman û Sermaye:** Dabinkirina jederên maddîne kû ji bo encamdana xebatek abûriyî ya fînansman pêwîst dike. Kapîtalîstan herî zêde jî hem tengaviyên fînansî yên dewletan û hem jî yên hêzên civakî bikaranîne û wusa xwe anîne rewşa hêzek rêkxistî û bi bandor. Merkantîlîzma kû çaxa dayîkbûna modernîta kapîtalîste(sermayedariya bazirganî), di heman demê de giranî qezençkirina fînansêye jî. Di ketina jêr yekdesta kapîtalîstan ya zanist û pîşesaziyê de jî pirsgirêka fînansê rolek mezin leyîstiye. Neo-lîberalîzm jî ew nimûneye kû desthilatdariya fînans-kapîtalê beyankiriye. Fînans-kapîtala kû tê xwestin wekû awayek abûriyî û heta wekû abûriyê bi xwe, bi mirovan were dayîna pejirandin, li ser bazirganiya pere re rêbaza bi destxistina danheva hêz û sermayê ye. Pêkanînên mîna; seneda pişkê(hisse), borsa, deyn-kredî-faîz jî, feltotiya(kurnazlık) vê rêbazêne. Sedemek girîng yê hertim jiyanbûna qeyranên demî yên “abûriyî” kû “berhemê” kapîtalîzmêne jî desthilatdariya fînans-kapîtalê ye.

Abûriya demokratîk-komînal, sermayê ji bo çalekiya abûriyî wekû faktorek bingehîn û kifşker na; berûvajiyê wê wekû yek ji encamên çalekiya abûriyî digre dest. Çalekiya abûriyî, bêy kû sermaye û kargeha kapîtalîstî hebe jî, tê pêkanîn. Herwusa bêy çalekiya abûriyî û nirx jî sermaye û fînans nikare derkeve holê. Fînansman, ji fînans-kapîtalbûyînê tê derxistin û bi awayê kû xizmetê ji abûriyê re bike, ji nû ve tê rêkûpêk kirin. Li şûna fînansa pesartiyê pere, bi awayek rast, di cih de û berhemdar be, bikaranîna jêderên ji bo abûriyê pêwîst, tê bingeh girtin. Di nêzîkatiya fînansman ya abûriya demokratîk-komînal de, hem ji navendperestiya pir zêde û hem jî ji xwecihtiya daxistî û pir zêde re cih tineye. Li gel bikaranîna jêderên cewherî û têra xwe bûyînê, nêzîkatiyên piştevaniyê, parvekirinê û temamkirina yên din, bi hev re tên bingeh girtin. Ji bo çareseriya pirsgirêka fînansê, damûdezgayên mîna; kooperatîf, banqe, zimhêr(fon-butçe) û sindûqan kû nirxên abûriya demokratîk-komînal bingeh digrin, tên damezirandin.

**Bac:** Pêkanîna bacê ya kû bingehê wê xwe dipesêre damezirandina dewletê, di modernîteya kapîtalîst û netew-dewletê de, bi awayê kû tevayê civakê bigre nav xwe, wekû polîtîkayek ya dewletê ya berfireh, bi bandor û bingehîn tê derbazkirina jiyanê. Dîtina hemwelatiyan ya wekû naçarên bacdayînê, encamê vê nêzîkatiyê ye. Di tevayê qadên jiyanê de, bi bacên naçar yên hatîn bicihkirin, ji tevayê çalekiyên civakê danheva qezenç û sermayê tê bi destxistin.

Nirxên mîna hevparbûyîn, parvekirin û piştevanî kû bingehê abûriya demokratîk-komînalin, bacê nepêwîst(gereksiz) dikin. Lê çareseriya pirsgirêkên pîvan mezin kû tevayê komanê yan jî komînê peywendîdar dikin jî jêderek cuda pêwîst dike. Di vê çarçuvê de li şûna bacê, pêkanîna para alîkariyê(katkı) hîn rasttire. Komanek yan jî komînek, di derbarê pirsgirêk û pêdawîstiyên di mijarên giştiyê peywendîdar dikin de, jêderên xwe bi xwe pêktîne; li ser vî bingehî ji endamên xwe

para alîkariyê(katkı) distîne. Parên alîkariyê, li gora berfirehiya pirsgirêk û pêdawîstiyan, naveroka wan û şertûmercên xweser yên endaman, dikare bi awayên cuda be.

**BEŞA ٥.**

**ÇARÇUVEYA SAZİYÎ(kurumsal) YA ABÛRİYA DEMOKRATÎK-KOMÎNAL**

**١. AKADEMIYA ABÛRIYÊ:**

Hêzên şaristaniya dewletparêz, dagirî û talana li ser qada abûriyî ya civakê, qasî pênç hezar sale di domînin. Vê rewşê qasî kû di aliyê encamên maddî yên di qada abûriyî ya civakê de rê li ber rûxînek mezin vekiriye, herwusa rê li ber şewişandinek(çarpıtma) zîhnî û wateyî ya pir kûr jî vekiriye.

Wekû di tevayê avakirinên civakî de bûyî, ji nû ve avakirina qada abûriyî jî sereta naçare di zîhnî de pêkwere. Di qada abûriyî de jî zîhniyet û avanîbûn raxmê kû di bandorkirina beramber hev de ne, lê ya sereta û kifşker zîhniyete. Avanîbûnek ji zîhniyetê qut, demekê li ser lingan bimîne û heta pir bi hêz xuyabike jî di dawiyê de rûxîna wê nayê revandin û pêktê. Lê li milê din zîhniyet jî naçare xwe bi binyadiyê(yapısal) ve yekpare(butunleştirme) bike. Zîhniyeta kû bikare rê li ber yekparebûnê veke, hem hebûna xwe û bawerdêriya xwe berdewam dike û hem jî pêşkeftinê çêdike. Eger na, wekû xeyalek; heta wekû jêdera mirûzê(moral) dibekû bi salên dirêj jî xwe biparêze, lê ji jêhatina çareserî anîna ji pirsgirêkên civakê re dur dikeve û di encamê de tê rewşa jêdera pirsgirêkan.

Qasî di civakê de zîhniyeta abûriya demokratîk-komînal hate pejirandin, bi cihbûn û erêkirin; li ser bingehê guncawê cewherê xwe abûrî, dikare ji nû ve were sazkirin. Ceribandinên abûriya komînal ya ji zîhniyetê qut, di dawiyê de yan dihelin û tinedibin yan jî ji bazara kapîtalîst re xizmetê dikin kû wê demê ji xwe bi xwebûyînê derdikevin.

Qada abûriyî ya civakê, li rasta zext, gef û êrişên giran yên bi taybet yekdestên sermaye-desthilatdariyê û bi giştî jî yên modernîteya kapîtalîst, tê; an kû dikeve bin bandora van hêzan. Abûriya demokratîk-komînal, li beramber cih-wext û derfetên wuha kû modernîteya kapîtalîst tê de desthilatdar, tenê ger têkoşînek pir giran ya zîhniyet û avanîbûnê bide, dikare derfetê pêkhatin, xwe berdewamkirin û pêşxistinê bibîne. Çêbûna zîhniyetê jî nikare bêy akademî were fikirîn. Ji ber van sedeman, pêdiviya xebata akademîk ya abûriya demokratîk-komînal, pêwîstiyek jiyaniye.

Akademiya abûriyê; ceribandin, danhev(birikim) û nirxên demokratîk-komînal yên civakê kû xwe dipesêrin sedhezaran sal, bingeh digre. Lê dema vê mîratê civakî digre dest, di nav dem, cih, derfet û pêdawîstiyan de, wê rojaneyî dike û îroya qada abûriyî saz dike; bi îroya sazkirî jî rêya sibeyê vedike. Akademiya abûriyê; di civakê de bi cihbûna zîhniyeta abûriya demokratîk-komînal, hatina nirxandina ceribandin û agahiyên di derbarê qada abûriyî de, hatina pêşxistina teknolojî û rêbazên

jîngeyî(ekolojîk) û di xizmeta civakê de pêşkêşkirina encamên ji van xebatan tên destxistin, herwusa di mijara abûriyê de perwerdekirina civakê, armanç dike.

Ji nû ve pênasekirina zanista abûriyê, di avakirina abûriya demokratîk-komînal de, di taybetiya gava yekemdeye. Zanistek kû neyê pênasekirin yan jî xelet were pênasekirin, çawa kû nikare bibe zanist, avakirina wê jî negengaze. Zanista abûriya demokratîk-komînal, şewişandina(çarpıtma) kû moderníteya kapîtalîst dibin navê "abûrî-polîtîk" de pêkanîye hem derdêxe holê û hem jî têkoşîna ji holê rakirina encamên kû wê di zîhniyeta civakê de rê li ber vekirî, dide. Bi vê rastiyê re, zanista abûriyê di nav yekpareyiya zanista civakî de wekû çiqek yê zanista civakiya xweser pênase dike û pêşdêxe.

Heta kû ji zihniyet û avanîbûna dewletparêz qutbûn çênebe, nekarîna sazkirina abûriya demokratîk-komînal, bi ceribandinên dîrokî û rojaneyî li holêye. Zanista abûriyê dema ji nû ve tê avakirin, zanîna jêder girtina ji şaristaniya dewletparêz ya pirsgirêkên di qada abûriyî de, di girîngiyek jiyanî de ye. Lê wekû temamkerê vê; lêgerîna çareseriya pirsgirêkan jî ji dervey şaristaniya dewletparêz, an kû di kevneşopiya şaristaniya demokratîk de lêgerîn, dê destpêkek rastbe.

Akademiya abûriyê, bi dem-cih, rêbaz û awayên kifşkirî-rawestayî nikare were sinûrdarkirin. Hewldana ji nû ve avakirinek li ser bingehê vê nêzîkatiyê, nêzîkatiyek dewletparêze kû hêj di gavên destpêkê de bi tinebûnê encambûna wê nayê revandin. Akademiya abûriyê, çawa kû ne xebata komek ya bijartiyên ji civakê û abûriyê qut, ji jor ve li civakê dinêrine; nikare bibe rêkxistinbûnek burokratîk jî. Li gel vê; nêzîkatiya zanistvantiya dibin navê endazyartî, pisportiya kû jêdera xwe ne ji civakê û xwezayê, belkû ji moderníteya kapîtalîst digre jî, nikare cihê xwe di xebata akademiya abûriyê de bigre. Her cihê kû jiyana demokratîk-komînal tê de dibe mijara gotinê, qada xebatê ya akademiya abûriyê ye. Akademiya abûriyê bi hişê 'zanista abûriyê jî encama danhev û ceribandinên civakê yên pesartiyê sedhezaran sale' tê sazkirin. Li ser vî bingehî, ji beriya her tiştî akademiya abûriyê, ji jiyan û civakê fêrbûnê û parvekirina wan tiştên fêrbûyî, wekû rêgeza exlaqî dipejirîne.

Akademiya abûriyê, qasî kû ji bo ji nû ve avakirina zanista abûriyê dixebite, ji bo derbazkirina li jiyanê ya vê zanistê jî xebatê dimeşîne. Di vê çarçuvê de tevayê kiryar û çalekiyên mîna; sazkirina çarçuveya teorîk ya abûriya demokratîk-komînal û pêşxistina bîrdoziya wê, pêşengîkirina ji encamdana avaniya saziyî û rêkxistinî ya kû teorî û bîrdoziya hatî çêkirin pêwîst dibîne, herwusa amadekirina derfet û binaxe ji bo kû civak polîtîkaya abûriya xwe bi xwe encam bide; dibin banê akademiya abûriyê de tên encamdan. Xebatên akademiyê, di nav yekpareyiya kû yek, yên din temambike de tê destgirtin. Dema girîngî li xebatekê tê dayîn, piştçavkirina ya din nayê pejirandin; bi hişê kû di nav yekpareyiya qada abûriyî de girîngî, watedarî û nirxê her xebatekê heye, tê tevgerkirin.

Akademiya abûriyê di xebatên xwe de dewlemendiya rêbazê bingeh digre. Li ser vî bingehî, girêdayê qada abûriyî di asta xwecihî-herêmî-netewî de saziyên mîna; dibistan, laboratuar, enstitûyên lêkolîn-pêşxistinê, seyrangehên tekno yên abûriya-

eko û weqfên tov û çandiniyê, dikarin werin sazkirin. Amûr-amrazên gihandinê bi awayek bi bandor dikarin werin karanîn. Lêkolînên qadê, rapirs(anket) û rapor dikarin werin amadekirin. Konferans, mêhrîcanên çandinî-lawirvaniyê, kongre û civînên gel dikarin werin rêkûpêk kirin. Li gel malbatan; cuwan, jin, zarok û beşên civakî yên di çalekiya abûriyî de cihê xwe digrin û bernameyên perwerdê yên derbarê komanan de, dikarin werin derbazkirina li jiyanê. Çalekî û kiryarên mîna; dewreyên demî, dewreyên perwerda gerîdeyê(gezgin), dewreyên destxistina pîşeyê dikarin werin encamdan.

**٢. AVAKIRINA KOMÎNAN:**

**a. Di Komînan De Rêkxistinbûn û Rêveberî:**

Di jiyan, sazbûn, xebitîn û çalekiyên komînan de wekû yekpareyî, tevlêbûna giştî endaman bi awayek çalak û rasterast, tê bingeh girtin. Li ser vî bingehî mekanîzmaya rêveberiya-cewherî ya demokratîk çêdibe.

Ji ber kû komîn armanca sazkirina jiyana civakî ya pesartiyê hevbeşbûnê, parvekirinê û piştevaniyê hildigrin, wargehan wekû navend rêkxistin dikin; qadên jiyanê û çalekiyên bingehîn jî di vê çarçuvê de sazdikin. Li gel vê, her rêkxistinbûnek, yeke yan jî koma di hindirê komînê de, hem wekû perçeyek yê komîna giştî û hem jî wekû komînek ew bi xwe hebûna xwe berdewam dike.

Girtina tevayê biryarên kû jiyan û çalekiyên komînê peywendîdar dike, diyarkirina polîtîkayan, erkdarkirinên bingehîn, çêkirina kar parvekirin û rêkxistinbûnan, di meclîsên komînan de pêktên kû hemû kesên di komînê de jiyan dibin, sazdike.

Tevayê yekîneyên bi armanca bersivbûyîna ji qadên jiyana civakî û beşên kiryarê re hatîn sazkirin, li ser bingehê demokratîk-xweser xebatê birêvedibin. Tevayê yekîne, kom û rêkxistin, biryarên kû komîn û kongreya gel digrin, derbazê jiyanê dikin. Lê bi mercê dijber nebûyîna li armanc, rêgez, rêsa(kural) û pîvanên giştî yên kû ji bo herkesê û hemû xebatê hatine kifşkirin; xebitîn û biryarên di hindirê xwe de ka dê çawa derbazê jiyanê bikin û dê çawa karbikin, bi xwe dikarin destnîşanbikin. Ramana kesî yan jî hevpar û pêşniyaran dikarin pêşkêşî komîn, kooperatîf û kongreya gel bikin. Biryar û kiryarên kû yekîneyan girtî; ji aliyê yekîneyên xebatê yên di bin banê komînên bi xwe tê de endamin ve û herwusa ji aliyê kongreya gel ya kû hevsengê xebatên wane ve, tên erêkirin û venêrandin. An kû her yeke yan jî rêkxistinbûna di hindirê komîn, kooperatîf û kongreya gel de, li ser bingehê avanîbûna demokratîk-xweser hebûnê peyda dike û çalekiyê dimeşîne. Ji yekîtiya bi hev re hevseng ya vana jî, mekanîzmaya rêveberiya-cewherî ya demokratîk ya civakê sazdibe. (di derbarê mijarê de ji bo agahiya bi hemû ziraviyan ve, dikare li berhema “Komîn û Meclîs” ê were temaşekirin.)

**b. Wargehên Mîmarî û Mînaka Rûniştgehê(konut):**

Bajarkirina gundan û gundkirina bajaran; yan jî bi qutkirina herdûyan ji hev perçekirina wan, înkara jiyana civakî û wargehên wê yên gund û bajarin. Di civaka demokratîk-komînal de têkiliya di navbera gund û bajaran de, ne pesartiyê pêgirtin yan jî rikberiyê ye, belkû pesartiyê sazkirina tevayetiya kû hev temamdike ye. Avana şêniyên wargehan û rûpîvanên erdê wan, pêwîste di wê mezintiyê de be kû têra wan bi xwe bike. Gund û bajar di mijarên wekû; vehewîn, tenduristî, abûrî, perwerde, çand, avana jêr, gihandinê de, di astek yekpareyî û têrê bike de û bi awayê kû çareseriyên jîngeyî hilberîne, ji nû ve tên nexşekirin û sazkirin. Gund, wekû navenda jiyana komînal û xebata pevrayî; navenda çalekiyên abûriyî ya pesartiyê çandinî-lawirvaniyê, tên destgirtin. Di abûriyê de, piştevaniya di navbera gundan de û têra xwe bûyîna pesartiyê têkiliyên rast yên bi bajêr re, tê bingeh girtin. Berhemên çandinî-lawirvaniyê yên kû komanên gund di hilberînin, di çarçuveya gundan de yan jî di kargehên pîşesaziyane yên navbera gundan tên sazkirin de, tên xebitandin. Ji ber vê, kooperatîfên girêdayê komînan tên sazkirin. Di rewşên kû hêza gundekê bi xwe derbaz dike de, piştevanî û hevkariya navbera gundan de tê bingeh girtin; pêdawîstiyên mîna perwerde û tenduristiyê, bi hev re tên derbazkirin. Li cihên valahiya di navbera gundan de, hem bi awayê kû rê ji pirsgirêkên mîna erd û avdaniyê re veneke û hem jî di dûrahiyek ya ji gihandin û hevkariyê re dest bide de, tên bicihkirin. Li her gundekê; erd, lawir, kargeh, têrûteseliya(donanım) teknîkî, amûrên gihandin û ragihandinê, jêderên wizeyê, qadên daristanî-şînatî û jêderên avê yên dibin payeya xebitandina komîn yan jî kooperatîfan de cih digrin lê ji bo jiyana hevbeş û kiryarên abûriyî tên bikaranîn, çêdibin. Li gora rêsa û yasayên diyarkirî, ji van amûr û jêderên hilberandinê, gundî dikarin ji bo hilberandina kesî jî sudmend bibin. Berhemên di çalekiyên abûriyî de tên destxistin, li bazara kooperatîfê tên pêşkêşkirin kû di navbera ji yekê zêdetir gundan yan jî bajaran de hatî sazkirin.

Di civaka demokratîk-komînal de; avakirina bajarên kû nasname, dîroka-xwezayî û tevnê çandî yê wan heyî, sereke pirsgirêkên xwe yên mîna avanajêr, vehewîn, tenduristî, perwerde û abûriyê çareser kirî, di her hêlê de têra xwe dike û di mezinahiya xwe bi xwe rêvebirinê de ne, herwusa li ser vî bingehî ji nû ve rêkûpêk kirina bajarên niha heyî jî, tê bingeh girtin. Abûriya bajêr, abûriya gund yan jî çalekiyên abûriyî yên pesartiyê çandinî-lawirvaniyê, destek dike. Lê li gel vê, di serî de hilberandina pîşesaziyane, herwusa gelek beşên hilberandinê, di hindirê sinûrên bajêran de, lê li cihên dûrî wargehan, tên bicihkirin.

Wargehên jîngeyî-xweşik û mînakên daniştgehên bi jîngehê re hevsengê jiyana demokratîk-komînal û abûriyê, an kû yên destdayê şertûmercên nîrî û erdnîgariya herêma tê de tê jiyanbûn, yên bi tevnê wê yê xwezayî, dîrokî û çandî re hevseng, herwusa yên tenduristiya mirov-civakê û xwezayê bingeh digrin, dîsa heman wargeh û daniştgehên qahîm, destdayî, rê li ber zêhakirinê(israf) venake, avana wê ya jêr bêkêmasî, ji bo kiryarên civakî-çandî-werzişî xwediyê derfetên pêwîst, tên bingeh girtin. Rûniştgeh di civakê de ne ji bo perçebûn û takekesvantiyê, belkû ji bo pêşxistina rêbaz û nirxên jiyana demokratîk-komînal, têne

nexşkêşan(tasarlamak), di vê çarçuvê de cihên pêwîstiyê yên mîna aşxane-xwaringeh, nanxane(fırın), balavxane(çamaşırhane) hevparin. Di tevayê komînê de ji bo kiryarên çandî-hunerî hola şano, sînema û pêşangehê; ji bo kiryarên werzişî hola werzişê, qad(saha), birk(havuz); herwusa derfetên mîna mala gel, pirtûkxane, hola konferansê û hwkd… jî cih digrin. Parvekirina van derfetan, li gora mezinahiya komînê û rewşa bi cihbûna wargehan tê rêkûpêk kirin, ji aliyê tevayê endamên komînê ve di pîvana hevbeş, wekhev û pêwîstiyê de, tê bikaranîn. Pêvajoya damezirandinê ya kû ji bernamekirinê ta tê rewşa bikaranînê, ji aliyê civatên komînê ve tê bi biryarkirin û encamdan.

**c. Di Komînan De Perwerde:**

Armanca sîstema perwerdê ya di komînan de, di mijara jiyana demokratîk-komînal de bi hêzkirina hiş û hêsta berpirsyartiyê ye; di raman, têgîn, kesayet, rêbaza jiyanê û hêlwestan de dabinkirina encamdana armanca kesayeta azad-civaka demokratîke. Li gel jiyana komînal-demokratîk, abûriya wê di heman demê de wekû giştî perwerdeyeke; tevayê endamên civakê dema jiyan dibin, di hilberînin û parvedikin, di heman demê de xwe jî perwerde dikin. Li gel vê, sîstemên perwerdê yên komînan jî hene. Di sîstema perwerdê de; çawa kû di derbarê zarokan, jinan, cuwanan, komên pîşeyê, qad û kiryarên jiyana civakî de bernameyên xweser hene, bernameyên giştîgir û tevlêhev jî çêdibin. Sîstem û bernama perwerdê, bi rêya komînan û mekanîzmayên rêveberiya-cewherî yên din, rasterast ji aliyê civakê ve tê sazkirin, rêvebirin û venêrandin. Ji perwerdê, tevayê endamên civakê bê pere û di astek wekhev de sudmend dibin, tevayê pêdawîstiyên di çarçuveya sîstema perwerdê de, ji aliyê komînan û Kongra Gel ve tên pêşwazîkirin. Zarok ta demek diyar(ev dem ji aliyê komanê ve, li gora derfet û pêdawîstiyan tê diyarkirin), ji aliyê dayîka xwe ve tên perwerdekirin. Di vê demê de dayîk, ji perwerde û çavdêriya zarokê xwe nikare were dûrkirin; berûvajiyê wê destek tê dayîn. Perwerde, ji bo zarokên ta ٦ saliyê wekû perwerdeya berê dibistanê, ji bo yên di navbera temenê ٦-١٨ salî de jî bi awayê perwerdeya naçarî û bê navber, dikare were pêşbînîkirin.

**d. Di Komînê De Kar Parvekirin û Xebitîn:**

Di komînan de xebitîn û jiyan, di nav yekpareyiyekê de tê destgirtin. Tevayê mirovên di komînê de jiyandibin, di astek wekhev de endamên komînêne. Herkesê kû komîn di cih de dibîne, hêza wî/wê ya biryarê heyî û dikare îrade û berpirsyartiya pêkanîna vê nîşabike; xwediyê mafê biryar girtinê, çêkirina polîtîkayê û derbazkirina vana ya li jiyanêye û herwuha xwediyê mafê bijartin-hilbijartinêye; hisabê dide û distîne, rexne dide û dike, dikarin raman û rapor pêşkêş bikin, herwusa dikarin pêşniyar pêşkêş bikin û projeyan amadebikin. Di çarçuveya kû komîn û kooperatîf destnîşan dikin de, bi awayek çalak tevlê xebatên abûriyî û civakî dibin. Kes û malbat, bi mercê kû tevlêbûna xwe ya li xebatên pevrayî(kolektif) paşnexin; dikarin xebat, çalekî û kiryarên hilberandinê jî encambidin. Lê ev xebatên wan dibin venêrana komînê de ye, encamên wê dikarin di nav jiyan, çalekî û pêkhateyên komînê de binirxînin. Zarok jî li ser bingehê xwesertiyên xwe dikarin werin

rêkxistinkirin, raman û pêşniyaran dikarin pêşkêş bikin, biryaran dikarin bigrin, lê van biryaran bi destekên komîn û pêkhateyên peywendîdar dikarin derbazê jiyanê bikin. Eger komîn di cih de bibîne û pêwîstiya wê pê hebe, zarok bi mercê kû pêşkeftina wan ya xwezayî û perwerdeya wan nerênî bi bandor nebe, dikarin di qad û pêngavên çalekiyên komînê yên guncaw de, cihê xwe bigrin. Tevlêbûna li xebatan ya vê komê, zêdetirê xwe li ser bingehê amadebûna bi cihanîna berpirsyartiyên perwerdê û jiyana civakî, tê destgirtin.

Karparvekirin û erkdarkirin, tevayê qad û kiryarên jiyana civakî digrin nava xwe û di meclîsên komînan, yasayên giştî yên kooperatîfan û Kongreya Gel de tê pêkanîn. Li gel kiryarên civakî û abûriyî, çalekiyên çand-huner-werzişê, bi awayê kû hev bi hêzbikin, tên encamdan. Di xebatê de, li ser bingehê derfet û pêdawîstiyên civakî, rêgeza "li gora jêhatina herkesê" tê bingeh girtin. Lê di mijara pêşxistina jêhatinên xwe, qezençkirina bikêriyan û fêrbûna pîşeyan de, ji tevayê endamên komînê re bi awayek wekhev derfet tê dayîn. Perwerdeyên di derbarê beşên hilberînê yên abûriyî, pîşe û qadên xebata civakî de, bi awayek bê navber, rêkûpêk û têrker ji tevayê endaman re tê dayîn. Girêdayê vê endam, bi awayê guncawê derfetên di komînan de hatîn destnîşankirin erkên xwe, cor û qada xebata kû tê de cih digrin, dikarin biguherin.

### e. Di Komînan De Tenduristî:

Civaka demokratîk, li dijî anîna rewşa sektorek bazirganiyê ya qada tenduristiyê; wekû encamê nêzîkatiya biyolojîkî-pizîşkî ya kapîtalîstî, li dijî bi nexweşî kirina civakê û li dijî nêzîkatiya komkirina desthilatdariyê-sermayê ya li ser vê re, têkoşînê dide. Di komînan de tenduristiya mirov-civak û dewrûber, di nav yekpareyiyekê de tê destgirtin. Li gel vê tenduristî bi xwe, wekû yek ji qadên jiyanî yên civakê, tê rêkxistinkirin. Qadên niştecihbûnê, derfetên jiyan û xebitînê, naçarin guncawê tenduristiyê bin. Di mijara parastina tenduristiya xweza-mirov-civak û ya xwe bi xwe de, tevayê endamên di rewşa karîna biryardayînê de ne, berpirsyarin. Sîstema tenduristiyê ya parêzvan û komînal kû parastin û dermankirina xwezayî; dermanên xwezayî, rêbazên şîfa û saxlembûnê yên kevneşopî bingeh digre, tê sazkirin. Sîstema tenduristiyê ya kû kedkarên tenduristiyê, pizîşkên gel, jinên pîr û zana, tê de pêşeng û rahênrawin(pratisyen); dibin banê komînan de rasterast ji aliyê civakê bi xwe ve tê avakirin, rêvebirin û venêrandin. Li ser vî bingehî di her komînê de; yekîneyên tenduristiyê yên kû xwediyê danhevek têrkerin û tê de erkdarên ji dil dixebitin, herwusa yên xwediyê hercore amûr û têrteseliyêne(donanım), di aliyê bi kêrî, karkirin û çarçuveyê de besê xwene, tên rêkxistinkirin. Ji bo operasyonên pizîşkî yên di astek bilin de girîng û nazik jî, avaniyên tenduristiyê yên kû di navbera komînan de hevpar tên karanîn, tên damezirandin. Xizmetên tenduristiyê, ji tevayê endamên komînê re bi awayek wekhev, bê pere û têrker, tên pêşkêşkirin.

### f. Di Jiyana Komînê De Çanda Meinewî:

Komîn, awayê jiyana civakiye kû çanda meinewî herî zêde şansê pêşkeftinê tê de dîtiye. Nirxên bingehîn yên mîna parvekirin, hevparbûn, piştevanî, wekhevî,

hezkirin, rêzdarî, hev têgihiştin û hev temamkirin kû çanda meinewî xwe dipesêrê, tenê di jiyana komînê de gengaze. Ev nirxane, di zîhniyet û meinewiyetê de rê li ber pêşkeftinê; herwusa rê li ber bihêzbûna taybetiyên mîna afirênertiyê, xweşiktiyê, hizirînê, hêza pênase û wateyê, vedike. Di sîstema komînê de, çanda meinewî ne qadek bazirganiye û nikare were bi pîşesaziyîkirin. Çand-huner ji bo civakê û li gel civakê tê çêkirin. Jiyana komînê, rê dide azadkertiya çandê û pêşkeftina wê ya li ser bingehê civakî. Ji milê din ve jî, ji bo pêşkeftina qada çandî(huner, wêje, folklor û wkd…) binaxeya meinewî û maddî amade dikin. Dema jiyan û çalekiyên komînê tên rêkûpêk kirin, dem û derfetên maddî yên kû ji bo pêşkeftina qada çandî pêwîst, tên dabinkirin. Di mijarên; qada çandî de xwe çêkirin, pêşxistina jêhatin û afirênertiya xwe û karîna pêşkêş kirina vê li civakê de, ji tevayê endaman re derfetên wekhev tên naskirin. Li ser vî bingehî, beşek girîng ya jiyana komînê û derfetên wê yên maddî, ji bo qada çanda meinewî tê veqetandin. Li rex xebatên hînker yên mîna; akademiyên wê yên çand-huner, enstîtuyên wê, dewreyên wê, atolyeyên wê û semînerên wê; herwusa derfetên pêwîst yên weke; holên wê yên şano û sînemayê, dikeyên wê yên servekirî û cihên wê yên pêşangehê jî tên amadekirin.

### g. Di Komînê De Pêşwazî Kirina Pêdawîstiyên Abûriyî Yên Bingehîn:

Li gel pêwîstiyên bingehîn yên kesî yên cuda, pêwîstiyên endamên komînê yên weke; tîmarbûn, vehewîn, parastin(cilûberg, gerimbûn, paqijî û hwd.), pêdawîstiyên pevrayî yên bingehîn yên civata komînê, bi rêya yekîneyên darayî-lojîstîkê ji aliyê komînê ve têne pêşwazîkirin. Wekû girêdayê cewher û jimara xwe endamên komînê, beşek ji pêdawîstiyên mijara gotinê ji yekîneyên darayî-lojîstîkê; beşek wê jî ji navendên belavkirinê, bazaran û kogehên(magaza) girêdayê komîn û kooperatîfan dikarin bidin hev. Di pêşwazîkirina pêdawîstiyan de, li ser bingehê wekheviyê rêgeza “li gora pêdawîstiya herkesê” tê bingeh girtin. Derfetên di destê komînê de, li ser bingehê kû li gel pêdawîstiyên hevpar yên komanê, pêdawîstiyên kesî yên endaman bi awayê herî baş pêşwazî bike, tên nirxandin. Kiryarên parvekirina pêdawîstiyên bingehîn yên pevrayî û kesî, di venêrana civakêdene. Yekîneyên darayî-lojîstîkê yên kû komîn û kooperatîfan rêkxistinkirî, pêkhateyên komîteya darayî-lojîstîkêne kû dibin banê Kongreya Gel de ye.

## ٣. MÎNAKA KOOPERATÎFÊ YA ABÛRIYA DEMOKRATÎK-KOMÎNAL:

Têgeha kooperatîfê, ji “cooperatif”a bi latînî tê wateya alîkarbûn, hevparbûnê tê. Kooperatîf ne qezenç, belkû kargehek abûriyî ye kû armanca pêşwazîkirina pêdawîstiyên bingehîn yên civakê hildigre; vê jî wekû pesartiyê xebitîn, parvekirin, piştevanî û rêveberiya-cewherî ya hevpar, pêktîne. kooperatîf, li rex pêşkêş kirina alîkariyê li jiyana hevbeş; pêşiya zêhakirina(israf) jêderên xwezayî, kedê, wizeyê û dem jî digre, bi vî awayî bi darayiyek kêm hilberandinek hîn destdayîtir pêktê.

Kooperatîf wekû pêkhateyên bingehîn yên kû ji biheqîqetbûyîna civaka exlaqî-polîtîk re; ji bihêzbûna zîhniyeta civaka demokratîk re û ji gihiştina vê ya binyadbûnê(yapısal) re; an kû li ser bingehê demokratîk ji avakirina ser ji nû ya civakê re xizmetê dikin, tên destgirtin. Di vê çarçuvê de kooperatîf li gel kû kargehên

abûriyîne, tenê bi hilberandina abûriyî xwe sinûrdarnakin. Hem bi çalekiyên kû bi taybet dimeşînin, hem jî li derdora van kiryaran bi desteka pêşkêşî qadên din yên civakî dikin, ji beşên kifşker yên civaka demokratîkin. Tevgerên kooperatîf yên dûsed salên dawiyê derketîn holê û nirxên kû afirandîne, tevayê tevgerên abûriyî yên hevparker, piştevanîker û parveker kû di rûbarê bingehîn yê bicivakbûna demokratîk ya dîrokê de cihdigrin, li gel ceribandinên kiryar û kargehên xwe nirxên civakî yên vana afirandîn, wek mîratê kû were bingehgirtin, lê xwedîbûn çêdibe. Lê ev lê xwedîbûn, di şertûmercên roja me de ne bi awayê vegerîna li dembûriyê wekû heyî yan jî bikaranîna bi têgîna pragmatîk ya nirxên derketîn holê ye. Ji kêm û kurtiyên ceribandinan ders tên derxistin û ji dubarebûna vana re rê nayê dayîn. Li dijî hewldanên yekdestên sermaye-desthilatdariyê yên valakirina hindirê kooperatîfvantiyê re yek kirina bi sîstema yekderstdar ve, têkoşîn tê dayîn. Bi vî awayî, mînakek ya kooperatîfê tê armanç kirin kû di wateya rast de ji pêdawîstiyên civakê re bersiv bide; qezencên civakî yên kevneşopiyê bi yên roja me re dewlemend dike û bi vî awayî ji bo sîstema abûriyî ya pêşerojê ya civakê bingehekê avabike.

### a. Kurtedîroka Kooperatîfan:

Li gel jiyana bi hevre, hilberandina hevpar û awayê bikaranînê yê kû bingehê kooperatîfêye, nirxên kû vê gengaz dikin; bi çalekiyên seretayî yên bi civakîbûna mirov re dest bi derketinê kiriye. Pir bi dilniyayî dikare were gotin kû çalekiyên abûriyî yên rêkxistinên gens, qlan, qebîle û eşîretan encamdayî jî ceribandinên kooperatîfîne. Çanda çandinî-lawirvaniyê, di heman demê de ew çanda kû zîhniyet, avanî û çalekiya kooperatîfê jî tê de herî bi bandor, xwecih û belave. Bi gelek belge û destkeftan hatiye çespandin kû ceribandin û danhevên vê çandê derxistîn holê, di dem-cihên cuda de û bi awayên cuda, ta roja me xwe parastine. Li rex tevgerên mîna Manîheîzm, Mazdekî, Xaricî, Îhvan-û Safva yên ser bi navenda Kurdistan, Anatolî û Rojhilata Navîn, di serhildanên koleyên Efrîqî û Kurdên Qizilbaş de, herwusa di berxwedanên demokratîk yên Şêx Bedredîn, Pîr Sultan Abdal û gelek pêşengên din yên gel pêşengtî kirîn de, çalekî û têkiliyên abûriyî xwediyê ceribandinên komîn û kooperatîfan yên pir dewlemendin. Îro di Kurdistan, Anatolî û qadên din yên Rojhilata Navîn de, di civaka gund-çandiniyê de ‘zibare, îmece’ û corên din yên hevparbûyîn, piştevaniyê kû hêj jî rola xwe hene, encamên van danhevên kooperatîfîne. Bi dirêjiya dîroka civakî nirxên kû hilberandin û parvekirina hevpar derxistîn holê, di tevayê cihên kû hêzên civakî û bi civakîbûn lê heyî de, bi awayek bênavber ta roja me karîne werin.

Tê gotin kû tevgera kooperatîfa hemdem di destpêkên sedsala ١٩’an de li Ewrûpa’yê derketiye holê. Teqîna danheva pîşesaziyane û teknîkî ya bi hezaran sal, di sedsalên ١٨ û ١٩’an de, kapîtalîstan girtiye destê xwe û bi navê “Şoreşa Pîşesaziyê” vegerandine li Pîşesaziyîzmê û ev di abûriyê de zalkirine. Di van sedsalan de dagiriya klasîk qasî kû di warê gelan de bûyî, di gelên Ewrûpî de jî rûxînên abûriyî yên mezin, tên jiyanbûn. Beramberê vê li Ewrûpa, lêgerînên abûriyî, civakî, siyasî, çandî yên li ser bingehê demokratîk, derdikevin holê. Ceribandinên komînê yên li Fransa û Îtalya’yê, serhildanên gundiyan yên li Almanya’yê,

serhildanên şkênerên mekînê û karkeran yên li Brîtanya’yê, çêbûnên terîqetî yên belavê tevayê Ewrûpa bûyîn û gelek ceribandinên din, bi dirêjiya çaxê pir bi bandor bûne. Di wateya giştî de, van destbikariyên(girişim) di aliyê parastina hebûna exlaqî-polîtîk ya civakê de, di qada abûriyî de jî di şertûmercên Ewrûpa de rê li ber derketina holê ya çêbûn û tevgerên kooperatîfan, vekiriye. Têkoşîna komîn-kooperatîfan kû ji dawiya salên ١٧٠٠’an û şûnde di serî de; Robert Owen, Charles Fourier, Mihaîl A. Bakûnîn, Pyotr Kropotkîn, Pierre J. Proudhon û gelek kesayetên din pêşengtî kirî, vedigere tevgera kooperatîfê kû ta roja me bi bandortiya xwe berdewam dike. Di vê demê de wekû bîrokeyî û kiryarî(teorîk-pratîk), xeyalî û pêkhatî; gelek ceribandin û mînakên mîna Banqevantiya Gel, Rêkûpêkiya Nû, Kooperatifa Famîlîstere Godîn, Falanster, Konfederasyona Jura, Komînên Lyon û Parîs’ê jî derdikevin holê. Bi dirêjiya sedsalên hev dişopînin li gelek welatan, di mijarên kooperatîfan de hewldanên pir berfireh û girîng yên derdorên dervey desthilatdariyê mîna; sosyalîstan, komînîstan, cepgiran, anarşîstan, humanîstan û demokratan, çêbûne. Li gel vê; li Ewrûpa, Emerîka û cihên din, bi awayên cuda ceribandinên abûriyê yên ji dervey dewletê yên hêz û komanên civakî jî, derketine holê.

Hêzên dewletparêz dema qada abûriyî ya civakê dagirdikin, tim dixebitin kû desbikarî û danhevên abûriyî yên demokratîk-komînal jî bêxin bin venêrana xwe de. Bi dirêjiya dema dîrokî, bi vî awayî bi destavêtina li bê hêjmar rêkxistinbûyîn û ceribandinên komînal, ew ji rê derxistine; bi valakirina naveroka wan, ew li ser mekanîzmayên desthilatdariya xwe zêdekirine; anîne rewşek wusa kû xizmetê ji mêtingerî û talana wan re bikin.

Piştî sedsala ١٨’an kû tevgera kooperatîfa hemdem tê de derketî holê jî, rewşa heman tê jiyanbûn. Kooperatîfa Rochdale, bi şixulandina pêdawîstiya fînansê naveroka wê tê valakirin, kooperatîfa krediya Reîffeîsen vedigere şîrketa kapîtalîst; Kîbbûtz’î tên rewşa corê proto yê dewleta-netewe ya Îsraîl’î, Kolhoz’î vedigerin şîrketên herî mezin yên kapîtalîzma dewletê. Di dema navbera ١٩٢٠-١٩٧٠’yê de, çêbûnên kooperatîfan bi awayek berfireh dikevin jêr destê dewletê û xizmeta siyasetê de. Bi rêya kooperatîfvantiya ji cewherê wê tê dûrkirin, gelek hebûnên ji dervey civakê gir dibin û kurtêlên(rant) mezin dest dêxin, kooperatîfên mijara gotinê bi berhemên kû hilberandîn, tên rewşa destekderên herî girîng yên bazara kapîtalîst. Serencam(sonuç itibariyle), kooperatîfên dikevin jêr venêrana dewletê, tên rewşa amûrên kû hêza kar, jêhatin, nirxên çanda maddî û derfetên abûriyî yên civakê, ji bo berjiwendiyên hêzên sermaye-desthilatdariyê seferber dikin.

Di belavbûn û berfirehbûna mînakên hukûmeta “dewleta sosyal” û sosyal demokrat ya wekû têkela kapîtalîzm û sosyalîzmê tê binavkirin de, para mezin ya kooperatîfvantiya cewherê wê hatî valakirin û ji bijartekbûyînê hatî derxistin, hebûye. Di bê bandorkirina têkoşîna jiyankirina abûriya demokratîk-komînal ya civakê de, di anîna rewşa “bê xusar”bûna wê de û di çêbûna ramana “raxmê hertiştî dikare bi kapîtalîzmê re were jiyanbûn” de, avanîbûnên bi corê kooperatîf yên bi vî awayî, rolek pir mezin leyîstine. Di mînaka “abûriyî”ya neo-lîberal ya piştî ١٩٧٠’yan desthilat bûyî de jî, dema piraniya avaniyên kooperatîf tên tinekirin û vedigerin komeleyan,

beşên mayî jî hatine rewşa şîrketên bazirganiyê. Li Tirkiyê û Kurdistan'ê jî qiyameta kooperatîfên bazirganiyê ya piştî salên ١٩٨٠'yan hatî jiyanbûn, perçeya vê rewşa giştiye.

Guhertina piştî ١٩٥٠'yan û şûnde di berxwedan û tevgerên civakî de hatî jiyanbûn, rê li ber ji nû ve ketina rojeva civakê ya kooperatîfan vedike. Bi taybet ji salên ١٩٦٠'an destpêdike û di gelek cihên cîhanê de tevgera kooperatîfê ji nû ve bi hêzdibe. Hinek çêbûnên kooperatîfê yên kû di vê demê de derdikevin, dema ji aliyê hukûmetên çepgir ve tên destek kirin, hinek ji wan jî bi temamî destbikariyên(girişim) dervey dewlet-desthilatdariyêne û xweserin.

**b. Çarçuveya Zîhniyetê Ya Kooperatîfa Demokratîk-Komînal:**

Kooperatîfa demokratîk-komînal, zîhniyeta abûriya demokratîk-komînal; paradîgmaya wê, rêgezên wê yên bingehîn û awayên wê yên nêzîkatiya li hebûnan ya derbarê qada abûriyî de, bingeh digre.

Pêşwazîkirina pêdawîstiyên bingehîn yên civakê û guncawtiya wan li jîngeyê, di tevayê kiryarên kooperatîfa demokratîk-komînal de, bi awayek bê kêmî tê bingeh girtin û derbazê jiyanê tê kirin.

Li gel kevneşopiya abûriyê ya civaka dîrokî, ceribandinên abûriyî yên berxwedanên demokratîk-civakî, herwusa li armancên gihiştina takekesê azad-civaka demokratîk ya ceribandinên kooperatîfê yên di du sedsalên dawiyê de, xwedî derdikeve. Qasî kû aliyên vana yên xizmetê ji pêşkeftina civaka exlaqî-polîtîk re dikin bingeh digre, aliyên wan yên rê ji binkeftinê re vedikin jî rexne dike.

Kooperatîf, têgihiştina hilberînê ya abûriya demokratîk-komînal bingeh digre. Kooperatîfek ji bo pêşwazîkirina kîjan pêdawîstiyên bingehîn yên abûriyî çalekiyan bimeşîne, armanç dike kû tevayê hilberandina derbarê wan de, dibin banê pêkhateya xwe de pêkbîne. Têgihiştina hilberandina giştîker, li gel jêderên ked, wize, dem, maddî û heyberên xam de, di mijarên mîna têrûteseliya teknîkî de zêhakirinê asteng dike, herwusa di hilberînê de berfirehbûna têgihiştina abûriyî bûyînê û bi sudbûna herî baş dabindike. Di hindirê kooperatîfekê de berhemên kû hilberandina wan ne gengazin jî li ser bingehê hevkariya bi kooperatîfên din re were kirin, tên dabinkirin. Bi vî awayî, li ser binaxeya civakî ya kû kooperatîf tê de cih digre; tevlêbûn, hevparbûn û parvekirin hêj zêdetir tên berfirehkirin. Li ser bingehê demokratîk-azadîxwaziyê, tevlêbûna civakê ya li hilberandina abûriyî jî zêde dibe; pêşiya karkerkirinê û bêkarkirinê tê girtin. Li gel vê, di jimarek bes de bûyîn, bi tenduristbûyîn û hîn binirxtir bûyîna berheman jî, tê pêkanîn.

Di rêveberî û meşandina kooperîfê de rêgeza demokratîkbûyînê ya abûriya demokratîk-komînal tê bingehgirtin. Kesên di komana kooperatîfa kû perçeyek yê civaka exlaqî-polîtîke de dixebitin, ne tenê endamên bê bandor yên bi dengdanê erkdarin, belkû bikerên çalak û temamkerin; ji rêvebirin û meşandina kooperatîfê berpirsin. Pêwîstiyên vê berpirsyartiyê jî bi tevlêbûna çalak ya li rêveberiyê, bi cih di

gehînin. Kooperatîf xwediyê mekanîzmaya rêveberiya-cewherî ya demokratîk û xwesere. Di vê çarçuvê de her kooperatîfek, mekanîzmaya rêveberiya xwe bi rêya demokratîk sazdike. Kiryarên rêveberiyê, dibin venêrana rasterast, vekirî û tam ya hem kesên di kooperatîfê de dixebitin, hem jî endamên komînê de ye kû kooperatîf perçeyek yê wê ye. Rêziknameya(iç işleyiş) hindirê kooperatîfê û biryarên derbarê xebatên tên meşandin de, bi tevlêbûna tevayê endamên kooperatîfê; biryarên bi giştî komînê peywendîdar dikin jî bi tevlêbûna tevayê endamên komînê, tên standin û derbazê jiyanê tên kirin. Her yekîneya di hindirê kooperatîfê de, dema bi xwe biryarên derbarê xwe de digre, biryarên yekîne û komanên din peywendîdar dikin jî di hindirê hevsengiyek hevpar de tên standin. Di demê sinûrên komanê derbaz dike de jî, standina biryaran, çêkirina polîtîkayan û derbazkirina wan ya li jiyanê, di navbera komanên mijara gotinê de, hevbeş tên pêkanîn.

Tevayê amûrên hilberandinê, lawir û xak-zeviyên di çalekiyên kooperatîfê de tên karanîn, di venêran û xizmeta karanîna hevbeş ya komînê de ne; herwusa ji bo pêşwazîkirina pêdawîstiyên hevbeş û hilberandina abûriyî ya hevbeş, tên bikaranîn. Daniştgeh û tişt û miştên tê de kû ji wan pêdawîstiyên bingehîn yên xweserên takekes yan jî malbatanin, bi armanca bikaranînê ji wan re wekû emanet tên dayîn. Amûrên gihandin û ragehandinê, hevbeş û bi awayê komî tên bikaranîn. Pêdawîstiyên mîna zad û cilûbergan, li gora pêwîstiyê hevpar, wekhev û bi awayê kû bibe bersiva pêwîstiya herkesê, ji aliyê yekîneyên darayî-lojîstîk yên komîn û kooperatîfê ve tên parvekirin. Li gel vê, li gora derfetên komîn û kooperatîfê ji her malbatê re di jimarek diyar de zeviya bostan yan jî lawir tên veqetandin.

**c. Rêgezên Kooperatîfa Demokratîk-Komînal Yên Xweser:**

١. Binaxeya rewatiya kooperatîfa demokratîk-komînal, hebûna civaka exlaqî-polîtîk û qada wê ya abûriyî ye.
٢. Di kooperatîfa demokratîk-komînal de, hiş û rêkxistinbûyîna demokratîk ya di civakê de, di hevbandor kirina beramberdene. Di vê çarçuvê de çalekiyên kooperatîfê, di heman demê de perwerde û rêkxistinbûyîna civakê ya di bingehê demokratîk-komînal de, armanç dikin.
٣. Di navbera kooperatîfên demokratîk-komînal û sazî û yekîneyên din yên civaka demokratîk de, têkiliyên temamker û giştgir hene. Hebûna kooperatîfan; hebûna mekanîzmayên rêveberiya-cewherî yên demokratîk yên mîna; komîn-meclîs-konseyên bajêr û kongreyan, herwusa bi bandortî û erkdariya wan merc dike.

**d. Nêzîkatiya Kooperatîfa Demokratîk-Komînal Li Rêgezên Kooperatîfvantiya Di Giştiya Cîhanê De Hatî Pejirandin:**

Rêgezên kooperatîfa Pêşengên Mafhezker Rochdale daniye holê, ji aliyê Yekîtiya Kooperatîfên Nav Netewî ve jî, di sala ١٩٨٥'ê de wekû rêgezên bingehîn yên kooperatîfvantiyê hatine diyarkirin. Piştî wê dîrokê û şûnde jî ji aliyê tevayê kooperatîfên di cîhanê de bi giştî hatine pejirandin. Kooperatîfa demokratîk-komînal,

dema hinek ji van rêgezan wekû heyî dipejirîne, hinek ji wan jî li ser bingehê têgihiştina xwe dinirxîne û bi vî awayî bingeh digre.

**١. Endamtiya ji dil û ji herkesê re vekirî:**

Kooperatîf saziyên ji dilin kû bêy cudatiya zayendî, civakî, regezî, siyasî û olî hebe, ji xizmetên wê sudmendbûn çêdibe û ji her kesê kû berpirsyartiyên endamtiyê dipejirîne re vekiriye. Ev rêgez, li şûna têgeha regezî, netewî; li şûna têgeha olî, têgeha çandî kû ol jî tê de cih digre, hîn rasttir dibîne.

**٢. Vênêrîna demokratîk ya ji aliyê endaman ve tê encamdan:**

Kooperatîf saziyên demokratîkin kû ji aliyê endamên xwe yên tevlê pêvajoyên siyaset çêkirinê û biryar girtinê dibin ve tên venêrandin. Jin û zilamên kû wek nûnerên hatîn hilbijartin xizmetê dikin, li beramber endaman berpirsin. Di saziyên kooperatîfê yên yekîneyê de, endam xwediyê mafê dengê wekhevin(ji her endamekê re mafê dengekê). Di saziyên kooperatîfê yên di astên din de jî mafê deng, bi nêzîkatiyek demokratîk tê rêkûpêk kirin.

Kooperatîfa demokratîk-komînal, li şûna venêrana demokratîk ya endaman, rêgeza rêveberiya-cewherî ya demokratîk, bingeh digre. Di vê çarçuvê de, li gora şertûmercan çawa kû dê rêbaza nûnertiyê jî bikare bikarbîne, heman demê rasterast tevlêbûna endaman ya demokratîk bingeh digre. kooperatîfa demokratîk-komînal, armanç dike kû ji beriya hertiştî armanca civaka exlaqî-polîtîk, di bin banê xwe de pêkbîne. Li ser vî bingehî, ne endamtiya bêbandor ya pesartiyê deng(oy), belkû endamtiya bikerê çalak û çist, bingeh digre.

**٣. Tevlêbûna abûriyî ya endaman:**

Endam, bi awayek dadî û durist alîkariyê bi sermaya kooperatîfa xwe re dikin û vê bi awayek demokratîk dimeşînin. Herî kêm beşek yê vê sermayê piranî malê hevbeş yê vê kooperatîfêye. Piraniya xwe endam, ji ber kû wek mercek yê endamtiyê peymandarî çêbûye(ger hebe), bi ser sermayê re di jimarek kêm de dahat bi dest dêxin. Endam, zêdehiya dahatê xwe dibe kû bi rêya çêkirina "jêderên herî kêm beşek ji wan nikare were parvekirin" ji bo pêşxistina kooperatîfên xwe; herwusa wekû hevsengê kiryarên ji kooperatîfa xwe re kirîn ji bo ji endamên xwe re qezencê dabinbikin û ji bo destek bûyîna ji kiryarên din re kû ji aliyê endaman ve hatine erêkirin, wekû vana ji bo yek yan jî tevaya armancan, dibe kû vediqetînin.

Abûriya demokratîk-komînal, rastiya xizanbûn û daketina abûriyî ya di civakê de dêxe berçav. Li ser vî bingehî pere, mal û tişt; bi çi awayî dibe bila bibe alîkariya sermayê, nikare wekû yek ji mercên jêneger yên tevlêbûna li kooperatîfê were dîtin. Pîvana bingehîn ya tevlêbûnê, hewandina abûriya hevparvan-parvekere û ji bo pêkhatina vê, di xwe de dîtina bawerî, vîn, bi biryartî û hêza çalekiyê ya pêwîste. Herwusa pejirandina paradîgma, rêgez û pîvanên kû kooperatîfa demokratîk-komînal bingeh digre; ji bo pêkhatina wan hewldanek ji dil û micid nîşakirine. Tevlêbûna maddî jî bi mercê xwedîbûna vê têgihiştinê, dipejirîne.

**٤. Xwesertî û serxwebûn:**

Kooperatîf, saziyên xweser, têra xwe dikin û ji aliyê endaman ve tên rêvebirinin. Hukûmet jî di nav de, dema kooperatîf bi saziyên din re dikevin nav peymanekê yan jî bi rêya jêderên derve danhevên xwe zêde dikin, bi awayê kû kooperatîf xwesertiyên xwe berdewam bikin û endam rêveberiya xwe ya demokratîk biparêzin, vê yekê pêktînin.

**٥. Perwerde, fêrbûn û agahdarkirin:**

Ji bo kû bi awayek baş û bi bandor li pêşveçûna kooperatîfên xwe tevlêbûn û alîkariyê bikin, kooperatîf ji endam, nûnerên xwe yên hilbijartî, rêvebir û xebatkarên xwe re derfetê perwerdê û fêrbûnê, pêşkêş û dabindikin. Kooperatîf, tevayê raya giştî bi taybet jî cuwanan û kesên raya giştî pêktînin, di mijara awayê hevkariyê û sudên wê de, agahdardikin. Kooperatîfa demokratîk-komînal, li rex abûriya demokratîk-komînal, ji bo bi hêzbûna taybetiyên din yên civaka exlaqî-polîtîk jî, perwerdeya komana di bin banê qada bi bandortiya xwe û çalekiyên xwe de, armanç dike. Di vê çarçuvê de kooperatîf; di qadên pîşeyî, civakî, çandî û werzişî de ji pêkanîn û destek kirina kiryarên perwerdê berpirse. Lê ev çalekiyane, di yekpareyiya komînê de tên destgirtin.

**٦. Hevkariya di navbera kooperatîfan de:**

Kooperatîf bi xebitîna li gel avan û çêbûnên xwecih, netewî, herêmî û navnetewî, ji endamên xwe re bi awayek hîn bi bandortir xizmetê dike û tevgera kooperatîfvantiyê bihêz dike.

Di abûriya demokratîk-komînal de kooperatîf dikarin yekîneyên bi corê kiryarên abûriyî, yekîneyên beşa hilberînê, yên herêmî, netewî û navnetewî damezirînin. Lê yekîneyên tên damezirandin, ne ji bo di qada abûriyî de yekdest yan jî desthilatdariyê avabikine, belkû xizmeta pêşwazîkirina pêdawîstiyên civakê dikin. Di çêbûna yekîtiya di navbera kooperatîfan de, avakirina avaniyên demokratîk-xweser tên bingeh girtin.

**٧. Beramber civakê berpirsyar bûyîn:**

Kooperatîf, bi rêya polîtîkayên ji aliyê endamên wan ve tên erêkirin, ji bo pêşveçûna dikare were berdewamkirin ya civakên xwe, dixebitin. Kooperatîfên demokratîk-komînal, mînakên kargehên di qada abûriyî de yên ji nû ve sazkirina civakê ya li ser bingehê demokratîkin. Ne tenê ji bo endamên xwe; li gel komîna kû perçeyek yê wêne, ji bo komîn û komanên din, herwusa ji bo pêkanîna pêşkeftina dikare were berdewam kirin û giştîgir ya tevayê civakan, dixebitin. Di vê çarçuvê de, di qadên wekû; tenduristî, avana jêr-jor, gehandin-ragehandin û jîngeyê de, di pîvana derfetên xwe de xebatan dimeşînin, ji yên heyî re jî destekê pêşkêş dikin.

**e. Avana Rêkxistinî û Awayê Xebitîna Kooperatîfan:**

Kooperatîf, dibin pêşengtiya yekîneya xebatê ya abûriyî de kû girêdayê komîn yan jî kongra gele; di rasteka biryarên di komîn yan jî kongra gel tên girtin de, tên sazkirin.

a. **Endamtiya Kooperatîfê**: Kesên di kooperatîfê de dixebitin û malbatên wan, endamên kooperatîfêne. Herkesê kû hêza biryarê û vîna pêkanînê heyî, di çarçuveya kooperatîfê de xwediyê mafê biryar girtin, pêkanîn û nirxandina encamên wê ye.
b. **Civata Kooperatîfê:** Ew komana kû ji kesên di kooperatîfê de dixebitin û malbatên wan pêktê. Ne civata bi serê xwe û ji komînê qut, belkû civatek xweser ya di hindirê tevayetiya komînê de ye. Xwesertiya wê jî, tenê bi xebatên taybet girêdayî kooperatîfê û jiyanê ve sinûrdare. Di vê çarçuvê de civat û endamên kooperatîfê, perçeyê komînê ne û pêwîstiyên di hindirê vê tevayetiyê de bûyînê, bi cih digehînin. Wekû herkesê din di jiyana komînê de, bi awayek demokratîk, alîkarvan-tevilbûyî û wekhev, cih digrin.
c. **Di Kooperatîfê De Demokrasî:** Berpirsyartiyên endaman, bi hilbijartina rêveber û erkdaran û herwusa bi tevlêbûna civînên di demên diyarkirî de tên kirin ve, sinûrdar nîne. Kooperatîfa demokratîk-komînal, ne yekdestdar bûyîna berpirsyartiyan, belkû di giştiya civatê de parvekirina wan bingeh digre. Tevayê endamên komîn û kooperatîfan; tevlêbûnek rasterast, çalak û tam demokratîk di çalekî, awayê karkirin, avana rêkxistinî û rêveberiya kooperatîfan de pêktînin û pêwîstiyên berpirsyartiyên xwe dikin. Li gel kû biryar, bi tevlêbûna piraniyê tên standin; pêkanîna hevbîriya li ser bingehê bersivbûyîna ji pêdawîstiyên komanê re, li gor rêgezên hatîn diyarkirin tevgeran, bi hêzkirina jiyan û xebata hevbeş, tê bingeh girtin.
d. **Avana Rêkxistinî Ya Kooperatîfê:** Kooperatîf, çalekiya abûriyî û veguherîna civakî di nav yekpareyiyê de digre dest. Ji bo pêkanîna çalekiyek ya hilberandina abûriyî kû bibe bersiva pêdawîstiya civakê, ji bo bi başî ber pê dayîna li pêvajoya hilberandinê, ji bo hîn bi berhemtir nirxandina ceribandin, ked, dem û jêderan û herwuha ji bo pêşwazîkirin û derbazkirina pêdawîstiyên bingehîn yên ji dervey abûriyê yên endamên kooperatîfê jî yekîne û zagonan sazdike. Dema kû demezirîna yekîne û yasayên kû rasterast tevayê kooperatîfê peywendîdar dikin, tevlêbûn û erêkirina komînê pêwîst dike; çêbûna yekîneyên hîn biçûk û sinûrdartir yên di hindirê kooperatîfê de jî di pêkhateya kooperatîfê de tên encamdan. Kooperatîfek, dibin banê pêkhateya xwe de gelek kargeh û karxaneyan dikare sazbike. Ji yekê zêdetir kargehên xwedî pîvana biçûk û navîn jî dikarin tenê kooperatîfekê sazbikin. Di herdû rewşan de jî avana rêkxistinî û awayê karkirinê yê kooperatîfên mijara gotinê, di çarçuveya kû hatî diyarkirin de dibe. Ji yekê zêdetir kooperatîf bi hatina gel hev re, dikarin kooperatîfek hevbeş yan jî yekîtiya kooperatîfê sazbikin. Di vê rewşê de kooperatîfa yekgirtî yan jî yekîtiya kooperatîfê ya mijara gotinê li gel komînên herêmên kû kargehên wan lê bicih bûyîn, ji aliyê kongreya gel ve bi hevbeşî tên karanîn û tên venêran.
e. **Desteya Giştî Yan Jî Meclîsa Kooperatîfê:** Ji kesên di kooperatîfê de dixebitin û malbatên wan, ji nûnerên meclîsa komînê û nûnerên yekîneya xebitîna abûriya

komînê, pêktê. Kooperatîf, biryarên di derbarê awayê xebitînê û çalekiyên di hindirê sinûrên xwe de digre û çavdêrî dike; karparvekirin û rêkûpêk kirinên hindirê kooperatîfê de, pêktîne. Di civînên kû li dardêxe de bi rêya demokratîk; stratejiya hilberandinê, karparvekirinê, awayê xebitînê, zagonan û rê-rêbazên kû ji bo kooperatîfê dê bingeh werin girtin, diyardike. Beşên guncawê parvekirina kar û erk ya di kooperatîfê de çêdike, nûneran hildibijêre û mekanîzmaya rêveberiyê pêktîne. Bi awayê li gel rêveberiya komînê di nav hevkariyê de, xebatên rêveberiya kooperatîfê çavdêrî dike. Çalekiyên wê li rasta erêkirina komînê tên û her şeş meh carekê raporê pêşkêşî komînê dike. Kooperatîf, di rasteka têgihiştina abûriyî ya komînê de, di rasteka pêdawîstî, armanç û biryarên girtî yên komînê de, çalekiyan dimeşîne. Mijarên ji dervey sinûrên kooperatîfê jî ji aliyê pêkhate û endamên komînê ve tên nirxandin û bi biryarkirin. Li gel kû her kooperatîfek li gora şertûmercên xwe dikare were guhertin, civînên desteya giştî, bi tevî salê carek yan jî du car tê li darxistin. Endamên desteya giştî ya kooperatîfê, di heman demê de tevlê civînên meclîsên komînê jî dibin.

f. **Desteya Rêveberiyê ya Kooperatîfê:** Ji aliyê desteya giştî ya kooperatîfê û meclîsa komînê ve bi hevbeşî tê hilbijartin, tê erkdarkirin û ji aliyê wan ve tê çavdêrîkirin; di civînên salane yên meclîsa komînê û desteya giştî ya kooperatîfê de endamên wê tên nûkirin yan jî dikarin demek din jî di kar de bimînin. Desteya giştî ya kooperatîfê û meclîsa komînê bi awayek hevpar; di erkên desteya rêveberiyê, wextê erkdariyê û rêbaza xebitînê de, di rasteka pêdawîstiyên giştî yên komîn û kooperatîfê de, dema pêwîst bike dikarin guhertinan çêbikin, ji kesên hatîn hilbijartin û erkdarkirin hisab bipirsin, ji beriya demê wê were ji kar bigrin yan jî erkên wan biguherin.

Desteya rêveberiya kooperatîfê; ji nûnerên desteyên zanist, makîne-teknolojî, venêran, darayî-lojîstîk û civakî, herwusa ji nûnerên yekîneyên hilberandinê, yên meclîsa komînê û yên yekîneya xebitîna abûriyê, pêktê. Anîna ser kar ya desteya rêveberiya kooperatîfê û ya endamên wê, girêdayê pesendkirina komînêye. Di kooperatîfê de rêveberiya navendî na; belkû sîstema rêveberiya-cewherî ya demokratîk kû wek vîna hevbeş ji yekîtiya xwesertiyan pêktê ya kû komînalîteya demokratîk, demokrasiya rasterast, ji aliyê komanê ve parvekirina hevbeş ya berpirsyartî û payeyê esas digre, tê bingehgirtin. Li ser vî bingehî, rêbaza hevberdevkiyê ya kû tevayê rêveberên yekîne û desteyan bi awayek dorveger dê tê de cihbigrin û rû bi rûyê venêrana rasterast û bi bandor ya civakê dimîne, tê bingehgirtin. Di rasteka biryarên kû desteya giştî ya kooperatîfê û komîn digrin de, ji rêvebirin û guhestina kooperatîfê berpirse. Ji dervey sinûrên kû ji wan re tên kifşkirin, nikare biryar bigre û pêkbîne. Lê di rewşên naçar de; bi mercê kû li rasta pesendkirina desteya giştî ya kooperatîfê û komînê were, dikare biryar bigre. Di derbarê çalekiyên xwe de, raporê dide desteya giştî ya kooperatîfê û komînê.

g. **Desteya Zanistê:** Ji wan endaman pêktê kû ji aliyê meclîsa komînê, nûnerên yekîneya xebata zanistê ya komînê û desteya giştî ya kooperatîfê ve tên hilbijartin. Li ser bingehê sudmendiya civakî û guncawtiya li gel jîngeyê, ji bo hîn

bi berhemtir encamdana çalekiyên hilberandina abûriyî yên kû kooperatîf pêktînin, ji meşandina xebatên zanistî yên pêwîst berpirsyare. Bi armanca hatina rewşa têrker û baş ya awayê hilberandinê; tenduristî, nirxdarî û cor bi corbûna berhem, di mijarên lêkolîn, lêhûrbûn, pêşxistin, pêş-pêkanîn, berfirehkirin û perwerdeya zanistî de, xebatan dimeşîne. Desteya zanistê di wateyek din de, nûnerê akademiya abûriye di kooperatîfê de. Di derbarê çalekiyên xwe de, raporê dide meclîsa komînê, desteya giştî ya kooperatîfê û desteya zanistê ya komînê.

h. **Desteya Makînê û Teknolojiyê:** Ji wan endaman pêktê kû ji aliyê meclîsa komînê, nûnerên yekîneya xebata makînê-teknolojiyê û desteya giştî ya kooperatîfê ve tên hilbijartin. Di mijarên dabinkirin, parastin, bikaranîn û çavdêrîkirina makîne û amûr-amrazên di pêkhateya kooperatîfê heyî de, xebatên perwerdê, lêkolînê, lêhûrbûnê, pêşxistinê û pêkanînê, encam dide. Di derbarê çalekiyên xwe de raporê pêşkêşî meclîsa komînê, desteya giştî ya kooperatîfê û yekîneya makîne-teknolojiyê ya komînê dike.

i. **Desteya Venêranê(denetim):** Meclîsa komînê û desteya giştî ya kooperatîfê, bi giştî awayê karkirin û çalekiyên kooperatîfê vedinêrin. Lê li gel vê, ev mekanîzmayane bi hevbeşî desteyek ya venêrana kooperatîfê, hildibijêrin. Desteya venêranê, pişkinînê dike kû bizane gelo awayê karkirin û çalekiyên kooperatîfê li gor rêgez û zagonên kû meclîsa komînê û desteya giştî ya kooperatîfê diyarkirîne yan na. Li ser rewşên ji dervey paradîgma, rêgez û zagonan, pêşniyara lêpirsînê amade dike. Ji bo dirustkirina netêrî û kêmasiyên dîtî, di demê wê de pêşniyarên çareseriyê pêşdêxe. Di derbarê çalekiyên xwe de, raporê dide desteya giştî ya kooperatîfê û meclîsa komînê.

j. **Desteya Darayî û Lojîstîkê:** Ji endamên kû desteya giştî ya kooperatîfê û meslîsa komînê hilbijartîn û ji nûnerên yekîneya xebata abûriyê, pêktê. Karên darayî û lojîstîkê yên komînê dimeşîne û çavdêrî dike. Karên dabinkirin, parastin, depokirin, belavkirin û ji dest derxistina xak, lawir, jêderên darayî, hebûnên maddî û amûrên hilberandinê yên di destê kooperatîfê de, dimeşîne. Pêdawîstiyên xebitîn û jiyanê yên darayî-lojîstîkî yê endam û yekîneyên kooperatîfê dabin dike û parvekirina vana encam dide. Encamên maddî yên çalekiyên hilberandinê, an kû dahat û mezaxtinan çavdêrî dike. Karên pêşkêşkirina ji civak û bazarê re ya berhemên tên destxistin, rêkxistin dike. Xebatên desteka kredî û darayî ya ji bo endamên kooperatîfê jî dimeşîne. Desteya darayî û lojîstîkê, nabe kû çalekiya hilberîna abûriyî bimeşîne û xwe bêxe şûna rêveberiya abûriyê, herwusa nabe kû bi serê xwe biryar bigre. Biryarên kû meslîsa komînê û desteya giştî ya kooperatîfê digrin, derbazê jiyanê dike. Ji dervey paye û sinûrên kû jê re hatîn naskirin, nikare biryar bigre û derbazê jiyanê bike. Dibin venêrandin û çavdêrîkirina tam, vekirî û rasterast ya meclîsa komînê û desteya giştî ya kooperatîfê de dixebite û raporê pêşkêşî wan dike.

Endamên desteya venêrandin, darayî-lojîstîk û ya rêveberiyê, nabe kû ji kesên di pileya yekem de xizmên hevin werin hilbijartin û werin erkdarkirin.

k. **Desteya Civakî:** Ji nûnerên meclîsa komînê û yekîneya xebata civakî ya komînê, herwusa ji wan kesên kû ji aliyê desteya giştî ya kooperatîfê ve hatine hilbijartin, pêktê. Ji bo pêşwazîkirina pêdawîstiyên di mijarên mîna tîmarbûn, vehewan, cil li xwe kirin, sexbêriya zarokan, tenduristî, perwerde, çand-huner-werziş, desteberiya(guvence) civakî ya endamên kooperatîfê û di hindirê qada kooperatîfê de; bi rêkûpêk, bê navber xebatên ser bingeha projê, dimeşîne. Projeyên kû amadekirine, pêşkêşî meclîsa komînê û desteya giştî ya kooperatîfê dike; di rasteka pesendkirin, destek û biryarên giştî standîn de, projeyên xwe derbazê jiyanê dike. Di derbarê çalekiyên xwe de, raporê dide desteya giştî ya kooperatîfê û meclîsa komînê.

l. **Yekîneyên Hilberandina Abûriyî:** Yekîneyên hilberandina abûriyî, xwe dipesêre karparvekirina kû bi armanca hîn baştir rêkxistinkirin û bi berhemtirbûyîna çalekiyên abûriyî yên kooperatîfê hatine sazkirin. Li gora erkdarî û çalekiyên kooperatîfê, cewher û jimara van yekîneyan dikare biguhere. Ji ber kû mînaka kooperatîfa abûriya demokratîk-komînal bingeh bigre, dê pesartiyê hilberandina abûriyî be, wekû giştî bi awayê yekîneyên; Jêderên wizeyê, Dabinkirin û Komkirina Tiştên Pêwîst, Nîv bikarxistin, Tam bikarxistin, Pakêtkirin, Depokirin û Parastinê, dikarin werin rêkûpêk kirin. Herwusa li gora armanç û şertûmercên kooperatîfê, yekîneyên hêj zêdetir jî dikarin werin bi rêkxistinkirin. Li gora pêdawîstiyan, derfetên komanê û cih, kooperatîfên kû erk û armancên wan yên cuda heyî jî dikarin werin sazkirin.

Çêbûnên yekîne û desteyan yên di kooperatîfa demokratîk-komînal de, ne perçebûna çalekiyên abûriyî, hilberînê û komanê; belkû di jiyana komînê û çalekiyên abûriyî de armanca çêkirina yekpareyiya ji yekîtiya xwesertiyan pêktê, hildigre. Di vê çarçuvê de tevayê yekîne û zagon, wekû xwe bi xwe beşên temamkerên çalak yên tevayetiyêne. Di navbera yekîne û yasayan de, têkiliyên hev bi hêz û temam dikin, tên bingeh girtin.

### f. Di Kooperatîfê De Rêbaza Xebitîn û Hilberandinê:

Rêbaza xebitînê ya di giştiya komînê de tê bingeh girtin, ji bo kooperatîfan jî derbaz dibe. Di xak û avaniyên hevbeş yên kooperatîfê de, li ser lawir, amûr û amrazên hilberînê yên jêr karanîna hevbeş ya kooperatîfê de ne, xebitîna pevrayî tê bingeh girtin. Tevayê endamên kooperatîfê yên kû di rewşa xebitînêdene, li ser bingehê zagon û pîvanên destnîşankirî, herî kêm di xebatekê de cih digrin. Bi awayê kû xebata pevrayî paşnexe, ji malbatan re derfetê hilberîna takekesî jî tê naskirin. Li ser bingehê hevsengiya di navbera veguherîna civakî û pêşwazîkirina bi awayê têr û pêwîst ya pêdawîstiyên abûriyî yên civakê de, demjimêr û roja kar tê rêkûpêk kirin. Bûyîna çalekiyek ya hem bi berhem, hem pir alî sudmend û hem jî bi hezkirin tê encamdan ya xebitînê, tê pêkanîn. Di vê çarçuvê de, rojê ٦ demjimêr, di hefteyê de jî bi giştî ٣٤ demjimêr kiryara hilberîna çalak dikare were bingeh girtin. Di nava xebatê de hem bêhndan tê dayîn û hem jî pir alî kiryarên civakî, çandî-hunerî tên encamdan. Ji bo ji kesên xebatkar re derfet were dayîn kû di qadên çandî, hunerî, werzişî de xwe pêşbêxin, dibin banê komîn û kooperatîfê de damezirande(tesis) tên vekirin û derfet

tên pêşkêşkirin. Kooperatîfa demokratîk-komînal, ji bo komîn bi xwe têra xwe bike di tevayê mijarên jêr çalekiyên xwe de, perwerdeyên pîşeyê bi meclîsa komînê re di nav hevkariyê de pêktîne. Di vê çarçuvê de binyata(zemin) fêrbûna ji yekê zêdetir pîşe ya her yek endamê komînê û binyata karîna bicih gihandina van pîşeyan, sazdike. Her xebatkarek, bi navberên ٣-٥ sal dikare yekîneya xebatê û kargehê biguhere. Di karparvekirin, rotasyon û rêkûpêk kirinan de, bi awayek rast û çalak tevlêbûna tevayê endaman li biryar girtin, polîtîka çêkirin û li mekanîzmayên rêveberiya-cewherî ya dibin banê komîn û kooperatîfê de, tê bingeh girtin.

**Xebata Piştevaniyê:** Ev xebata kû meclîsa komînê û desteya giştî ya kooperatîfê bi hevbeşî rêkûpêk dike, armanca bi komîn û gelên din re piştevaniyê hildigre. Berhem yan jî dahatên kû tên destxistin, rasterast ji gel û komînên din re tê veguhestin. Li gora derfetên komîn û kooperatîfê, di hindirê bernameya kiryara abûriyî yan jî bernameya jiyana giştî de, dikare were bi bernamekirin.

**Di Çalekiyên Hilberandinê De Wekheviya Jin û Mêr:** Kooperatîf, di çalekiyên hilberandinê de li dijî zayendperestiyê têkoşînek bi bandor dimeşîne. Dema ber bi karparvekirinek ya derbazkirina rolên zayendperest yên ji jinê re hatîn kifşkirin armanç dike ve tê çûyîn, rêya hîn bi bandortir tevlêbûna jinê ya li çalekiyên abûriyî tê vekirin. Karên wekû sexbêrî û perwerdeya zarokan, şuştina cilan, xwarin-vexwarin û amadekirin yên wek karên jinê yên naçar û xwezayî tên dîtin; li jêr banê kooperatîfê yan jî komînê, di kargehên hevbeş yên jin û zilam bi hev re lê kardikin de, tên meşandin. Têgihiştin û nêzîkatiya ji jinan re dayîna karên abûriyî yên wek kêm û bêwate tên dîtin, nayê pejirandin. Li ser vî bingehî, rêya karîna cih girtina jinê ya di tevayê pêvajo û corên çalekiyên abûriyî de, tê vekirin. Ji bo vê, perwerdeyên pîşeyî û xweser yên pêwîst tên encamdan, karparvekirin û rêkûpêk kirinên wekhevîxwaz tên pêkanîn, derfetên maddî tên amadekirin.

**Parvekirina Qezenç û Berhemên Maddî:** Hilberandina pevrayî, parvekirina pevrayî û jê sudbûna pevrayî tê bingeh girtin. Berhemên kû kooperatîf di hilberînê tên radestkirina desteya darayî û lojîstîkê. Deste beşek ji vane, ji bo kû endamên komînê pêdawîstiyên xwe pêşwazîbikin, pêşkêşî bazarên kooperatîfê dike yan jî rasterast belavê endaman dike. Beşa dimîne jî, pêşkêşî bazarên kooperatîfê yan jî bazarên xwecih, yên herêmî, yên navkomîn û yên navnetewî dike. Bi dahatê tê destxistin, pêdawîstiyên bingehîn yên komîn, kooperatîf û endamên wê tên pêşwazîkirin. Xebatkarên kooperatîfê, berhemên di xebatên abûriyî yên wekû kesî ji wan re hatî naskirin de destxistîn, li ser bingehê berambertiyek diyar, radestê bazara kooperatîfê dikin. Endamên kooperatîfê di heman demê de ji ber kû endamên komînêne, pêdawîstiyên bingehîn yên malbatî û kesî yên wan, li jêr bazneya komînê û li ser bingehê rêgezên komînê, tên pêşwazîkirin. Ji endamên kooperatîfê re, bi awayê kû di astek têrker de pêwîstiya wan ya vehewînê pêşwazî bike, yek ji wan rûniştgehên kû dibin payeya bikaranîna hevbeş ya komînêdene, wekû emanet tê dayîn. Endam nikare vê rûniştgehê(konut) bifiroşe, bide kirê yan jî bi armancek din nikare bikarbîne. Herwusa amûrên di hindirê malê de yên pêdawîstiyên bingehîn; amûr-amrazên navmalê jî li gel rûniştgehê ji aliyê komînê ve tên dabinkirin. Endam, pêdawîstiyên

xwe yên tîmarbûn, cil li xwe kirin û yên dinên xwe yên bingehîn ji bo demkûrtî, ji kogeha(magaza) kooperatîfê bi awayek bê pere dabindikin. Xizmeta tenduristiyê, di nav sîstema tenduristiyê ya komînê de, bê pere tê pêşwazîkirin. Perwerde wekû pêdawîstiyek bingehîn tê dîtin û ji aliyê komînê ve tê pêkanîn. Pêdawîstiya gihandinê(ulaşım), ji aliyê amûrên gihandinê yên pevrayî yên komînê ve tê pêşwazîkirin. Ji bo pêdawîstiya ragihandinê jî amûrên ragihandinê yên pevrayî yên komînê tên bikaranîn. Lê li gel vê, bi awayê kû jiyana komînal û xebitîna pevrayî paşnexe, amûrên takekesî yên ragihandinê jî dikarin werin karanîn.

g. Bazara Kooperatîfê:

١. Têgihiştina bazar û piyaseya abûriya demokratîk-komînal, tê bingeh girtin.
٢. Zagon û derfetên awayê karkirinê ya bazara kooperatîfê; ji aliyê kongreya gel, desteya giştî ya kooperatîfê, meclîsa komînê û yekîneyên peywendîdar yên çalekiya abûriyî ve, bi awayek hevbeş tên sazkirin. Bazara kooperatîfê wan derfetan amade dike kû civak pêdawîstiyên xwe yên bingehîn bi awayek azad û wekhevîxwaz bikare tê de pêşwazîbike û berhemên xwe bikare tê de bifiroşe.
٣. Bazara kooperatîfê tenê xwe napesêre berhemên kû ew bi xwe çêdikin. Li gel berhemên kû endamên kooperatîf û komînê wekû takekesî di hilberînin û berhemên kooperatîfên din; herwusa berhemên komanên ji dervey kooperatîfê abûriya kevneşopî bingeh digrin, di afirînin jî dikare bikeve bazarên kooperatîfê.
٤. Berhemên çandinî-lawirvaniyê di astek bi nirx, demê xwe de, bi tendurist û têr de, tê gihandina civakê.
٥. Berhemê tê destxistin, rasterast û bê kû ti navbeynvanek hebe, ji pêwîstiya civakê re tê pêşkêşkirin. Bi vî awayî ji komên mîna bazirgan û sîmsar yên di hilberandina abûriyî de cih nagirin lê qezenca herî zêde distînin re, binyat nayê pêşkêşkirin; pêdawîstiyên kû pêdiviyên civakêne, bi dermaliyek hîn kêmtir, dabîn dike; dahatên çalekiyên abûriyî zêde dibe.

### ٤. DI ABÛRIYA DEMOKRATÎK-KOMÎNAL DE ÇIQÊN HILBERÎNÊ Û QADÊN ÇALEKIYÊ:

Abûrî, weke çalekiyek kû civak tenê pêdawîstiyên xwe yên bingehîn pêşwazî dike, nayê dîtin. Di heman demê de li derdora çalekiyên abûriyî, bi civakîbûyîn tê bihêzkirin. Di abûriya demokratîk-komînal de çiqên hilberandinê, têkiliyên van çiqan bi hev re û bi giştî re, li gora têgihiştina yekpareyiyê ya kû ji yekîtiya xwesertiyan pêktê, tê rêkûpêk kirin. Komîn û kooperatîf, di derbarê jêder, çalekî û beşên hilberînê yên abûriyî de kû rasterast jêr payeya karanîn û berpirsyartiya wan bi xwe de ne, bi xwe biryar digrin û derbazê jiyanê dikin. Lê biryarên kû digrin, naçare di Kongreya Gel de werin pesendkirin, herwusa bi polîtîka û biryarên abûriyî yên giştî kû li vê derê tên kifşkirin re hevsengbûyîn û guncana çalekiyên abûriyî yên dimeşînin jî, bingeh tê girtin. Bi mercê kû li rasta pesendkirina Kongreya Gel were, komîn yan jî kooperatîfa mijara gotinê, beşek ji berhemên kû destxistî ji xwe re vediqetîne, beşekê jî radestê

Yekîneya Xebata Abûriyê ya Kongreya Gel dike. Girtina biryaran û destnîşankirina polîtîka û zagonên abûriyê yên tevayê komînan bi awayek hevbeş peywendîdar dike, çêkirina bername û projeyên bi pîvanek mezin, bi tevlêbûna demokratîk ya tevayê komînan, pêktê. Şixulandina nirxên abûriyî yên hevbeş weke; jêderên avê, kanza, jêderên wizeyê kû li jêr payeya karanîna tevayê civakêdene û nirxandina berheman, xwe di pesêrin vî bingehî. Tevayê çiqên hilberandin, çalekî û têkiliyên abûriyî yên ji çandinî-lawirvaniyê ta hilberandina pîşesaziyane; li jêr banê komîn, kooperatîf û Kongreya Gel de, rasterast ji aliyê civakê ve, ji nû ve tên avakirin û rêkûpêk kirin.

Li xebatên ji nû ve avakirina abûriyê tevlêbûnek çalak ya kesên kû danhev û tecrubeyek wan di derbarê qada abûriyî de heyî, tê çêkirin. Ji nû ve avakirina çiq û qadên çalekiya abûriyî de, pêşwazîkirina pêdawîstiyên bingehîn yên civakê û guncawtiya li jîngeyê, rêgeza bingehîn ya jênegere. Di vê çarçuvê de têkiliyên her beşek yê hilberînê bi beşên din, bi yekpareyiya çalekiya abûriyî, bi civakê û bi jîngeyê re, ji nû ve tên rêkûpêk kirin. Di tevayê kargehên abûriyî de, di mijarên wek; dem, wize, ked û darayiyê de, teknolojiyên abûriyî-jîngeyî yên kû rê ji zêhakirinê re venakin, xusarê nadin tenduristiya dewrûber û civakê û di hilberînê de bi berhemtiyê çêdikin, tên bikaranîn.

Di abûriya demokratîk-komînal de, qasî kû tevayê beşên hilberînê ji civakê re xizmetê dikin, binirxin. Lê li gel vê; çiqên din yên hilberandinê, di aliyê jiyana civakî û sîstema-eko de hinek ji wan xwediyê girîngiyek kifşkerin û çalekiyên abûriyî yên kokin. Çalekiyên çandinî û lawirvaniyê, ew çalekiya abûriyî ye kû mirov yekem car li derdora wê bi civakîbûna xwe avakiriye û berdewamî pê daye. Ev çalekiya abûriyî, pêdawîstiya tîmarbûna civakê ya kû di serê her tiştî de tê, pêşwazî dike. Lê tenê bi vê ve sinûrdar namîne; li gel qadên jiyanî yên civakê yên wek; parastin, tenduristî, perwerde û ziman-çand, herwusa li ser pêdawîstiyên abûriyî yên wek; vehewîn, cil wergirtin û gihandinê jî rasterast û bi rêyên nerasterast xwediyê bandorên kifşkere. Ji demên seretayî yên bi civakîbûyînê ta roja me çawa kû ev girîngiya wê ti car kêm nebû, berûvajî hîn zêdetir bûye. Abûriya demokratîk-komînal, bi biryara; "çi qas abûrî û çanda çandinî-lawirvaniyê, ew qas civak û jînge" tevger dike. Li ser vî bingehî, çandinî û lawirvaniyê digre navenda çalekiya abûriyî û pêşengiyê dide wê. Qasî kû armanç dike civak li çandinî û xakê vegere, herwusa armanç dike çandinî û xak jî bigihin cewherên xwe û cihên kû bi maf kirîne. Li ser vî bingehî, ji pirsyara 'kîjan çandinî-lawirvanî'yê re; bersiva 'çalekiyên çandinî-lawirvaniya xwezayî-lebetî(organîk) an kû jîngeyî', dide. Lê li dijî; bi qutkirina ji tevayetiya civakê û abûriyê re anîna rewşa sektorek bazirganiyê ya çandiniya lebetî kû herî zêde qezencê tîne yan jî dîtina wê weke tenê çalekiya komên desthilat û perçeyî, têkoşînê dide. Li ser vî bingehî, çalekiyên çandinî-lawirvaniyê yên jîngeyî û civakî tên bingeh girtin.

**a. DI DERBARÊ VALA DERXISTINA NÊZÎKATIYA KOÇBERKIRIN Û MIŞEXTKIRINÊ DE:**

Koçberkirin û mişextî, ji aliyê hêzên dewletparêz ve, wekû amûra herî bi bandor ya bê abûrî hiştina civakê tim hatiye bikaranîn. Bi vê rastiyê derketina rê re

destpêkirina ji nû ve avakirina abûriya demokratîk-komînal, di heman demê de berûvajî vegerandin û vala derxistina koçberiya ji gundan berbi bajêr û ji bajêran ber bi dervey welate. Di aliyê civakî de erkdar kirin û bikarxistina hêza kedê û wizeyên abûriyî, tên bi vegerîna li welat û cihûwarê xwe gengaze. Li ser vî bingehî; kiryarên sereta;

١. Di asta netewî de pêkanîna xebatek ya pêşlêkolînê(etud) kû siyaseta koçberkirin û mişextkirinê di aliyê abûriyî-civakî de rê li ber hilweşandin û pirsgirêkan vekirî û pêşniyarên çareseriyê, dihewîne.

٢. Bi hilgirtina rojeva xwe ya mijara koçberiyê ya komîn, konseyên bajêr û meclîsên Gel; herwusa tevayê kom û rêkxistinbûyînên civaka demokratîk, di mijara afirandina çareseriyê de xistina tevgerê ya wan.

٣. Di projeyên vegere gundan de, di amadekirina bingehê abûriyî û çareseriya pirsgirêkên avanajêr de, destek girtina ji rêveberiyên xwecihî.

٤. Di hindirê yekpareyiya hişdarî, rêkxistinbûn û çalekiyê de, gihandina civakê li astek ya parastina-cewherî kû kiryarên koçberkirin û mişextkirinê vala derxe. Bi proje û helmetên(kampanya) rêkxistî, bernamekirî, amade û herwusa bi helmetên kû ji pirsgirêkan re çareseriyê bîne, berfirehkirina vegerên gundan. Li ser vî bingehî; rêkxistinkirina dij-koçberiyê yan jî koçberiya cihê xwe-welatê xwe; rêkxistinkirina tevgerekê bi armanca "koçberê welat bibe; gund-bajarê xwe ji nû ve avabike." Ne tenê rêkxistinkirina koçberiyê, li ser bingehê guncawtiya li gel pêdawîstiyên civakî û jîngeyê, bi awayê kû çareseriyên di derbarê tevayê qadên jiyana civakî de bigre nav xwe, ji nû ve avakirina gundan û bajaran. Di vê çarçuvê de, di tevayê mijarên mîna; binyat amadekirina ji çalekiyên abûriyî re, avanajêr, parvekirina xak û zeviyan, bikaranîna avê, pirsgirêka wizeyê, xizmeta tenduristiyê, perwerde û di mijarên çand-huner de, hilberandina çareseriyên lez, dem-demî û dem dirêj. Di mijara vegerên gundan de, ji qadên herî zêde pêwîstî pê tê dîtin û qadên herî zêde derfetên wan guncaw re pêşikî dayîn.

٥. Vala derxistina kiryarên mîna; bendava pîşesaziyî-SBH, avdanî, çiftlikên yekgirtî(entegre), kargehên kanzayê, avakirina santralên termîk, qedexeyên çûyîna zozanan yên bi hêceta ewlekariyê tên pesartin, vala kirina gundan û wekû herêma leşkerî beyankirina wan cihan.

٦. Ji bo berfirehkirina vegerên gundan, di çarçuveya abûriya demokratîk-komînal de, di derbarê çandinî û lawirvaniyê de avakirina kooperatîfan. Di asta xwecihî, herêmî û netewî de pêşxistina projeyên pîlot ya van damûdezgayan.

### b. DI DERBARÊ ZINDÎKIRIN Û PÊŞXISTINA ÇANDINÎ Û LAWIRVANIYÊ DE

#### ١. Ji Nû Ve Rêkxistinkirina Qada Çandiniyî:

- Di mijara çandinî-lawirvaniya jîngeyî de, di nav yekpareyiyekê de girtina dest ya hişdarbûyînê, hilberîn, rêkxistinbûn û bi sazîbûnê.

- Di derbarê koman û beşên civakî yên kû di bazneya qada abûriyî de pesartiyê çandinî-lawirvaniyê, derbazkirina jiyanê ya bernameyên perwerdê yên berfireh û bi bandor yên ser bi navenda zîhniyet û beşên hilberandinê. Li ser bingeha akademîk; an kû di nav yekpareyiya bîrdozî-pêkanîn-pêşxistin û berfirehkirinê de girtina dest ya van perwerdeyan.
- Kesên kû di derbarê çandinî-lawirvaniyê de xwedî zanist, danhev û tecrube û yên kû van çalekiyan bi cih digehînin, di çarçuveya abûriya demokratîk-komînal de û li jêr banê mekanîzmayên rêveberiya-cewherî ya demokratîk, xwe bi rêkxistinkirina wan.
- Di hindirê abûriya demokratîk-komînal de kifşkirina cih û erkê çalekiyên abûriyî yên pesartiyê çandinî-lawirvaniyê. Li ser vî bingehî di asta xwecihî, herêmî û netewî de gihandina wê ya li avana rêkxistinî û saziyî ya pêwîst. Damezirandin û bikaranîna kooperatîf û yekîneyên kooperatîfê yên di derbarê çandinî-lawirvaniyê de, enstitûyên lêkolîn-pêşxistina hilberandinê, navendên pêşxistina zanist û teknolojiyê, banqeyên tov, akademî, labaratuar û saziyên mîna vana. Hem di navbera xwe de û hem jî bi saziyên mîna vana re pêşxistina têkiliyên pesartiyê piştevanî, hevkarî û xebata hevbeş ya van saziyan. Herwusa demokratîk kirina erkdarî û naveroka rêkxistinbûnên heyî yên di derbarê qada çandiniyê de.
- Girtina nav bazneya abûriya demokratîk-komînal ya çalekiyên çandinî-lawirvaniya pîvan biçûk û têra xwe dike ya gel kû bi navê xwe yê kevneşopî tê naskirin.
- Bi bernameyên masterî, herêmî, kurt-navend û demdirêj amadekirina nexşeyên hêz-wize û çalekiyên çandinî-lawirvaniyê ya di asta welat, herêm û qadan de.
- Ji bo pêşxistina abûriya pesartiyê çandinî-lawirvaniyê, yek ji pirsgirêkên bingehîn kû çareserkirina wê nayê revandin jî karkertiya çandiniyê ya werzî-gerîdeyî û bi destheqe. Li ser vî bingehî, ji holê rakirina sedem û şertûmercên kû rê ji karkertiya çandiniyê ya werzî-gerîdeyî re vedikin. Ji bo kû ev mirov di gund û xakên xwe de, bi xwe bixebitin û bimeşînin, amadekirina binyatek ya çalekiyên çandinî-lawirvaniyê. Di rewşên kû karkertiya çandiniyê ya werzî-gerîdeyî naçar de, li ser bingehê bi rêkxistinî û hişdariya demokratîk, çêkirin û amadekirina derfetên jiyana bi keramet û xebitînê. Li gora vê, di mijarên vehewîn, tîmarbûn, tenduristî û destheqan de sazkirina têrîtiyekê, herwusa ne astengkirina çalekî û xwepêşandanên wan yên di derbarê perwerde-çand-hunera wan bi xwe de. Di têkiliyên di navbera karkerên çandiniyê yên werzî-gerîdeyî û komanên li qadên kû ew lê dixebitin de, wekû mercek bingehîn û jêneger pejirandina rêzdariya beramber hev. Dema berûvajiyê vê bûyer çêbûn jî, berdana kar û vegerîna li cih û warên xwe. Ji bo kû zarokên ji ١٤ saliyê biçûktir di van xebatan de cih negirin, rêgirî çêbibin.

**٢. Çalekiyên Di Derbarê Ji Nû Ve Belavkirin û Jı Karanînê Re Vekirina Xakan De:**

١. Ji nû ve parvekirina zeviyên çandiniyê û xakan, rêkûpêk kirina wan û anîna rewşa amadeyê bikaranînê ya wan; ka dê lig ora kîjan pîvanan û çawa werin

nirxandin, ka dê kîjan rêbaza berhem û avdaniyê derbazê jiyanê were kirin; li jêr pêkhateya mekanîzmayên rêveberiya-cewherî ya demokratîk yên mîna; komîn, kooperatîf, yekîneyên xebata abûriyî û kongreya Gel, rasterast ji aliyê gel ve tê diyarkirin, encamdan û venêrandin.

٢. Vala derxistina kiryarên ji dest standina xakên gundiyan yên di pîvana biçûk û navîn de, dibin navê li hev komkirina xakê de; herwusa li bajaran jî dibin navê rêkûpêkiya avadaniyê(imar) û avanîbûyîna modern de, standina perçe xakên bicûk yên malbatan. Li ser bingehê abûriya demokratîk-komînal hevgihandina van xakan û ji bo çalekiyên çandinî-lawirvaniyê encamdana amadekariyên pêwîst û xebitandina wan.

٣. Ji nû ve standina bin venêrîn û karpêkiriniya rasterast ya civakê ya wan xakên kû sazî û payedarên dewletê, desthilatdarên xwecih, sîxûr-hevkaran, yekdestên sermayê yan jî hêz û kesên din yên mîna vana bi rêyên ne rewiştî, ne demokratîk û ne rewa dest danibûn ser û herwusa amadekirina wan xakan ji bo xebitandina li çandiniyê.

٤. Ji nû ve rêkûpêk kirin û li çandiniyê vekirina wan zevî û xakên kû demek dirêje ji ber sedemên wek; bi mayînbûn û gemarbûna bi bermayên şer, kêmasiya avanajêr, netêriya maddî, xemsarî yan jî ji ber valakirina gundan, nayên karanîn.

٥. Di hilberîna çandiniyî de di demek kurt de ne pir berhem standin; belkû karîna bi berdewamîbûn û demdirêj zêdebûna berhem, bingeh girtin. Li ser navê destxistina pir berhem; pir avdanî, dermanên kîmyawî yan jî tovên bi hormon, nekaranîn. Li şûna van rêbazan, bi berçavgirtina binirxtiyên çandiniyî yên xakê, nîr û derfetên avdaniyê re bikaranîna zibil û peyînê xwezayî, çandina berhemên kû temamkerê hevin, encamdana rêbazên wek şûvê. Jîngeyîbûn û guncawbûna li tenduristiya civakê ya rêbazên kû di xebitandin û anîna rewşa xebitandinê ya xakê de tên karanîn, herwusa rê nedana kêmkirina avana xwezayî û bi berhemtiya xakê ya ji aliyê teknolojî û amûrên kû werin karanîn ve.

٦. Bi armanca destxistina xakên çandiniyê yan jî ji bo çandiniyê anîna rewşa hîn bi berhemtir ya zevî û xakan, têknedan û pûçnekirina tevnê xwezayî.

٧. Bi awayek hevseng û hev temamker, di nav hev de strandina rêbazên zanistî û danhev-zanista çandiniyî ya civakê kû xwe dipesêre hezaran sal, bikaranîna wê di çalekiyên çandiniyî de.

### ٣. Çalekiyên Hilberîna Çandiniyî:

١. Bingeh girtina beşên berhem, turên lawir û nifşên wan, teknolojî û rêbazên guncawê xaknîgarî, nîr, civak û çandê,

٢. Wekû pîvana jêneger bingeh girtina guncaw bûyîna li gel tenduristiya civak û xwezayê ya rêbaz û amûrên di hilberînê de dê werin karanîn,

٣. Li dijî yekdestdarkirin û bi pîşesazîkirina çandiniyê têkoşîn kirin. Li dijî hilberandin, bazarkirin û bikaranîna berhemên çandiniyê yên bi hormon û OGG(GDO), standina tedbîrên bi bandor.

٤. Wekû rêbaza esasî bingeh girtin, berfirehkirin û desthilatkirina çandiniya jîngeyî. Di vê çarçuvê de bi dirêjiya pêvajoya çalekiya çandiniyî ya ji dema vebûna xakê ji çandiniyê re ta bikaranîna berhemên tên destxistin, bi karanîna rêbaz, teknîk û amûrên jîngeyî. Bikaranîna tov-şitil, peyîn û dermanên xwezayî.
٥. Di derbarê zêdekirina jimar û cor bi cortiya hilberîna çandiniyî de pêkanîna rêkûpêktiyan. Li ser vî bingehî amadekirina bernameyên xwecih, herêmî û netewî û herwusa pêşwazîkirina pêdiviya avana jêr û avana jor ya pêwîst.
٦. Parastin û standina bin ewlekariyê ya şînatiyên endemîk(şînatiyên di xwezayê de bi xwe xwe çêdibin) û corên fêkî yên kîvî. Ji pîşesazîyanekirina wan û ji aliyê yekdestên çandinî û dermanan ve hatina şelandina wan re derfet nenaskirin. Bi berfirehkirin û belavkirina çandiniya van şînatiyan ya guncawê jîngeyê re dorfirehkirina qadên wan û bi awayê kû ji pêdawîstiyên civakê re bibin bersiv, nirxandina wan.
٧. Bi armanca hilberandina çandiniyî berfirehkirin û belavkirina hatina nirxandina darên fêkiyên endemîk kû dema werin aşîkirin destdayê bijûniya(verimli) fêkiyê bi berhem û binirxe. Di pêşxistina corên fêkî de ji van daran sud wergirtin.
٨. Parastin û pêşxistina berhemên xwecih, herêmî û netewî. Belavekirina çandina van berheman, astengkirina bi pîşesaziyanekirina tovên wan û hatina standina bin parastina taybet de.
٩. Bi pêşdexistina çandiniya berhemên kû li gora erdnîgariyê û nîr guncawin lê nayên hilberandin re anîna rewşa kû têrê bike ya jêderên tîmarbûnê, şînatiyên alif û herwusa jimar û cor bi cortiya şînatiyên pîşesaziyî.
١٠. Li rex berhemên mîna; kîvara çandî, kaparî(gebreotu) û tûfrengiyê(çilek) bi mercê kû civakî û jîngeyî be, pêşxistina serevaniyê(seracılık) jî.

### ٤. Çalekiyên Hilberîna Lawirvantiyê:

١. Bi têkoşînkirina li dijî têgîna wekû hilberîna goşt dîtina çalekiyên lawirvantiyê re pêşxistina çalekiya lawirvantiyê ya di çarçuveya berhemên lawirî yên ji dervey goşt de.
٢. Li dijî lawirvantiya pîşesaziyîvan ya kû lawiran wek tiştên bêcan-bêgiyan û tiştên bazirganî dibînin, têkoşîn kirin. Li ser bingehê jîngeyî û civakî meşandina hilberîna pîşesaziyane ya di qada lawirvantiyê de.
٣. Pêşîgirtina desteserkirina dibin navê hilberîna mîkro-kredî, peymandar yan jî bi pere ya ked û nirxên abûriyî yên civakê ji aliyê hêzên sermayê ve. Ji aliyê komîn û kooperatîfan ve derbazkirina li jiyanê ya proje û bernameyên kû çalekiyên lawirvantiyê yên kevneşopî û bi pîvana biçûk jî digrin nav xwe.
٤. Anîna asta têrê bike ya çandina alifê lawiran, herwusa berbelavkirina bikaranîna wekû alif ya telp û armuşkên ji ber çandin û pêkarkirina berhemên çandiniyî dimîne.
٥. Ji nû ve rêkûpêk kirina belavkirin û bikaranîna jêderên avdaniya mêrg, çêrgeh û lawiran.
٦. Bi rojanekirina kevneşopî û rêbaza jiyana koçertiyê re ji nû ve zindîkirina wê û rakirina astengiyên li pêşiya vê.

٧. Di lawirvantiyê de li ser bingehê rast bi hev gihandina rêbazên kevneşopiyê û rêbazên zanistî yên hemdem. Li ser vî bingehî bi awayek rast û têrker bikaranîna mînakên pîşesaziyî û teknolojiyên jîngeyî-abûriyî yên dij-pîşesaziyîvaniyê. Di timarkirina lawiran û pêşxistina corên wan de giranî dayîna li ser turên xwecih. Li rex vê, destek kirina turên din jî kû destdayê nîr û erdnîgariyêne.

٨. Di gundan de dema giranî ji pez û lawirên kolikî(kumes) re tê dayîn; di qadên deştî yên nêzîk bajêran de giranî dayîna ji dewar-lawirên ser mezin û yên kolikî re.

٩. Bi awayek hîn bi bandor nirxandina derfetên di mijara lawirên kolikî, mêşvantî û masîvantiyê de.

١٠. Xwedîkirina kurmê hewrîşim û pesartiyê vê, belavekirina hilberandina hewrîşim.

١١. Tîmarkirin, sexbêrî û parastina tenduristiya lawiran û herwusa di vehewandina wan de bikaranîna alif, derman, amûr û rêbazên xwezayî.

### ٥. Di Derbarê Bikaranîn û Pêkarkirina Berhemên Çandinî-Lawirvaniyê De:

١. Ne bi heyberên kîmyawî û sentetîk, belkû bikaranîna rêbazên xwezayî, pir alî pêkarkirina berhemên çandiniyê û herwuha bi vî awayî bi sazkirina têrîtî û cor bi cortiya berhem re astengkirina zêhakirinê.

٢. Avakirina demezirandeyên(tesis) pêwîst kû berhemên tên bidestxistin li cihên kû tên hilberandin, dê hatina rewşa amadeyê bikaranînê, dabin bikin. Di pêkarkirina berheman de bingeh girtina parastina tam, çeşnî(lezzet) û tazeyiya xwezayî. Li ser vî bingehî berhemên zad û qût yên di qada kû tên hilberandin de anîna wan ya rewşa berhemên wek; ar, meqerne, hişk kirî, konserve, tirşî, rêçal, salçe, ava fêkî û dohn. Ji bo kû şînatiyên alif bikarbîne, avakirina karxaneyên alif, ji bo şînatiyên pîşesaziyî bikarbîne, avakirina karxaneyên ben, raçandin-vehandin û boyaxê, herwusa avakirina atolyeyên kogehan(konfeksiyon-magaza).

٣. Bêy kû berhem tazeyî û taybetiyên xwezayî yên xwe wek; tam, çeşnî, bêhn û hwd… windabikin, bingehgirtina pêşkêşkirina rasterast ji xizmeta civakê re.

٤. Li jêr pêkhate û banê komînan û kooperatîfan, derbarê lawirvantiyê de avakirina kargehên pîşesaziyî-yekgirtî yên pesartiyê bingehê jîngeyî. Xwedîbûyîna van kargehan ya amûrên hilberandinê, têrûteseliya teknîkî û derfetan kû bikarin tevayê berhemên bingehîn û nebingehîn yên di çalekiyên lawirvantiyê de bi destdêxin, pêkarbikin û wan bînin rewşa amadeyê pêkarkirinê.

٥. Wekû nirxê abûriyî dîtin û bikaranîna tevayê berhem û amûr-amrazên dikevin nav bazneya çalekiyên lawirvantiyê de.

٦. Bi rêya bazarên serbest yên girêdayê komînan û kooperatîfan, navendên belavkirinê û kogehan, ji civakê re gihandina berhemên tên destxistin.

### c. DI DERBARÊ NÊZÎKATIYA LI TEVNÊ XWEZAYÎ Û DARISTANAN DE:

Qadên daristanî û tevnê xwezayî, bi awayê rasterast û nerasterast taybetiyên abûriyî yên pir girîng hildigrin. Lê ev dewlemendî, bi pîvana maddî nikarin werin nirxandin û nikarin weke jêdera danheva qezenç-sermayê werin dîtin. Ji ber taybetiyên we yên wek; jêdera oksîjenê, sedemê barîn û xunavê, rêgiriya lêmişt-ramalînê(ezozyon), zêdekeriya berhemdariya çandiniyî ya xakê, bûyîna qadên herî girîng yên sîstema-ekoyê, ji bo berdewamiya jiyanê alîkarî û destekên kifşker pêşkêş dikin. Daristan û tevnê xwezayî, mîratê bi milyonan sale kû ji civaka roja me re hatiye hiştin. Ji ber vê sedemê, tenê komên li herêma mijara gotinê jiyan dibin peywendîdar nakin, nabe kû li jêr payeya bikaranîna her çi hêz yan jî komekêdebin, nabe werin tiştkirin û malkirin û herwusa nabe kû wek jêdera danheva qezenç û sermayê werin dîtin. Abûriya demokratîk-komînal, li ser bingehê vegerîna li xwezaya civakî, veguherîna çanda jiyanê armanç dike. Ev nêzîkatî, rêbazên ji qadên daristanî û betenoka(bitkiortusu) xwezayî sudmendbûna civakê jî diguhere. Di vê çarçuvê de, rêjeya mezaxtina jêderên daristan û betenokê jî, di rêjeyek mezin de dadikeve. Di rewşên mezaxtina naçarî de jî paşda vegerandina qezençkirina hîn zêdetir ya hatî kêmkirin, tê bingeh girtin. Bi derketina rê ya van rastiyan re, li dijî bipîşesaziyanekirina daristanan û betenoka xwezayî, dijî anîna rewşa sektora bazirganiyê, herwusa dijî bikaranîna ji dervey pêdawîstiyên naçar û nayên revandin, bi awayek berbilav û bi bandor, têkoşîn tê kirin. Qad û meydanên hokeya çîm û golfê, dibin navê mîmariya modern û rêkûpêktiya dewrûber de bi betonkirinê, çêkirina komira daran, bendavên bi pîvana mezin û projeyên din yên pîşesaziyî, rewa nabîne.

**Çalekiyên Hilberîna Daristanvaniyê:**

١. Di civakê de pêşxistina hişdarî û hişmendiya sexbêrî-parastina daristanan û tevnê xwezayî; ji bo kû ev hiş di kiryarê de îfade û pênaseya xwe bibîne, berbi rêkxîstinbûyîn û rêkûpêkiyên pêwîst ve çûyîn. Wekû sudmendtirîn çalekiya abûriyî girtina dest kû aliyên civakî û çandî yên bi daristankirin û bi darkirinêne jî belavekirina wê ya bi awayê kû bigihe asta çandê. Di vê çarçuvê de rêkûpêk kirina helmetan(kampanya) bi awayek kû bi bandor, berbelav û bê qutbûn be.

٢. Di mijara qadên daristanî û tevnê xwezayî de, li ser bingehê abûriya demokratîk-komînal, kifşkirina stratejiyek giştî û çêkirina polîtîka û rêkxistinbûyînên guncawê vê.

٣. Di giştiya welat de sazkirin û derxistina nexşeya daristan û betenokê. Amadekirina rapora pêşlêkolînê(etud) kû bi tevayê aliyan ve rewşa rojaneyî û rûxînên tên jiyankirin yên daristan û tevnê din yê xwezayî, digre dest. Beramberê vê, ji bo ji nû ve dewlemendkirina qadên daristanî û tevnê xwezayî yê din, amadekirina projeyên kû derfetan, pirsgirêkan û pêwîstiyên divê werin kirin digre nav xwe û herwusa di asta welat û herêman de amadekirina projeyên kû bernameyên masterî, netewî, herêmî û xwecihî digrin nav xwe.

٤. Bingeh girtina çandina darên kû guncawê erdnîgarî û nîrê qada kû çandiniya daran lê tê kirin. Mînak; neçandina darên wek okalîptûs kû pir avê dimezêxin.

٥. Herî kêm sazkirina qadek ya daristanî û parastina wê ya her gundekê. Bi vê re di bajaran de pêkanîna qadên daristanî û bi şînatî yên têr.

٦. Nûkirin û çak kirina daristanên bi sedemên cuda xirab bûne û rûxiyane.
٧. Daxistina asta herî jêr ya sedemên kû rê li ber şewatên daristanan vedikin, ji bo kû di demê wê de û asta têrker de destkarî û rêgirî li şewatên daristanan yên çêdibin bê kirin, standina tedbîrên pêwîst. Ji bo vê qasî rêkxistinbûyînên pêwîst, herwusa dabinkirina perwerde û têrûteseliya teknîkî ya têrê bike.
٨. Di encama vegerîna çanda jiyanê de ji ber kû bikaranîna amûrên plastîk û sentetîk yên din dê kêm bibe, dibe kû wek berçav zêdebûna bikaranîna daran çêbibe. Bi vê rastiyê derketina rê re; bi awayek berbilav û berfireh sazkirina qadên daristanên biçûk û yên mezin kû ji darên guncawê çêkirina amûran yên wek; spîndar, qaç, çam, gurgan û hwd… pêktên.
٩. Vala derxistina wan polîtîkayan kû qadên daristanî yên girêdayî gel bi zanabûn yan jî di encama xemsariyê de bê çavdêrî dihêlin û di şewitînin, bi vê rêyê erk û girîngiya daristanan didin windakirin û piştî tînin vê rewşê jî, pêşkêşî yekdestên sermayê dikin.

**d. DI DERBARÊ BIKARANÎNA KANZA, PETROL Û JÊDERÊN DIN YÊN XWEZAYÎ DE:**

١. Di tevayê mijarên ta bikaranîn, pêxebitîn, bikarxistinê ya kanza, petrol û jêderên xwezayî yên din de, bi bingeh girtina abûriya demokratîk-komînal, di asta netewî de ber bi rêkûpêk kirina ji nû ve çûyîn.
٢. Bi rizgarkirina ji yekdestên hêzên dewlet û sermayê yên ji dervey abûriyê ya jêderên xwezayî û kargehên derbarê vana de, bi rêya komîn û kooperatîfan girtina jêr venêrana civakê.
٣. Wekû pêwîst û qasî têra pêşwazîkirinê bike hatina nirxandina pêdawîstiyên civakî; derbazkirina li jiyanê ya van stratejî û polîtîkayên di rasteka vê armancê de û sazkirina rêkxistinbûnan.
٤. Di tevayê pêvajoyên di derbarê bikaranînê û nirxandinê de, bingeh girtina xusar negihandina li tevnên civakî, dîrokî, xwezayî û çandî.
٥. Di çarçuveya bernameya xwecihî-herêmî-netewî de bi awayê kû li gel qadên din di nav hevsengiyekê de be, li qadên kû dewlemendiyên binerd lê tên derxistin, li heman qadan bikaranîna wan destkeftên kû tên derxistin û bingeh girtina vegerandina wan ya li berheman.
٦. Li pêşiya pêşveçûna çalekiyên abûriyî yên din yên civakê, nebûyîna asteng ya rejîm, polîtîka û kiryarên di mijara nirxandina jêderên xwezayî de.
٧. Bikaranîna jêderên jeo-termal bi armanca pêşwazîkirina pêdawîstiyên mîna birq û germbûnê ya komîna kû di hindirê qada jiyanê ya wê komînê de cih digre, belkû ne bi armanca bazirganî-qezencê. Li gel vê bi armanca tenduristiyê, bi awayek bê pere wekû ji karanîna tevayê civakan re vekirî, xebitandina wan.

**e. DI DERBARÊ BIKARANÎNA JÊDERÊN AVÊ DE: (jêderên ava vexwarinê, rubar, gol û ava binerd):**

Di abûriya demokratîk-komînal de, her core jêderên avê, wekû nirxê tevayê mirovatiyê tên dîtin. Her core jêdera ava vexwarinê, rubar, gola xwezayî û jêdera ava

binerd, wekû malê yekdestên sermayê û desthilatdariyê nikare were dîtin û were bazirganîkirin. Lê di heman demê de komanek yan jî gelek kû li herêma jêderên mijara gotinê lê heyî jiyan dibe, ne xwediyê wî mafiye jî kû bi tena serê xwe û çawa bixwaze van jêderan bikarbîne. Bi cewherî av, ya tevayê civakê ye; nikare bibe ya hêz yan jî komanek bi her awayî. Di mijara bikaranîn û pêkarkirinê ya tevayê jêderên avê de, bi awayê kû guncawê zîhniyet, têgîn û rêgezên abûriya demokratîk-komînal bibe, berbi rêkûpêktiyan ve tê çûyîn.

١. Rasterast standina jêr venêran û parastina civakê ya tevayê jêderên avê.
٢. Li ser bingehê rêgeza ‘sifir xusara jîngeyî’, nirxandina tevayê jêderên avê yên mîna rubar, gol avên binerd û kanî, bi awayê kû têra pêşwazîkirina pêdawîstiyên bingehîn yên civakê bike.
٣. Standina tevayê jêderên avê ya rasterast jêr bikaranîn û pêkarkirina hem komên li herêma kû ev jêderên avê lê ne, jiyan dibin û hem jî tevayê mirovatiyê. Ji aliyê kooperatîfa komînê ya li herêmê jiyan dibe ve şixulandina her çi jêderek ya avê. Lê, di navbera komîna mijara gotinê, gelên din yên li herêma jêdera avê lê heyî jiyan dibin û gelên li giştiya cîhanê tengaviya avê jiyan dibin de bingeh girtina rêbaza parvekirinê ya hilberîna kû di vê karxanê de tê destxistin. Di parvekirinê de girtina dest ya têgîna wekheviyek kû xwe di pesêre hevsengiya hêz, ked û pêdawîstiyê.
٤. Ji karanîna wekû metayê derxistina ava vexwarinê. Bi awayek bê pere, bi tendurist û têrê bike, rasterast ji van jêderan dabinkirin û pêşwazîkirina pêdawîstiya ava vexwarina xwe ya civakê.
٥. Astengkirina bikaranîna li ser bingehê pîşesaziyî ya jêderên avê. Li ser vî bingehî li şûna SBH’yan wekû heman girêdayê sîstemên wizeyê yên jîngeyî; bikaranîna sîstemên bendava xwecih ya bi tevger kû di aliyê jîngeyî de xusarê nadin yan jî ev xeterî di sinûrên herî kêm de dimîne. Destur nedayîna projeyên avdaniya çandiniyî ya pîşesaziyî.
٦. Li ber qeraxên jêderên avê yan jî li herêmên nêzîkê wan, ne avakirina kargehên pîşesaziyane. Di demên naçar de jî, qirêjkirin û gemarkirina avê ya van kargehan, wekû mercek yê neyê pejirandin were destnîşankirin.
٧. Di her rewş û şertûmercan de, astengkirina avêtina gelaş û bermayan ya li nav jêderên avê yên mîna cok-kanî, rubar û golan.
٨. Destur ne dayîna kanza, petrol yan jî her projeyek din ya dibin erdê de were encamdan kû rê li ber cih guhertin, paşda vekêşan yan jî gemarbûna jêderên avê yên binerd veke.

### f. DI DERBARÊ HILBERANDINA PÊDAWÎSTIYÊN PÎŞESAZİYÎ DE: (berhemanîn-pîşesazî)

Hilberîna pîşesaziyî, beşek pir berfireh ya hilberîna abûriyî ye. Tevayê amûr-amraz û keresteyên kû di qadên jiyanê û pêdawîstiyên bingehîn yên civakê de tên bikaranîn, di çarçuveya vê beşa hilberandinê de ne. Hilberîna pîşesaziyî di aliyê derketina xwe de, li ser pêwîstiya amûr-amraz û keresteyên kû di çalekiyên çandinî-lawirvaniyê de

derketî holê, hatiye sazkirin. An kû binaxeya hilberîna pîşesaziyî, xwe di pesêre çandinî-lawirvaniya kû çalekiya abûriyî ya koke. Lê hilberîna pîşesaziyî jî di hatina rewşa çandekê û belavebûyîna hilberîna pesartiyê çandinî-lawirvaniyê de bûye xwediyê rolek kifşker. Abûriya demokratîk-komînal, cudatiya di navbera hilberîna pîşesaziyî û hilberîna çandinî-lawirvaniyê de wek cudatiyek destsaz(yapay) ya kû karê hêzên dewletparêze, dibîne û red dike. Ji ber kû tevayê beşên hilberandinê wekû hêmanên hev temam dikin û giştiyê sazdikin digre dest, hilberandina pesartiyê hilberîna pîşesaziyî(hilberandina sanayî) û çandinî-lawirvaniyê; abûriyên bajêr û çolê ne wekû rikber û dijberên hev, belkû wek temamkerên hev, digre dest. Li ser vî bingehî, çiqê hilberîna pêdawîstiyên pîşesaziyî, ji nû ve tê rêkûpêk kirin. Kargehên pîşesaziyî, li gora mezinahî û qadên çalekiyên xwe, li jêr venêran û payeya bikaranîna kooperatîf, komîn yan jî kongreya gel de ne. Dabinkirina amûran, rêbazên bikarxistinê, derfetên xebatê, awayên hilberîn û parvekirinê, bi rêya mekanîzmaya rêveberiya-cewherî ya demokratîk ji aliyê civakê ve tê destnîşankirin. Dema kû kargehên bi pîvan biçûk li jêr venêrana hevbeş ya komîn yan jî kooperatîfa kû girêdayê wê kardikin de ne; kargehên bi pîvan navîn jî li jêr venêrana hevbeş ya komîn û kooperatîfên li herêmên dikevin nav bazneya qadên çalekiya wan de ne.

### g. DI DERBARÊ POLÎTÎKAYA WIZEYÊ DE:

Di abûriya demokratîk-komînal de, yekdesta hêzên sermaye-desthilatdariyê ya li ser jêderên wizeyê, nayê pejirandin. Tevayê jêderên wizeyê, bi rêya komîn û kooperatîfan rasterast ji aliyê civakê ve tên xebitandin û venêrandin. Li şûna sotemeniyên fosîl û bermayan, bikaranîna jêderên wizeyê yên şûnde tên vegerandin û dikarin werin berdewamkirin, tên bingeh girtin. Li ser vî bingehî, rêbazên bi corê; wizeya tavê, hîdrolîk, termal, bîo-dîzel û metan tên bikaranîn. Di rewşên kû sotemeniyên fosîl bi naçarî tên karanîn de jî di mijara daxistina asta herî jêr ya têkdan û rûxandina jîngeyî de, tevayê tedbîr tên standin. Di xebitandin, parvekirin û bikaranîna jêderên wizeyê de têgîna yekpareyî û giştîgiriyê ya ji yekîtiya xweseran pêktê, tê bingeh girtin. Li gel vê, her komîn, kooperatîf û kargeha abûriyî, bi mercê jîngeyî û civakî be, armanç dike kû di asta têr de ji xwe re pêdawîstiyên xwe yên wizeyê dabinbike.

### h. DI DERBARÊ GEŞT Û GUZARÊ(turizm) DE:

Abûriya demokratîk-komînal, geşt û guzarê ne wek sektorek bazirganî ya kû qezencê bi dest xwe ve tîne, belkû wek çalekiyek ya kû bi civakîbûyînê bi hêz dike, dibîne. Li ser vî bingehî geşt û guzar; di nav çand, koman û netewan de pêwîste destek û alîkariyê pêkêşî pêşxistina hev naskirin û têgihiştinê, piştevaniyê, parvekirinê û têkiliyên di navbera civakan de, bike. Hîn baştir têgihiştina dîroka gerdûnî, bihêzkirina hişê hevbeş yê dîrokî-çandî yê civakan û parastina nirxên wan, bi awayek hevbeş tam û coş girtina ji şaheberhemên(şaheser) xwezayê ya tevayê komanan, digre navenda xwe. Dahatên pesartiyê geşt û guzarê jî tên veguhestina zimhêra(fon-butçe) kû dê bi armanca parastin, nûjenkirin û nasandina tevayê nirxên

dîrokî-çandî û şaheberhemên xwezayî yên tevayê mirovatiyê û di giştiya cîhanê de heyî, were sazkirin û guncawê vê armancê tê nirxandin. Ev zimhêr, di navbera komîn û kongreyan de, li gora hîmên demokratîk tê sazkirin, xebitandin û venêrandin.

### i. TÊKILDARÊ ÇALEKIYÊN ABÛRIYÎ YÊN DI DERBARÊ XIZMETAN DE:

Nirxên mîna; piştevanî, parvekirin, alîkarîkirin û mêvanperwerî yên wek bingehê jiyana mirovî û civakî tên bingeh girtin, di modernîteya kapîtalîst de ji cewherê xwe hatine valakirin û dibin navê sektora xizmetê de li jêdera danheva qezenç û sermayê, hatine veguherandin. Abûriya demokratîk-komînal, vê têgînê red dike. Di rewşên naçar de, dema kû mirov ji mal, xizim, nasyarên xwe yan jî ji cihên lê jiyan dibin dûr dikevin; tê bingeh girtin kû mirov pêdawîstiyên xwe yên bingehîn wek; xwarin-vexwarin, vehewîn û hwkd… bi rêya bihêzkirina jiyan û çanda komînal pêşwazîbikin. Li şûna têgihiştina xizmeta qelb ya kû tê de her tişt xwe di pesêre pere, bi bingeh girtina nirxên mîna piştevanî, parvekirin û alîkarbûnê, mirov dikarin pêdawîstiyên xwe yên mijara gotinê pêşwazî bikin. Ev rêbaz dema kû li milekê bi civakîbûnê bi hêz dike, li milê din dê rêya beralîkirina derfetên maddî li çalekiyên abûriyî yên rast, veke.

### ٥. XWESERTIYA ABÛRIYÎ

Ji beriya çi bûyîna xwesertiya abûriyî, ji çi nebûyîna wê destpêkirin, dê sudmendtir be.

Xwesertiya abûriyî; têgîn û polîtîkayên têkildarê abûriyê yên kapîtalîzma dewletparêz, kapîtalîzma taybet, versiyonên dewletparêziya bi sosyalîzm dapûşandî û mînaka têkel, red dike. Xwesertiya abûriyî ne ewe kû dibin navê serbixwebûnê de netew yan jî civakek, qada xwe ya abûriyî li ser bingehê navendî û wekû dewletek cuda, rêkxistin bike. Ji ber kû bi mînakên hatîn diyarkirin, abûrî serbixwe nabe; belkû berûvajî, dibin vî bergî de hîn zêdetir dikeve rewşa pêgiriya modernîta-kapîtalîst û sîstema wê ya netew-dewletan.

Tê destnîşankirin kû armancên bingehîn yên wek; derbazkirin an kû bihûrtina desthilatdariya navendperestî ya netew-dewletê ya li ser abûriyê, herwusa bihêzkirina xwesertî û pêşdestiyên(inisiyatif) netew-dewletê, yên federalîzm, xwesertiyên kargêriyî yên pesartiyê herêm-parêzgehan û yên “ajansên geşebûyîna abûriyî”ne kû bi hêzkirina rêveberiyên xwecihî re di salên dawiyê de hatîne belavekirin û berfirehkirin. Ev nêzîkatiyane, çareseriyên nav dewletîne û di rastiyê de armancên bi temamî veguhestina li sîstemê ya danhevên abûriyî yên civakî û herwusa li ser qada abûriyî hîn zêdetir kûrkirin, belavekirina desthilatdariya xwe ya hêzên modernîteya kapîtalîst û netew-dewletê, hildigrin. Li milê din di encam de ev mînakane ji ber kû ji aliyê bloqên sermaye-desthilatdariyê ve tên sazkirin, reform û guhertinên kû tê inyatkirin ji bo sudê civakê çêdikin jî, herdem bi dibetiya tinebûnê re rû bi rûne.

Xwesertiya abûriyî, herwusa ne abûriya marjînal û daxiraw ya gunde kû wek abûriya kevneşopî tê binavkirin; ne ew rêkxistinbûyînên yekîneyanin jî kû beşên

hilberîna pîvan biçûk di navbera xwe de sazdikin. Ji ber kû ev avanîbûn, li beramber modernîteya kapîtalîst û netew-dewletê, ji vîn, hêz û rêkxistinbûyîna berxwedanê, bêparin. Ji ber kû wusanin jî derfetên têra xwe kirinê her kû diçe ji destê wan tê standin û hêz-wizeya wan ya abûriyî tê veguhestina kapîtalîzmê.

Xwesertiya abûriyî, çawa kû ne çalekiyên abûriyî yên girtî, bi xwe re sinûrdar û ji hev qutin, herwusa ne ewe jî kû çalekiyên abûriyî yên komanên cuda kû li herêmekê yan jî welatekê dijîn, dibin navê yekîtî-yekpareyiyê de ji tenê navendekê ve werin beralîkirin.

Xwesertiya abûriyî çiye?

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di paraznameya xwe ya bi navê "Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Netewa Demokratîk" de, girîngiya xwesertiya abûriyî wuha bilêv dike: *"… Xwesertiya abûriyî, li hevhatina biçûk ya di navbera netew-dewletê û netewa demokratîk de were gihiştine. Li hevhatin yan jî çareseriyek dibin wê de, tê wateya radestbûn û "tine bibe" yê. Xwesertiya abûriyî veguhestina li serbixwebûnê, tê wateya netew-dewletek beramber kû ev jî di encam de radestbûna li modernîteya kapîtalîste. Ji xwesertiya abûriyî paşgezbûn jî radestbûyîna li netew-dewleta desthilate. Naveroka xwesertiya abûriyî, ne kapîtalîzma taybet û ne jî kapîtalîzma dewletê bingeh nagire. Wekû awayê demokrasiyî yê li abûriyê vedayî û derbûyî, pîşesaziya jîngeyî û abûriya komînê bingeh digre. Sinûrê kû ji bo pîşesaziyê, geşebûnê, teknolojiyê, kargehan û xawendarîtiyê tê kifşkirin, sinûrê bûyîna civaka jîngeyî û demokratîke."*

Abûrî, ji ber kû yek ji qadên bingehîn yên civakêye, bi wan re di nav yekpareyiyekê de tê destgirtin. Li ser vî bingehî xwesertiya abûriyî ewe kû netewa demokratîk ya bi xwesertiya demokratîk re digihe avanîbûnekê, qada xwe ya abûriyî di bingeha xweser de ji nû ve avabike.

Xwesertiya abûriyî ewe kû, qada abûriyî ji navendperestiyê, yekaneperestiyê û yekdestiyê, ji kapîtalîzma taybet û ya dewletê, herwusa ji dewletperestiyê û desthilatdariyê were dûrkirin; li şûna vê dubare wekû qadek ya civakî û ji aliyê civakê ve were rêkxistinkirine. Lê derfet nayê dayîn kû her çi hêzek xwe deyne cihê civakê û li ser navê civakê; ji dervey vîna civakê-komanan, ji derve ve, pesartinên navendî bike. Ji biçûk ta mezin tevayê koman, yekeyên civakî û wargehên niştecihbûnê, çalekiyên xwe yên abûriyî, bi vîn û biryarên xwe pêktînin; hêz û wizeyên abûriyî yên xwe, bi xwe dixebitînin; di vê bingehê de qada abûriyî avadikin. Wate, ji dibetiyek ya kû rêya navendîperestiyê, desthilatdariyê, dewletê û yekdestiyê veke re bêy kû binyat pêşkêş bike; ji aliyê xwecihiyan ve ji nû ve avakirina qada abûriyî ye. Xwesertiya abûriyî qasî kû xwe dipesêre xwecihiyan, tevayiya kû ji yekîtiya xwecihiyan pêktê ye. Her yek civat yan jî wargeha niştecihbûnê, çalekiyên xwe yên abûriyî bi xwe rêkxistin dike, pêktîne û venêran dike. Lê eşkereye kû tevayê nirx, danhev û çalekiyên dikevin nav bazneya qada abûriyî de jî, encama keda civakî, payeya şixulandina civakê û tevaya wê peywendîdar dikin. Li gel vê, her civatek bi temamî bi derfet û hêza xwe tenê beşek yê pêdawîstiyên xwe yên bingehîn dikare pêşwazî bike. Ji çalekiya

abûriyî jî wêdetir, ti civat yan komanek bi tena serê xwe ne xwediyê wan hêz û derfetane kû jiyana xwe berdewam bike. Ji ber van sedeman, civat û xwecih, qasî kû di aliyê berdewamkirina jiyana xwe de heyî, di qada abûriyî de jî bi awayek jê neyê revîn naçarin kû bi hevre piştevanbin, hevparbin, bi hev re tevger bikin-bixebitin-hilberînin û bi hev re parvebikin. Her civat û komanek dema kû qada xwe ya abûriyî bi awayek xweser rêkxistin dike, ji milê din ve ev xwesertiyane bi hatina gel hev re, xwesertiya abûriyî ya kû qada abûriyî ya tevayê civakê digre nav xwe; an kû xwesertiya abûriyî ya wek yekîtiya xweseran, sazdikin. Di xwesertiya abûriyî de civat, xwecih yan jî xweser, ji derve ve bi zexta vekirî yan jî veşartî ya her çi hêzekê na; belkû bi temamî bi vîn, xwestek, biryar û çalekiyên xwe, di bingeha ji diltiyê de yekîtiyê sazdikin û vê yekê berdewam dikin. Tevayê civat, xwecih û xweser, rasterast li ser bingehê tevlêbûna demokratîk û wekheviyê, sîstema xwesertiya abûriyî bi hev re avadikin û dimeşînin. Têkildarê abûriyê standina biryaran, çêkirina polîtîkayan, amadekirina plan, proje û bernameyan, pejirandina wan, pêkanîna wan û nirxandina encamên wan, di vê çarçuvê de pêktê.

Xwesertiya abûriyî, ji ber kû sîstemek ya di nav giştiya xwesertiya demokratîk de ye, bê guman dê çarçuveyek zagonî hebe kû bingeh bigre. Lê, bi zagon û sîstema huquqê ya yek alî ya netew-dewletê û modernîteya kapîtalîst kû bi sinûrên ne xwezayî û bi destê xwe xîzikdayî re koman, netew yan jî civak xistî bin desthilatiya xwe û qada wan ya abûriyî desteser kirî, ev pêdawîstî nayê pêşwazîkirin. Binyata rewayî û çarçuveya yasayî ya xwesertiya abûriyî, xwe di pesêre hebûna civaka exlaqî-polîtîk. Xwesertiya abûriyî, di vê çarçuvê de zagon, rêgez, pîvan û rêûresmên xwe kifşdike.

Avakirina xwesertiya abûriyî û berdewamkirina hebûna wê, nabe kû ji rehm û pesendkirina dewletê re were hiştin. Lê xwesertiya abûriyî, li ser dijbertiya dijî dewlet yan jî sermaya taybet re na; belkû li ser avakirina qada xwe ya abûriyî re hebûnê peyda dike. Ji aliyê sîstema dewletparêz ve hatina pejirandin yan nepejirandina wê, giringiyek kifşker nîşa nake. Ji bo avakirina xwesertiya abûriyî; destûr standina ji hêzên netew-dewlet yan jî modernîta kapîtalîst, li hevhatina li ser pêkanîna hinek guhertin û nûjeniyên kû tê fikirîn sudmend be yan jî li bendêbûyîn kû sîstem were demokratîk kirin, wekû merc yan naçariyekê nikare were pesartin. Bi heman awayî, ger were gotin û fikirîn kû hêj dem zûye; piştî pijana şertûmercan û temamkirina amadekariyan dikare ber bi avakirina xwesertiya abûriyî ve were çûyîn jî; heman di vê watê de ye.

Rêbaza jiyana demokratîk-komînal û kevneşopiya abûriyî ya civakê kû xwe di pesêre bi hezaran sal, di deh salên dawiyê de asta vîn, hiş û rêkxistinbûyînê, bawerî û bi biryartiya kû gihiştiyê, herwusa gelek sedemên mîna; weke yek ji qadên herî girîng yên civakî derketina pêş ya qada abûriyî, bi lez dest bi avakirina xwesertiya abûriyî naçar û neyê revandin dike.

Di dawiyê de xwesertiya abûriyî, ew sîsteme kû tê de; kom û civat bi navend girtina wargehên niştecihbûnê re, têkilî û çalekiyên xwe yên abûriyî yên hem di

hindirê xwe bi xwe de û hem jî di navbera hev de heyî, li ser bingeha demokratîk, komînal, wekhevîxwaz û azadîxwaz, rêkxistin dikin. Xwesertiya abûriyî ew mekanîzmaya rêveberiya-cewherî ya demokratîke kû zihniyeta wê; ji abûriya demokratîk-komînal, avaniya wê ji komîn û kooperatîfan, awayê xebitîna rêkxistinî û banê sazûmaniyî kû di nav de cih digre jî ji meclîsên komînê û kongreya Gel, pêktê.

*******